



AHMEDÊ HEPO

HÊSIRÊN XWÎNÊ

Berhevoka Serhatiyan

PEYWEND

HÊSIRÊN XWÎNÊ

HÊSIRÊN XWÎNÊ

Ahmedê HEPO

Weşanên Peywend: 42 | Wêje

Amadekarî û ferhengsazî: Umîd Demîrhan

Edîtorê Kitêbê & Redaksiyon: Umîd Demîrhan

Berg û Rûpelsazî: Peywend

Wêneyê Bergê: Ji pirtûka *“Duderan Dawidiyan Aşîreti”*
ya Mahmut İbrahimoglu

ISBN: 978-605-81608-3-5

© Weşanên Peywend & Ehmedê Hepo

Çapa Yekem: 2018

Çap:

Sadık Daşdoğan – Berdan Matbaacılık

Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.

C Blok No: 215-216, Topkapı / İstanbul

Tel: (0212) 613 12 11

PEYWEND

Şemal Medya – Maltepe Mah. Davutpaşa Cad.

Tim 2 İş Merkezi, 8/515 Topkapı - Zeytinburnu / İSTANBUL

Tel: 0532 176 93 64

E-mail: peywend-@hotmail.com

Sertifika No: 28947

Ahmedê Hepo

HÊSIRÊN XWÎNÊ

Berhevoka Serhatiyan

Amadekarî û Ferhengsazî
Umîd Demîrhan

 PEYWEND

Ahmedê Hepo - Di sala 1934an de li gundê Şîranê (Qemerlî/Ermenistan) hatiye dinê. Di sala 1937an de tevî pêncî hezar kurdên misilman, malbata wî ji Ermenistanê koçberî Qirgizistanê dibe, lê malbata Hepo di 1942an de vedigere Azerbaycanê. Li vê derê, li navçeya Yêvlaxê dibistana amadehiyê diqedîne. Di sala 1964an de li Rewanê Enstîtuya Pedagojiyê diqedîne. Li wir heft salan di rojnameya *Riya Teze* de dixebite. Di beşa kurdî ya radyoya fermî ya Dewleta Azerbaycanê de serwêriyê dike û bi navê *Dengê Kurd* rojnameyeke kurdî derdixe. Ji azerî bo kurdî hin wergeran kiriye. Di warê roman, çîrok û folklorê de berhem dane. Ahmedê Hepo niha li Bakûyê diji.

Berhemên wî yên çapbûyî ev in:

Adar (serpêhatî, 1965)

Emir Gul Vedîde (çîrok, 1975)

Bawerî (roman, 1990)

Birîn (roman, 1996)

Karîbarên Gelê Kurd (zargotin, 2000)

Rêwiyê Bêmal (bîranîn, 2007)

Du Evîndar Du Gulle (roman, werger, 2009)

Xemildarên Jiyanê (bîranîn, 2010)

Hêsirên Xwînê (çîrok, 2018)

NAVEROK

ÇEND GOTIN AN JÎ RÊNEXŞEYA XWENDINÊ	07
Pêşek	07
QÎZA QIRQIZ	13
BEXTÊ QÎZA METÊ	38
LAÇIK.....	60
ZEHMETÊ GIRAN	74
HUB Û ZINÊKARÎ	79
EMRÊ TEZE Û RASTHATINA NEBÎRKIRÎ	92
FÎNCANA BIRÎNDAR	96
DERMANÊ DILÊ DÊ.....	101
EWLED.....	106
DARA GÛZÊ.....	113
KEVIRÊN REŞ.....	115
BAR-CEMEK	125
PERÊ MERZEL	134
HÊSIRÊN XWÎNÊ.....	140
XWÎN BI XWÎNÊ.....	156
DEVA SIPÎ	161
LO KEKO, LO BIRAO	171

SERHATİYÊN WERGERANDÎ

I. BEDEWA KURDAN / Huseyn Îbrahîmov.....	179
II. LÊ DAYÊ, BÊ LÊ DA SIMBILÊ ME ŞKÊNAND / Êlûca Atali	185
III. SURRA EVRA / Hezî Eliyêv	192
IV. ZINARÊ HÛMAYÊ / Famîl Sulêymanov	202
FERHENGOK.....	205

ÇEND GOTIN AN JÎ RÊNEXŞEYA XWENDINÊ

Pêşek

Taybetiya wêjeya kurdên Kafkasê ew e ku bi zimanê axaftinê yê rojane hatiye afirandin. Dibe ku di nava hevokê de hinek peyvên biyanî hebin; lêbelê ev peyv ziyanê nadine hevoksazî û bedewiya nivîsaran. Ahmedê Hepo jî yek ji wan nivîskaran e ku bi keda salan bi zimanê gel berhem afirandine û ev berhema wî ya duyem e ji aliyê weşanxaneya Peywendê ve tê weşandin.

Wêjeya kurdên Kafkasê ji bo çend sedeman gelekî girîng e:

1. *Ji bo dengnasî (fonetîk) û peyvsaziya kurmançî gencîneyek e. Zimanzanên kurd dikarin numûneyên wê wekî model bigirin, peyvan darêjin.*

2. *Ji bo naskirina şêweyên derbirînê hevoksaziyeke wê ya taybet heye.*

3. *Wekî belgeyeke dîrokî jiyanê kurdên kafkasî ronî dike.*

Ev “Berhevoka Serhatiyan” a Ahmedê Hepo li ser du beşan hatiye levakirin: Beşa yekem ji kurteçîrokên wî bi xwe pêk tê ku nivîsandina wan ji sala 1965an dest pê kiriye; hinek bi sernavên “Adar” û “Emir Gul Vedide” wekî pirtûk hatine weşandin, hinek jî di nava berhemên wî yên din de hatine raçandin. Me “Adar” û “Emir Gul Vedide” ji tîpên krîlî guhastin ser latînî; her wiha yên belawela weşandî di vê beşê de kom kirin. Di beşa duyem de jî hinek kurteçîrokên ku wî ji azerbeycanî wergerandine hene.

Dema ku xwendevan vê berhemê bixwîne:

-wê bibîne ku ziman û hunera nivîskarî wekî grafîkekê ast bi ast bi pêş ketiye; ji Rewanê dest bi tevgerê kiriye û li Bakuyê cîwar bûye.

-wê huner û bedewiya zimanê gel ji nêzîk ve binase ku dil nevêje zimanekî çêkirî yê sentetîk.

-ji bo ku peyvên kêmnas hatine şîrovekirin, ne te vê berhemê wê bikaribe gelek berhemên wêjeya Kafkasê bê ferheng bixwîne.

Ji bo îsbatkirina gilî-gotinên jorîn divê em vê mijarê hinekî veko-lin û bi kurtasî nêrînên xwe şîrove bikin:

a. Dengnasî:

1. Di vê antolojiyê de zimanê nivîskarî kurmanciya rojane ya gel raxistiye ber çavan. Wekî numûne li gelek cihan tîpa /b/yê vege-riyaye /v/yê an jî berevajî bûye:

nabe-nave, bibe-bive, derbaz bî-derbaz-vî...

nekebe-nekeve, derkebe-derkeve...

Cihguhestina van her du tîpan gelekî eşkere ye. Her wiha guhar-toyên gelêrî yên hinek peyvan jî balkêş e:

devra-derva, weyset-wesyet...

2. Hemû paşdaçekên /re/, /de/ û /ve/ di forma kevnare ya /ra/, /da/ û /va/ da hatine nivîsandin. Gelek caran pêşdaçek hatine ra-
kirin:

xwe ra (ji xwe ra), mal da (di malê de)...

3. Ji bo kurtkirinê gihaneka /û/yê di gelek peyvên têkildar de hatiye rakirin.

zer-zinar (zer û zinar), keç-bûk (keç û bûk), gelî-gebezok (gelî û gebezok)...

Ev kurtkirin gelekî bikêrhatî ye ji bo herikandina hevokan.

4. Gelek peyvên biyanî carina bi formata resen a wî zimanî yan jî bi formateke kurdî hatine derbirîn:

têlêgram (bi rûsî: télêgram), aylîx (bi tirkî: aylık): mehane...

5. Forma kevnare ya pirjimariyê carinan hatiye bikaranîn:

guliyêd (guliyên), palêd (paleyên)...

b. Peyvsazî:

1. Gelek peyv hene ku ji bo dariştinê û modelgirtinê baş in:
nermkêş, hevgel (hevpar, şîrîk), reşeve kirin (çîlovîlo kirin), nemebir (namebir, posteger) ...
2. Gelek peyv hene ku alternatîfa peyvên biyanî ne:
hutul-mutul (qethiyen), fe'mdarî ye (hate fehmkirin), serwaxtî ye (ez serwext bûm), agirdadayî, jehrdadayî...

c. Hevoksazî

1. Carinan navê kesê axaftî di nava du bendikan de hatiye dayîn:
-Hevalê Baltabayêv, -Velo got,- ez seva mesela xandinê hatime cem we. Lazim e em civatekê bikin.
2. Hûn ê gelek caran rastî hinek hevokan bên ku divê hûn wekî awayê li jêrê nîşandayî fêr bikin:

Mirin hatinê merî yê bimire. (Piştî mirin were merî yê bimire.)

Ew wê da hatinê, em çend eskera bi serkariya pelewane te bişîni-pêşiyê. (Ew wê da were, em çend eskera bi serkariya pelewane te bişînine pêşiyê.)

Ciwana bi wê fîncanê av vexwarinê qure qure digotin. (Piştî ku ciwana bi wê fîncanê av vexdiwar qure qure digotin.)

Birê te yî mezin înstîtût xilaz kirinê ra zewicî. (Birê te yî mezin piştî xilazkirina înstîtûtê zewicî.)

d. Ahmedê Hepo: Wekî dilsozekî zimanê bav û kalên xwe

Camêr 20ê meha gulanê ya 1934an li gundekî herêma Elegezê yê bi navê Şîranê hatiye dinyayê. Di sê saliya xwe de bi sirgûnê tê şîre-vekirin. Di sêzde saliya xwe de tevî malbatê ji Celalabada Qirxizistanê vedigere Azerbaycanê. Bi rastî malbat dixwaze vegere gundê xwe; lêbelê Ermenistan pêşiyê li wan digire û nahêle ew bizivirin ser warên xwe yên berî sirgûnê. Sal dibihurin, cîwanê ku dibistana amadehiyê li Bakûyê xwendiyê; firsendekê dibîne û tê Ermenistanê. Li wê derê dibe pisporê zanistên perwerdehiyê û tevî karwanê rojnameya *Riya Teze* dibe.

Hê di xortaniya xwe de li nava gundên kurdan digere, li ber tendûran li gel kal û pîran rûdine û çanda kurdên heyama xwe diguhêze ser kaxezê. Bi vî karê xwe ne tenê hewana xwe tijî peyv, gotin,

çîrok û serpêhatî dike; her wiha çand û wêjeya kurdî ya devkî bi reseniya wê ve digihîne nîfşên nû. Jixwe taybetmendiya zimanê Apê Ahmed ew e ku axaftina rojane ya birekî kurdan parastiye û kiriye belgeyeke nemir. Wisan bawer dikim ku nîfşên nû dê bi riya berhemên wî him dîroka vî birê kurdan zelal bikin him jî vê devokê ji gelek aliyên ve binirxînin.

Berhemên Apê Ahmed ne tenê ji aliyê zimên ve belgeyên wê-jeyî ne; her wiha ew serpêhatiyên wî jî bi qasî zimanê wî orjînal in. Her kurdekî ku bi mebesteke kurdewariyê çûye Azerbaycanê teqez riya wî bi mala Apê Ahmed ketiye; bi alîkariya wî gihiştîye mirazê xwe. Ahmedê Hepo him damezrînerê wêjeya kurdî ya kurdên Azerbaycanê him jî bi xebatên xwe alîkariya pêşveçûna wêjeya kurdên Ermenistanê kiriye. Ji serpêhatî û bîranînên wî diyar e ku di nava sînoren Ermenistan û Azerbaycanê de nemaye; di serî de Kurdistan, li gelek welatan geriyaye; doza zimanê xwe kiriye. Carinan li gel giregirên wêjeya kurdên Qafqasê rûniştîye; ketiye nava nîqaşên zimanî. Carinan fikr û ramanên xwe bi kurdên Kurdistanê û koçberiyê re pareve kiriye; heyama xwe bi awayekî zindî ragihandiye wan. Tenê berhem nenivîsandine; him berhem wergerandine kurdî him jî berhemên nivîskarên ciwan sererast kirine; bi pêşniyarên xwe rê li ber wan asan kirine û asoyên geş dane pêşîya wan.

Ji bilî çapemeniya nivîskî, ketiye rojeva medyaya dîtbarî, beşdarî gelek bernameyên televîzyonan bûye. Di konferans û semîneran de jî bi ramanên resen û serpêhatiyên zindî derketiye pêşberî guhdaran.

Ev kaniya gurr hê jî dikişe; ji heşt saliyan heta heştê û heşt saliyan her kurd dikare bêminet ji vê kaniyê avê vexwe. Em bextewar in ku di heyama wî de jiyane; bi wî re axivîne û gelek tişt jê hîn bûne. Wisan bawer dikim ku nîfşên pêşîya me jî bextewar bûne ku rêhevaltiya Ahmedê Hepo kirine û li pey xwe şahidekî rastgo hiştine. Her wiha nîfşa li pey me jî dê bextewar bibe ku bi saya Apê Ahmed aveke paqij a zelal vexwariye. Sîpasî ji bo te Apê Ahmed; Xwedê kir, Xwedê tu dayî gelê me.

Umîd Demîrhan

27.02.2017, Bazîd

HÊSIRÊN XWÎNÊ

Berhevoka Serhatiyan

QÎZA QIRQIZ

Bihar bû. Îdî hulm-gulm ji erdê dikişiya. Te'vê tîrêja xwe davîte ser çiyayê bajarê Kok-Yangakê. Berfa li berekê çiya diheliya. Çemê ku nav bajêr ra dikişiya diha gur dibû. Carina usa dibû, wekî av ji kendalê çem derdiket. Ji meha biharê ya ewlîn xêlê ro derbaz bûbûn: kulîlkê rengrengî li hev ketibûn. Meriv ku li çiyayê pêşberî bajêr dinihêrî hew zanibû cinet e.

Dara kulîlk dabûn, bîna wan dûr va notla gulavê dihat. Merî ji bîna wana têr nedibû.

Çivîka dikire wîtewît, berî hev didan, hev ra şa dibûn, te tirê digotin: "Bihar e, bihar."; lê dûmeqeska li ser bana hêlînê xwe çêdikin.

Bajarê Kok-Yangakê orta du çiyayê dirêj e notla kejiyê kurda cîwar bûye. Xelazbûna çiya tune; lê wextê dadigerî tu hêdî hêdî xatirê xwe çiya dixazî û dertêyî deştê kolxoz û sovxoza².

Ew bajarê çûk³ î quntara çiyê çiqasî bêjî bedew e. Çem diha bedewiyê dide wî.

Hema devê çem, aliye rastê bin dara gûzê ye mezin da odeke sê çe'vî hatiye danînê. Fêza wê odê da, aliye rastê çe'vê te çiqasî dibire mêşe ye. Zarê bajêr diçine nav mêşe, xwe ra digerin û bi eşq ber bi

1 te tirê: te qey digot.

2 kolxoz û sovxoza: dema Yekîtiya Sovêta berê de koperatîfên gundîyan bûn. Gundî dibûne endamê kolxoz û sovxoza, kê kar dikir, dewsa heqê xwe, rojebat distand. Pêş rojebatên xwe dawiya salê kolxozê çî direşand û diçand ew distand.

3 çûk: biçûk

malê xwe vedigerin. Wextê kal û pîr wan dibînin dikine axînî, axir emrê wan î berê ne tu emir bû.

Mala Hesenê Mehmed ber çêm bû. Apê Hesen pêncî û pênc salî bû. Ewî emirê xwe payê pîr nav rojê reş da derbaz kiribû. Hetanî êvarê seva zike nan mala vî begî, wî axayî xulamî, şivanî, gavantî kiribû; lê nebibû xudanê xwe tişteki.

Bira axiriya meriv xêr be. Rastî axiriya wî, wî ra hatibû. Wekî te ji Apê Hesen bipirsiya: “Apo, te cahiltiya xwe çawa derbaz kiriye?” Wê bigota: “Cahiltiyê da bûme şivan, gavan, xulam; lê paşê bûme xudanê kura û qîza.”

Kulfetê mala Apê Hesen ne haqasî giran bû. Ezîz nuxuriyê wî bû. Xortekî nîvçe, navmil e pehn bû. Te hewas dikir eniya wî ye kever, çe’vê wî ye reş, buriyê wî ye qeytanî binhêriya. Ezîz bîst salî bû. Malê da her Apê Hesen dixevitî. Ezîz berî şer dersxana hevta xilaz kiribû. Qîza mezin, Gulê dersxana şeşa, ya çûk, Terê, dersxana çara da dixwand. Ceyran nedixevitî. Bê feqîrê qil-qop kiribû. Hetanî sî-sî pênc saltiya xwe wê tu roja baş nedîtibû. Ewê nizanibûye orxan-doşek çi ne. Bê orxan-doşek li erdê nermkêş, li ciyê sik e sar razabûye. Ewê timê xwezila xwe qîzê xwe danî û digot: “Hûn e bextewar in, bextewar.”

Sibe teze safî bibû. Xuşexuşa ava çêm bû. Bayê biharê yî hênîk belgê dara ra dilîst, çivîka li ser dara gazî hev dikirin. Meriyê ku vê berbangê mal derdiket usa hesab dikir, wekî teze ji diya xwe bûye.

Ezîz jî vê berbangê rabibû. Îro ew hinekî derengî ketibû, lema ber bi şextê¹ dilezand. Wexta gihîşte ber derê şextê, yekî para va çe’vê wî bi her du desta girt û got:

-Eger te tê derxist kî ye, ez ê çe’vê te vekim.

Ewî wê deqîqê dengê hevalê xwe yî qirqîz nas kir û got:

-Tajibay, ew tu yî?

Ewana sibexêrî dane hev, Silo hat. Vê demê Ezîz got:

1 şexte: kana komir

-De gelî hevalno, mesekinin, zû bikin em dest bi xebatê kin.

Xebat gumreh¹ diçû. Ezîz him komir dikola, him wî xeber dida:

-Gelî hevala, wekî ev şer nîbûya niha me komir bi vî teherî nedi-kola. Hûn rind zanin ewî şerî çî zîyan da me.

-Belê, usan e, -Tajibay got,- lê xebata desta gelekî nakişîne, we-dekî kin da gişk ê bi maşînê bê serî.

Siloyê ku xeber nedida nîşkê va got: "Bira dost dost be, dijmin jî kor be."

Eva mehek hebû ku Ezîz erze² ser navê dîrektor³ nivîsibû û qe-bûlî şextê bibû.

Cara ewlîn wextê Silo digot wekî "were şextê, tev min bixebite" ew razî nedibû; lê axirî ew razî bû.

Roja ewlîn bona wî ze'f çetin bû. Usa dibû, dixast bihêle bireve. Lê ji heval-hogira şerm dikir. Xên ji vê yekê ew î rûnêrm bû, çî digotî-nê, çî şuxul didane extiyarê,⁴ bê gilî diqedand, bona vê yekê teva ji wî hiz dikirin.

Êvar bû. Telte ewrê reş ser şextê da girtibû. Baraneke hûrehûr direşand. Barana biharê... Çiqas xweşî mêriv tê. Ewê belgê darê mêşa usa şuştibû, ku dûr va mîna şûşa dibiriqîn.

Palêd ku sirîya⁵ xwe xilaz kiribûn vedigeriyane malê. Ezîz û he-valê xwe va teze ji xebatê derketibûn û hev ra şîrin-şîrin xeber di-dan.

Ezîz gotî ji wan biqetiya, hema wê demê Alîk got:

-Te herî mal here, lê siheta heyşta were em herine kînoyê.⁶

Te'rî ketibû erdê. Ewra apinciyê xwe yî reş qest-qerezi avitibû

1 gumreh: xurt.

2 erze: erzehal, daxwaznameya fermî.

3 dîrektor: rêvebir, gerînende, mudîr.

4 çî şuxul didane extiyarê: çî kar dispartînê, çî wezîfe didanê.

5 palêd ku sirîya xwe xilaz kiribûn: paleyên ku vardiya xwe xilaz kiribûn

6 kîno: sînema

ser bajêr¹. Lê bajar mîna hîva çardeşevî şewq dabû. Li her soqaqê da bextewarîk, şayîk hebû. Qîz-xort deste-deste hevraz-berjêr diçûn û dihatin. Ezîz jî ber bi xanmanê kînoyê dilezand. Wextê ew gihîşte wir Alîk û Nînayê bilêt stendibûn, hîviya wî bûn. Zengil kire zingîn, meriv çûne hundur. Îşq vêsandin², ser ekranê hate nivîsarê: “Molodaya Gvardiya”.

Heyf, sed car heyf, nişkê va qeytana kînoyê qetiya. Hey gidî, çima kînomexanîk³ xam e? Na, na; lê ewî ev şera ber çe’vê xwe dîtibû, lema... Ewî elbê ra⁴ rast kir û dîsa şikil hate nîşandayîn. Vê demê Ezîz ketibû fikirê kûr û ser milê xwe yî rastê nihêrî. Tacîkxan kêleka wê rûniştibû.

Birînê hubê⁵, birînine xedar in, ew birîn tenê wî çaxî sax dibin, wekî hub xwe hekîmiyê li wan bike.

... Tacîkxan e bedew bû. Guliyêd wê⁶ ye reş e dirêj rast gûzekê wê diketin. Ezîz zû va dixast wana mîna deste gul qevt ke,⁷ lê...

Kîno kuta bû. Ezîz berî gişka derketê derva, wekî çend giliya wê ra bêje; lê Alîk û Nîna jî pey wî derketin. Nînayê dît ku Ezîz mitala dike, got:

-Ezîz, çima usa bê mede sekinî yî? Ware em herin.

Ewana bi xeberê şîrin-şîrin xanmanê kînoyê dûr ketin.

Wê demê Silo hat, gihîşte wan û got:

-Kînoyê gelekî hukumî ser dilê min kir. Bavê min..., kela wî tijî bû.

-Silo, qe kelogirî neve,⁸ -Nînayê got,- ne jî derd têke dilê xwe. Tu tenê nîn î, şer gelek êfîm hiştin, lê tişt nabe...

1 ewra apinciye xwe yî reş qest-qerezî avitibû ser bajêr: ewra kincê xwe yî reş rasterast avitibû ser bajêr.

2 îşq vêsandin: çira damirandin.

3 kînomexanîk: tamîrkarê sînemayê.

4 elbê ra: hema pê re.

5 birînê hubê: birînen evîndariyê.

6 guliyêd wê: guliyên wê.

7 qevt ke: zeft ke.

8 neve: nebe

Ezîz qe xeber nedida, Silo nihêrî, wekî ewî pirçî¹ kiriye, jê pîrsî:

-Canim, tu çima qe xeber nadî?

-Ez ê çî xeber dim?

-Ez rind zanim, çima usa bê mede yî. Tişt nave, rok ê bê wekî tu yê bi mirazê xwe şa bî.

Li ezmanê sût her steyr dihatine kivşê².

Wextê ezîz gihîşte derê malê careke mayîn serê xwe hilbirî³ li ezmanê sût nihêrî û dilê xwe da got: "Gelî steyrkno, hûn bûne şehe-dê gele, gele evîntiyê dila, gele miraz bin îşqa we da gihîştine hev, qetiyane. Kî zane çiqasê nolî min e dilhebandî, kewran⁴ girêdane, yanî hema tiktenê rê ketine, bi îşîqa we rê bijartine, şevê dirêj qe ranezane, lê ez...."

Kew teze ketibû sibê⁵. Neferê mala Apê Hesên xêncî Gulê hê xewa şîrîn da bûn. Ewa zû rabûbû, wekî hinekî dersê xwe binhêre, dît ku birayî hê razaye, dey lê kir⁶:

-Ezîz, Ezîz, rabe! Tu îro ji xebatê mayî.

Ewî çevê xwe vekir, sehetê nihêrî, dît ku pênc deqa ji xebatê maye. Zû zû kincê xwe, xwe kir û bi lez derket.

Ber şextê ew rastî serwêr⁷ Baltabayêv Sûltan hat. Serwêr qe hiz nedikir, wekî xebatê derengî kevin.

-Ezîz, eva çî hewal e?

-Hevalê Baltabayêv, ez îro hinekî nexweş im...

Serwêr îzna wî da, ku ew here mal.

Ewî rê va xwe xwe ra digot: "gelo ez çawa bikim, gelo çima ke-

1 ewî pirçî kiriye: bê mede sekiniye, li ber xwe dikeve.

2 li ezmanê sût her steyr dihatine kivşê: li esmanê şîn û kesk tenê stêrk dihatine kivşê.

3 careke mayîn serê xwe hilbirî: careke din serê xwe bilind kir.

4 kewran: karwan.

5 kew teze ketibû sibê: sibe teze ji hev zelal dibû

6 dey lê kir: deng lê kir, gazî kirê.

7 serwêr: serwer, serkar

time vî halî? Kî nifira cahila dike, bira bêje: ‘Agir-alava hubê te bi-peritîne’.”

Hub û hizkirina Tacîkxanê Ezîz ji rê-dirba dexistibû, ne şeva wî şev bû, ne roja wî roj.

Te qey digot ew î merivekî serxweş e, qe nizane çi dike, ku da diçe.

Ew gihîşte mal, dê nemek da wî¹, ewî neme vekir û xwend:

“Îro êvarê sehet 8a li mektebê civat e. Em tewaqe dikin², seba zara xwe werine mektebê.

Serkara dersxana şeşa Tacîkxan.”

Dû xwendina nemê ra te tirê ava kaniya miçiqî kire bilqebilq, ewî jî devê xwe kire avê, têr vexwer û got: “Dilê min rehet bû.” Şa-bûna dayîk hemêz kir. Seyranê nizanibû ew çima usa şadibe bûye û pirsî:

-Lawo, ew çi kaxez e?

-Dayê can, êvarê li mektebê civat e.

Seyranê mîna zara pirçiyê xwe kir û xwest derbazî oda din be, derî kutan³. Cemê hate hundur. Seyrê nehişt Cemê tu giliya bêje, bire oda dinê û gotê:

-Lê Cemê, xûşkê, porkurê ser min da. Ezîz bûye aşiqê wê qîza qirqiz e heystê ciyî geriyayî. Lê min dixast qîzika te jê ra bixazim.

-Seyrê, çima mîna zara xeber didî, min ra dibêjin Cema Nadir, ez ê orta sê roja da Tacîkxanê ber çe’vê wî reş kim.

Cemê ev giliyana gotin û dêrî va derket. Hê wextê Ezîz û Dilber çûk bûn xûşka ewana bêşkertme kiribûn⁴. Niha îdî wextê wan î zewacê bû. Lê Ezîz nedixast qîzxatiya xwe bistîne. Dê û bavê jî digotin, na gerekî hutul-mutul⁵ qîza wê bistînî. Bona vê yekê çendik çend cara mala wan da bibû qalmeqalm.⁶

1 dê nemek da wî: dê nameyek da wî.

2 em tewaqe dikin: hêvî û rica dikin.

3 derî kutan: li derî xistin.

4 bêşkertme kiribûn: di zaroktiyê de ew bi hev re zewicandibûn.

5 hutul-mutul: qethiyen

6 qalmeqalm: nîqaş û qelebalix

... Wextê Ezîz gihîşte mektebê dît ku dê û bav dersxanê da rûniştine û hêviya dersdaran in. Êmê du-sê dedîqa şûn da dîrektorê mektebê kete hundur, paşê dersdar.

Dîrektor rabû, civat vekir û gilê da Tacîkxanê. Ewa cîyê xwe rabû, çe'vê xwe gerand û dest bi xebardana xwe kir, kutasîyê¹ ewê got:

-Gelî dê û bava, em gerek tevayî çîqa² qeweta me heye berev kin³, zarê⁴ xwe rind terbiyet kin û diha baş bidine xwendinê. Paşê qîmetê⁵ her zarekê got û bi vê yekê va xebardana xwe xilaz kir.

Nava vî wedeyî da Ezîz qe çe'vê xwe ji çe'vê qîzikê nedibirî, carina çe'vê wan li hev diket, hizkirina wî mîna meqledûzê⁶ mezin û qewet, çawa hesin-gîsina pey xwe dikîşîne, usa ber bi xwe dikişand.

Civat kuta bû, Ezîz çû ser riya Tacîkxanê sekinî, wekî tev herin.

... Ew salek bû ku Tacîkxanê li bajarê Frûnzê înstîtût xilaz kiribû û mekteba nehsalê da çawa dersdar⁷ dixebitî.

Îdî çend meh bûn ewa ser Ezîz, Ezîz jî ser wê bengî⁸ bibû.

Tacîkxanê xwest, wekî usa rex Ezîz ra derbaz be, ew bi wê nehese; lê nebû.

-Ezîza min, -ewî got,- axir ha nave, îdî bes nîn e, wekî em agirê hubê da bişewitin? Were ez te birevînim.

-Na, Ezîz, xêr. Axir em dixazin miqabilî⁹ edetê kevn têkine şer; lê xwe jî dixazin edetê kevin teze kin. Revandina qîzê jî tiştêkî paşda-mayî ye. Çima gerekê ez te ra birevim, eger tu qoçax¹⁰ î dê-bavê xwe bide înakirinê.¹¹ Ewana usa difikirin, wekî ez çend sala tenê bajarê

1 kutasî: dawiya dawîn.

2 çîqa: çîqas.

3 berev kin: berhev kin, kom kin.

4 zar: zarok.

5 qîmet: pûan.

6 meqledûz: miqnatîs.

7 çawa dersdar: wekî dersdar.

8 bengî: aşîq û sewdaser.

9 miqabil: hember, dij.

10 qoçax: jîr û jêhatî

11 înakirin: bawerkirin.

Frûnzê da mame û min namûsa xwe pêpes kiriye;¹ lê ne usan e, tu wana ra bêje.

Ewî şerma dengê xwe nedikir. Serê xwe kiribû ber xwe, deng jê dernediket. Tenê guh dida wan giliyê heqiyê.²

Xêlekî şûn da kêlimî:³

-Rihana min, wî çaxî wextekî dirêj lazim e ku ez dê-bavê xwe serwaxt kim.

-Belê, belê usan e, lez mekeve. Ji min metirse, ez ê hîviya te bim.

Ezîz ewa bir, derxiste mala wan, xatirê xwe ji wê xast û şûn da lezand. Ewî dilezand, wekî zû xwe malê ra bigihîne û dê-bavê xwe ra xeber de. Wexta ew çû hundur, kalik-pîrik ketibûne xeweke şîrîn, qêmîşî wan nekir⁴ ji xewê rake.

Zimezim⁵ ketibû şextê. Dengê kulinga⁶ mîna zengila bîra komirê hingavtibû. Ezîz û Silo kêleka hev dixebitîn. Wana bi hev ra kuling bilind dikirim û jor da dianîn, şeltê komirê ye reş e qetran dixistin, jor da dihanîn xar, vagonê komirê tijî dikirin û verê dikirin.⁷

Wextê firavînê bû. Ezîz, Silo û Alîk nanê xwe dixarin. Ezîz got:

-Silo, me ji plana xwe ye îroyîn hê pêncî heyşt selef qedandiye.

-Tişt nave, hetanî dora me xilaz be em ê diha bicedînin.⁸

Ser vê xebirdana wan da brîgadvanê⁹ şextê hat û got:

-Ezîz, bîra komirê ye hejmara sisiya da avê leqem daye¹⁰, hinek kêranê ku li erdê dixin ji cî hejiyane, gerekî herî wira, wana bidî

1 pêpes kiriye: bînpê kiriye, pê lê kiriye.

2 giliyê heqiyê: gotinên rast û durist.

3 kêlimî: axivî.

4 qêmîşî wan nekir: dilê wî li ber derneket û xwe ranegirt.

5 zimezim: 1. dîngedîng 2. dengê pez û berxan.

6 kuling: tevir.

7 verê dikirin: bi rê dikirin.

8 bicedînin: hewl bidin û bixebitin

9 brîgadvan: serkarê ewlehiyê, kontrolor.

10 avê leqem daye: avê jê avêtiye, lûleya avê qelişiyê.

mehkemkirinê. Wira xêncî te merî dîsa hene, min temî daye wan jî, fesal bixebitin ha...

Hinekî şûn da ewî ew spartin xilaz kir û hate ser xebata xwe.

Wextê xebatê yî şîrîn da Ezîzî got:

-Silo, derdê Tacîkxanê ez helandime.

-Lo Xudê hîştî, tu ev jî ne wextê berê ye, dê-bavê xwe bişîne, bira herin, belgê pê da kin.

-Tu çi ji gurçika xwe ye germ xeber didî? Dê-bavê min çawa zare-ke ne's¹ hespê siyar be û bikî-nekî peya nave, a usa edetê kevn siyar bûne û naxazin peya bin. Xatiya min jî hevgele² wan e.

-Canim, ew çi dixaze?

-Xastina wê ew e ku ez qîza wê bistînim.

Silo îdî tu gilî negot û hêrsa bi zexm kuling komirê xist.

... Îdî havîn bû. Zeviyêd gênim, ceh û noqîta ye biniya bajêr dûr va mîna pelêd rengewazî³ dihatine kîvşê. Darê reza reng reng barê xwe girtibûn, serê xwe berjêr kiribûn û çêrê serî raxistî ra ketibûne lecê.⁴

Şextê da jî gele guhastin hatibûne kirinê, bîrê teze dihatine vedanê û şuxulê bi desta hatibû mexanîzasiyakirinê.⁵

Wextê dorguhastina ewlîn bû. Velo, katibê komsomola⁶ yî pêşîn, ji mal derket diçû xebatê.

Ew gihîşte şextê. Derê kabînet⁷ dîrektorê şextê Baltabayêv Sûltan kuta û kete hundur, sibexêrî da dîrektor. Ewî selama wî vegirt û cî nîşan da ku rûne.

-Velo, zanî çi heye?

-Çi heye hevalê Baltabayêv?

1 ne's/nehs: şûm.

2 hevgele: hevpar, şîrk.

3 rengewazî: rengrengî.

4 lec: nîqaş.

5 hatibû mexanîzasiyakirinê: hatibû mekanîzekirinê, bi makîneyan dihate kirinê.

6 komsomol: rêvebirî.

7 kabînet: buro, nivîsgeh.

-Lazim e, wekî em leca sosiyalîstiyê diha bidine firekirinê.

-Hevalê Baltabayêv, -Velo got,- ez seva mesela xandinê hatime cem we. Lazim e em civatekê bikin.

Dîrêktor serê xwe hilbirî û got:

-Belê sibê da. Tu rave here şexta çilî, binêre li wir komira duh derxistî îşev şandine yanê na? Paşê, sehetekê şûn da, min ra zengil xe.¹

Velo gihîşte şexta çilî, brîgadvanê şextê Tatbik ji hundur derdiket. Ewî pirsî ku komira duh vedayî rast kirine, yanê na? Brîgadvan bi beşereke xweş got, wekî xortê mîna Ezîz, Alîk û êd mayîn qe dihêlin komir erdê bimîne. Velo razî ma û her du bi hev ra vegeriyan hundurê şextê. Katibê komsomola yî pêşin ketibû pêşiyê, brîgadvan jî dabû pey. Nişkê va çe've wî li stûneke ji ciyê xwe leqiyayî ket, ew sekinî.

-Hevalê Tatbik, ev çi ye? Ewî destê xwe da stûnê, nihêrî ku diheje. Tatbik hêdfika, çawa merî here diziyê, xeber da ku min qe bala xwe nedayê. Velo bi hêrs got:

-Lê navê şuxulê we çi ye? De zû bikin, yanê wê stûnê biguhêrin, yanê bidine berkkirinê.²

...Êvar bû. Sera klûbê bi meriva va kimkimî bû. Dengê qîz-xortêd cahil nava hewê da mina dibûn.³

Hinek derbaz bû, dîrêktor hat. Her tişt pêş da hazir bû. Dîrêktor selam da hazira û derbazî hinda dikê bû. Katibê komsomola Veloyê Biro, civat vekir û gilî da dîrêktor.

Têlê sipî zû va xwe avîtibûne serê Baltabayêv, lê wextê ew rê diçû, usa qivrax û şidiyayî diçû, qe xortê çardeh salî mîna wî nikaribû rê biçûya. Wextê Velo gilî da wî, ew ji ciyê xwe çapik rabû ber dikê.

-Gelî hevala, -ewî got,- hûn rind zanin, wekî şexta me ro bi ro gul vedide. Lema şexta me bona xebata xwe ye baş bi ordêna Lenîn

1 min ra zengil xe: telefonî min bike.

2 berkkirin: xurtkirin, mehkemkirin.

3 mina dibûn: winda dibûn.

hatiye rewakirinê¹. Ev rewakirin me borcdar dike, wekî em diha rind bixebitin û cem partiya û hukumeta xwe ye delal rûspî derên.

Pey kêlma² dirêktor ra geleka xeber dan. Paşê gilî dane Velo.

Ewî rabû tomerî xeber da. Cara ewlîn da kîvîşe çawa komsomolê sextê ro bi ro pêş da diçin û kî ye ji wan derbdar.

Paşê civatê qirar qebûl kir, wekî gelek cahila bişînine xandinê.

Ji wan cahilêd ku wê biçûyana xandinê, ji gişka Ezîz gelekî şad bû. Çimkî him ew ê biçûya xandinê, him ew ê li Celal-Abadê rastî Tacîkxanê bihata.

Berî çûyîna xwe ewê dîsa mesela xwe û Ezîz dersdara ku, wê ra dêtî kiribû qise kir; Sonayê Tacîkxanê ra got:

-Qîza min, min nava emrê xwe yî pêncî saliyê da gele hub û hiz- kirina qîz-xorta dîtiye. Hene ew xort ku şev-ro pey qîza digerin. Lê paşê... Ezîz î bi bejn-bala xwe va xortekî ser xorta ra ye. Lê kî zane dilê wî da çi heye. Kî zane ew xudanê çi xeysetî ye. Eva yeka mese- leke here çetin e, rind bifikire. Hene cahilê usa ku qe dûr-kûr nafi- kirin û rastî hev tên dizewicin. Kî lez ket jê diçe. Hûn gerek e rind hev nas bikin, çawa cimaet divê: "Hûn gerekî têkevîne kirasê hev." Qerez³ usa bikin, wekî axiriyê da poşmantî tunebe.

Tacîkxan hêdîka ji ciyê xwe raû ewa hemêz kir û got:

-Heta roja mirinê ne te, ne jî şîretê te bîr nakim.

Paşê ewê xatirê xwe ji Sonê xwest û hate mal. Xêlekê şûn da ew ê bihata stansiyayê û bi poêzê biçûya kûrortê.⁴ Berî wê ewê Ezîz ra gotibû, wekî filan rojê ez ê herime kûrortê. Ezîz ew sehetek bû li stansiyayê hîviya Tacîkxanê bû. Xort hê dûr va ewa dît. Destekî wê da şemsper, destê dinê da çemedanekî sivik hebû.⁵ Ewê ku Ezîz dît ber bi î hat û selam dayê.

1 bi ordêna Lenîn hatiye rewakirinê: bi madalyaya Lenîn hatiye xelatkirinê.

2 kêlm: xebardan.

3 qerez: qethiyen, tegez.

4 xêlekê şûn da ew ê bihata stansiyayê û bi poêzê biçûya kûrortê: bîstekê şûn da ew ê bihata rawestgehê (termînalê) û bi trêne biçûya germavê.

5 destekî wê da şemsper, destê dinê da çemedanekî sivik hebû: di destekî wê da şemsiye/sîwan, di destê dinê da çenteyekî sivik hebû.

-Tacîkxan, -ewî got, - tu diçî; lê min bîr neke, min ra qe nebe çend nema binivîse.

-Ezîz, ez ê çî binivîsim, mehekê şûn da ez ê vegerim.

-Delala min, eva çend car e, wekî ez û tu astî hev tîn û xeber didin, ancax tu gilîkî rast mi ra navêjî, diqewime tu ji min îna nakî?

Te qey digot Ezîz tê derxistibû, wekî Tacîkxan jî wî hez dike; lê ... sebir dike, wî dicêribîne. Ewê nihêrî, wekî Ezîz aşiqê wê yî rast e, sura dilê wê zû cem kiriye lema got:

-Ezîz, lez nekeve, merî bi sebrê digihîje mirazê xwe. Ez ê te ra çend giliya bêjim, lê dîsa sebir bike. Bizanibe, wekî ez ji te pêştir soz nadime tu kesî. Ancax, we'dê dirêj¹ lazim e ku em hev rind nas kin û fehm kin. De bi xatirê te, ez çûm.

Poêz hêdî hêdî ji ciyê xwe leqiya. Ezîz bi beşereke xweş vegeriya mal. Rê va xwe ra digot: "Ewa qîzeke bi namûs e, ew ji min rasttir nêzîkî mesela paşwextiyê dive. Ezîza min, bira gotina te be. Ez ê sebir bikim."

Wexta Ezîz hate mal xûşk e razayîbûn; lê dê-bav hişyar bûn.

-Ez qurban, -elbê ra dê nan anî, danî ber lawê xwe û got, - ez heyran bixwe.

-Kurê min, -Hesen got, - civat çawa derbaz bû?

-Bavo, ez î gelekî birçî me, bihêle nanê xwe bixum, paşê.

Ezîz ku nan xar, xilaz kir, got:

-Dayê, tê bîra te min digot ez ê herime şextê bixebitim, te digot na, neçe nekeve wê "gor"ê; lê kurê te him navê derbdariyê² stend, him jî min dişînine xandinê.

Dê-bav gelekî şa bûn. Civatê da çî bibû Ezîz gişk hûr hûr qise kir. Seyranê pirsî:

-Tu yê çend sala bixûnî?

-Wê me bişînine texnîkûma çarsale³.

-De, ez qurban, werê em te bizewicînin, bûkê bide ber destê diya xwe û te ra oxir be, here.

1 we'dê dirêj: demeke dirêj.

2 navê derbdariyê: navê xelatgiriye.

3 texnîkûma çarsale: lîseya pişekariyê ya çarsale.

-Dayê, tu şikir tenê nîn î, du qîzê mîna xezala ber destê te dixebitin.

-Lê ez qurban, wekî dilê te yî zewacê tune çima pey qîza qirqîz digêrî?

-Dayê, bavo, ez ji wêya hiz dikim.

Seyranê xwest xeber de, Hesên nehîşt.

-Kurê min, axir ewa ne ji mîletê me ye.

-Bavo, çima usa xeber didî, ze'f jî, ji mîletê me nîn e.

-Ezîz, -Seyranê bi hêrs got, - min hîşt tu wê qîzê bînî mal, gerekî navê xwe biguhêrim.

-Dayê, kesek pêşya hub û hizkirinê nesekiniye, kî jî sekiniye xêr nedîtiye, xênî vê yekê guh bide min, binê qîz-xortêd bengî çî gotine:

Sê tişt hatine dinê min tevayî,

Divên yek mirin e, yek xelayî, yek jî huba dila,

Mirin hatinê merî yê bîmire,

Xelayî hatinê merî yê bi pincarê bîdebire,¹

Lê ji huba dîlşkestinê

Tu car, tu car li ser şêx mella nacebire.

Hesên xwe ker kir, lê Seyranê dîsa xeber da. Ezîz rabû ser piya û got:

-Dayê min ra hine nan bipêje, mirîşkekê jî sor ke, karê kurê xwe bike, ne lawê te diçe xandinê, -ewî got û derbazî oda dinê bû.

Seyranê Hesên ra got:

-Min te ra digot, îdî wextê gende ye, em bi serî kin², te digot na, zar e. Xudê qebûl nekirê, berê qîz çardeh salî didane mêr, kur jî panzdeh salî de dizewicandin.

-Ê, Seyran, -Hesên bi hêrs got, - çî te bi edetê kevn î çirûk va girtiye bernadî. Berê me orxanek nedidît bavîta ser xwe, niha jî ser kerevata³, orxan-doşekê rû mexmer da radizên.

1 bîdebire: aboriya xwe bike.

2 em bi serî kin: bizewicîn.

3 kerevat: ranza, baza.

-Pak, gotina te çi ye? Xortekî mîna Ezîz here qîzeke qirgîza ye heyştê ciya geriyayî bistîne, erê?

-Stend jî wê bistîne, jinik, ez çi bikim?

-Sibê rave em herine mala Cemê qîza wê Ezîz ra bixazin.

-Seyran, tu ji dilê xwe xeber didî? Ne cimaet divê: "Bûk e bi dilê zavê ye." Eva çûn, me qîzik xast, paşê Ezîz jî lê neve xuyî, em ê nav xelqê da rezîl bin.

-Sibê gerekî em Ezîz ra xeber din, paşê xêr-xaşî rast kine xandinê.

Ezîz oda dinê da ev giliyana dibihîst û ew xwe, xwe xwe ra difikirî: "Tu xirab bî zemanê kevn, çawa xerab bûyî. Hela binihêre çiqasî hukumî ser merivê berê kiriye. Lê guneh gişk dîn da ye. Bin-hêre dîn çi aniye serê millet. Dîn millet hev daye qirê. Tişt nave, zûdereng ez ê bice'dînim van fikrê kevn e rîziyayî ji serê wan bidime derxistinê."

Ezîz bi van fikra kete xewa şîrîn. Sibetirê lawkê ku wê biçûyana xandinê gişk berevî kabînetê Velo bibûn. Kaxezê wan hazir dîkirin. Velo lawka ra got, ku rabin herine mal, we ra çi lazîm e hildin, du seheta şûn da werêne ber stansiyê, ez ê jî we ra bême Celal-Abadê.

Ezîz ku hate mal bav î ne mal bû; lê Seyranê û qîza hazirîya wî didîtin.

-Kurê min, -Seyranê got,- tu zanî em ê herin qîza Cemê te ra bixazin?

-Na, dayê, ez nîzanim û naxazim bizanibim jî. Dayê can, dilê min wê da tune. Lê hûn ê çawa min ra ewê bixazin? Xwe em "çe'vgirtinok" nalîzin ku, tu çe'vê min bigirî û mîna mirîşka şevkorî dora xwe bibî-bînî.

Ser vê xebêrdanê da Hesên hat. Paşê dê û bavê gotin:

-Em ji vê yekê ditirsîn, wekî tu Tacîkxanê bînî, ya me hev negire, em hev ra rê neçin.

-Bavo, ew yeka destê min da ye. Lê hê ortê tişteke tune, belkî ya min Tacîkxanê hev negirt...

-Ezîz, diya te xwe ra gotiye, ji oxira xwe nemîne.

Ezîz xatirê xwe kulfetê malê xast û xast ku derê, dê giriya. Ezîz ku dît dê digirî, vegeriya destê xwe stûyê wê ra bir û got:

-Dayê can, tu ez diçime ber şer tu digiriyî? Megirî, ez diçime xandinê. Qet fikra meke.

Wextê Ezîz û hevala va gihîştine bajarê Celal-Abadê îdî êvar bû. Velo ewana birine mêvanxanê, cîwar kir û got ku em ê îşev vira bin, sibê ez ê herime cem dîrêktorê texnîkûmê we ra razanxanê da cî bistînim.

Wê şevê Ezîz hetanî berbanga sibê raneza. Ew kêlek, kêlek wel-digeriya¹. Îna nedikir gelo sibe yê çi wextî bê wekî ew here kûrortê, Tacîkxanê bibîne.

Sibetirê Ezîz întiham dida² û ew vala nîbû, wekî here kûrortê. Lê wexta ji texnîkûmê derket wekî here razanxanê orta kuçê da ew Tacîkxanê va rastî hev hatin.

Her du ji zûr bûbûn, li rûyê hev dinhêrîn.

-Ezîz, -Tacîkxanê got, - tu ev dera?

Ewana ji rê derketin, xwe dane bin darê; Ezîz got:

-Tacîkxan, hela bêje tu ye çewan î, pak î?

-Ze'f razî me, Ezîz, ez e pak im.

-Tacîkxan, ez û hinek hevalê me şandine vira xandinê.

Qîzik ji wan giliyê Ezîz gelekî şa bû, got:

-Bice'dîne rind hîn be, gele tiştê baş bin erdê mêşê³ me da hene, gerekî bikaribî sura wana hîn bî û wana bidî dîharkirinê.⁴

-Bê gilî, ez ê bice'dînim rind hîn bim.

-Lê tu niha ku da diçûyî?

-Min dixast herime razanxanê, lê tu?

-Min ji ûnîvêrmagê⁵. Wekî wextê te heye em tev herin.

Ewana wê rojê têr geriyan, tu hesret dilê xwe da nehîştin. Paşê qîrar kirin êvarê herine kînoyê.

1 weldigeriya: werdigeriya, diziviriya.

2 întiham dida: îmtihan dida.

3 mêşe/bîşe: daristan.

4 bidî dîharkirinê: bidî diyarkirinê, derxî holê.

5 ûnîvêrmag: marketa mezin.

Hela heta destpêbûna kînoyê xêlê wext¹ hebû. Ezîz Tacîkxanê va rûniştibûn xwe ra xeber didan. Mal çî qewimîbû Ezîz Tacîkxanê ra qise kir, ewê îcar bi temamî îna kir, wekî Ezîz aşîqê wê yî heqiyê ye.

-Ezîz, -Tacîkxanê got,- tu ne bavê xwe ra, ne jî diya xwe ra seva min gulê te'ltir tiştêkî nebêje. Dikarî wana wê bela edet derxe ser riya heqiyê. Dîsa divêm, lez nekeve... Bixûne, xilaz ke paşê.

-Na, Tacîkxan, min ku kûrsa yekê xilaz kir, xêr-xaşî em ê de'watê bikin.

-Ew şuxulê te ye, Ezîz. Ez ê pênc roja şûn da vegerime mal, tu yê vira tenê bimînî. Lê ber xwe nekeve. Ez ê timê te ra binivîsim.

Wê xeberdana Seyranê û Cemê şûn da ewa çû mal, hine pere hilda û berê xwe da mala Melle Fetî. Wexta ew hate hundur melle çay vedixar. Melle ku Cemê dît, wê sehetê havîte zimanê narê² û got:

-Jinik, jinik, Cemê ra tiştêkî dayne bira rûne.

Ewa ku rûnişt Melle bi rûvîti halê wê û kulfetê malê pirsî, paşê ber xwe neda, got:

-De bêje, tu çî qewî hatî?³

-Melle, ez qurbana te, wî ceddê te û kitêba te me, Xudê ji kurê Hesên biriye, riya Xudê derketiye, bûye aşîqê qîzeke qirqiz. Divê⁴ heye ew e, tune ew e, ez ê wê bistînim. Ez qurbana wê riya te me ku tu tê ra diçî, nivîstekê bike, ewê nevixêrê⁵ ber çe'vê Ezîz reş ke. Hê giliyê devê wê xilaz nebibû, Melle got:

-Nivîşt be tişt nave.

Ewê pere danî ber Melle.

Melle şa bû. Rabû belgê kaxez û qelem anî. Dest pê kir kaxez reşve kir, qat kir, raberî Cemê kir⁶ û got:

1 xêlê wext: hinek dem, demeke fireh.

2 havîte zimanê narê: bi dengêkî bilind gazî kir

3 tu çî qewî hatî: tu ji bo çî mijarê hatî

4 divê: dibê/dibêje.

5 nevixêr: nebixêr, bêxêr.

6 kaxez reşve kir, qat kir, raberî Cemê kir: kaxez çîlovîlo kir, qat kir û

-Han vê nivîştê bive têke be'lgîyê Ezîz. Ewî ku serê xwe danî ser be'lgî razê wê qîzikê bîr ke...

-Melle Fetî, ez qurba, Ezîz ne li vir e.

-Ê, Cemê, -ewî serê xwe hejand û got, - te gerek e pêş da bigota. Niha gerek e tu tiştêkî dinê jî bavêjî ser kitêbê, ez ê usa bikim Ezîz heta hetayê wê nevixêrê bîr ke...

-Ez wê kitêba te kim, min çî anîbû da te, hema ew bû.

-De, tişt nabe, rabe here mal, ez ê nivîştê binivîsim hazir kim, sibê were bibe, ez ê îşev li ser nivîştê bixebitim.

-Erê, erê, ez qurban, usa bike, -Cemê got û rabû, çû. Melle Fetî cehê du kera nikaribû ji hev bibijêre, ^{le}tu were royê qazanca wî êpêce bû.

Muxdarekî xurt¹ Cemê dihat-diçû mala Melle.

Ewî royê menîk digirt², rokê jî ewî got:

-Cemê, min nivîşt Ezîz ra kiriye, ancax gerekê qîzikê ra jî nivîştêkê bikim, wekî keçik wexta gende divîne hevt nepeniya³ têxe orta xwe û wî. Lê tu xwe zanî, nivîşt bê tişt nave.

-Erê, ez qurbana xuliya bin piyê te me.

Melle navê Tacîkxanê pirsî, dîsa perçe kaxez reşeve kir û dirêjî wê kir û got:

-Evê nivîştê tu gerekî bivî têkî nav avê, bidî Tac...xanê ewê ku ava nivîştê vexar, muhbeta dilê wê da wê deqîqê devê wê ra derê... Cemê nivîşt hilda û ber bi mala bavê Tacîkxanê lezand.

-Meta Cemê, -Tacîkxanê got, - tu zû va nehatibûyî mala me, te îro çî qewî em kirine bîra xwe?

-Qîza min, bîna min tenê dernediket, mal da kesek tune. Min go herim qasekê bal Tacîkxanê xeber dim.

-De warê, rûnê.

Ewê çêvê xwe li wan dera digerland, te qey digot tiştêk unda

dirêjî Cemê kir.

1 muxdarekî xurt: miqdarekî xurt, demeke dirêj

2 menîk digirt: mehneyek û bihaneyek digirt.

3 nepenî: nihênî, perde

kiriye. Ewa li vêdroyê¹ digeriya. Bext ra ewe lap kêleka vêdroya avê rûniştibû. Tacîkxanê pişta xwe wê da kirinê, ew ê zû nivişt ji paşila xwe derxist û kire nav avê. Wexta destê xwe kişand, destê wê lêva vêdroyê ket. Tacîkxanê tiştek seh kir. Ewê ku vêdroyê nihêrî dît ku pirtî kaxez ser avê ye û tê derxist ku nivişt e. Îdî hal pîrê da nema. Ewê xêlekê çe'vê Cemê nihêrî û got:

-Meta Cemê ev çi ye? Tu navêjî ez ê vê sehetê te rusa kim². Tacîkxanê qest ewa da tirsandinê.

Zimanê pîrê hatibû girêdanê, çe'v derketibûne ser kelle, nikaribû xeber da.

-Qîza min, Xudê rûyê Seyranê li vê dinê jî, wê dinê jî reş ke. Nivişt da min got: "Bive têxe avê, bira Tacîkxan ava wê vexwe, belkî Ezîz ber çe'vê wê reş be." Tacîkxanê jî şerbik tijî kir û vexar û got:

-Here Seyranê ra bêje ku, min ji ava niviştê vexar. Bi vê yekê va Ezîz tu wexta ber çe'vê min reş nabe. Lê pîrê nivişt kîjan melleyî kiriye?

-Ez nizamim, Seyranê digot Melle Fetî kiriye.

-De, niha rûnê nîn bixwe, paşê kerem ke here û cake³ pey virvîzê melle neçe.

Bona vê hurmeta Tacîkxanê Cemê lap metel ma.

Êvarê Tacîkxanê mesela Cemê bavê ra qise kir. Ewê tiştîk ji bavê xwe venedişart, çimkî Kerîm him li wê bawtî, him jî dêtî kiribû.

Kerîm rabû, çû mala Bedo mesela jinê jê ra bêje. Tacîkxanê jî rûnişt, name Ezîz ra nivîsî.

Ewê aha dest pê kir:

"Ezîz, cara ewlîn selama alavî dişînim. Delaliyê min, em e sax û silamet in, saxî-silametiya te dixazim.

Ezîz, hela nav me de gele merivê ku pey mellê miftexur⁴ diçin hene. Ewana xwe veşartine. Bibaxşîne, yek ji wana diya te ye, yek jî xatiya

1 vêdro: satila avê.

2 rusa kim: rezîl û riswa bikim.

3 cake: careke din.

4 miftexur: belaxşur, heramxur.

te ye, ku hê pey gotina mella diçin, wekî em têkevin mal mal, şêher û gundê wetenê me bigerin, em ê her malekê da rastî xwendevanekî bîn û eger her yek bixaze wê usa bike, ku ew merivana ji riya xaromaro derên, têkevîne riya rast, pêşîra wan ê ji lepê merivê dînhebandî xilaz be...

Ewê hê name xilaz nekiribû bavê wê der da kete hundur. Tacîkxanê xast namê veşêre, Kerîm got:

-Şerm neke, qîza min, ez zanim tu Ezîz ra namê dinivîsî, binivîse. Binivîse ku kalik-pîrikê me, dê-bavê me timê serê xwe didane oxira hebandinê. Bi meha birçî diman, digotin ku bona Xudê ye. Lê Xudê qe tiştek nedida wan, xêncî belengaziyê. Şêxa û mella ewana timê bi Xudê ditirsandin, ewana jî dibûne qûlê wan û gelek gelek dibûne nêçîra edetê kevn î riziyayî. Roja li vî erdî emirê teze hate çêkirinê, min xwe bi van destê xwe va bîrine usa şêx û mella ra kola ku heta hetayê ji wir dernayên. Ancax ê mîna Fetî hê hene, tişt nabe, ez ê wî ra jî bîrekê bikolim. Qîza min, çi dinivîsî binivîse, her usa fesal binivîse bira Ezîz ber xwe nekeve. Ez bavê wî rind nas dikim, camêrekî pak e.

Paşê Kerîm derbazî oda dinê bû, Tacîkxan tenê ma, dîsa dest pê kir name nivîsî. Axiriyê da ewê nivîsî:

“Ezîz, tu ku hatî mal, wana ra nekeve şer, fesal nêzîkî wan be; bi rastî, bi îzbatîya² va bide înakirinê ku tiştekî heqî dîn da tune.

De bi xatirê te. Tacîkxan.”

Mehê xandinê bi serfniyazî³ ser Ezîz ra derbaz bûn. Çawa li şextê, usa li texnîkûmê we’dekî kin da ew bû hizkiriye kolêktîvê⁴. Roja ezîz nema Tacîkxanê stendibû întihamê nîvsalî ye ewlîn dabû û qîmetê ze’f rind stendibû. Nema Tacîkxanê li ser wî gelekî hukim kir û ew ber xwe diket, xwe xwe ra dikire şer: “Çima heta niha min

1 dînhebandî: olperest.

2 îzbatî: îsbatî, delîl.

3 bi serfniyazî: serfirazî.

4 kolêktîv: saziya karê gelemperî

diya xwe û xatiya xwe ji wê nexaşiye xilaz nekirine, lê tişt nave, ez ê ji vir ha da usa bikim, ne ku ewana xwe, lê usa jî yên mîna xwe riya dîn bidine derxistinê û bêjin ku em jî gelekî wê rê da çûn; lê me nihêrî tiştê heqiyê tune...”

Rojtira dinê ew avtobûsê¹ siyar bû, berê xwe da Kok-Yangakê.

Wexta Ezîz gihîşte mal berêvar bû. Dê û xûşka wî ye çûk li mal bûn. Ceyran ji ciyê xwe rabû û xwe avîte pêsîra kur, ew mehkem hemêz kir, ramûsa û got:

-Şikir, kurê min, tu sax û silamet vegeriya. Ez qurbana tûncik-temoliyê, bejn û balê vim. Xûşkê qet destê xwe ji stûyê wî nedikişand. Paşê Hesen û Gulê hatin, wana kêf-halê hev pirsîn. Gulê bi dengê nimiz Ezîz ra got:

-Ez ê mizgînê Tacîkxanê ra bivim.

Ezîz bi beşereke xweş xûşkê nihêrî, got:

-Bive.

Sehetekê nekişand hevalêd Ezîz e şextê: Silo, Alîk, Tajibay û êd mayîn, usa jî qewm lêzim, cînar hatine bal Ezîz. Paşê ewana rabûn çûn, hevalê Ezîz neçûn, wana Ezîz ra derheqa şextê da, ewî wana ra derheqa texnîkûmê da qise dikir. Xeberdana wan e şîrîn da Gulê hat û hêdîka gazî Ezîz kir, derxiste derva got:

-Tacîkxanê ‘elb hildan çû avê, digot bira bê ser kaniya devê çêm.

Çokê Ezîz ji şabûna reqisîn, hevala ra got:

-Çend deqîqa min bibaxşînin, ez ê niha bêm.

Hevalê wî elbê ra serwext bûn, Alîk got:

-Kerem ke, em ê sehetekê hîviya te rûnên.

Xort gihîşte ser kaniyê. Tacîkxanê ‘elbek tijî av kiribû, dixast ya dinê jî tijî ke, dengê bihîst û serê xwe hilbîrî, ji şabûnê ‘elba vala ye dêst da kete kaniyê. Ewa xar bû ‘elbê hilde, wê demê Ezîz jî xar bû û alîkî ‘elbê girt. Ji huba her du dila te digot qewet nemabû, ku ‘elba vala ji çevkaniyê derxin.

Ew rûniştin, Ezîz guliyê Tacîkxanê ye hûnayî qevz kir, bi wan ra şa dibû, çawa tiştêkî bidî destê zara pê şa be. Ewê serê xwe kutabû

1 avtobûs: otobûs

sîngê wî û hev ra bona roja xwe ye paşwextiyê xeber didan. Nişkê va Ezîz anî bîra xwe ku heval mal da hîviya wî ne.

-Rihana min, bibaxşîne, -ewî got, - hevalê min mal hîviya min in.

-Here, here; delalê min şerm e.

Ezîz vegeriya mal. Silo meta Seyran û Cemê ra got:

-Hûn çi ra pêxemê lê dixin¹, nahêlin mirazê du hizkiriya bigihîje hev? Meta Cemê, tu çima xiravtiyê dikî, çima gura Melle Fetî dikî?

-Dayê, -Ezîz got, - eger nivîstê mella rast in, lê çima ne ez ber çe'vê Tacîkxanê reş bûm, ne Tacîkxan ber çe'vê min reş bûye? Melle tenê ê mîna we dixapîne û xwe jî mîna bega dijî.

Hesen ku xeberdana kurê xwe bihîst got:

-Kurê min, tu rast divêjî, melle gişk e virek in, berê diha pîs bû. Xelq dixapandin, hebûna wan ra kêf dikirin, lê hukumeta Sovêtiyê koka wana bi reha va da vedanê, ancax ê mîna Fetî yê rûvî hela xwe veşartine.

-Apê Hesen, -Tajbay got, - em ê sibê herine şikyat û bêjin, yanî Melle Fetî bişînine xebatê, yanê jî, ji vira bidine derxistinê.

Seyranê hemû tişt îdî rind fe'm kir û dilê xwe da fikirî: "Rastî jî kirinêd Melle vir in, eger vir nîn e, lê çima Tacîkxanê ava nivîstê vexar tişt nebû, hela ser da jî Ezîz got Tacîkxanê wê deqîqê min ra name nivîsî..." Ewa wa difikirî.

-Apê Hesen, Meta Seyran, -Silo nişkê va got, - vê gavê bira Melle Fetî ciyê xwe da bisekine, em ê sibê heqê wî derên. Warên, em ji mesela ferz xeber din. Ezîz ji Tacîkxanê hiz dike, ew jî wî hiz dike. Merî nakeve orta du dila û çar çe'va, werên em herine xazgînê Tacîkxanê.

-Ez nîzanim, -Seyranê zû cab da, - Hesen zane.

Apê Hesen hinekî fikirî û got:

-Ez ê dewsa cawê, we ra serhatîkê qise kim. Vê serhatiyê kesek nizane, xêncî min, Seyranê û du merivê dinê ku ne li vir in. Silo, kurê min, hinekî bisekine ez xeberdana xwe xilaz kim. Derheqa Ezîz û Tacîkxanê da em ê paşê xeber din. Em li welatê Romê bûn. Ez

1 pêxemê lê dixin: difeşkilînin, asteng dikin

û xortekî kurd şivanê Elî Begê bûn. Ew du sal bû ez û Feto diçûne ber pezê beg. Feto Fetoyê rast û bokeberan bû. Ne diya wî, ne bavê wî hebû, qerez êtîm bû. Ji malê dinê tenê kulavekî wî yî şivantiyê hebû. Ew jî ne yê wî bû, eger Elî Begê me'nî bi wî bigirta dikari-bû ew kulavê şivantiyê jî wî bistanda. Wan sala gelekê mîna Feto xudanê wê "hebûn"ê bûn. Em zikekî têr, zikekî birçî, sal dunzdeh meha diçûne ber pêz. Me germî-sarî nizanibû, em bûn, hinek nanê tisî û tasa şîr... Carekê em e li zozanê bûn. Şev bû. Pez li guherê nedisekinî. Şeveke gelekî seqet bû, çêv çêva nedidît. Zîpikê mehkem lê dikir, carîna ewra birq vedida, te nişkê va dinêrî pez herikî. Ez û Feto va çarnikalê¹ pêz diçûn-dihatin, xêlekê baraneke hûr dest pê kir. Em rind şil bûn, binatara pêz da me ji serma pişt kutabû pişt hev ku hinekî germ bin, nişkê va me dengê piyê meriva bihîst. Em zû hev qetiyan, çimkî şevê ha Beg dihate nav pêz, teseliya pêz dikir. Eger ewî şivan razayî, yanî li bal hev bidîta, wey halê wî şivanî, sibê Beg ew dida ber zopa, hevtekî dixiste nava cî û nivîna. Wê demê Feto revî fêza pêz. Bîstek derbaz bû, ne deng hebû, ne his. Ez meh-tel mam, min dilê xwe da digot, eger Beg bûya niha kiribû hêwirze.² Lê eva çi sur e, kî hat? Ez hêdî hêdî hevraz ber bi Feto çûm. Wextê ez diçûm, min nihêrî Feto û qeretûyekî va ber bi min tîn, ez hema ciyê xwe da sekinîm, çok li min sist bûn. Ewana lap nêzîkî min bûn û Feto hêdîka gazî min kir:

-Hesen pêş da were, Xanê me ra xurek aniye. Min ku navê Xanê bihîst, nolî bûzê ciyê xwe da qerisîm, livitandin bi min nebû. Silo ber xwe neda û got:

-Apê Hesen, axir Xanê kî bû?

-Silo, kurê min, sebir ke, çaxê mezin xeber didin merî giliyê wan dêv da nahêle.

Silo şerma îdî dengê xwe nekir, Hesen dîsa dest pê kir:

-Ewana dîtin ku ez ji ciyê xwe nalivim, lap hatine cem min, Feto tiştêk dirêjî min kir û got:

1 çarnikal: çarmedor, her çar teref.

2 hêwirze: hawar û gazî

-Hesen, hanê vê destexanê.¹ Min destexana nîn ji destê wî girt û got:

-Qîza min, Xanê, tu vê şevê çi digerî?

Ewê şerma serê xwe mîna merivê sûkar kire ber xwe. Feto dît ku deng ji Xanê dernayê got:

-Apo, te qe cahiltî² nedîtiye?

Îdî min her tişt fe'm kir û ji wan dûr ketim. Xanê qîza Elî Begê bû. Îdî salekê geлектir bû, ku wana derdê dilê xwe şevê ha ye te'rî da timê hev ra qise dikirin. Lê min bîr kir, negot ku Xanê him xandî bû, him jî gelekî bedew bû. Niha ez we ra qise kim, binihêrin wana çawa hev hiz kirine.

Rokê Feto pêz dadixe ser kaniyê û dixaze here ji kaniyê avê vexwe, dinêre Xanê li wir rûniştiye, dike vegere Xanê divê:

-Feto, çima paş da vegeriyaî? Were avê vexwe, ez zanim tu tî yî.

Ew paş da vedigere, Xanê şerbik tijî av dike û dide wî. Ji wê rojê şûn da rojê dûman e mij, şevê te'rî ye sar her du hizkirî rastî hev dihatin û huba dilê xwe hev ra qise dikirin.

Feto ku vegeriya hat em rûniştin, me sifra xwe vekir, nanê xwe têr xar.

-Feto, lê Xanê te ra çi digot? -min ji wî pirsî.

-Xanê digot, em ji zozanê dagerine aranê,³ lazim e em herine welatê aza.⁴ Ewê me ra qise dikir, wekî li walî Erez⁵ dewleteke teze hatiye sazkirinê. Lazim e ku em herine wî welatî û aza nefesa xwe bikşînin.

Em bêsebir hîviya wê rojê bûn. Me şivana, gavana li çolê derheqa wê rojê da xeber dida. Kê çi dibihîst dihatin hev ra qise dikirin. Eger şivanekî, yanî jî gavanekî tişteki teze bibihîsta, ciyê me li zagekê⁶ bû, wê derê xeberêd teze dihatine gotinê. Lê Xanê ji geleka

1 destexan: sifre.

2 cahiltî: xortanî, ciwanî.

3 aran: germiyan, erdê germ ê ku ne zozan e.

4 aza: azad.

5 li walî Erez: li wî aliyê Erez.

6 zag: rêza zinarên asê.

pirtir me ra tiştê teze digot, çimkî mala wan da timê beg top dibûn, xeber didan.

Îdî wextê dagerê bû. Sur û serma payîzê hêdî hêdî xwe dida ki-vşê. Koçekoç ketibû nav êlê¹. Em jî dageriyan. Rojêd payîzê kin di-bûn, lê şev dirêj. Wan şevê payîzê ye dirêj me hetanî berbanga sibê pez diçêrand.

Şeveke payîzê ye sayî bû. Me pez teze rakiribû şevînê. Ez Feto va rûniştibûn, me xwe ra xeber dida. Me wextekî nihêrî pêşiya pêz ser me da silikî. Em rabûne ser xwe, me dît ku Xanê bi lez ber bi me têt. Te digot agir mala bavê ketiye, tev bi kulfetî şewitîne, tenê jê ew maye. Ewa ku gihîşte me, xwe avîte pêşîra min, giriya û got:

-Apo, me ji vî agirî derxe. Îşev êvar da bavê min çok kutaye çoka Evdile Begê qelenê min vedibire. Ez çiqasî divêjime diya xwe, wekî bavê min ra bêje, ez ji kurê Evdile Begê hiz nakim, nebû tiştêkî.

Ez û Feto ber dilê wê da hatin, qerez me bi curekî ew ker kir. Paşê Xanê dîsa me ra got:

-Feto, min çend cara gotiye, wekî warên em herine welatê Sovê-tiyê. Min got:

-Qîza min, çima em çe'vê xwe kor dixazin, em ê jî bîn.

Me usa qirar kir du roja şûn da şev ji wî welatê qetlê birevin. Me fikra xwe lawika ra jî got.

Ew şeva ku em e zû va çe'vnihêrî bûn,² hat gihîşt. Em gişk li ser kaniya binetara gund topî ser hev bûn.

Wê şevê gelekî sar bû. Em rê ketin. Me rê da alî hev fikir. Mîna teyrê koçer em dibeziyan, wekî zû bigihîjinê. De, nav me da jinê hemle, jinê destdergûş³ jî hebûn, ew feqîrana bi me ra dihatin. Ew ji geh direviyan, geh disekinîn, carina erdê diketin û radibûn; lê tenê xastineke me hebû: bigihîjine welatê aza. Belkî te'va⁴ wî welatî wan û ewledê wan e çûk germ ke, em gişk direvîn. Çawa merî cûcika bigire birûçikîne, cûcîk birevin li xwe tiştêkî têxin talde a usa em

1 koçekoç ketibû nav êlê: êlê dest bi koçkirina ji zozanan kiribû.

2 çe'vnihêrî bûn: çav li rê bûn.

3 jinê destdergûş: jinê ku pêçekê zarokan di destan de.

4 te'v: tav, roj.

direvîn. Em direvîn ku welatê aza me têxe bin baskê xwe, belkî pûrt me bê... Belê, em revîn, xilaz bûn. Pûrta teze li me û ewledê me hat.

Wê şûn da apê Hesên avek xast û got:

-Eva derda min ber çe'vê xwe dîtiye. Xanê bona Feto, diha rast bona hub-hizkirinê, dê û bavê xwe hîşt û hat derkete vira. Lê îja Ezîz û Tacîkxan wê ku da herin? Sibê roja le'dê' ye, gişk dîsa berev bin, warên em herine mala Kerîm.

Hevalê Ezîz bi van giliyê apê Hesên ra gelekî şa bûn; lê per-baskê Ezîz tunebûn, wekî bifire.

Ji navrojê xêlek derbaz bibû. Apê Hesên, Seyranê û merivêd ku wê biçûyana xazgîniyê îdî hazir ibûn, wekî ji mal derkevin.

Cemê ev yeka dîtîne li ber derî çev kire' Seyranê, yanî tu ku da diçî?

-Lê çi bikim, -ewê hêdîka got,- ez im ew kur e, ez nikarim dilê wî bişkênim.

Cemê orta şemîkê da me'tel ma û kete fikra: "Gelo here perê xwe ji Melle Fetî bistîne, yanê na."

1 roja le'dê: roja lehdê/yekşemê.

2 çev kire Seyranê: çav ji Seyranê re qirpand.

BEXTÊ QÎZA METÊ

Qado teze ji zavodê¹ derdiket, nemebir² nemek da wî. Ewî wê sehetê ew destnivîsara xaromaro nas kir û nişkê va veciniqî.

Mal da pakêt bi fesal vekir, neme xwendinê şûn da kete halekî çetin, Orta du ava da mabû, nizanibû çi bikira. Gelekî fikirî, haqasî fikirî, wekî êşê girte qafê wî. Rabû ku razê, lê tawtiya³ wî nehat.

Qerez, hate ser wê qirarê, wekî rûnê caba⁴ nema wê ya binvîse.

“Pakîzer, berê ewlîn selam!

Selamê şûn da, tu bizanibe wekî îdî dereng e, dereng...

Ez nikarim dilekî bikirim, dilekî jî bifroşim. Îro rast hevtek e ku me belge daniye serê qîzikê. Eger ev yeka nîbûya, ez ê dîsa bi dil û ceger bibûyama maşoqê gula xwe ye ewlîn.

Ezîza min, bira derd te pûç neke, hela emrê dirêj pêşiya te ye. Eger nevî qûlê edetê kevn, tu yê xweşbext vî.⁵

Qado”

Qado bi serfniyazî dersxana deha xilaz kir, atestata⁶ xwe stand. Kulfetê mala wan ji çûka hetanî mezina şa bûn.

Bavê ku ev şabûna dît, got:

1 zavod: kargeh

2 nemebir: namebir, posteger.

3 tawtî: tebatî, hedûr, huzûr.

4 cab/caw: cewab, bersiv.

5 xweşbext vî: xweşbext bî.

6 atestat: dîploma, bawername.

-Kurê min, gotî tu herî înstîtûtekê da qebûl bî û rojeke ha xilaz kî bêyî em ê diha şa bin.

-Bavo, nêta min jî ew e. Wekî îzna we hebe, ez ê sibê na du siva herime Êrêvanê.

-Here, oxir be, hema tu qebûlî înstîtûtê bûyî, cawê bide me.

Wan herd roja¹ Qado gund da ma, sê-çar cara diçû wî serî gund, di hate vî serî belkî Pakîzerê bibîne. Lê diya wê îdî ser heshesa ketibû² û lema nedihîşt ewa tu dera da here. Roja wê rê keta, berbangê, Qado derkete nava gund. Geriya geriya hat derkete hinda bêderê, ciyê cara ewlîn ewî û Pakîzerê ramûsanê şîrîn hev guhastin. Ew kê-leka cewa³ hinda bêderê rûnişt.

Bayê sarî ku vê berbangê porê wî yî gustîl gustîl dixist, xwe pencerâ mala bavê Pakîzerê ra digîhand û eger zar-ziman hebûya wê bigota: "Pakîzer, çima usa melûl, melûl rûniştî, rabe, îro hizkiriye te ji gund dertê, here verê ke."

Qado hê derheqa Pakîzerê û rojê bihurî da fikirî; lê dengê piyê Xanimzerê ew ji wan fikira dûr xist.

-Qado, tu tenê vê berbangê çima hatî vira, usa posîde⁴, posîde rûniştiyî?

-Ez ê îro îdî herime Êrêvanê, min dixast qe neve roja paşin Pakîzer bidîta û çend gilî-gotin jê ra bigota.

-Tişt nabe, fikara meke, here oxira xwe da, meta te ye bêîman nahêle Pakîzer ji mal derê. Here, hema tu înstîtûtê da qebûl bûyî, carekê were, ez ê destê wê bikime destê te, hilde, bive.

-Xanimzer, -Qado hêdîka ji ciyê xwe rabû û got, - îdî îlaca min tu ne, ez ê rabim herim. Lê temiya min li te, hema te dît wekî dixazin Pakîzerê bivin, min ra têlêgramê bişîne.⁵ Ez jî ku, înstîtûtê da hatime qebûl kirinê, ez ê wê deqîqê te ra adrêsa xwe bişînim.

-Qado, wa ye Letîf î nexaş e, ser kêlekê ye; hela îsal Pakîzerê

1 herd roja: her du roja.

2 îdî ser heshesa ketibû: ketibû şikê û wesweseyê.

3 cew: cihoka avê.

4 posîde: xemgîn.

5 têlêgramê bişîne: telegrafê bişîne

navin¹, saleke dinê jî Xudê zane. Tu arxayîn² û bi dilekî şa bide ser oxira xwe.

Ewî teme da û hîvî kir, wekî gilî-gotinê wî bigihîne Pakîzerê û xatirê xwe ji wê xast, hate mal, çi lazim bû hilda û rê ket.

Avtobûsê Qado ji gundê wan î rewşa tebiyetê ye awaz-awazî xwekirî dûrxist.

Avtobûsê deşt, zevî, gul, rihan û darêd başqe başqe yêd devê rê da mîna xeleqê zincîra pey hev rêzbûyî, para va dihiştin³; hemû qewimandinê zarotiyê⁴ dîtî, heta vê deqîqê, çawa ava kaniya zelal e gundê wan, ber çe'vê wî ra derbaz dibûn. Û te tirê Pakîzer jî pêşberî wî sekiniye dibêje:

“Delalê min, here, te ra oxir be; lê min û vê rewşa gundê me bîr neke.”

Avtobûsa bêper e, bêbask, çawa merî hespekî kihêl î bê gem siyar be, a usa ew ji vê xemlê dûr dixist û direvand. Wexta ro dageriya Qado gihîşte bajêr.

Wextê întihama bû. Qado şuxulê xwe dabû înstîtûta polîtêxnîkê.⁵

Cahil gelekî beravî ber înstîtûtê bibûn. Dilê her yekî da tişteke disewirî.⁶ Qado întihama ewlîn rind da, lê ya duda da nikisî.⁷ Ewî usa hesab dikir ku ew ji vir ha da nave⁸ xudanê xwe tu şuxulî, ya wî heta vira bûye. Ew ji înstîtûtê derketinê soqaqê bajêr e fire ber çe'vê wî nolî şiveriyê xaromaro dihatine kivşê. Çe'vê wî reşeve dihatin. Bi halekî çetin xwe gîhande mêvanxanê.

1 navin: nabin.

2 arxayîn: bi xwe ewle, dilrehet.

3 para va dihiştin: li pişt xwe duhiştin.

4 qewimandinê zarotiyê: bûyerên zaroktiyê.

5 înstîtûta polîtêxnîkê: enstîtuya pirpîşeyî.

6 disewirî: diçû-dihat, teswîr dibû.

7 nikisî: bi ser neket.

8 nave: nabe.

Wê şevê heta berbanga sibê raneza. Kêlek kêlek weldigeriya.¹
Ewî rind seh dikir², wekî rehetiyê nade kalê, ku wê odê da razaye.

Sibe teze safî bûbû. Qado rabû ku kincê xwe xwe ke, kalê pirsî:

-Kurê min, te îşev qe xew nekir, çi qewimiye?

-Qet, apo, tiştê neqewimiye.

-Na, kurê min, ez îdî şêst pênc salî me. Min emirê xwe da gele
gele tişt dîtiye... Bêje min, axir çi qewimiye, belkî ez ê bikaribim alî
te bikim.

-Apo, min şuxulê xwe dabû înstîtûtê, lê...

Kalê îdî her tişt fe'm kir û giliyê wî nîvcî hîşt:

-Kurê min, kî ku dersxana deha xilaz dike, gotî here çend sala
bixebite, nava xebatê da qal be³ û bizanive qazanc-kar çawa tê ki-
rinê. Wekî cahil kolxozê da-sovxoze da bixebite û paşê bê, înstîtûtê
da bixûne, xilaz ke, ew ê xandinê jî, qedrê xebatê jî rind bizanive.
Ew nav xebatê da rastî çi çetinahiya bê, wê alt bike.⁴ Fikara meke;
rabe bi eşq, şa vegere gundê xwe û kolxozê da du-sê sala bixebite,
paşê were înstîtûtê. Tu, tu wextî poşman nabî.

-Na, apo, ez venagerime gund. Ez ê li vir bimînîm û herime za-
vodekê da bixebitim.

-Tu zanî, -kalê rabû ser piya û gotê- ez îdî diçim, dereng e, gotinê
min e axiriyê ev e, cimaet divê: "Eva derî ye, eva jî pencere ye, kîjan
te ra dest dide wir ra derê." Lê merî pencerê ra dernayê, merî derî
ra dertê."

Pey çûyîna kalê ra Qado dîsa kete mitala, çi bike? Vegere gund,
çawa vegere? Ne axir, nêta wî Pakîzerê serê xwe negirt. Ewî dixast
têkeve înstîtûta şevê û cîkî da bixebite, here hizkiriya xwe jî bîne. Lê
niha... Axirî hate ser wê qîrarê, wekî here têkeve zavodekê bixebite.

Cimaetê rind gotiye: "Bi pîrsê merî diçe qursê." Ew ji mêvanxanê
derket, bi salixa hat gihîşte zavoda "Parêd Avtoya".⁵ Nêzîkî derê ku

1 kêlek kêlek weldigeriya: ji wê kêlekê dizivîrî ser kêleka din

2 seh dikir: fehm dikir.

3 nava xebatê da qal be: nava xebatê da bipije û bibe pîşekar

4 alt bike: wê mexlûb bike, têk bibe.

5 parêd avtoya: parçeyên erebeyan

ser nivîsîbûn “Para Kadra”¹ bû û hêdîka derî kuta, kete hundur, selam da xortê qemer, xort selam vegirt û cî nîşanî wî da, wekî rûnê.

Ewî pirsî:

-Kerem kin, xizmeta we çi ye?

-Heval, dixazim zavodê da bixebitim.

-Ze’f rind. Qe xwendina te heye?

-Belê, min îsal dersxana deha teze kuta kiriye.

-Diha baş, diha baş, wî çaxî pêş da rûnê; erzekê binivîse û sibê warê ser xebatê. Ez ê te bişînime ser xebateke lap e hêsa².

Paşê Qado xatirê xwe xwest û derket.

Îcar jî ketibû fikara sitarekê. Ewî ji du-sê malê kêleka zavodê pirsî, gelo xanîkî çûk bona du meriva tune, bi kirê bidine min. Xudanê malekê got na; lê qîzeke çarde-panzde salî got:

-Xanîkî me yî çûk heye, werê lê binêre; lê dê-bavê min ne mal in, wexta wê bîn³.

Keçikê derê xênî vekir. Qado li xênî nihêrî. Hema ew esil xanîkî aha digeriya. Xêlekî şûn da bavê keçikê hat, wana xeber dan û xanî bi kirê dane Qado.

Qado şebeqa sibê ra rabû, te’ştêke⁴ sivik xar û hate ber zavodê. Ewî nav û navê bavê xwe got, serwêr destûrnema ku ser navê wî hatibû nivîsar dirêj kir⁵ û got:

-Tu timê wexta tê yî ser xebatê, destûrnemê xwe ra bîne û ber derge derxe, nîşanî nobedar bike wê te berde.

-Hevalê serwêr, fe’mdarî ye.⁶

Vê xeberdanê şûn da ewana derbazî hewşa zavodê bûn. Hewşa zavodê haqasî mezin dihate kivşê, wekî te tirê gundekî çûk î sivik vir da cîwar bûye.

1 “Para Kadra”: beşa xebatkaran

2 xebateke lap e hêsa: xebateke gelekî hêsa.

3 wexta wê bîn: bîstekê şun da wê bîn.

4 şebeqa sibê ra rabû, te’ştêke sivik xar: şefeqa sibê ra rabû, taştêyeke sivik xwar.

5 serwêr: serkarê xebatê.

6 fe’mdarî ye: hate fehmkirin.

Ew teze kete hewşa zavodê, du xaniyê dirêj e mezin dihatine kiv-
şê. Orta wan her xaniya ra maşîne¹ derbaz dibûn. Pê da, pê da dirê-
jaya xaniya ra dar hatibûne çikandinê. Wan dara rewşeke mayîn
dida wê rê². Ji wan xaniya hinekî vir da tele erd³ hatibû rakirinê û
gul reşandibûn. Li rex gula ciyê rojnema hatibû çêkirinê.

Dengê dezgeha hê dûr va li meriva xweş dihat. Wextê Qado ew
dîtîn, elbê ra hinek ji qanûnê fîzîkê ketine bîra wî. Serwêr ew ji du
dezgeha derbaz kir û li ber yekê sekinî. Li ser wê xortekî zerîn bîst
heşt-sî salî dixebitî. Serwêr nêzîkî wî bû û gotê:

-Deqîqekê sebir ke.

Xort dezgeh da sekinandinê. Ewî destê xwe da ser mila û got:

-Ev xort ê bal te bixebite. Rind hîn ke. Lê Qado ji ciyê xwe nelivî.
Xort nêzîkî wî bû û destê xwe dayê da.

-Andrey.

Ewî jî destê xwe da wî û navê xwe got. Paşê hatine bal dezgehê.

-Qado, -Andrey bi hemdê xwe dest bi xebirdanê kir, -vê dezgehê
ra divên: "Rêzbarêz" yanî ku ser vê rêzba⁴ didine birînê. Tu îro qe
destê xwe nede tişteki, tenê bal min bisekine û li destê min mêze
ke, binê ez çî dikim. Tu yê deh-panzdeh roja bin destê min da çawa
şagirt bixebitî, paşê gerekê întihamê bidî, derecê bistînî. Eva dûz
şeş sal e, ku ez li vê zavodê dixebitim; salê jî qe nebe şagirtêkî-duda
hîn dikim. Hene ew şagirtê, ku ber destê min hîn dibûn, niha zavo-
dê da hosta dixebitin. Wekî tu jî bi aqil û kemal bixebitî, wext ê bê,
tu yê ne ku bibî hosta, lê înjênêr⁵.

Paşê ewî li kincê wî nihêrî got:

-Lê çima van kinca va hatî?

-Kincê min e xebatê tunenin.

-Tişt nabe, wextê firavînê em ê herin bêjin bira te ra kincê xebatê
berdin.

1 maşîne: makîne, erebe.

2 wê rê: wê riyê.

3 tele erd: zeviyeke biçûk; kerdî.

4 rêzb: keresteyê daran; kêran.

5 înjênêr: endazyar, muhendis.

-Tu van kincana dibînî, -Andrêy kincê xwe nîşan da û got, - evana zavodê dane.

Paşê ewî dest bi xebatê kir.

Qado ser wî ra sekinî bû, xebata wî dinhêrî. Carina jî serê xwe bilind fikir, li zavodê dinhêrî. Dinhêrî, wekî ser her dezgehkê merivek sekiniye û bi kel-bîn dixebite. Çend qîzê cahil e xelatê ter e temiz lê, têne bal wana; xebata wana dinihêrin û diçine bal ê dinê. Xort dixast evê yekê ji hevalê xwe yî teze bipirse; lê şerm kir.

Îdî pale derketibûne firavînê. Hevala tev erze birine hesabdariyê. Hesabdar ser erzê nivîsî û evana çûn ji embara kinca şel, blûzek û cote batînke¹ stendin.

Andrêy Qado anî wê derê, kî derê ku pala kincê xwe diguhastin. Ewî li wir kincê xwe êxist û kincê xebatê xwe kir. Andrêy li wî nihêrî û bi ken got:

-A, tu hêja bûyî palê rastî.

Bû pirqepirqa² wan, kenîyan û ber bi xarinxana zavodê çûn.

Ser nîn Andrêy pirsî:

-Bibaxşîne, dê-bavê te hene?

-Belê, hene.

-Lê ne bavê min heye, ne jî diya min. Bavê min şer da hate kuştinê, lê rehmetiya diya min van sala mir. Ewî êmekî³ xwe ker kir, paşê pirsî:

-Dêmek, te gava dinê got ku ez î hê nezewicî me, erê?

-Belê, min îsal dersxana deha teze xilaz kiriye

-Lê hizkiriya te tune?

Ji vê pirsê hevalê xwe, Qado zenceyî⁴ bû. Nizanibû çi cab bida. Dixast bigota, wekî na, lê nişkê va aha fikirî: "Min li gund derdê evîntiya xwe carina Nermîn ra, carina Xanimzerê ra digot, yanê jî derdiketime ser ava ku kêleka mala me ra dikişiya, qîse dikir û dilê xwe rehet fikir, lê vira?" Lema jî got:

1 batînke: bot.

2 pirqepirq: fîqetîq, dengê kenînê.

3 êmekî: demekî.

4 zenceyî bû: mat û mehtel ma, şaşopaşo bû.

-Heye.

-Kî ye, çi kare ye?

-Hela derheqa vê yekê da tişteki nepirse. Wekî ez vê yekê qise kim wê gelekî bikişîne; Pakîzer e, Pakîzer...

... Qado mal ra neme nivîsî:

"Bavo, cara ewlîn destê te radimûsim, paşê hûn bizanibin ku ez nehatime qebûl kirinê; lê zavodê da dixebitim, min xwe ra xanîkî çûk kirê kiriye. Ez îdî nikarim bême gund. Min ra destê nivîn² bîne, eva du şev in xudanê xênî cî-nivîna dide min û ez tê da radizêm. Fikara min qet nekin, heta niha min usa hesêb dikir, wekî her tiştî înstîtût dide meriva; lê na. Ez ê çend sala zavodê da bixebitim, paşê herim înstîtûtê.

Carina min ji merivê ahil³ dibihîst, digotin ku destê filankesê zêr dibire. Rastî jî usan e. Gumana min heye⁴, nava salekê-duda da ez ê bibim pêşekzanekî.⁵ Wê min ra jî bêjin destê wî zêr dibire. Neferê malê ji çûka hetanî mezîna selam dikim.

De bi xatirê we.

Qado."

Pakîzer... Hizkiriya Qado...

Çûktiyê da ew e gelekî rind bû, çiqasî mezin dibû aqasî⁶ bedew dibû. Bejnê va orte bû. Dême wê mîna hinaran sor dikirin.

Wextê ew e çardeh salî bû, şeveke payîzê dê-bavê û birê bextê wê dareke diriyê alandin.

Îdî belgê dara, çêrê kewşen zer dibûn. Payîz bû. Mêş-moza kêr dikire vizeviz. Hebûna kolxozê gişk berevî ser hev kiribûn, çopek li çolê nemabû.

1 çi kare ye: çawa ye, bi çi awayî ye?

2 destê nivîn: desteyek nivîn: orxan, doşek, balgî.

3 merivê ahil: merivê navsere, aqilmend.

4 gumana min heye: hêviya min heye.

5 pêşekzanekî: pîşekarekî xwedan meslek.

6 aqasî: ewqasî.

Şuxulê kolxozê sivik bibû. Kolxozvan payê pir li fêrmê dêwêr û pêz dixebitîn.¹

Êvareke payîzê Mehmed ji fêrmê vegeriya mal; nihêrî ap e, jinap e û du-sê qewmê wan e dinê hatine mala wan. Wedekî şûn da dê şande pey cînara.

Mala Elo bi qewm, lêzim û cînara va kimkimî bû. Qado û dê-bavê wî li wê meclisê bûn. Ewî xwe dabû kuncêkî xênî û guh dida ser xebardana wana. Xidir gilîk ji vir anî, yek ji wir; kutasiyê hate ser mesela ferz û got:

-Elo, em bira ne; lê îşev dixazin wekî vê qewmtiyê diha mehkem kin. Tu gerekî qîza xwe bidî Letîf. De, qîzap û kurap in, wê diha ser hev bişewitin.

-Rast e, hûn hatine herê-na, min razîbûna xwe da; lê niha dinê-rim keçik Letîf hiz nake. Xênî vê yekê, birao, serê vê koma rûniştî kim, wekî ez bizanibim, qîza min ê kurê te ra jintiyê bike ez ê bidim.

-Lo, mal avayo, ew çi xeber in tu divêjî? Çima kurê min î kor e, topal e, seqet e? Şikir xortekî ser xorta ra ye.

-Na, mesele ne ser wê yekê ye; lê zanebûna ez zanim dilê Pakî-zerê Letîf da tune.

Mêrê li wir herekê alîkî da gotin ku "Elo, kuro, çiyê bav heye qîz çi pêşe ye?" Elo şerma sor bû û xwe ker kir. Hema vî çaxî Mirdê gazî Elo kir, bire derva û hêdîka got:

-Lo kundê mêra, çi te wan giliya ketiye divêjî ku dilê keçikê tune. Çima ziman davêjî devê Pakîzerê? Malê birangê te gelek e, here hundur, bistîne qelenê xwe.

Elo vegeriya hundur, rûnişt, Hamo got:

-Elo hûn qewm-pismamê hev in, hev neêşînin, qelenê qîza xwe bêje, em qelen bibirin, ravin² şîrînayê bixun.

Vê demê Qado îdî taw nekir³ û got:

1 kolxozvan payê pir li fêrmê dêwêr û pêz dixebitîn: xebatkarên saziyên gelemperî yên gundan bi piranî li mandirayên dewêr û pêz dixebitîn.

2 ravin: rabin.

3 taw nekir: sebir nekir.

-Bavo, çi te ra, ewana xwe çi dîkin bira bikin.

Hamo kur ra tiştekek negot, lê çe've xwe li wî cinove kir¹. Lê ser qelen gelekî ber hev dan. Haqasî ser wê kirîn-firotanê xeber dan, wekî hindik mabû dîkê berbangê bang de. Ancax tu kesî nedigot ê zewicî kê distîne. Axir çima em zinêkariyê dîkin? Gelo çima kurap ser qîzapê bengî dive.² Lê îja³ kanê edetê kevn, wekî destê xwe têkî tînê û jê bipirsî: eva çi yek e? Ne axir, zû va koka wî mîna dareke hişk e hola⁴ hatiye vedanê û şewitandine. Lê îja de tu werê, hê ne-bixêr, xuliya wî kunca da maye û car cara kêrî merivê paşdamayî tê.

Pakîzerê oda dinê da hêsirê xûnê dibarandin; lê dê-bavê û birê ew derxistibûne bazarê, qîmet digotin, bikirçiya⁵ ra pev nediketin.

Vê demê Xanimzera hevala wê derî vekir û kete hundur.

-Pakîzer, ez rind zanim, wekî dilê te Letîf da tune; lê bi hêsiira tu tişt nayê serî. Tu pak zanî, wekî dê-bavê min jî dixastin min zorê bidane mêr. Te dît, min çi anî serê wan. Ez rabûme rûyê wan û got, wekî hûn min zorê bidine mêr ez ê xwe agirdadayî kim⁶, yanî bihelim alîkî da birevim. Rabe, şermê bide bin piyê xwe, derbazî oda dinê be, bêje: "Gelî bikirçiya, çima hûn dilê nehebandî⁷ didine hebandinê? Bi gotina we, giva⁸ li cehnemê beroşa qîrê-qetranê heye; hema xût⁹ ciyê we ew der e. We gotî¹⁰ bivin bavêjine beroşeke usa û agirê gur bidine bin beroşê; hûn saxesax wê beroşê da bişewitin, bikelin û paşê hûn ê bizanibin hub çi ye, hizkirin çi ye, qelen çi ye, ê ku bûye û dibe baîsê¹¹ gele gele Mêm û Zîna.

1 çe've xwe li wî cinove kir: bi çavên hêrsbûna xwe nîşanî wî da.

2 bengî dive: aşiq dibe (dive: dibe).

3 îja: îcar.

4 dareke hişk e hola: dareke hişkbûyî.

5 bikirçî: kiriyar, muştêrî.

6 xwe agirdadayî kim: agir berdime xwe.

7 nehebandî: heznekirî (hebandin: hezkirin).

8 giva: goya, qaşo.

9 xût ciyê we: hema cihê we.

10 gotî: divê.

11 baîs: sedemkar.

Heyf, Pakîzerê ev yeka nekir, tenê digiriya, usa digiriya digot, wekî şerm e bira dengê min jî nebihîzin.

Xulase, wextê dîka bangdanê ewana qelen birîn: hezar manat, sê xelatê mêra, sê xelatê jina, du pezê goşt û gelek tiştê mayîn.

Kew ketibû sibê. Pakîzer anîne oda mêra û belge dane serê wê. Ewê xwe zeft nekir û bû îskefska wê mîna zara giriya. Xidir bi beşereke xweş¹ pirsî:

-Xudê xêr ke, bûka min çima digirî?

-Qaydê qîzan e, -Mirdê got,- wextê nîşaniyê-dewatê qîz şabûna digirîn, qîza min jî şabûna digirî.

Gişk kenîyan, bimbarek û pîroz kirin. Her kes rabû, ber bi mala xwe çû; lê Pakîzer orta her çar dîwarê bavê xwe yî nexêr da ma.

Ji wê şeva zulmkar, soraya dêmê wê roj bi roj kêmbû, çawa ku dara sêva bar bigire û sêvê ser sor bin, herek bibe şelteke²; lê nişkê va merivekî nexêr bide balteke³ û here destê xwe bişkêne, damarê darê jê ke, sêv jî xwe da roj bi roj biçilmisin.

Dilê wê Letîf da tunebû, ancax şerma ev yeka kesî ra nedigot, wekî bigota jî kê giliyê wê dewsa tişteki hesab bikira. Tişteki destê wê da tune bû û ancax tenê îxtiyara hêsi⁴ destê wê da bû. Ew hêsi⁴ ra jî kereker,⁵ wextê tenê diçû ser kaniyê dikire tev ava kaniyê ye zela û digot:

“Kanî, kesek hêsi⁴ min ber tişteki hesab nake, qe neve tu li hêsi⁴ min bive xudan û derdê min ra bive şîrîk. Axir orta qîzapê û kurapê da çi firqî heye, ne ewana jî bira-xûşk in.”

1 bi beşereke xweş: bi rûyekî ken.

2 herek bibe şelteke: her yek bibe parçeyek.

3 balte: bivir.

4 îxtiyara hêsi: vîn û hilbijartina hêsi.

5 kereker/kerrekerr: di dengê nizm, dizîka.

Hevtek bû Qado li ber destê Andrey dixebitî. Ewî hinekî serederî ji dezgeh derdixist¹, dikaribû bi mifta çûk frêza² ku hazir bû derxe, ya teze ye tûj têke ser; rûnê wê xilazbûnê, rêzbê bankê rûn veke, rûn dagire. Xên ji vê yekê Andrey destekê dezgehê dida destê wî, digot:

-Lez mekeve, bi hemdê xwe bide xebatê.

Cara ewlîn ewî destek bi zexm bilind kir; lê heval got:

-Wekî aha ne rind e. Wî çaxî nişkê va fitil zêde dibin û diqewime rêzbê ku tu dixazî çêkî xirab ke.

Usa jî digot:

-Wekî tu dixazî dezgeh bidî xayîkirinê, lazim e dîsa hêdî hêdî destek berjêr kî, hetanî kutasîyê. Eger usa nekî, nişkê va bidî xayîkirinê, diqewime ji wê yekê tok bişewtîne.

Qado mîna zarê çûk guh dida ser giliyê dersdarê xwe ku ew hînî pêşek dikir. Ewî dezgeh dida xebatê û sekinandinê çawa ku lazim bû, lê hê nedihîşt dêtala³ çêke. Carina şa dibû, digot:

-Birê min, ez îdî dikarim dêtala çêkim.

-Na, ezîzê min, -Anderey got,- ez gelekî şa me, wekî tu zû hînî wê yekê bûyî, lê eger ez dêtalekî bidime te, tu çêkî û nişkê va xerab kî, wî çaxî zanî çend manat⁴ ziyar li zavodê dikeve? Lema jî hinekî sebir ke, rind hîn be, bona her dêtalekî zavodê lazim e em biricifin, çawa ku dê ber zara xwe.

Xêlê wext bû Qado malê ra name şandibû, lê tu caw nestendibû. Ji perê ku ewî xwe ra ji mal anîbû, çend manat mabû. Ewî şerm dikir vê yekê bêje hevalê xwe.

Wextê waha tev rêzba kevn derxistin, ku bivin tûj kin, Qado rê va got:

-Ezîzê min, şuxulekî min ketiye yalê⁵ te, dixazim te ra bêjim; lê şerm dikim.

1 serederî ji dezgeh derdixist: ji dezgeh fehm dikir û pê dikaribû.

2 frêz: parçeyê darikê dariştî.

3 dêtal: model.

4 manat: diravê azerbaycanê.

5 yal: alî.

-Te ra şerm nîn e tiştê usa dibêjî? Bêje, binê¹ çi şuxul e?

-Perê min xilaz bûye, ewî usa hêdîka got hew zanibû Andrêy wê ser hêrs be; lê na.

Ewî got:

-Hiz dikî em herine bal katibê komsomola yî ewlîn, bira te ra hine pere bide berdanê, hetanî te perê aylixa² xwe stand; yanî jî ez bidim.

-Na, eger zanî wê pera min ra bidine berdanê, tu zehmetê ne-kişîne.

Hema ser xebardana wan da katibê komsomolayî ewlîn hat. Ew jî diçû sêxa³ berevkinê.

Andrêy ew da eglekirinê⁴ û mesela pera gotê.

Ewî bi beşereke xweş got:

-Lo, komsomolê qenc te rind kiriye, wekî ev mesela hevalê xwe ra gotiye. Ez vê sehatê vedigerime îdarê, werê. Wir erzê binivîse, te ra çiqas pere lazim e em ê berdin. Min roja roj te ra gotiye ku çi çetînaya te heve, were bêje; em ê bicedînin dûz kin⁵, bidin. Çimkî tu teze hatî qebûlkinê.

Qado ji şabûna nizanibû çi bikira, per-baskê wî tunebûn ku bi-fire. Eger ew rastî hinek çetînaya dihat, merivê aha ye xêrxaz alî wî dikirin.

Carina êvar êvar dixast ku xwe ra xurekê çêke, bixwe, çêdikir jî. Ewî ne li te'mê, ne bêxoytiyê û şortiyê nedinihêrî; bona wî baş bû. Lê mala bavê xurek hinekî şor bûya, ewî xurek nedixar û ser da jî diya xwe ra şer dikir. Hela xurek çêkin bira wê da bisekine, pol dişuştin⁶. Ev yek gişk bona wî xêr bû; lê neheqiyêd ku diya xwe dikirin...

Ewana sirîya yekê de dixebitîn. Sihet nîvê çara ew û Andrêy çûne bal katibê komsomola yî ewlîn, erze nivîsîn û birine hesavda-

1 binê: binêrim.

2 aylix: mehane, destheqa mehekê.

3 sêx: beş.

4 ew da eglekirinê: ew da sekinandinê.

5 dûz kin: sererast kin.

6 pol dişuştin: qasik-tasik û fera dişuştin.

riyê, paşê pere stendin. Wextê Qado xêlekî ji Andrêy dûr ket nişkê va kete bîrê wekî sibe roja le'de ye; lema gazî wî kir û got:

-Tu malê nas dikî, sibê kincê xwe ye qirêj werîne bira Kîma bişo.

Ew hê negihîştibû mal, qîzika xudanê xênî têtêgramek dayê. Têtêgram bavê şandibû, wê êvarê gerekî bav bihata. Ew kete hundur, kitêb hilda, bive bide kitêbxanê û ji wir jî here stansiyê. Ew hate stansiyê, xêlekî sekinî maşîne hat, bavê wî ji vagonê peya bû. Ew hatine dest-rûyê hev, kêf-halê hev pirsîn; paşê taksiyê siyar bûn û hatin mala Qado.

-Bavo, de bêje çi heye?

-Lawo, cara ewlîn saxî û silametî ye. Bedirê kurê cînarê me birine eskeriyê, Xanimzera xûşka te dane mêr. Wekî dinê tu tiştê teze tune.

Dû van gotina bavê ra xort kete behra fikira... "xûşka te ye Xanimzer dane mêr... xûşk dane mêr..."

Bavê dît ku rengê wî hate guhastinê û xwe ker kiriye-xeber nade, lema jî pirsî:

-Kuro, çi bû te xwe ker kir; lê nabêjî-napirsî xûşka min dane kê? Xûşka te dane Elî.

-Lê wekî dinê çi heye?

Dixast qe neve bav ji mala cînarê wan, ji mala bavê Pakîzerê xeber de.

Bavê jî qest derheqa wan da xeber nedîda; lê Qado pirseke aha da:

-Bavo, ji qewma, pizmam kî nexaş e?

Bavê ev pirsî nikaribû bê caw bihîşt; çimkî tiştek wî ra lazim bû, ew vê pirsê ra girêdayî bû.

-Ha kesekî nexaş tune, xêncî Letîf. Divên pişika wî nexaş e. Teme dane min ez herime qirê¹ Develiyê hilqetûzê² peyda kim û şîrê wê biniqîtînime şûşekê û bivme gund...

-Em bêjin, te hilqetûz bir, paşê...

1 qir: çiyayê bi zinar.

2 hilqetûz: çêreyek e.

-Paşê wê çend dilop şîrê hilqetûzê vala kine ser kirtike şekir û bidine Letîf...

-Çima navine ser doxtir?

-Ê, Xudê hîştô, Seyrê ne ku doxtir e, Loxman e, ewa her tiştî zane.

-Ax, bavo, hûn çawa ji wê Seyra poşe îna dikin. Nemirim sax bimînîm, gerekî Seyrana "loxman" bi destê xwe rast kime cîkî usa, wekî hişk be û pêşîra cimaetê jê xilaz be...

-Kuro jinik loxman e, tu çî dibêji?

-Pak, pak bira loxman ê mîna Letîf be. Bavê Xanimzerê çiqas qelen stend?

-Xudê hîştô, bavê wê şuxulekî usa kir, qe kal-bavê me tiştê usa ne bihîstibûn, ne jî kiribûn. Ewî bê qelen qîza xwe da. Em bêjin gune wî da tune bû. Keçik rabû rûyê bavê xwe, wekî tu min bê qelen didî Elî bide, nedî ez ê pê ra birevîm; tu jî nava xelqê da rezîl be. Ewî tîrsa canê xwe, bê qelen destê wê girt û da Elî.

Ji van giliyê bavê, ew gelekî şa bû û bin lêva va keniya.

-Qado, -Hamo çêvê xwe li xaniyê çûk î rindik gerand û got, - her tişt bira wê da bisekine, tu venagerî gund?

-Na.

-Çima?

-Ez îdî dixebitim.

-Te ra xebat dest nade. Şikir bavê te yî pêşiyê ye û du birê te yî xebatçî hene ku gund destê wan da ne, were xwe ra mal da rûnê, saleke dinê dîsa were înstîtûtê.

-Bavo, tu gelekî şaş î, belkî saleke dinê dîsa qebûlî înstîtûtê ne-bim, paşê? Eva nebûye mesela zewaca min ku we dixast hê ez î der-xana hevta bûm bizewicandana.

Bavê çawa merivekî sûçkar xwe ker kir û îdî derheqa wê yekê da xeber neda. Ewî rind zanibû Qado îdî venagere gund. Çimkî ewî haqasî pesnê zavodê û wan merivê xêrxaz dida, bav me'tel dima, nizanibû çî bigota.

Sibetirê Hamo çû qirê Develiyê hilqetûzê bîne û bê, vegere gund.
Qado bavê xwe verê kir, hate poçtê¹ û neme Elî ra nivîsî:

“Elî can, cara ewlîn selam ji aliyê birê te yî Qado da. Cara duda, ez gelekî şa me hûn gihîştine mirazê xwe. Lê çima te û xûşka min e Xanimzer bê min dewata xwe kir? Bibaxşîne, ez kin dinivîsim, bavê min ê sibê, dusibe bê; wê were her tiştî qise ke.”

Elî ew salek bû ku înstîtûta zootexnîkê² xilaz kiribû û gund da dixebitî. Lê salekê geletir bû, ewî û Xanimzerê sura dilê xwe ber hev vekiribûn.

Orta wî Qado tunebû. Ew qewmê destgirtiyê Pakîzerê bû.

Îro ewî qest wî ra ew nema kin nivîsî, wekî Xanimzer adrêsa wî hîn ve û bide Pakîzerê.

Sibê, wextê siriya ewlîn, Qado hate zavodê, hevalê wî jê ra got:

-Hêja serekê dorguhastinê min ra got, wekî pey xebatê ra tu û şagirtê xwe va werên bal min. Îdî bîst roja geletir e Qado çawa şagirt dixebite, te ew rind hîn kiriye, lazim e em derecê bidine wî.

-Gelo ez ê bikaribim întihamê bidim?

-Gumana min heye wekî tu yê bidî. Niha zû here kincê xwe bi-guhêre. Pêşiyê ez ê ji te întihama hildim. Eger te bal min rind sere-derî ji dezgehê derxist, bizanive tu yê li bal mexanîk³, bal serkar jî rind caba xwe bidî.

Wextê Qado li înstîtûtê întiham dida haqasî neketibû tewsiya. Ewî zû zû kincê xwe guhast û hate cem Andrêy.

Ewana hatine ser dezgeh.

-Hê deh deqîqe hene, -Andrêy got,- wekî em dest bi xebatê kin, niha ez pîrsa bidim, tu jî cabê bide. Te çi nizanibû ez ê bêjim.

Andrêy nolî pênc pîçiyê xwe serederî ji dezgehê derdixist. Teze dereca şeşa stendibû. Mabû derecek, wekî hosta bixebite. Gele gele

1 poçte: poste.

2 înstîtûta zootexnîkê: enstîtuya beytariyê.

3 mexanîk: pisporê makîneyan

cara wextê dezgeh xirab dibû, ewî ne gazî hosta, ne gazî înjênêr dikir, xwe çêdikir. Andrêy axiriyê da got:

-Qe metirse, tu yê îro dereca ewlîn bistîni û sibê tenê bixebitî.

Dû bihîstina van giliya ra, wekî Ezîz şerm nekira, wê çepilê xwe hilda ber van dezgeha bileyîsta.

Pey xebatê ra ewana çûne îdarê, du cahil jî hatibûn întihama bidin.

Qado û xortekî va pak cawa serek, master¹ û înjênêr dan; lê yekê rind caw neda. Van herda ra derece nivîsîn; lê ê dinê ra gotin ku here baş hîn be.

Ewana ji îdarê derketin, Andrêy got:

-Te dît, min te ra digot metirse, tu ditirsiyayî. Merivê ez hîn bikim tu wextî ziyane navîne. Vê şûn da ez dixazim te ra çend giliya bêjim. Tu yê sibê da tenê bixebitî, timê bicedîne, rind bixebite û dêtala xirab neke. Û çi çetinyê te hebin yan min ra, yan here katibê kom-somolê ra bêje, malê nas dikî, warê-here.

-Birê min, çima em tu heta hetayê hev diqetin, tu usa temiya didî min?

-Na, xêr, usa nîn e. Sibê da em ê başqe başqe bixebitin, lema dibêjim. Lê mesela Pakîzerê em çawa bikin? Kengê dixazî em herin bînin.

Ewî mesela xwe û Pakîzerê hevalê xwe yî ezîz ra qise kiribû, lema ewî usa digot.

Dû xebardana Andrêy ra, dîsa fikir mîna çemêd biharê ye tijî ber çavê wî ra derbaz bûn û te yê qey bigota merivek ber wî sekiniye û dibêje:

“Qado hê koma deha xilaz nekiribû, roke havînê ye germ hate mala Xanimzerê, wî bi fesal Xanimzerê ra got:

-Rave, here bêderê, Pakîzer li wir dixebite, bêjê bira navrojê neyê mal, here baxê kêleka bêderê, li wî ciyî, kî derê ew çend cara bûye. Her du rastî hev dihatin, derdê dilê xwe hev ra digotin û dibilandin². Pakîzerê bi dengê zelûl kilamê evîndariyê digot:

1 master: hosta

2 dibilandin: gotin dirêj dikirin.

*Hey dil, hey dil,
Ez naçime baxê bê gul,
Bira Xudê tu car, tu car,
Hasil neke mirazê bê dil.*

Hema vê gotina wê ra Qado rex wê ra derdiket û bi dengê zelûl digot:

*Lê dînê, vî zinarî me sî kir,
Min ê bişkoşk vekir, sîng sipî kir,
Heçî kesê hatî-çûyî dîtîne,
Yê bêjin qîz-xort bûn laqirdî kir.*

Wextê Pakîzerê Qado didît, radibû pêş wî va diçû û digot:

*-Xwestiyê min dêranê dudu ne,
Yek kurê apê, yekî din e,
Bila kurê apê xwe wê da here,
Yê dînê zêrê serê min e.*

Ha ezîzê usa navêje, bêje:

*-Xwestiyê min delalê dudu ne,
Yek kurê apê, yek kurê xelqê,
Bira kurê apê ji xwe wê da here,
Kurê xelqê qolê zêr ê serê min e.*

Ew dikeniyar û xwe davîtine hemêza hev. Ewana ser çêrê mîna emeniyê¹ kurda ye bi gulgulî rûdiniştin.

Pakîzerê serê xwe dida ser dilê Qado û digot:

-Delalê min, xeber de... Xeber de... Ne axir tu serkarê du dilê bengî yî, çima xwe ker dikî? Xeber de...

¹ emenî: cureyekî xalîçeyan e.

-Ezîza min, ez ê çi xeber dim, min gotiye, dîsa divêm, hema ku koma deha xilaz kir û çûme Êrêvanê, qebûlî înstîtûtê bûm, ez ê şe-
vekê bêm te bibim...

Ewana xêlekî xeber dan û rabûn xwe ra henek dikirin. Pakîzerê berî Qado dida, dora darê ra dibir-dihanî. Westê ew digirt, bi hiz-
kirina Memê û Zînê hev radimûsan. Nişkê va nevixêr Letîf kêleka wana ra derket. Reng herda sipîçolkî bû. Herd jî ji ciyê xwe nedili-
vitîn. Letîf bi hêrs-kîn got:

-Qado, te ra şerm nîn e, destgirtiya min ra van heneka dikî?

-Destgirtiya te ye, hizkiriya min e.

-Tu lap nehişî xwe xeber didî, çawa yanî hizkiriya min e? Ez ê vê
sehetê hûr-rûviyê te hilşînim¹ e erdê.

-Nehiş tu yî, wekî tîke gewriya te da naçe û dixazî zorê daqurtînî,
zorê merî nikare tiştê usa bike.

-Tu çi xeber didî, ez nizamim. Pakîzerê hêdî hêdî pêş da hat û got:

-Letîf, berê xwe nede wî, bêje binihêrim tu çi ji min dixazî? Rind
bizanive, ez tu wextî serê xwe te ra nadime ser balgîkî. Cara ewlîn
bona wê yekê, axir ez tu çawa divêjin xanîkî da mezin bûne, û çi
bira, çi kurap, çi firqî?

-Qado qewet da giliyê Pakîzerê û got:

-Letîf, ewa ze'f rast dibêje, axir çima qîz tune, wekî tu bistînî?
Merî qe qîza apê xwe distîne? Rast e ev edetê me yî kevn e; lê em
gerekê hevt nepeniya têxine orta xwe û wî edetî. Axir tu Pakîzerê va
heta vê rojê bal hev in, mîna xûşk û biran in...

Letîf ji wan giliya hindik dima bibe'ce; lê çi bikira? Tişteki ji destê
wî nedihat, lê hêdîka caba wê da:

-Eger usa bû, îsal sê sal e çima belga min didî serê xwe? Eger usa
bû, dilê te min da tunebû, te çima roja roj belga min da serê xwe?

-Wî çaxî jî min nedixwest, lê çe'vê min e girtî bûn. Min her tişt
fe'm nedikir. Te him emrê min, him jî emrê xwe pûç kir. Min dixand,
tu û bavê xwe va bûne baîsê min. Tu xwe jî ne dixûnî, ne dixebitî,
çima tu kurê kîjan padşayî yî. Rind bizanive kal-bava gotine: "malê

¹ hilşînim: birijînim.

bava mêriv ra nave war.” Belkî sibê bavê te mir, tu yê malxuytiyê bikî? Qado, li ser piya mesekine, werên em rûnên. Kuma daynin pirsra jê bikin. Min zû va dixast, Letîf, rokê mecaleke ha têkeve destê min û çî kul dilê min da heye, gişkî derxim. Letîf, tu xort î, ter û can î, ancax mîna kalê hevtê salî li berê wî dîwarî rûdinêyî, papîrosê¹ dikişînî, kuxtekuxta te ye... Wê şûn da tu nexweş, eger malê bavê te heye here sanatoriya,² here nexweşiya xwe qenc ke, bira te xilaz kin. Xwe ra sin’etekê hîn ve, bi gilîkî va tu merivekî eware yî, ji min dest bikişîne. Lê ez zanim apê min tu wextî dest vê yekê nakişîne; ancax tu rind bizanive eger hûn min zorê birevînin, ez dîsa bal te nasekinim, çimkî tu birê min î...

Qado îdî nehîşt Pakîzer xeber de û gotê:

-Pakîzer, ez aha hesab dikim ku Letîf tu rind fe’m kirî, rabe, here.

Ew rabû û çêvê Qado nihêrî, yanê ez herim. Ewî çêv kirê ku here.

Pakîzer çû, Qado hate kêleka Letîf û got:

-Letîf, em merivê gundekî ne... Ez ê temekê bidime te, neçe nevê-je ku min Qado û Pakîzer filan derê dît, çî hêja ye?

-Na, ez naçim navêjim û ez ê belga xwe vegerînim; lê bavê min ne mal e. Ku hat ez ê bişînim, bira belga min vegerîne.

-Ez soz didim, wekî heta mehekê, ez Pakîzerê ne bivînim, ne jî xeber dim; lê niha guh bide min te ra çî dibêjim. Nava emirê însîn da cahiltî guleke biharê ye; lê gul zû diçilmise, cahilî jî derbaz dibe. Ancax nava emrê însîn da wextê cahiltiyê gele qewimandin diqewimin û ew yek hetanî roja qiyametê bîra mêriv naçin.

Niha em e cahil in, tu jî cahil î; lê u dixazî zorê cahiltiya xwe û Pakîzerê mîna gulê biharê ye bêwext biçilmisînî, werê tu dest ji vê yekê bikişîne. Ez dîsa dibêjim ne axir ew qîza apê te ye? Qîza apê yanî jî xûşk, çî firqî heye, ji xûn-tamarekê ne.

-Ez te ra mîna mera divêjim, -Letîf got, - ez ê belgê bidime vegerandinê û xebardana me ye îroyîn jî tu kes bira nizanibe.

1 papîros: cixareya rûsî.

2 sanatorî: nexweşxane.

Nava van mitala da hevalê Qado, Andrey ew de'v da' û bimbarek kir, wekî te dereca yekê stend. Ewî melûl melûl li wî nihêrî destê xwe avît, wekî Pakîzerê bigire, lê destê wî nava hewê da vala man... û paşê got:

-Ze'f razî me, birê min.

A, ev yeka Qado Andrey ra qise kiribû...

Rojê ewlîn, wextê îdî Qado tenê bû, ewî xebat zeftî xwe nedikir, xebatê ew zeftî xwe dikir. Carina serwêr bi ken wî ra digot, wekî yeqîn planê biqedîne. Van deqîqa ew gelekî ber xwe diket gelo ez ê kîngê planê biqedînim. Ancax tiştekî wî pak bû, ku tu wextî dêtalê wî çêkirî xerab dernedixistin. Lê usa dibûn wekî yek-dudu paş da vedigerandin. Çend hevteya şûn da ewî êd xirab bernedidan.

Qado ji xebatê vegeriya û Xanimzerê ra nemek nivîsî, dû gelek selam-kilava² ra hîvî kir, wekî evê nemê yeqîn bigihîne Pakîzerê:

"Ezîza min, Pakîzerê, ez hevalê xwe va hatine ser wê nêtê û nêta me ye kutasiyê ye, wekî roja le'dê êvarê rast seheta deha em ê hinda darê çinarê ye binetara aş bin û tu jî were wir, em ê te birevînin.

De bi xatirê te.

Qadoyê te."

Neme du roja şûn da gihîşte Xanimzerê. Ewê neme stend, vekir, gelekî şa bû û neme qat kir, kire nav kitêba ku dêst da bû. Hema usa jî hîşt çû ji mala bavê xwe haveynê qêtix³ bîne. Ewa derkete derva, Elî hate mal û çawa bû çe'v kitêbê ket. Hilda ku binihêre, nav da nema Qado dît. Hema zû vekir xwend, xwendinê şûn da qat kir dîsa kire nav kitêbê û dûz çû mala Xidir, derheqa nemê da Letîf ra qise kir. Vê şûn da Letîf hogirê xwe top kir, wekî çawa bikin?...

Sibetirê Xanimzerê name bir da hevala xwe. Wextê Pakîzerê neme xwend şabûna bû xulexula hêsira, ji çe've wê barîn. Ewê Xanimzer berk hemêz kir, ramûsa û got:

-Serwextî ye, ez ê usa jî bikim, çira min e...

1 de'v da: dehf da, dehfang.

2 kilav: kelam, axaftin.

3 qatix: mast.

Cimaetê rind gotiye: “Piyê bûkê zengûyê da ye, lê kes nizane qismetê kê ye.” Yanî jî divêjin: “Bûke li hespê ye, hevsarî mistê ye; lê kesek nizane qismetê kê ye.” Wê şeva le’de Pakîzer ji mal derket û dixast piyê xwe têxe zengûya zînê hespê Qado yî hubê û siyar ve, heta hetayê hevsarê hespê wî têxe orta herd destê xwe û bernede; lê... Lê ewa hê negihîştibû darêd çinara, Letîf û çend xortê dinê va nolî gurê çila gihîştine Pakîzerê, hildan avîtime hundurê maşînê

Pakîzer bona vê yekê lap me’tel ma. Ewê Letîf temam nas kir, îdî her tişt ber çe’vê wê reşeve hat û xast ku biqîje; lê nehîştin. Ewê bi kulma xwe va şûşa maşînê hûrhûrî kir û destê wê şeq bûn; xûna gevez bona hub-hizkirinê ew hilda, ew ê serê xwe maşînê ra derxist û tenê carekê kire qarînî. Ew deng wê deqîqê li Qado û Andrey tesele bû¹; lê dereng bû... dereng...

1 tesele bû: hat bihîstin

LAÇIK

(Bi motîva cimeta kurdan)

Nalenala bavê bû. Hevtêkê zêdetir bû, wî ji destî nexaşiya xedar mekabetî¹ dikişand, ji kezevê dinaliya. Dû-dermanê loxman berga tişteki nedigirt²: ro bi ro nola belgêd payîzê ye dereng diçilmisî.

Nişkê va bavê kire intinî, te hezir kir³, kizinî ji dilê kur hat, got:

-Çî ye bavo, bêje? Bêje, ez bi gorî!

-Sêvdîn lawo, îdî çerxa emirê min çep ziviriye. Ez ê bimirim. An-cax keserek dilê min da ma. Min tu nezewicandî. Lêbelê, ez mirinê şûn da zû-dereng tê bizewicî. Ditirsim tu herî rastî yeke bê esil bêyî. Nav-namûsa mala me erdê xe.

-Bavo, Xudê neke tu bimirî, ev yek.Ya duda qe şayîşiya nekişîne⁴, ez ê jî riya kal-bavê xwe da herim.

-Ê, lawo, riya em tê ra derbaz bûne, rêke çetin e.

-Bavo can, min qebûl e.

-De wekî usan e, lawo destê min da ad-qesem ke⁵, ez ê tişteki bêjime te, weysetê xwe bikim, wekî rehet herime axberê⁶ sar.

Sêvdîn sê cara destê bavê da ad-qesem kirinê şûn da, wî got:

-Lawo, weysetê min ew e, wekî te jin anî, hetanî laçika serê xwe veneke, nede ber serê te, serê xwe pê ra nekî yek...Kalê min jî, bavê

1 mekabetî: eziyet û cefa.

2 berga tişteki nedigirt: bi kêrî tişteki nedihat.

3 te hezir kir: te qey go, te wisa hesiband.

4 qe şayîşiya nekişîne: qe xema wê yekê nexwe.

5 ad-qesem ke: ehd û qesem ke, sond bixwe.

6 axberê sar: qebra sar.

min jî usa kirine. Lawo, laçika serê kulfet bal cim'eta me tişteki ziyaretî ye¹. Hetanî ew laçika xwe bide ber serê te diqewime, meh-sal derbaz bin. Orta wî wedeyî da tê wê rind bicêribînî. Lawo, jina necêribandî şîrê germnekirî ye, te da ser êgir, germ kir, diqewime biqete, nikaribî qêtx bimeyînî. Jina cêribandî namûsa mêra ye. Hespa cêribandî nav-dengê mêra ye. Te ku jina xwe cêriband, nav-namûsa wê dît, îja hemû sura xwe bêjê, mîna bira îtibara xwe pê bîne. Lawo, niha rind guh bide min, ez ê ser giliya vekim. Navê pêşîki me² Çiyaguhêz bûye. Ew keça, padşakî direvîne. Tê dikevîne zaxekê. Cabê dişîne, filankes, ez î filan derê me. De namûs bûye, bavê keçikê esker dişîne ser. Çiyaguhêz dikeve nava esker, hey qir dike, hey esker tê. Roja sisiya para va şûrekî qafê wî dixin. Keçik serê wî girêdide, laçika serê xwe vedike, dide ber serê wî. Divê, birîndar e bila serê wî neêşe. Paşê şûr hildide ber zaxê disekine, dibê: "Kî pêş da bê, yanê ez ê xûna xwe birêjim, yanê xûna wî..."

Esger pê dihesê, wekî Çiyaguhêz birîndar e, hucûmî zaxê dikin. Serkarê esker divîne, wekî keçikê laçika xwe vekiriye, serqot ber zaxê sekiniye, emir dike, esker paş da vedikişê. Çiyaguhêz destgirtiya xwe va sax û silamet vedigerîne mal. Bavê Çiyaguhêz meselê dihesê, tê rûyê bûka xwe û qutîke çûk pêşkêş dide wan. Çiyaguhêz ku dimire, qutiyê pêşkêş dide kurê xwe, kurê wî jî dide kurê xwe, tê digihîje min.

Ez jî didime te, roja çetinayê derxe. Qutî fêza êrîg³ da ye, hilde. Tema min te, heta jina te laçika xwe nede ber serê te, serê xwe pê ra neke yek. Wekî dinê çiqas mal-hal heye, li te helal be, mîna şîrê diya te.

Çend roja şûn da bavê Sêvdîn wefat bû.

Rojeke meha gulanê ye xweş bû. Sêvdîn derê malê rûniştibû û nuqî nava fikira bibû. Xulamê wî, Evdilbarî nêzîkî wî bû û got:

1 ziyaretî: pîroz.

2 pêşîki me: pêşiyekî me, mezinê me.

3 êrîg (şeklê tewandî yê arîg): banê xaniyekî ji hundir ve.

-Axa, îdî bahar e. Xweş bahar e. Çivîk çivîktiya xwe bi nikula qirş-qala tîne, hêlûnê xwe ra çêdike. Lê ez qe nizam, çima axê min, vê baharê qe destê xwe nade reş-sipî.

-Evdilbarî, -Sêvdîn got, - eva çendî çend sal e tu mala me da dixebitî, timê derd-kulê me ra divî şîrîk. Ez ê vê hebûnê, vî milk û mekanî çi bikim.

Evdilbarî wê deqê fikira axê xwe fem kir û gotê:

-Belê, axa, belê! Lazim e tu bizewicî. Gotî tu jî pey xwe ûrtekê¹ bihêlî...

-Eferim, Evdilbarî, eferim! Hema gotina min jî ew e. Hema îro da ez ê mal-milkê xwe bispêrime te û herim. Eger hatim, xwe hatim, xêr ku nehatim, ev mal, şênî, dewleta min mîna şîrê diya te li te helal be. Her tenê salê carekê, bahar bahar pêş min va, qebira dê-bavê min ziyaret ke. Xêr û xêratê bide. Usa bide, wekî çêvê kasib-kûsiba têr be. Li mexlûqet pak binihêre, cim'etê neêşîne.

-Ser çevê min, Sêvdîn. Qedirê zêr, zergar² zane. Eger tu yê herî, te ra oxir be.

Xût wê rojê Sêvdîn hespê xwe da zînkirinê, qutiya çûk e êrîk da veşartî hilda, çek-sîlihê xwe girêdan û terkese³ dinê bû³. Ewî rojê ajot, şeva rehet bû, şeva ajot, roja rehet bû. Hat derkete kêleka bajarekî çûk î bedew. Bîneke xweş hate wî. Aliyê bajêr î rohilatê mêrg-çîmanekî nedîtî hebû. Ewî ajot çû wir. Bîna gul-sosin û rihana, notila gulava keç-xortê bengî merî mest dikir. Sêvdîn jî hespê peya bû. Gema hespê jî dêv derxist, wekî biçêre, xwe jî serê xwe danî ser kevirekî û kete xewa şîrîn. Hema wê rojê keça padşayê wî bajarî, bi çil cariya va hatibûne mêrg-çîmanê kaniya "Dil û miraza". Wê rojê padşê emir kiribû, tu benî-însanek⁴ li aliyê bajêr î rohilatê negere. Lê wexta keça padşê nav mêrg-çîman da hesp dît, gote cariya:

-Canim, ev çi hesp e? Xweyê hespê xudanê xwe çi cul'etî ye,⁵ wekî ji emirê bavê min derketiye?

1 ûrt: war

2 zergar: zêrfiroş.

3 terkese³ dinê bû: mal û milkê dinyayê terikand û çû.

4 benî: bende, evd.

5 cul'et: cur'et, cesaret.

Carîkê gotê:

-Xanim, destûrê bide, herim binihêrim, çika' ew çi hesp e?

-Na, xêr, -xanimê bi hêrs gotê, - ez ê bi xwe herim. Hûn ciyê xwe da rûnên.

Xanimê carî ser kaniyê hiştin. Ber bi hespê çû. Çe'v Sêvdîn ket û sekinî. Nihêrî xortek razaye, merî heyîr-hejmekar² e dêmê wî binihêre. Eniya kever zîpik zîpik xû daye, şîrin şîrin razaye, tê kivşê westiyaye, kesiriye. Îdî lipitandin bi wê nebû, xem-xiyalêd cahiltiyê dilê horiya hevde-heyîjdeh salî da ber tîra.

Êmê çend deqîqa xanim ker-lal ser wî ra sekinî. Lê nişkê va hespê kire şihîn³. Sêvdîn hişyar bû, dît, wekî qîzeke dêmênûr,⁴ horî-perî, ser wî ra sekiniye. Bîstekê xwe şaş kir, wî tirê xewn e. Paşê hêdika, got:

-Keça delal, di riya Rebê Alemê⁵ be, bêje tu kî yî? Navê te çi ye?

-Ez, -xanimê got, - keça padşayê vî erdî me. Navê min Perîşan e. Lê tu kî yî? Çi digerî?

-Ez merîkî xerîb im, Perîşan. Bextê xwe digirim.

- Çawa bextê xwe digirim?

-Belê, bextê xwe. Ay, bextê min îdî destê te da ye. Perîşan, tu Rebê Jorîn kî, bêje binê, tu destgirtî yî, yanê ezep î?

-Xorto, lê navê te çiyê?

-Sêvdîn.

-Sêvdîn, ez ne destgirtî me, ne jî bûk im.

Sêvdîn û Perîşanê êpêcekî hev ra xeber dan, destê hev da sond xarin û ji hev qetiyar.

Hema wê êvarê Sêvdîn çok kuta çoka padşê. Perîşan xwest. Padşê mesele gote wezîrê xwe. Wezîr gotê:

-Padşayî sax be, xortekî kesib tê kivşê. Sê kîsik zêr jê bixweze. Ez zanim zêrê wî tunene, serê wî bide lêdanê, xilaz bû, çû. Padşê hat û got:

1 çika/ca ka: îcar ka, bê ka.

2 heyîr-hejmekar: şaş û mehtel ji kêfxweşiyê.

3 şihîn: dengê hespan.

4 dêmênûr: rûyê wê nûranî.

5 di riya Rebê Alemê: bi xatirê Rebê Alemê

-Sêvdîn, te ku sê kîsik zêr da, Perîşanê bive qîsmetê te, xêr ku na¹, ez ê serê te bidime lêdanê.

-Padşayî sax be, bavê min timê digot, nanê padşayî ser çokan e. Rica dikim nexeyîde. Rabe gazî melle ke, bira bê mehra min û Perîşanê bibire, min ku zêrê te nedan, xûna min li te helal be.

Padşa ser cul'eta wî mehtel ma, him jî mecbûr bû usa bike, çawa ku Sêvdîn got.

Pey mehr birînê ra, Sêvdîn qutiya lal û dur danî ber padşê. Çehvê padşê şabûna, mîna çehvê gurê birçî yî rastî berxê hatî, çîrûsîn. Lê wezîr û wekîl xwe da tevîzîn, kirtinê ber wan neket.

Padşê rabû emir kir, dest bi def û dewatê kir. Pey dewatê ra Sêvdîn Perîşan hilda û vegeriya mekanê bavê xwe.

Sê meh... Rast, sê meh bû, wekî Sêvdîn zewicî bû. Ewî hê dest nedabû Perîşanê. Her sive radibû ber serê xwe dinihêrî, laçika Perîşanê ber serê xwe nedidît. Ew gellekî ber xwe diket, rengê wî dixeyîrî.²

Lê Perîşan? Halê wê ro bi ro xirab dibû. Ro bi ro xwe da mîna belgê binavê zer dibû. Zevta cahiltiyê nedihanî, dikewgirî³. Axir, ew jî şah û şuhreta cahiltiyê h bû. Behra kemaltiyê gihîştibû, gul bîn ketibû, feqet...

Perîşanê, rojê bejin-bala Sêvdîn dinihêrî kirina wî ye mêrxas, dêmê wî yî fire, xeysetê wî yî baş didît xwe merîke here hetab⁴ hesab dikir. Lê şevê, wexta wî piştî xwe didayê, radiza, xwe merîke here bêbext hesab dikir. Huba wê ye agir-alav, te hey zanibû, av ser da dikirin. Hêdî-hêdî destê sar dikete orta wan.

Rokê jî ewê qîrar kir, bavê ra namek nivîsî: "Bavo, rûyê min bin piyê te ye, ez çawa keç hatime, usa jî keç mame, îlacekê bike..."

1 xêr ku na: heke na, heke wisa nebe.

2 dixeyîrî: diguherî, diçilmisî.

3 dikewgirî: di xwe de diheliya.

4 hetab: bextewar û kêfxweş.

Padşayê qecer name stendinê, kapê wî lîst¹. Gazî wezîrê xwe kir, mesele gotê. Wezîrê xayîn î telaqreş tişteki wa² digeriya, çimkî kurê wî yî eware³ hê ezep bû. Ewî bi rûvîti gote padşê:

-Padşayî sax be, îja ew gedê çi ye, tu ber wî dikevî.

-De bêje, wezîrê min, de bêje! Bêje, ez çi bikim?

-Niha, -wezîr gotê,- namekê ser navê Sêvdîn binîvîse. Binîvîse, wekî zavê ezîz, ez î nexweş im, Perîşanê hilde, were ser min. Ew wê da hatinê, em çend eskera bi serkariya pelewane te bişînine pêşiyê. Bira li rasta "Qetilê" lê din bikujin, xilaz bû, çû.

-Eferim, merheba, wezîrê min!

Padşê hahanga⁴ namek nivîsî û da qasidekî, şand.

...Sêvdîn name stendinê ber xwe ket. Mesele gote Perîşanê. Ewê wê deqîqê lêva xwe gest, tirsîya, çimkî, zanibû bavî bi dek-dolav e. Ciyê gulistan ew dike dêmistan⁵. Ciyê sekinî merivê ametam fina dike,⁶ lema jî hêsir barandin.

Sêvdîn hêsirê wê dîtin, ber dilê wê da hat:

-Qe megirî, ezîza min, em ê sibê rê kevin.

Sêvdîn dilê xwe sax, çi zanibû ew hêsir ne bona bavê ne, lê bona wî ne. Bona bext-talihê wî ne. Perîşan fikirî:

"Wekî ez bêjim, were em neçin. Lê wê nekeve şikê, wê nevêje, çawa, çima neçin?"

Sivetirê, Sêvdîn barxaneke⁷ giran hilda, her yek hespekê siyar bû û rê ketin. Roja sisiya gihîştine rasta "Qetilê". Li wê rastê bavê Perîşanê timê xûna neheq dida rêtinê. Çendî çend darê dara daraxacê⁸ wira hatibûne danînê. Lema jî cim'etê ew rast nav kiribûn rasta "Qetilê".

1 kapê wî lîst: firsend kete dêt.

2 wa: wiha, wisa.

3 eware: bêkêr.

4 hahanga: hanzûka, zû bi zû.

5 dêmistan: erdê dêm ê bêav.

6 Ciyê sekinî merivê ametam fina dike: ji bo tişteki ne tu tişt merivê sipsax dikuje.

7 barxane: kel û melê rêwîyan; alavên xwarin, vexwarin û razanê.

8 dara daraxacê: sêdareya dardakirinê.

Hindik mabû ewana ji rasta "Qetilê" derbaz bin, nişkê va çend siyara hucûmî ser Sêvdîn kirin. Sêvdîn qe xwe şaş nekir. Şûrê xwe kişand û kete meydanê. Bû şîrqeşîrqa şûra, şihîna hespa. Her şûr jor da hatinê dilê Perîşanê dibû fateresk, digiriya, îmdad ji Xudayê xwe dixwast.

Hinekî şûn da Sêvdîn koka mêra anî¹, yê sax ew bû, wekî ji mala xwe nehatibû. Perîşan bê hed-hesab şa bû. Ser mêrxasiya wî metel ma. Ewana gava gihîştine koç-seraya padşê, cav² danê, wekî padşa, zava û keça te hatin. Padşa ecêbmâyî ma, rabû derkete pêşiya wan. Bi rûvîti kêf-halê wan pirsî û got:

-Wexta cab dane min ku hûn hatin, tê bêjî nexweşiya min mina bû.

-Ez gellekî şa me, -Sêvdîn got, -wekî pêparê³ me li te hat, şikir vê gavê ra. Lê niha padşayî sax be, îznê bide, ez herim, kincê xwe biguhêzim, çimkî bûne xûn. Rê va çend qaçaxa hicûmî ser me kir...

Wexta Sêvdîn çû, padşê keçik bire odeke xewile⁴ û jê pirsî:

-Ne axir, min esker şandibû pêşiya we, wekî lê xin wî bikujin, te jî bînin. Ew çawa ji destê wan xilaz bû?

-Bavo, sebeb?

-Çawa sebeb? Ne te name nivîsîbû.

-Belê, min name nivîsî bû. Min nenvîsîbû tu qetlê bikî, bibî bayîsê xelqê. Min nivîsî bû, wekî tu îlacekê bikî, dû-dermanekî peyda kî?

Wexta keçikê ha got, padşa açorokî bû,⁵ kete halekî xirab:

-Dêmek, tu mirina wî razî nîn î?

-Na?

-Çima?

-Çimkî ew mêrxas e. Nevîçirkê yekî mîna Rostemê Zal e.

-Rostemê Zal?

-Belê, qe ecêbmâyî nemîne.

1 koka mêra anî: qira mêran anî.

2 cav/caw/cab: cewab.

3 pêpar: yom, oxira xêrê.

4 xewle: cihê ku kesek lê tune; tenha.

5 açorokî bû: reng û rû lê guherî, kete halê nexweşan.

-Lê çima ewî heta niha derheqa wê yekê da tiştek negotiye me.

-Hema mêrxasî jî ew e. Gotî êl bive maka mêriv¹, gotî êl bêje, ew kî ye?

Xaşa padşê xeverdana keçikê ra nehat. Avrûke tûj dayê, got:

-Hiz dikî bila kurê Rostemî Zal be, ew ber çe'vê min şeyikî ne hêja ye?

-Çima, bavo?

-Çimkî orta wî û qûlê derê mala min da firqî tune.

Îdî sebira Perîşanê nehat, qiriya, hêsir barandin, lê padşa derket çû bal wezîrê rûvî.

Hevtêkê padşê ezet-hurmeteke usa zavê û keça xwe ra kir, her Xudê zanibe. Perîşanê dilê xwe da digot: "Yeqîn bavê min ji kirina xwe poşman bûye."

Lê na? Çawa divên, gayê reş sipî nabe, dara biyê bar nagire, me-rivê telaqreş bi rehm nabe. Berbangekê padşê gote Perîşanê:

-Keça min, îro xanima wezîr gazî te û diya te mêvandariyê dike. Kerem kin herin.

Keçik û dê çûnê şûn da, padşê gote zavê:

-Sêvdîn, lawo, xanim çûne mêvandariyê, rabe em jî hespa siyar bin, herine nêçîrê. Bintara şêherê me mêşek heye, xezal tê da tijî ne. Dilê min goştê xezalê dixwaze. Dibên, tu nêçîrvanekî seqet î.

-Em herin, Sêvdîn bi dilê xwe yî sax got.

Sêvdîn nizanibû, wekî padşa û wezîrê alçax² wî dibin, wekî serê wî lê din, wî nizanibû, wî divine bagê hate-nehatê³. Bi gotina gotiya dibên wî baxî da dêw heye. Çivîk çivîktiya xwe nikare li wî baxî bifire.

Li bêx kanîk hebû jê ra digotin "Kaniya Derd-Kula". Ava wê dermanê gellek û gellek nexaşiya bû. Lê de tu were dêw çilke av⁴ nade tu kesî. Ava kaniyê ji bin zinarekî derdiket, du-sê gava dikişiya û dîsa mina dibû.

1 gotî êl bive maka mêriv: divê êl-eşîr bibe dayika merivan.

2 alçax: bêexlaq.

3 bagê hate-nehatê: riya mirinê ya bê veger.

4 çilke av: çilikek/dilopek av.

Ewana hespê kihêl siyar bûn, rê ketin. Êpêceyî bajêr dûrketinê şûn da, padşê got:

-Sêvdîn, baxekî min î rind heye. Darê dinê da çi bêjî lê peyda dibe. Ez wî baxê xwe nîşanî hemû kesî nadim. Kerem ke em herin bax binihêrin, paşê...

-Kerem ke, Sêvdîn gotê.

Dora bax sûrkiî bû. Ew jî sûreke çendî çend mêtira bilind. Du dergê bêx hebûn. Dergek wî serî bêx bû, yek wî serî bêx. Çawa diçûyî ber derge ew xweberê vedibû û dihate dadanê, îdî venedibû, gerekê biçûyayî dergê mayîn ra derketayî. Ber dergê mayîn jî dêw birîbû.

Ewana hatine ber derge, ji hespa peya bûn. Nêzîkî derge bûn, derge vebû, padşayî pêşiyê bû, xwe paş da da û got:

-Zava can, kerem ke, tu çawa mêvan pêşiyê derbaz ve.

Sêvdîn înkâr nekir. Hema derbazî wî alî bûnê derge ser da xirp hate dadanê. Padşa şa bû û vegeriya mal û dest bi dewatê kirin.

Perîşanê dengê def-zurnê bihîstinê, bi kel û bîn hate mal, pirsî:

-Ev çi def-zurne ye?

-Lawo, îdî derheqa Sêvdîn da nefikire. Ew bû xurê dêw. Ev dewat jî ya te û kurê wezîr e.

-Ax, zalimo!

Hê bû kûrekûra Perîşanê. Hinekî şûn da bi dehan qesaba kêr hildan, wekî goştî ser jê kin, bi dehan kulfeta sinî dane destê xwe birinc bibijêrin bona pelawê, bi dehan aşpêja milê xwe hildan, beroşêd mezin e bi çar qulpî dane ser kuçika, wekî xurek bipêjin. Beg-axelerêd bajêr, xanim, xatûn, keçên xwe va destê destê kişiyane mala padşê. Mêr beravî odekê bûn, kulfet jî beravî yekê. Keç-bûka perde girêdan, Perîşan xemilandin. Lê Perîşanê hêsir mîna taviya baranê dibarandin. Xanimêkê derheqa vê yekê da gote padşê, ewî got:

-Hêsirê ber perdê, hêsirê şayê ne.

De padşayê bêbext, wezîrê anîzaz¹ fêza gişka rûniştin simêl baddan.

1 anîzaz: şeytanç qebrax.

Nişkê va qîreqîr ji otaxa¹ kulfet tê da rûniştî hat. Zavê teze, kurê wezîr, ber dêrî bû, berî gişka revî wira. Kulfetekê got:

-Hela, hela mişk.

Ewî papaxê xwe derxist û avîte mişk. Mişk erdê ma. Ewî çû boçika mişk da girt, bilind kir û gote jina:

-Him, we dît, min çawa mişk kuşt! Dinihêrin, ez çito mêr im!

Paşê mişk anî bal Perîşanê.

-Dinihêrî, -ewî dîsa peyê xwe da², - destgirtiyê te mêrxasekî çawan e. Min hema derbekê ra ew kuşt.

Paşê mişk hilda derbazî oda mêra bû. Wira jî êpêcekî peyê xwe da. Hinek keç, bûk, xort bi wî kenîyan, qerfê xwe bi wî kirin. Vê demê Perîşanê Sêvdîn anî ber çehvê xwe. Dilê xwe da got: "Ewî lê da çend esker, pelewane welêt kuştin, qe negot Perîşan te dît, min çawa ew kuştin. Evî eware mişkek kuşt û nava xelqê da xwe kire sosret³."

Dîsa Perîşan ber perdê da giriya. Mîna berxa kaliya, nolî dayika ewled unda kir naliya, şivêta⁴ xezala birîndar zariya.

Her dem xûn tamara da reş dibû, telte telte dibû û dikete dilê horiya ber perdê. Perîşanê dîsa dilê xwe ra xeber da: "Ax, Rebê min! Min çî anî serê xwe. Qismetê kê bûm, bûme qismetê kê. Destê şêra derketim, ketime destê kundê mêra. Ax, lema gotine: "Bin siya rûvî da rûnenê, bila şêr te bixwe, ser pîra namerda ra derbaz nebe, bila lêyî⁵ te bive."

Te hew zanibû van giliyê axiriyê qewat kirine çokê wê, îşiq⁶ anî çehva û rabû ser xwe. Rabû ji ber perdê derket, bêdil kenîya, hate ber neynikê bi qelptî mekrbazelek da xwe.⁷ Berbûyê ev yeka dîtinê, şa bû û got:

1 otax: ode.

2 peyê xwe da: pa û pesna xwe da.

3 sosret: 1. ecêb û nedîtî 2. rezîl û riswa.

4 şivêta/şubheta xezala: mîna xezala.

5 lêyî/lehî: sêlav, ava gur.

6 îşiq: ronahî.

7 bi qelptî mekrbazelek da xwe: bi awayekî sexte tevgeriya û dest bi fêlbaziyê kir.

-A usa, usa! Ne tişteki henekan e, tu dibî bûka wezîrê dewletê.

-Erê, -Perîşanê got,- tu rast dibêji. Hûn cîyê xwe da rûnên, ca ez xwe hewzê xim bêm, ji germa serê min dêşe.

Ew dêrî va derket û berê xwe da baxê dêw. Go, bira dêw min ji bixwe, lê nevime qismetê kundê kora. Perîşan ber bi bêx çû.

Dergê bêx ser Sêvdîn da hatinê dadanê, ew piş xwe va zivirî kesek tune. Xwe derge xist, derge venebû. Mehtel ma. Dor-berê xwe nihêrî. Destê xwe avîte wî alî, avîte vî alî, tişteki dest va nehat. Belê fem kir, wekî paş da zivirandin bêaqilî ye, rê-dirb tune, pêş da çû. Çû, nişkê va dengê usa lê tesele bû¹, te tirê, çiyakî bilind jor da kire xûrînî hat. Cî da sekinî. Dîsa deng lê tesele bû. Pêşberî xwe nihêrî, ecêbeke reş e giran. Dêwek wê da dihat, erd dihejiya. Pêşiyê tirsîya. Mirin hate ber çehva. Lê ruh şîrîn e, jiyîn şerbet e. Him ji huba Perîşanê ye, çawa divên ked kiriye, behre² nedîtî tijî dil bû.

Emir, jiyîn, hub, azayî, mêranî, egîtî mîna lêlavekê dil da li hev piçilikîn³ û ewî şûrê xwe ji kêlîn⁴ kişand, mîna bokeberanekî çok kuta erdê. Dêw ev yek dîtîne, go:

-Cûciko, çok nekute erdê. Derba pêşîn, ya min e, ya te ye?

Sêvdîn fikirî: "Axir kal-bava gotiye, derb derba pêşîn e." û lema jî got:

-Hazir be, derb derba min e.

Sêvdîn vê gotinê ra usa hicûmî ser wî kir, usa şûrek qafê wî da dayê, çawa teyrê atmece⁵ dade erdê tişteki hilde û dîsa qilozî esmîn be.

Dêw paş da vekîşîya, xûna xwe dalast, wekî îcar jî ew derbê bigihîne Sêvdîn. Feqet ewî taqet nekir, firî ket. Ketinê ra post lê qelişî.

1 tesele bû: hate bihîstin.

2 behre: fayde.

3 mîna lêlavekê dil da li hev piçilikîn: di dil de mîna çêreya leflefoke li hev aliyan.

4 kêlîn (şeklê tewandî yê kalan): dewsa şûr.

5 atmece: cureyekî balindeyan e.

Sêvdîn texmîn kir, ku ew ne dêw e, merî ye, lê şivêta dêwan e. Îdî mecal nedayê, ser birî, gotê:

-Bêje min, ev çi sur e?

Wî merivê gapêran¹ bi dengêkî ricaf got:

-Min nekuje, ez pelewane dunê yî herî qewet im. Ev gişk kirina padşê ye. Ez bi navê dêw anîme kirime vira, merivê ku padşa dixaze bikuje, dixapîne nolî te tîne vir û ez jî dikujim. Paşê jî her tenê ew hukumdariyê ava kaniyê bike, baha û baha bifiroşe padşêd mayîn.

-Lê wekî tu yî usa qoçaxî, çima bûyî qûlê padşê, ciyê sekinî xûnê dirêjî?!

-Sura vê jî heye. Min keça padşakî dixwest, nedidane min, evî padşê ew min ra stend, bi wî qewilî, ew çi bêje, ez bikim. Him jî nîvê perê ava kaniyê dide min.

-Hûn her du ji hev zalimtir in, Sêvdîn got.

Û şûr jor da anî, ew qetqetî kir; dakete ser kaniyê. Ser çehvê xwe şûşt, av têr vexwar. Westiyabû, kesirî bû, serê xwe danî ser kevirkî kaniyê û kete xewa şîrîn. Hema vê demê Perîşanê dergê bêx vekir û hate hundur. Hê xofê, tirsê ew hilda. Ricifî, nola belgê ber bê bû. Ewê rind zanibû paş da rê tune, pêşiyê jî dêw e. Lê wexta kirina kurê wezîr anî ber çehvê xwe, xof-tirs qat kir, kire bin piyê xwe, ser ra derbaz bû û pêş da çû.

Hinekî hatinê şûn da erdê nihêrî û çilkê xûnê dît. Mîna zara kire îskinî, tîrsa lêv lê qelişî, reng lê bû kitan. Ewê îdî texmîn kir ku dêw Sêvdîn xwariye, ev jî xûna wî ye. Ancax çawa bû çehv cinyazet ket. Kûz bû² nihêrî Sêvdîn nîn e. Wê deqîqê sorayî hate dêmê bedew û dilê xwe da got: "Ax, şikir vê gavê ra, şêrê şêra sax e". Lê zû ji fikira xwe dûr ket, dêm dîsa xitimî, xwe xwe ra got: "Axir, ev ne cinyazetê dêwan e? Kanê dêw?"

Ber bi kaniyê lezand. Gihîşte kaniyê, nihêrî Sêvdîn serê xwe danîye ser kevirekî, mîna merivê nava rojê xoyê kişandî westiyayî, razaye. Ewa hêdîka hat ber serê wî rûnişt, paşê xwe xwe ra got: "Weyla

1 gapêran: laşê wî mîna gayekî.

2 kûz bû/xûz bû: xwe xwar kir.

min dêranê, hela binê¹ ewî serê xwe daniye ser kêvir.” laçika serê xwe vekir û hêdîka danî ber sêrî û rûnişt. Rûnişt û şabûna mîna ta-viya baranê hêsir barandin. Hêsirê delalê mîna hingiv nuqutî ser sû-retê Sêvdîn. Sêvdîn hêdîka çêhvê xwe vekir û seh kir ku tişteki nerm ber sêrî ye. Dest avîtê, nihêrî laçika Perîşanê ye. Şabûna ji ciyê xwe quloz bû. Ewî weysetê bavê xwe jê ra qise kir. Ewê jî derheqa bavê xwe da, derheqa def-dewetê, derheqa kirina kurê wezîr da jê ra got.

Pey gotina Perîşanê ra, te tirê çiqas kîn-boxsa dunyayê hebû, tijî dilê Sêvdîn bû. Rabû destê horiya xwe girt û ji bêx derket. Vê demê rênçberêd çolê dîtin, wekî xort, keçikek sax-silamet ji bêx derketin, çûk û mezinê şêher meselê hesiyan. Cim’et hey deste deste dihate ber qesirê.

Sêvdîn mesele cim’etê ra qise kir. Pêla cimetê ser hev ra çû-hat. Bi Sêvdîn ra tevayî hicûmî ser oda mêra kirin. Orta çend deqîqa da wezîr, wekîl, beg û axelerê xûna cim’etê mêtî bi cehnemê şa kirin.

Sêvdîn pêsîra padşê girt, ew kişande ortê û şûrê xwe hilbîrî, wekî wî ber çêhvê cim’etê bişîne wê dunê. Hema vê demê, Perîşanê xwe wî ra gîhand û got:

-Rica dikim bavê min nekuje, ew gune ye.

-Na, ez ê buikujim, Axir, ew xwedanê xwe gellek û gellek qetila ye. Qe gunê wî rokê merîkî kesib hatiye?

Perîşanê dît şuxul xerab in, got:

-Ez ber te çok vedidim, bavê min nekuje. Têke qûlê ber destê xwe, lê nekuje.

Feqet Sêvdîn guh neda giliyê wê, şûr bilind kir, wekî bîne serê zalimê zalima. Keçikê nihêrî şuxulê bavê xirab in, çawa divên, destê wê ji erd-esman hate birînê, lê nişkê va dest avîte laçika serê xwe, vekir û avîte ber piyê Sêvdîn, got:

-Ya Rebê min, bira rehm têkeve dilê te! Yanê laçika min pêpes ke, yanê bavê min aza ke!

¹ binê: binêre.

Xort mehtel ma û got:

-Alçaxo, here qurbana vê laçika ziyaretî be.

Hema vê demê kalekî rûsipî pêş da hat, got:

-Sêvdîn lawo, şîrê te mêtî li te helal be. Rast e, wî gellek xûn rêti-
ne, lê te baxişande laçika jinê. Eferim lawo, eferim!

Êrêvan, sala 1969a.

ZEHMETÊ GIRAN

Wextê qeziya meriv diqewime, merî paşopêlî dive, çawa divêjin, merî xwe şaş dike. Wezîr jî ketibû wî halî, ancax serê şînê wî jî kirîvê Pogos pirsî:

-Bavê min kê derê kuştibûn?

-Kenarê kambaxê bajêr. Ew heftek hebû rehmetî hatibû mala me. Royê diçû dixebitî, êvarê dihate mal. Wê êvara ku wê bihata kuştinê wî gote min: "Kirîvê Pogos, vê nêzîkayê malek heye, deynê min ser e, ez ê herim bistînim û zû bêm." çû û venegeriya. Hetanî sivê tu cav nehat. Sive berbangê min nihêrî Grîgorê kurapê min derê me kuta:

-Mala te neşewite, tu çi rûniştî? Vê sivê ez diçûme xevatê, min nihêrî meriv beravî dora meYTEKÎ bûne. Ez ku nêzîk bûm, êgir girte qafê min. Min kirîvê te nas kir. Îdî çi xêr li te barî, kevir-kuçik li me. Em revîn, çûn û me cinyazê rehmetylêbûyî anî.

-Kirîvê Pogos, -Xezalê pirsî, - wextê malşewitî gote te ez diçim deynê xwe bistînim, lê te nepirsî, deynê te ser kê ye?

-Na welleh, min xwe kor kir nepirsî.

-Bira dijminê te kor be.

Xezalê dîsa kire kûrînî, giriya. Hinekî şûn da hêsirê çêhvê xwe temîz kir û hewal da¹:

-Kirîvo, divê ê deyndar malxirabî bixapîne, bive wir û bide kuştinê?

-Ez çi bêjim, mehtel im, kirîvê, her tişt diqewime. Ê niha bajêr da hal usa xirab e, wekî seva² çend manata merî serê meriya dixwe.

1 hewal da: xeber da.

2 seva/seba: ji bo.

Pogos hetanî heftiya Cewar li mala kirîva xwe ma. Roja heştta wextê ew rê ket, here mala xwe, got:

-Kirîva Xezal, bira canê Wezîr sax be, şukur ew xort e, qîza te jî gir e. Rehma Xwedê li kirîvê min ve, de em gişk ê bimirin, kê me berê dunê bigire, bimîne.

-Rehme dê-bavê te be. Helbet usan e. Kesek me berê dunê nagire, namîne; lê qe neve, merî gerekê bizanibe ji kê alî kevir hat, qafê te ket.

-Meseleke cima'eta we ye rind heye, divêjin: "Bavê te hat kuştin, siyara kuşt yanê peya kuşt, kuştin."

Wextê ew dêrî va derket, hate rûyê Wezîr, Dilşayê û got:

-Xwedê per-bask bide we. Ez we bêguman' nahêlim.

-Em gelekî ji kirîvê xwe razî ne, -Xezalê got, -Xwedê te bêguman nehêle.

Wezîr diya xwe va ji mal derketin û êpeceyî kirîvê xwe ra çûn, wextê vegeriyanê wî ji dê pirsî:

-Kirîvê Pogos çi merîkî pak e. Gelo qe bavê min qencî bi wî kirîbûye dayê?

-Erê lawo, wan sala, hê ez qîz bûm, vira millet hev qir dikir, lê kalikê te yî rehma mala bavê Pogos ji wê zulmê xilaz kir. Nehîşt aha destê xwe bidana mirîşkeke wî ya kor. Wan sala bavê min gundê kalikê te da dima.

Paşê, ku her tişt ker-lal bû, em hatine vî gundî; lê mala bavê Kirîvê Pogos çû bajêr. Wî çaxî Kirîvê Pogos teze zewicî bû. De hema wê rojê da me hev ra kirîv, dost got; em çûne malê hev û hatin. Şukur niha halê wan î pak e, kur wî ra gihîştine.

...Ji wê rojê şûn da Wezîr dest bi zehmetê giran kir, ji wê rojê da bin barê zemanê qetlê da kire inteint. Wext zemanê reş î tarî bona zike nan serê wî li vî kevirî, wî kevirî xist. Pêlêd emrê bi zulm ew hemêz kir û çî nehanî serê wî tifalî...²

Hema wî çaxî da ewî hesreta her tiştî kişand, çêhvê wî ma deriya; lema gotine: "Çêhvê li deriya, xulî seriya..."

1 bêguman: bê debar û aborî.

2 tifal: zarok.

Ro pey hev dihatin, derbaz dibûn. Rokê Wezîr derê malê stuyê xwe xwar kiribû, rûniştibû, Melle Hesen hate heyata wan.

-Wezîr, lawo, diya te mal e?

-Na, ez xulam, çûye mala Meta Nazê.

-Lawo, şukur tu îdî xort î, çima ber dîwara rûdinêyî? Here bixebite. Min ketayê' gund ra gotiye, hema sivê da here mala wî da bixevite.

Xezalê hatinê Wezîr mesele gotê. Ew pêşiyê razî nebû, paşê çî fikirî, çî nefikirî razî bû. Ew îdî nesekinî, hema wê rojê çû mala ketayê gund.

Heyateke keta ye mezin hebû, dora wê sûrkirî bû û sûreke bilind bû.

Wextê Wezîr hate heyatê qîza keta ye mezin Esliye alîkî hewşê da feraq dişûştin: Ewê ku ew dît got:

-Kerem ke, kerem ke bavê min mal e.

Wezîr hilkişiya qatê duda, derê oda Selman, ketayê gund tê da rûniştî vekir: Ewî ser doşekê rûniştibû û pala xwe kutabû balgiyê tûke¹.

Ewî Wezîr dîtine got:

-Were, were.

Ew derbazî hundur bû.

-Melle merîkekî bi rehm e, -keta dest bi xebardana xwe kir, -rastî weliyê Xudê ye. Bona te hat ji min hîvî kir, wekî tu bêyî mala min da bixevitî. De xevateke usa tune, lê giliyê wî camêrî min nikaribû erdê xista: Çend hespê min hene, ez fikirîme tu hema miqatî hespa vî. Axir, bavê ne'lbend bû, merî gerekê senetê bavê xwe bike. Tu razî yî?

-Belê, ez xulam.

-Heqê te ez ê meh meh bidim: De here, here bira Bedîr te bi xevatê re têke nas.

Wezîr ku dêrî va derket kete fikira: "Gelo wê mehê çî bide min?"

1 keta: muxtar.

2 balgiyê tûke: balîfê ji pûrta perindeyan.

Ew hê noqî fikra bibû dengê xulamê mezin, Bedir ew ji fikira raqetand. Bedir nêzîkî wî bû, got:

-Îro da tu gerekî şuxulê xwe nas kî. Çar meh in du hespê kihêl û şeş hespên qoşkirinê¹ hene. Tu gerekî wan hespa mîna taseke şûştî temîz xayî kî...

Ewî Wezîr anî tewla hespa. Vira çi lazim bû Bedir wî ra şîrove kir û lê da, çû.

Wezîr timê berbangê dihate xevatê, êvarê tarî diçû. Hesp derdixiste derva, binê wan bêrê va temîz dikir, zirmix² dibire derva, paşê bi çalxûyê³ va paqîş dikir, dihanî tewle peyn dikir. Once dikire afirê kihêl û mehîna, gîha dikire afirê hespê qoşker⁴. Paşê hesp rind qeşaf dikir, dihanî ser afirê wan girêdida: Wê şûn da diçû, royê sê cara hevdeh-heyjdeh elb av dihanî, dida hespa.

Wan rojên zivistanê, çawa divên, wî goştê xwe dida devê xwe û ber sur-sermê, ber vî zehmetê giran teyax dikir⁵. Zikekî têr, du zika birçî rojêd reş derbaz dikir: Lê de tu were ber vî zehmetê wî yî giran va keda mehê nîv pût⁶ ceh dida.

Wî gelek cara dixwast bihêle here, ancax ku da? Yek jî Esliyê wî ra mîna xûşka hurmet dikir. Hema ku dikete firsendê wê dihanî nan, xarin dida wî.

Rokê wextê tewlê da qulefîska rûniştibû û ketibû mitala Eslî der da hat:

-Were bira, -ewê got,- em herine mala me: metirse şerm neke. Dê-bavê min ne mal in, çûne dewatê: Were ez ê te ra tiştêkî bêjim.

Ewî Wezîr anî ber sobê da rûniştanê. Qelî derxist, anî germ kir, tasek tijî danî ber wî û got:

-De hilde, bixwe.

1 hespên qoşkirinê: hespê bezê.

2 zirmix/zirnîx: rêxa dewêr a şil.

3 çalxû: gêziya darînî; siqawêl.

4 hespê qoşker: hespê bezê.

5 teyax dikir: li ber xwe dida.

6 pût: kod.

Şerma zîpikê xudanê mîna hebê morî-mircana li eniya wî hatine xanê¹.

-Qe şerm neke, -Eslîyê dest bi xeberdana xwe kir, - qencyê bavê te ser me gelek in. Diya min e rehma lîbûyî digot, wexta ez e sê-çar salî bûme, ketime bîra çil arşûn²: Diya min hewar-gazîyê dadixe: Derê ku bavê min cul'et nake têkeve bîrê, lê bavê te yî rehma dîke-ve bîrê û min derdixe: Ax xuzula niha diya min sax bûya. E çi bêjim bira, niha dêmariya min qe royê nade serê min.

Vîra ewê dengê xwe birî, êmê çend deqîqa kerr û lal sekinî, lê nişkê va usa kire axînî, te tirê dilê wê dane ber tîra, got:

-Wezîr, bira, bavê min û dêmariya min bona malê dunê dixazin min zorê bidine kurê Paşa begê. Ez qe nizam çi bikim?

Hema vî çaxî xulamê mezin, Bedir hat û xeberdana wan nîvcî ma.

...Vê mala têr e tijî ye zulmkar da her tenê rehma dilê Eslîyê da hebû. Lê bavê wê destê wê zorê girt û da mêr.

Wê rojê da dilê Wezîr derizî. Wê rojê da ew ji vî qapî zivêr bû³ û qîrar kir, wekî tu wexta piyê xwe nevêje vê malê.

1 hatine xanê/xuyanê: xuya kirin, diyar bûn.

2 arşûn: pîvaneke kevn e. arşûnek 75 cm e. (40 arşûn bi qasî 30 mêtroyî ye.)

3 ji vî qapî zivêr bû: ji vî dergehî aciz bû.

HUB Û ZINÊKARÎ

Rojêd zivistanê ye sar e şexte¹, bi tîpî derbaz bûbûn. Axir, zivistan jî fesaleke² salê ye, divêjin her tişt rind e wextê xwe da, lê kasiva³ ra zivistan roja reş e.

Îdî leq ketibû⁴ bûza ser çemê ku bintara gund ra dikişiya.

Bûz telte telte⁵ ser avê ketibû.

Berf berojê çiyayê pêşberî gund belekî ketibûnê, diheliya, ava wê jor da dihat.

Xulexula avê belekiya, wîtewîta çivîka, holehola şivan, gavan, berxvan û cotkara mîna lêlavkê hev dipîçilî, zingîn dikire rasta, lê wextê li şel-pela diket mîna zengilê stuyê karwanê deva li merî va xweş dihat.

Li her derê bahar bû. Bahar ... Ancax dilê Wezîr da zivistana derd û kula bû.

Hewa usa xweş bû, meriya nedixast here hundur. Êvarekê Wezîr û Dilşa derê malê rûniştibûn, kariyê⁶ ku ro da berev kiribûn li ser koziya êgir dipehtin. Wî çaxî Bekir hate mala wan, selam da û got:

-Wezîr can, ez û tu hevalê hev e zarotiyê ne. Ez timê tême mala we, lê qe nizanîm sebeb çi ye tu qet naxazî bêyî mala me.

Pey vê gotinê ra wî rûyê Dilşayê nihêrî. Birê dît wekî ew soromo-

1 şexte: barana zîpikan.

2 fesal/fesl: demsal, mewsim.

3 kasiv/kasib: feqîr û belengaz.

4 leq ketibû: derizî bû û dileqiya.

5 telte telte: parçe parçe.

6 karî: kîvark.

ro bû. Ewa îdî nesekinî, revî kete hundur, Wezîr hê cava wî nedabû Bekir dîsa hewal da:

-Wezîr, were em herine mala me: Diya min tiştekî usa rind pehtiyê, wexta tu bixuyî wê xaşa te bê, çawa divêjin tilîka xwe pê ra bixwî.

Wezîr û Bekir hev ra hevaltîke şîrîn dikirin, lê dû wefatbûna bavê ra, çawa divên, per-baskê wî şkestibûn. Nolî berê, dest nedikire peleguha xwe, nedikire kakekak, kilam nedistira. Kêf-henekê berê wî heval-hogira ra dikir, îdî meskenê xwe bar kiribûn... Rehmetlêbûyî Cewar şeka kulfetê malê şkênandibû.¹

-Bekir, -Wezîr got, - diya min ne mal e, bira bê paşê.

-Çima diya te ku da çûye?

-Çûye mala apê Mecîd, savar bihêre.

Hema ê xeberdana wan da Xezal hat: Îdî wî xwe Bekir xilaz nekir û ew çûne mala wan.

Wana hê pê davîte heyata wan, bîna kade û goşt avîte pozê wan.

Rastî Wezîr kade gelekî hiz dikir. Diya wî ew ze'f rind dipehtin. Wî û xûşkê diçûn pêqask berav dikir, dihanî. Dê hahanga hevîr distra, pêqask temîz dikir, dişûşt, ew toxavkê² va, yanê toraqê va rind hev dixist. Paşê loq loq dikire nav hevîrê vekirî, her du aliyê hevîr dida ser hev, destê xwe va dineqîşand, sêl dida ser kuçik, hine bez, yanî rûn davîte hundurê sêlê, ew diqijilî. Paşê carê 10-12 hev kulor davîte nav rûn û ew xwe da sor dibû û diwerimî, êd pehtî ji sêlê derdixist dikire hundurê tasekê, wextê kulor vedipesirî³, wana ku dixar, lezet didît. Lê sala îsalîn dê hela kulorê usa nepehtibûn...

Nava wan mitala da, hewşê da melle û jinê hev ra kêf-halê Wezîr pirsîn, paşê melle got:

-Lawo, de hûn derbazî hundur bin.

Sê odê wan hebûn. Derê her sê odê wan hev da vedibûn.

1 şeka kulfetê malê şkênandibû: çiviyê wan sist kiribû û ken li ber devê wan nediket.

2 toxavkê: toyê xavik ê zirav.

3 vedipesirî: bi emadê xwe radiwestî.

Lê derê odê yî jorîn î duda ser gomê da vedibû, wan şev derê gomê para va dadida û dihatine odê.

Hinekî şûn da jina melle ye çûk Kubar jî hat: Ewê kêf-halê Wezîr pirsî, paşê malîvanê nan, xurek û kulor anîn, wana nan xar, sivre hate hildanê, Fatmê got:

-Wezîr, lawo, rehmêlêbûyê bavê te cînarekî pak î xêrxaz bû, de Xudê Teala ciyê wî cinet ke. Niha mezinê malê tu yî, welleh ez dixazim gilîkî kurê xwe ra bêjim...

-Meta Fatme, rehme dê-bavê te be. Kerem ke, çi giliyê te hebe bêje.

Wezîr nizanibû Fatme yê çi bêje, lê melle zanibû, lema ew ser jinê da hêrê bû¹ û gote Wezîr:

-Kurê min, aqilê jina hinekî sivik e, devê xwe nede ber devê wê.

Wezîr li melle nihêrî, li jinê nihêrî û tu gilî negot, rabû razîbûn da malxûyê malê û dêrî va derket.

Hema çawa gihîşte mal, wî mesele diya xwe ra qise kir. Dê wê sehetê fehm kir, wekî Fatmê çi xastiye bêje û mesele kur ra qise kir:

-Lawo, wê rojê Bekir pêşiya Dilşayê birîbû û gotibû:

-“Tu li hewata² dunê sax bî ya min î, lê bimirî ya xuliyê yî... Hilbet, xûşka te çawa lazim bû cava wî dabû, lê... Fatmê xastiye meselê veke, te ra bêje; lê melle nehîştiye.”

-Dayê, lê çima te ev yeka heta niha ji min veşartîye.

-Ez qurban, de hêrs nekeve, qîzek ya xortekî ye. Bekir kurekî pak e. Mala melle têr e tişî ye, bira xûşka te here parî nan bixwe.

-Lê Dilşa Bekir hiz dike?

-Lawo, ewê min ra tişteki usa negotîye, lê ez texmîn dikim, wekî qîzik wî hiz dike.

...Îdî erdê barê giraniya zivistanê zû da avîtibû, xemla baharê ye geş avîtibû ser xwe. Her kolozê berfê yî çiyayê Girîdaxê dûr va diçûrisî. Wan rojê baharê ye xaş da bende ji çûka girtî heta mezina dixevîfî. Wezîr jî nêr hebû here bajêr, mala kirîvê Pogos û wir bixe-

1 hêrê bû: beziyayê û nehîşt zêde biaxive.

2 hewat/heyat: jiyan.

vite. Li gund, te tirê hewa têra wî nake. Du qeweta ew ber bi bajêr dehv dida. Yek ew bû, wekî here bajêr derheqa kuştina bavê xwe da tişteki hîn be. Wî derdî dilê Wezîr da mîna dara diriyê şax dabû û kelemê wê dilê wî qul dikir. Axir, Xudê jî ev yeka qebûl nedikir, xelqê jî ev yek serê wî dikirine serevde¹. Ya duda ew bû, wekî wî nedixast, roja dewartê, roja verêkirina Esliyê şîn-giriyê vê qîza rehm bivîne. Çimkî wî mîna bira ew hiz dikir.

Ewî dilê xwe da digot:

-“Ya pak ew e, bihêlim herime bajêr. Bira ne çêv bibîne, ne jî dil bivîne...”

...Êvar bû, Xezal orta her du ewledê xwe da rûniştibû û şîrin-şîrin xever dida, nişkê va Melle Hesên, Fatma jîna wî û birê melle der da ketine hundur.

Ew ber wan rabûn û Wezîr got:

-Kerem kin, rûnên, hûn ser sera, ser çêva ra hatine.

Paşê ser da zêde kir:

-Vê şevê we xêr e?

-Çêvê te ser gula be, -melle got, - şukur xêr e, Xudê te hezar salî ke.

Xezalê û Dilşayê demekê şûn da sivre vekirin, Xudê çi dabû anî-ne ber wan.

-De, kerem kin, -Wezîr got, - hildin, em parî nan bixun.

-Na welleh, -melle got, - em bona meselekê hatine, wê meselê safî kin, paşê.

Wezîr çêvê diya xwe nihêrî, wê jî wî nihêrî.

-Canim kerem kin, -Xezalê got, - nîn bixun.

-Na, -Fatmê got, - heta mesela me safî nebe, em destê xwe dirêjî sifra we nakin.

-Axir çi mesele ye?, Xezalê pirsî.

-Em hatine îşev, - mele got, - bendçarixa neva girêdin, kurê min qîza te dixwaze. Min bihîstiye Wezîr dixwaze here bajêr, de pey de'wetê ra, bira xêr xaşî here.

¹ serevde/serhevde: nav û nûçik; riswayî.

Xezalê rind zanibû, wekî melle toximekî¹ usan e piyê wî ku ket, gerek e ew ya xwe bike.

Lema Xezalê çe'v kire Wezîr û ew derketinê derva, wê got:

-Wezîr, zû here mala Bedo bira ew û Nazê jî bên. De, ewana me ra qewm-pismam in.

Tu qewm û pismamê wan tunebûn, ancax mala apê Bedo wan ra gelekî heyf bû. Hela hê wextê Cewar sax bû, ew neferê mala xwe va timê dihatine ser sifra hev e şayê û şînê. Niha, ew cînartî, dostî, diha qewîn² bibû.

Wezîr zû çû wan ra got. Apê Bedo, meta Nazê û Torin hatine mala wan.

De, melle dest pê kir. Axiriyê Wezîr got:

-Ez jî, diya min jî razî ne, ma mesela qelen, em wekîliyê didine apê Bedo.

Qerez hinekî vir da, hinekî wê da qelen vebirînê şûn da Wezîr got:

-Ez ê tişteki bêjim, em derê mala xwe defê naxin, lê çi ku dimîne derheqa we da, hûn dizanin.

Fatmê zû rabû boxçe vekir, hevtreng avîte serê Dilşayê, gustîl kire tiliyê; xurme, kaka û fêkî kire siniyê û danî orta cima'eta rû-niştî.

Pey şîrîniyê ra melle got:

-Xezal, Wezîr lawo, şukur hebûna min heye, ez ê sivê da qelenê we bidim, hûn jî karê xwe bikin, hetanî hevtêkê ez ê bûka xwe bibim.

Berî de'wata Dilşayê Wezîr çû pey kirîvê Pogos; ew hate de'watê.

Pey de'watê ra kirîvê Pogos çend roja mala Cewar ma, çûnê ew Wezîr teyayî çûne bajêr.

Çend roja Wezîr bajêr buhust buhust geriya, ji hal ket, ancax bal dostekî kirîvê Pogos kete xevatê.

1 toxim: tov.

2 qewîn: xurt.

Ew xarinxanê da dixebitî. Vira halê wî hinekî pak bû. Têretêr¹ bermayîne nanê xelqê dixar, perê aylixa² xwe yanî xwe dibir, yanî jî dida hineka diya xwe ra dişand. Wekî dinê, eger tiştek lazim bûya, dikirî û çûnê xwe ra dibire mal.

Ew çiqasî pey mesela bavê xwe ket, lê ser tu tiştî va venehat. Meh dihatin pey hev derbaz dibûn, lê hesav yek bû ewî dest ji meselê venedikişand.

Êvarekê ew û kulfetê mala kirîvê Pogos rûniştibûn, xwe ra xever dida. Wextekî wana nihêrî kelb direyê. Berî gişka Wezîr çip kire derva. Wextê ewî ew zilam dît, ji çe'vê xwe îna nekir. Torinê kurê Bedoyê gundiye wan derê malê sekinîbû. Demê wî xitim bû, rengê wî reş qemilî bû. Te bi hevt kêra va li Torin xista, îna bikî çilke xûn nedihat.

Elbê ra nuqutî dilê Wezîr, wekî qeziyak qewimiye.

-Torin, tu serê min, tu qebra bavê min, rast bêje çi qewimiye?

Wî bi curekî ancax xever da, tûk dêv da miçiqîbû, zimanê wî te tirê nedigeriya, bi teherekî³ got;

-Qet tiştek neqewimiye, nizamim çima diya te digot: "Bira Wezîr bê."

Hema vê demê Pogos jî derkete derva û got:

-Werine hundur, axir çi bûye?

Torin dîsa mesele vir da wê da avît, kutasiyê wana gelekî zor dayê, wî got:

-Melle Dilşa kuştiye.

Vê demê te tirê birûskê li Wezîr xist, devê wî kete hev, êşê girte qafê wî. Wî usa hesab dikir, wekî çend celat ser wî ra sekinîne û bi mêkuta didine qafê wî. Porê serê wî bîzbîzî⁴ bû. Nişkê va wî kire qîrîn:

-Çawa? Çima? Û her du desta va hate serê xwe. Xast xever de, hêsira rê neda hev, mîna şêrê birîndar kire zarînî, kevir-kuçik ji den-

1 têretêr: bi têra xwe.

2 aylix: mehane, destheqa mehekê.

3 bi teherekî: bi awayekî.

4 bîzbîzî: vîzvîzî, yeko yeko û rakişandî.

gê wî diheliyan. Ewî çok kuta erdê, mîna melle ser qameta nimêjê destêd xwe ber bi esmîn bilind kir û kire zarînî:

-Îlahî, ev çi daxê¹ bû te anî serê me!

Kulfetê mala kirîvê Pogos bi wî ra digiryan.

Xêlekê şûn da bi teherekî Wezîr dil da ber dilê xwe û got:

-Bira, Torin, bêje çima, çima bûka desthene...

Wî nikaribû giliyê xwe tamam kira. Torin got:

-Wezîr, şukur tu xort î, ter î, can î; te ra şerm e girî. Qeziya tê serê mêra. Sebir ke. Rind guhê xwe bide min, te ra bêjim çima melle Dilşa kuştiye. Desteberbanga sivê bû. Em mal da razabûn, wextekî dengê girî me teselî bû. Hinekî şûn da bû hewar-gazî. Ez bavê xwe va zû rabûn, derketine derva. Mecîdê gavan ber bi mala me direvî, hê dûr va kire qîrînî:

-Bedo, mala te neşewite, divêjin Dilşayê xwe kuştiye.

Em ber bi mala wê revîn, mal da me ecêveke nedîtî dît. Diya te ser-çe'vê xwe tîştîşî kiribû², xûna gevez hildabû, teyê bigota cewkê xûnê³ ser sûretê wê da dixulxulî.

Jina melle ye çûk, Kubar jî mala wê bû. Bavê min jê pirsî:

-Kubarê, qîzê ev çi hewal e?

-Apo, -ewê dest bi xeverdanê kir,- bira tamam cima'et bizanive, wekî mele Hesên rastî ne melle ye, Xudê ew xuliqandiye tenê zînê-kariyê û xeraviyê bike. Ne hûn zanin, wekî eva hevtek e Bekirî neyî li mal e, çûye mala apê xwe. Îdî wextê razanê bû, derê me kutan. Melle rabû derî vekir û du xortê telaş e dirêj der da hatin. Min ew nas nekirin. wan û melle kêf-halê hev pirsîn. Ewana derbaz bûn, rûniştin, melle gote min:

-Qîzê rave, lawika ra nîn bîne.

Lê wana nehîşt û got wekî em westiyane, me ra cî daynin. Li oda jêrîn min sê cî danîn, lê em kulfet derbazî oda xarinê bûn.

Hinekî şûn da me û wan serê çirê daxistin. Fatme zû kete xewê,

1 daxê: birîna cihê şewitî.

2 tîştîşî kiribû: qelaştibû.

3 cewkê xûnê: cihokê xwînê.

lê min Dilşayê va xwe ra kerr kerr xever dida. Êpêce wext derbaz bû, min çe'v rijiyayê got:

-Dilşa ez usa tî me, te şelbik¹ danî kê derê, ravim hine av bixum.

Ewê nehîşt û got:

-Tu raneve, ez ê ravim. Ez xwe jî tî me.

Ewa hêdîka rabû, dêre û kurtikê xwe xu kir, çimkî ew gerekî oda jêrîn ra derbaz bûya, biçûya talanê, av bihaniya. Ew hema pêxas, ser pêçiya hêdî-hêdî çû, wekî melle û wana hişyar neke.

Êpêcekî kişand Dilşa nehat. Nişkê va min bihîst dengê Dilşayê tê. Ez me'tel mam, gelo ew kê ra xever dide. Çend deqîqe derbaz bûnê qîrîniya Dilşayê kete guhê min, min banzda ser xwe. Heta min kincê xwe xu kir, hatme oda jêrîn, derî vebû û ew her du xort derî va derketin. Min zû serê çira vêtî bilind kir, îşqê otax hildabû. Min bîr kir bigota, wextê xort derketin, melle jî wan ra derkete derva.

Min xwe avîte ser Dilşayê û ew hemêz kir, pirsî:

-Lawo, qîza min, ev çi xûn e? Çi bûye?

-Kubar, -ewê bi dengêkî melûl got,- tu dewsa diya min î, melle mêkut va da qafê min. Ez te ra çi dêjim, yeko yeko bireve diya min ra bêje. Wexta ez hatim, min hêdîka perda dêrî hilda, wekî herime talanê, wan mêvana yekî gote melle: "Melle Hesên, te Cewar bi me da kuştinê, qîzê kurê xwe ra bistînî, yanî jinê xwe ra bistînî..."

-Ew dêlik, -melle gote wan,- min ra nehate rayê. De, Bekir qîz stendiye, wextekê jî ez ê Xezalê bistînim. Sala bîst yekê ve, ez ê dîsa gotina xwe bikim.

Kubarê, min îdî tehmûl nekir û şerm da bin piyê xwe, gote melle:

-Ax, dêmek bavê min bi destî te hatiye kuştinê, erê? Ez ê vê sehetê hewariyê daxime gund. Hema min ha gotinê melle mîna cuniya² ji ciyê xwe rabû mêkut va da qafê min.

Nizam³ dîsa ewê dîsa çi dixast bigota, lê xirexir ket gewriyê. Hema vî çaxî melle ji derva vegeriya. Hilbet, min bîr kir bigota, heta

1 şelbik/şerbik: tasa avê ya biqulp.

2 cunî/cinî: dîn.

3 nizam: nizanîm.

wî çaxî hêwiya min ji hişyar bû, hate oda jêrîn. Erê, mele vegeriyanê, gote me:

-Gidî, bextê we me halê wê çawan e?

Ewî dît, wekî Dilşa texbîr bûye¹, bi lava got:

-Ez qurbana wê me, vê xûn-mûnê bişon, temîz kin, meytê Dilşayê, vê xûn-mûnê bivin têkine qelaxa kerma. Qelaxê ser da tep kin û bêjin, çûye kerma bîne, qelax ser da tep bûye.

Îdî min ev yeka tehmul nekir. Te qey digot melle bi van giliya va çend gulle jendine² bedena min û ez rabûm, revîm, hatme vira. Mîna çawa ew zulma veşarta? Îro da ez piyê xwe navêjime wê cehnemê, ez ê herime mala bavê xwe. Hema roja roj ewî ro nedaye serê min.

Pey van giliyê Torin ra hesirê çêvê Wezîr miçiqîn, te tirê qewet hate ber milê wî, îşq hate çêva rabû şipê û got:

-Torin, rave em herine gund!

Lê Pogos nehîşt:

-Wezîr lawo, îdî çî bûye, bûye; vê şevê merî ser riya nakeve. Bihê-le sibê, em ê tev herin.

Qerez, Pogos nehîşt. Ew rabûn ku razên û berbangê herine gund. Feqet xewa Wezîr nehat, kêlek kêlek weldigerî û nihêrî wekî gişke razanê, hêdîka rabû, tiving û qema dardakirî hilda, derkete derva. Çû tewlê. Hespê kirîvê wî yî boz î xalxalî hebû, agir ji bin piya difirî. Wezîr ew zîn ir, teng şidandin, siyar bû, gundo ku yî ez hatim...

Ewir xitimîbûn, mîna pezê ku dikeve kurîyê³, a usa giran-giran ji ciyê xwe dileqiyar. Şeverêş bû, lê car cara ewra dikire şîrçêşîrç, tîştîştî dibûn, ji hev diqetiyar û zû ser hev da diciviyar.

Hespê ew mîna birûskê difirand. Carina ji bin simêd hespê kevir û kestek dipekiya, ser serê wî ra dikire vizîn. Hespê hêşîn boz şeva tarî ye qetran dibirî û derbaz dibû.

Payîz bû. Payîza derengî bû, sermê mîna kêrê meriv dibirî.

1 texbîr bûye: ruhê xwe daye û miriye.

2 gulle jendin/jenîn: gulle berdan

3 kurî: dema ku pez ji ber germê serê xwe dike bin hev û ji hev venaqete; kiwê.

Kevir û kesteke, te bigota îmkana nedida hesp rind bibeziya. Car-na Wezîr hesp qamçî dikir, te yê bigota hespê ew qamçî qebûl nedikir, ji hêrsa gem dikot, kef ser xwe ra davît û rê qevz dikir. Axir dibêjin: “Hespa çê qamçiya xwe naxe.”; lê Wezîr dixast zû bigihîje gund, têkeve wê mala qetilê û birîna xwe derman ke.

Ew gihîşte çemê hinda gund. Ew ji çem derbaz bû, hespê peya bû, her du çêvê wî ramûsa, lingê wî qeyd kir, kilît kire cêva xwe û ber bi wê mala zinêkar¹ çû. Ew ciyê ku ew Dilşa westê da lê henek dikirin ber çêvê wî ket û sekinî. Rojê zarotiyê ketine bîra wî. Xûşkê û bira çiqasî mîna karê xezala ser van kevir-kuçikê çem ra banzda-bûn, hev ra şa bibûn, pey hev ketibûn.

Gujeguj û xuxexuşa ava çem, te qey digot hukumî ser Wezîr nake. Wê demê ew hazir bû mîna ziyayê² ku hikiyatê da divêjin, wekî devê xwe dike çem avê dimiqîqîne, xût wê demê usa hatibû serê wî. Ji kerba, ji şewata wêliyê³ wî dixast devê xwe têke çem û ava wî bimiçiqîne.

Nişkê va rast fêza serê wî da ewira birq veda û kire guregur. Wî hêdîka serê xwe hilbirî ewrêd reş e mîna wî xitimî, nihêrî û kerba lêvêd xwe cûn. Cîkî mayîn bû girmegirma ewra, te qey digot, du berana berê xwe dane hev du û şîrqeşîrqa sturiyê wan e, li hev dixin. Ber çêvê wî bû tarî: te yê bigota beranê kok î bi qewet zorê dide beranê jarik...

Ew îdî nesekinî, bi kel-bîn bê xof nêzikî mala melle dibû. Wî hew zanibû du qewet hundurê wî da miqabilî hev şer dikin, yek divêje: “Here, here heyfa bavê xwe û xûşka xwe ye bêmiraz hilde! Ne caîz e merivê mîna Melle Hesên li hewata dinê bijî! Ew xudanê gelek tiştê qilêr e. Here, tu heyfa heqîqetê hildidî, heqî timê alt dike...” Lê qeweta mayîn miqabilî ya ewlîn derdiket.”

Qerez, bi qîrîniya dîkê destebêrbangê ew gihîşte mala Melle. Ewî zehf rind zanibû, niha Melle bi hevt zirza⁴ va derî para va dadaye.

1 zinêkar: zilimkar.

2 ziya: marê mezin; ejdeha.

3 wêlî: xizm û eqreba.

4 zirze: kilîlka ku deriyan ji pişt ve kilît dike.

Lema ew derkete ser xênî, kulekê ra nihêrî. Ne deng bû, ne hes. Hinekî wê da çû, rastî kuleka sivdera¹ oda Melle hat. Ze'f fesal² lê nihêrî, dît ku minkûna³ wir ra têkeve hundur tunebû, dive ku wextê wî xwe tê da bavîta, ew kelb bi wî bihesiya. Hinekî fikirî, hate aqilê wî qayîşa pişta xwe û dezmalê dora kolozê xwe veke, hev va girêde, bi curekî têkeve hundurê sivderê. Ewî usa jî kir. Wezîr bi fesal derê odê vekir. Rast çû hinda ciyê Melle. Wê demê jina Melle, Fatme bi dengê lingê wî hesiya, veciniqî û got: "Bismilah, bismilah." Melle ji xewê hişyar bû got: "Jinik, jinik çi bû? Eşeda xwe bîne..."

-Melle, -Wezîr got, - rave serê çirê vêxe, paşê eşeda xwe bîne.

Wextê wan dengê xort bihîstin mîna berazê beyanî yî birîndar bû qîrîniya Melle. Wezîr bi hemdî xwe got:

-Metirsîn, ez im, Wezîr im. Ravîn serê çirê vêxin, yanê na, hûn xwe zanin...

Ewî xwe da kuncêkî odê, tiving da ser eyêx⁴, emir kir wekî çirê vêxin. Melle mîna nexaşekî hevt sale nava cî da xwe çivilandibû⁵ ser hev. Fatmê bi taqa kiras-derpê⁶ çira vêxist. Melle orxan kişandibû ser xwe û ketibû halê jûjî. Ew derbazî fêza Melle bû û got:

-Rave ser xwe!

Melle bi curekî rabû, qulafîska rûnişt.

Wezîr tiving rasteve kire wî⁷ û got:

-Zû bêje, binêrim te çima bavê min û xûşka min e desthene kuşt?
Ew xortê ku hatibûne mala te kî bûn?

-Min... min... bavê te ne...

Zimanê Melle ketibû hev, reng lê firîbû. Her du, mele-jin mîna belgê ber bê ba dibûn. Wezîr nihêrî Melle ketiye halê merivê ruhîs-

1 sivder: salon.

2 ze'f fesal: bi baldariyeke mezin.

3 minkûn: mumkin.

4 eyax: dîkê tivingê.

5 çivilandibû: veleziyabû û xwe giviştibû hev.

6 taqa kiras-derpê: taxima kiras û derpiyan.

7 tiving rasteve kire wî: berê tivingê rast kire wî.

tîn serbirî¹ û wê nikaribe tu xeverekê² devê wî derxe û we'de jî der-
baz dive, anî ku gullekê rast bere qafê wî de. Ancax fikirî, wekî den-
gê gullê derê, îna bike gund gundîti wê dengê tivingê bihesin. Lema
çend gava pêş da hat, pêşberî Melle sekinî, qeme ber xwe kişand û
heta qeweta wî hebû rast dilê Melle da bada. Melle çend cara kire
ofînî û çû cehnemê. Paşê Wezîr vegeirî gote Fatmê:

-Fatme, eger tu heta berbangê dengê xwe bikî ez ê te...

...Ew derkete derva, derî ser wê da dada û ber bi mala xwe çû.

Ew nêzikî mal bû. Dengê girî dihat. Meriv gelek bûn. Hinekî
ber dêrî sekinî, nihêrî derî vebû û Meta Nazê ber bi mala xwe diçe.
Wezîr pêşiya wê girt, got:

-Meta Nazê, ez im, metirse min heyfa xwe hilda, min Melle kuşt,
bêje binhêrim mala me da kî hey?

-Pî, pî, -ewê got û her du desta va li çokê xwe xist,- lawo mala
we tijî merî ye, di riya Xudê ve, neyê mal, li vir bisekine ez ê herim
porkura diya te ra bêjim.

Hinekî şûn da Xezal, Apê Bedo û Meta Nazê derketin. Dê xwe
kuta û avîte pêşîra kur.

-Dayê, îdî negirî wextê girî nîn e, bêje ez çi bikim? Min Melle
kuşt!

Apê Bedo got:

-Kurê min hebûna Melle pir e; bira-qewm-lêzimê wî wê çi lazim
e bidine wekîlê dewletê û te heta hetayê têkine zîndanê. Ne tişteki
henek e, te mellê dîwanê kuştiye. Kurê min ya pak ew e, hema îşev
derbazî wî alî Erez ve.

Dê dîsa bi hêsir-girî got:

-Erê lawo, apê te yî Bedo rast divêje. Xudê mala wî vaîsî³ xirav
ke, çawa xirav kir. Wezîr lawo, te hew zanibû min bi dilê xwe Dilşa
da Bekir, na. Axir ez fikirîm, wekî çaxê keçikê nedim, wê birevînin,
tu yê jî herî xetaki bikî. Axir te...

1 halê merivê ruhîstîn serbirî: rewşa mirovê ku ezraîl ser wî biriye/qut
kiriye.

2 xever: xeber, gilî, nûçe.

3 vaîs/baîs: sedemkar.

Ewê giliyê xwe kuta nekir, kur hemêz kir, serê xwe kuta sîngê wî û mîna zara kire îskeîsk.

Vê demê dilê Wezîr kewrek bû¹ û hêstra xwe berê xwe kirine pi-repir, hatin; te tirê hêsrê dayka feqîr û ewled tev hev dibûn û li erdê qetilê golgolî dive.

Hinekî şûn da Apê Bedo got:

-Wezîr lawo, îdî dereng e.

Wezîr çiqasî got wekî: “dayê, were em tev herin, derbazî wî alî vin” ew razî nebû. Ewa hîvya definkirina bêmîraza xwe sekinî.

Ew diya xwe dîsa hatine dest-rûyê hev. Meta Nazê jî mîna ewledê xwe dest stuyê Wezîr ra bir û hate rûyê wî. Paşê ew, Apê Bedo rê ketin. Ewana terkiya hev siyar bûn û hespê hêşînboz qamçî kirin.

Belê, zemanê zulmê destê dê û ewled ji hev qetand, îmkan neda birê qe neve bi destî xwe xûşkê defin ke.

Wextê ewana ji gund derketin, îdî ewir mîna gurê têkeve nava pêz tartarî bike², xût usa cî cîn telte telte dihate kivşê. Mezelê gund î pêşiyê bû. Ew û Apê Bedo çûne nava mezel. Wezîr qebra bavê xwe dît û serkêlka bavê xwe hemêz kir, ramûsa û bi van fikira dûr ket:

“Gelo çima tebiyet hineka usa dixuliqîne, wekî çêvê wan ji tu tiştî têr nave?”

Demekê şûn da ew gihîştine ber çemê Erez. Wezîr û apê Bedo hatine dest-rûyê hev û wî got:

-Apê Bedo, jor Xudê, jêrê jî tu yî, li diya min bive xayî.

-Gotin çî ra ne, kurê min, here fikra meke, te ra oxir be.

1 kewrek bû: nazik û tenik bû.

2 tartarî bike: ji hev belawela bike.

EMRÊ TEZE Û RASTHATINA NEBÎRKIRÎ

Maşînê¹ dikire kufekuf, mîna hespê kihêl î tewlê da xayîkirî fişefiş bû, oxir diqelişand.

Bayê berbangê yî hênîk xwe pencera vekirî ra xûşî hundur dikir. Rêwî hê payê pir xewa şîrîn da bûn, lê Wezîr zû va rabûbû û pencerê ra dinihêrî. Li her dera beyraqê al-gevez dimilmilîn. Wextê wî vê rewşa rengmexmer² mêze dikir, dilê wî tijî eşq û şayî dibû. Gula eniya wî diçirûsî, te tirê hemû derd-kulê mîna tokî ser qêtx³ hatiye hildanê, lê na...

Ew gelekî lez diket, dixast zû bigihîje gund. Axir, sivê eyd bû, eyda temamiya merivê diltemîz. Ev eyda ne eyda rojiyê bû, ne eyda Xidirnevî⁴, ne jî eyda Îsmayîl pêxember e qurbanê bû, lê eyda roja azayê. Eyda ku bi hezara êtîmê mîna Wezîr e zêrandî gihande bext û miraza. Sivê hevtê noyabrê⁵ bû. Sivê roja ezîz derê gişka dikuta. Eva gele sal bûn, wekî Wezîr jî ev roja ezîz bi şayî derbaz dikir û rojêd bihurî dihanî, ew himberî hev dikir.

Ewana yê ro dageriyanê bigihîştana stansiya axiriyê. Wê şûn da hetanî gund riya du seheta bû. Xulase çî dibû, bira bibûya. Wezîr gerek e sivê xwe kolxozê ra bigîhanda. Ber îdara kolxozê bi destî xwe kolxozvana ra canegex, dudu şer jê kira.

Ev çend sal bû, ew wekî sedrê kolxozê dixevitî; lê roja şayê da timê jî fêrmê bona kolxozvana heywan şer jê dikir û goşt mîna qurbanê cim'etê pareve dikir. Vê roja ezîz tişteke dikete bîra wî. Wextê

1 maşîn: makîne, erebe.

2 rengmexmer: rengqedife.

3 tokî ser qêtx: toyekî li ser mêst.

4 Xidirnevî: Xidirnebî.

5 noyabr: meha mijdarê.

ew î hê zar bû, li welatê Romê roja Îsmayîl qurbanê bavê wî kavirek şer jê dikir û digot: “Wezîr lawo, tiliya xwe xûnê da ke û eniya xw xe, bira Xudê te ji derd-bela xelaz ke.” Lê Xudê ne ku ew ji derd-bela xelaz kir, ser barê ser da dilê wî kire hêlûna derd-kula. Hesreta dê, bavê û xûşkê kire kuleke serteşî¹ û go: “Heta tu xaş î xwe ra bigerî-ne, bişewite, bikizire, ji kezevê binale..”

A vê berbangê, te qey digot, derdê berê dîsa mîna derziyê kulê paş pîlê qul dikir û ketibû fikira: “Ax, xuzula bavê min, xûşka min e bêmiraz sax bûyana, dayîke cem min bûya û ez vî cureyî bidîtama, wê çiqasî çiqasî şa bûna. Ê, ez zanim bav û xûşk bûne xudanê erdê sar, lê çi hate serê daykê? Gelo ewa sax e? Gelo têr e, birçî ye? Yanê ji destê der û qehra zêmin mîna dayka Memê bûye gura serê çiya. Ax, ax, dayê can...”

Îdî rêwî gişk rabûbûn. Şerbetê Xezal bir, ser û çe'vê wê bişo.

...Ev çend sal bû, Wezîr zewicîbû. Ji ewleda her qîzeke wî hebû. Ewî navê diya xwe wê kiribû. Xezale gelekî rindik bû, te tirê pîrik bû. Wezîr gelekî şa dibû, wekî ew ewqasî li diya wî çûye.

Maşîne li stansiyekê sekinî. Wezîr peya bû, hine fêkî stend û ve-geriya. Vê demê Xezal digiriya, wî ji jinê pirsî:

-Şerbet, qîzik çima digirî?

-Divê te çima nehîşt ez bavê xwe ra biçûyama.

-Tişt nave, -Wezîr gote qîzê, - careke mayîn ez peyabûnê ez ê te xwe ra bibim. Hilde, hela çi sêvîne rind in, bixwe qîza min.

Pey vê xebirdanê ra ew ser milê xwe yî rastê fitilî û nihêrî, wekî jineke porsipî û xortekî çaxê wî ra sekinîne, li wî mêze dikin: evana rêwiyê teze bûn, vê stansiyê li vagona wan siyar bibûn.

Wezîr rast çe'vê jinikê nihêrîn û hema wê demê te qey digot bîn li wî çikiya, bû risas, zar lê hate girtinê, reng da, reng stend. Sipîçolkî bû. Agir-alavê bedena wî hilda. Çe'v tijî hêsir bûn, çok lê derizîn û nişkê va kire qîrînî:

-Dayê, dayê ne ez Wezîr im.

Ewê jî mîna zara kire îskînî û xwe avîte kur:

-Wezîr lawo, ev xewn e!

Bû kûrîniya dê û ewled dest stuyê hev ra birin.

1 kula serteşî: kula bêderman

Wezîr şabûna sûretê wê ye qerçimî, mîna zara çawa bistîn bimê-je, a usa radimûsa. Carina jî destê xwe li bistanê wê digerland, kerba wî nedişkêst, destê dê dikire devê xwe û radimûsa. Lê daykê îdî nehîşt, serê wî kuta sîngê xwe û şabûna pirepira hêsrâ bû ji çêvê her da dipekiyan, jor da dihatin, pêşîra daykê şil dikir.

Hinekî şûn da daykê got:

-Wezîr, ez qurban, ne ev xort jî Bekir e.

Wezîr navê Bekir bihîstinê, beden lê derizî, xast vekîşe... Lê dê got:

-Eger Bekir nebûya, niha zû va hestuyê diya te erdê da, yanê jî kela Romê da riziya bû.

Vê gotina dê ra Wezîr xwe avîte pêşîra wî û hev hemêz kirin, ew hatine dest-rûyê hev, Bekir got:

-Şukur vê rojê ra bira, dîsa me hev dît.

Ew rûniştin. Wezîr destekî xwe stuyê diya xwe, destek jî stuyê Bekir ra bir û xeber da:

-Dayê can, wekî per-baskê min hebûya, min ê hûn bilindî erşê ezmîn kirana û temamiya duniyayê ra bigota: "Ez î bextewar im, ez î xweşbext im..." Dayê can, ca qise ke tu çawa hatî vî erdî?

-Merivê vagonê gişk beravî dora wan bibûn û dixwestin bi vê êşê ve bihesin.

-Wezîr lawo, -ewê dest xebardana xwe kir, -şeva tu hatî, sivetirê hewar-gazî kete gund. Orta çend seheta cav gihîşte qezayê. Wî çaxî Bekir ne mal bû, mala apê bû. Sivetirê qar-qudretê Xudê ra Bekir û ap hatine gund. De, dê meselê qise dike. Bekir divê: "Apo, dayê em gotî mîna merivê dilsax bifikirin. Wezîr bavkujê min e, lê bavo him bavkuj, him jî qetilkarê xûşka wî ye. Û dibên ew reviyê. Kes nizane ku da çûye. Niha jî hûn dixazin Xezala belengaz e ber dîwara mayî bidine destê cendirmê Romê. Ez tu wexta nahêlim, çimkî dilê wê îdî hatiye daxkirinê. Dilê wê ra tevayî dilê min jî hatiye peritandinê. Ne min Dilşa hez dikir... Bîna Dilşayê ji wê tê, ez ê hebûna bavê xwe gişkî bidime wekîlê dewletê û nahêlim tu tiştî bînine serê Meta Xezal. Axir gunê wê çi ye? Apo eger vê yekê da tu alî min nekî ez ê kêrekê zikê xwe ra kim, yanê zikê te ra kim." Xêleke xurt şer orta apê, dê û kur da çû. Apê Bekir nihêrî, wekî bi zorê wê nikarive zêra ji destê Bekir derxe û lema razî bû wekî min nedine destê cenderma.

Qerez, wekîlêd dewleta qetilê hatin, ez dame xebordanê, ciyê te pirsîn. Qerez çi kirin, çi nekirin, te tirê parsa xwe stendin, hîştin çûn. Bekir gelekî komekî da min û me Dilşa rex tirba¹ bavê te defin kir.

Vê derê wê giliyê xwe nîvcî hîşt û pirsî:

-Wezîr lawo, ev bûk kî ye, ev qîzik kî ye?

-Dayê can, dayê min şabûna xwe şaş kiriye. Ev bûka, bûka te ye, ev qîzik jî neviya te ye; min navê te li wê kiriye.

Dê rabû neviya xwe da milê xwe, ramûsa, paşê ew Şerbetê va hatine dest-rûyê hev û dîsa şabûna bû pirepira hêsira.

-Dayê, ez qurban, -Wezîr got, -îdî megirî, çiqasî tu giriwayî, çiqasî hatî zêrandinê bes e. Qiseke bê paşê çi bû?

-De, paşê, -ewê got, -Bekir mîna kurê min li min bû xweyî. Feqî-ra Fatmê hema wê salê satircemî² bû û çû rehmeta Xudê. Kubar jî çû gihîşte mala bavê xwe. Bekir hat gihîşte mîn, apê gelekî lê zor kir wekî hebûna wî jê bistîne. De, qerez hinek stend. Paşê jî me nihêrî cim'et derbazî vî alî dive, em jî bi bîst-sî malî ra çar sala pey te ra derbazî vî alî bûn. Roja ku em derbazbûnê, te digêrîn. Îna bike me temamiya xuliya Ermenistanê buhust buhust pîva, lê çi feyde?

-Axir ez ne Ermenistanê me, ez niha Adrbeycanê me û sedrê kolxozê me. Eva mehek e ez, bûk û neviya te çûbûne mala hêsa-bûyînê³, ber devê Be'ra Reş, niha jî vedigerine mal.

-Wezîr can, -Bekir got, -de tu qise ke, tu çawa hatî gihîştî vê derê.

-Ez ku derbazî vî alî bûm, hinekî çetînayî kişand; paşê çûme gundê kurda û mala Apê Heso da mam. Ez him xebitîm, him jî min xwend. Dersdarê gund cînarê me bû, şev-ro min ra mijûl bû, paşê ez çûm texnîkûmê da hatime qebûlkirinê. Min texnîkûm xilaz kir, hatime kolxozê. Du sala brîgadîr xevitîm, paşê cim'etê ez bijartim çawa sedrê kolxozê⁴. Lê min dîsa dest ji xandinê nekişand. Dûreke⁵ înstîtûta malhebûna gundîtiyê da hatime qebûlkirinê. Par na pêrar min ew înstîtût jî tam kir.

1 tirb: gor, merzel.

2 satircem: cureyekî nexweşiyên e.

3 mala hêsa-bûyînê: îstirahetgeh

4 sedrê kolxozê: gerîndeyê saziya gelemperî ya gundan.

5 dûreke: perwerdehiya ji dûr ve.

FÎNCANA BIRÎNDAR

Ew çendek bû hinek gund bi gund digeriyan; derewger¹ didane belakirinê, wekî Ermenîstan ê êrişî Laçînê bike, yên ku nerevin ruhê xwe xilas nekin, wê têkevîne roja Xacaliyan. Hinekan ji vê bawer dikir, hinekan bawer nedikir, digotin: “Çima, Xwedê neke, çi bi mirovên me hatine? Em ê pişta xwe bikutine pişta leşkerê me, destên xwe bidine destên wan û em ê nehêlin piyê neyar li axa me kebe. Çima em nijad, ewlad, nevî, nevîçirkên Sûltan Begê nîn in? Laşê me yê vira bimîne, lê em ê gavekê ji Laçîna rengîn dûr nekebin².” Ax, wax dunyayê! “Tu ya xwe bêje, binê felek çi dibêje?” Lê çend rojan şûn da gotin, wekî mala filan kesê ji Laçînê bar kiriye, ji filan gundî, mala filan kesê koç kiriye. Ya Xaliq! Carina navên mirovên usa dihate kişandinê, qe xewna şeva da nedikete xewna te, ji ber ku ewana mirovên nehiyê ye navdar, dewlemend bûn. Tu nebê navên wan malên dunyayê bûye, mêraniya wan bayê li bêderê bûye. Yên usa pêşiyê mal-navmala xwe, paşê ruhê xwe hildan, cî-warên kalbavên xwe, tirbên ezîzên xwe, çiyayên xwe ye evra³ hîştin revîn.

Çend rojan şun da rev-bez li gundê me jî ket. Hinek dewlemen-dên gund şev ku da bar kiribûn kesekî nizanibû.

Lê rojekê... Lenet li wê rojê bê!

Saziya leşker li fêza gundê me bû. Berbangê dengê şar-wariyê⁴

1 derewger: derewçîn, virek.

2 dûr nekebin: dûr nekevin.

3 evra: pîroz.

4 şar-warî: hewar-gazî, hêwirze, heys û beys.

gund hingavt¹... Bê wê jî gundî nava heshesê² da bûn, bi veciniqîn ji xewê hişyar bûn, kirine hewar-gazî. Hinek derketine hewşên malan, hinek derketine ser banê xaniyan, hinek revîne ser rê-dirban, bizanibin ka binê çi bûye? Çi qewimiye? Nihêrîn, çi nihêrîn leşkerê çek li destan jor da usa direvin, yek rê nade yekî din, him jî usa dikine qîreqir, her Xwedê xayî ke! Evê rev-bezê hejeke usa kire nava gundiyan, gund gundîti hev ket. Baweriya her kesî hate pêpestkirin; xof, tirs, sew tijî dilên wan bû.

Leşker serbarê ser da gulle, fîşek diavîtin, dikirine qareqar, wekî “birevin ermenî tîn!” Hewêrze, zarezar, kete nava gund. Mirov ser hev ra, ber hev ra derbaz dibûn, diçûn-dihatin; qe kesî nizanibû kî çi dike. Paşê êrişî malên xwe kirin, ketine hundur giran, sivik çi kete destên wan hildan, dane ser rê.

Deng-hes mala me jî hildabû serê xwe. Jina min êpêce kel-mel hilda, lê diya min hinek fera-fotik beravî sindoqê kirin û gazî min kir:

-Lawo, were devê vê sindoqê qayîm bigire, girêde.

Ez hatim, min bendek hilda, wekî devê sindoqê girêdim, çavên min fîncanekê ketin. Destên min sist bûn, rex min da ketin. Çirikekê³ mitala ez birime ser kaniya “Ava Tirş”. Fêza gundê me kaniya ava tirş hebû. Bi gotina gotiya ew av dermanê hevtê hevt derdî bû. Kalikê min fîncaneke gellek hên⁴ biribû danîbû ser wê kaniyê. Hatî-çûya bi wê fîncanê ava kaniyê vedixwar û rehma Xwedê li wî dihanîn.

Wê fîncanê ra “Fîncana Mirazan” digotin. Ew jî mîs bû. Bi nexşên usa va hatibû neqîşkirinê, erd-esman jî ser bedewiya wê ketibû heyr-hejmekariyê.

Alîkî fîncanê tav û hîv hatibû neqîşkirinê; aliyê din, ser zinarekî wêneyê balindekî gewre. Per-baskekî balinde hindik dima bigihîje tavê, per-baskê din hindik dima bigihîje hîvê. Dema te fîncan hildida bilind dikire jorê, bi baldarî mêzekirinê, te hew dizanibû vê çirîkê balinde yê fitilekê-firekê bide xwe, qulozî erşê ezmîn be.

1 hingaft: hilda.

2 heshes: weswese û pîrsyarî.

3 çirîkek: kêliyek, deqîqek.

4 hên: 1. qedîm 2. hêja.

Jêra fîncanê da qulpeke biçûk hebû. Kalikê kalikê min ser zincîra ji 99 xeleşan, didu jî zêde kiribû, serîkî wê avîtibû wê qulpê, serê din singê hêsin va dabû perçînkirin¹ û zinarê ser kaniyê da kutabû.

Kal-pîr-porspiyên gund zû zû dihatine ser kaniyê, rûdiniştin, hêmin² dibûn, bi wê fîncanê av vedixwarin, zincîr jî mîna tizbiyê dikişandin.

Wedê ew vedigeriyane gund te tirê ruh ber ruhê wan da hatiye, qudûmê wan şidiyaye, nûra çavên wan zêde bûye.

Ciwana bi wê fîncanê av vexwarinê qure qure digotin: “Min bi “Fîncana Mirazan” av vexwariye, lema awa bihêz im. Keçikan jî digotin: “Min bi “Fîncana Mirazan” av vexwariye, lema awa bedew im”.

Wê gavê, ew yek kete bîra min, wekî carina payîzan ji gundên nêzîk ermenî dihatine aliyên me, gund bi gund, mal bi mal digeriyan, kartolê anî, ceh, genim ra diguhastin, bi wê yekê va tivdîra zivistanê dikirin. Carekê rêya kartolfiroşekî ermenî kete mala me. Ewî av xwest. Pîrika min tasekê da av da wî. Paşê ewê ew tas cuda danî derekê û teme da me destên xwe nedinê. Hinekî şûn da ew tas bire ser kaniyê, bi heriyê va çend caran paqîş şûşt, hevt cara av tijî kirê, tê warda³, hê ew anî kire nava fera-fotikan.

Lê naha? Lê naha ez wê fîncana kalikê xwe, ya pîrika xwe çawa dujmin ra bihêlim, bên pê avê vexwin, wêya bihêrimînin?

Ji sêrî hetanî piyan êgir-alafê ez hingavtim, min qe nizanibû destê min da çi hebû, wê da avît û derketime derva.

Ne min got, gundê me mîna bûkekê xemilandibû. Alîkî gundê me diçû digihîşte çêm, aliyê din diçû derdikete daristanê, pêşekî gundê me zinar dihingavtin, lê aliyê jêrê fire fire penc vedabû û rê dida hatî-çûyan. Ê, çi li gundê me tunebû? Çemê ku kêleka gundî ra dikire lemelem dikişiya, kaniyên avên sar e mîna qeşayê, darên gûzan, sêvan, hurmiyan... Derdorê wê pincarên mîna: “tolikê, tûzikê, silmaskê, sûsê, pûngê, sirmikê, ce’tiriyê, tirşo, lo keko, çima ewana deh bûn, sed bûn bidime jimarê, bîn didane bîna hev, di-

1 perçînkirin: lehîmkirin û qayîmkirin.

2 hêmin dibûn: rehet û bihuzûr dibûn.

3 tê warda: tê werda, çelqand.

bûne dermanê derdên nexweşên salan. Heylo, birano, binihêrin çi qewimiye, lê ez li çi digirim? Dibên: “Kevirên aşan ro da diçin, tu pey çeçeçe ketî”.

Ez derketime derva û min bere xwe da hevrazê fêza gund, revîm. Diya min pey min kire qîrinî:

-Heso, lawo, ku da diçî?

Nava 30-33ê salên xwe da cara yekemîn bû, min bersîva diya xwe neda. Qe ez nezivirîm, pişt xwe jî nenihêrî, min bi xwe jî nizanibû, ew çi perošî bû, ew çi hêza hundurê min bû, ez didame lezandinê, wekî pêş da herim... birevim... Ji gund heta “Ava Tîrş” êpêce erd bû. Ez gihîştîme kaniyê. Min sê fîncan ava kaniyê ye sar vexwarin, xar bûm kevirên dora wê ye me’t¹ sê cara maç kir. Vê demê te tirê rona-hiya çavên min zêde bûn, taqet hate çokên min. Min ji dil bîna xwe kişand û vegeirîm li zer-zinarên ku çivîk bi çivîktiya xwe nikaribû bifire ser bilindaya wana, mêze kir. Lê gava min av vexwarinê neyar ez dame ber fişekan. Ya Rebî! Ev çi dujminekî xwînmêti² ye, dibêm, mirov av vexwarinê, merê reş jî mêriv venade! Wekî usan e Xaliq ê nehêle gulla neyar li min kebe!

Min fîncan ji zincîrê vekir. Ew hilda, da ser dilê xwe, bi her du desta va girt û pêberjêr³ ber bi gund revîm. Dengê fişekan nediha-te birînê. Neyaran ez dabûme ber nişanê. Carina fişekan erdê ber piyên min, carina erdê aliyê mîn î rastê, çepê tiştîştî dikir. Tîrsa min firiyabû, niqutîbû dilê min, gulle yê min nekebin, ji ber ku ez ser rêya heq bûm.

Ez ji rê derketim, min xwe da nava kevir û zinaran. Min usa ser wan ra banzdida, te tirê baskên min henin, ez difirim. Nişkê va ji destên gullên neyaran, ji zinarê aliyê min î rastê keviyek hîlbû û li fîncana hemêza min ket. Fîncan erdê ket. Min “fîncana birîndar” ji erdê hildanê usa hizir kir ku dilê min jî hatiye birîndarkirinê. Alîkî wê xar bibû. Min dîsa li tu tiştî nenihêrî, bê hemdî xwe direvîm vê heshesê da dengê guhê min da hate bihîstinê: “Lawo, te ne ku

1 me’t/meht: rast û şimşad.

2 xwînmêti: xwînmij.

3 pêberjêr: ber bi jêr.

tenê fîncana bîranîna kalikê xwe ji destê neyar da xilazkirinê, him jî te nehîşt ruhê kalikê te bê êşandinê.”

Dîsa rev. Litimîm¹. Ji ber piyên min betekî² zinaran, yekî mezin, ji ciyê xwe leqiya, çawa dibên, kete pêşiya min, ser rêya xwe kevir-kuçikan, lat-zinaran, sel-pelan diket, ew beşbeşî, hûrhûrî fikir, bi xwe ra pêberjêr dibir. Ewana hev ketinê dengê qirçe-qirç, guregur, teqeteq, leqe-leqa wan tev hev bû, pîrîsk didan, gund gundîtî derketibûne derva, te hew zanibûn erd diheje, çiya hatiye hedimandin.³

Îdî dengê gullên neyaran nedihat. Ez bi wan kevir-betan ra te-vayî hol dibûm. Ewana hey li min diketin, min êş-jan seh nedikir. Ew kevir-zinar li berê çem seqirîn⁴, xwe ra cî girtin, lê ez ji wan cî-waran deroder bûm. Naha ez xwezilbûna xwe wan keviran, wan zinaran tînim. Xwezila ez jî bibûyama keviyekî û li berê çemê gundê me bimama.

Lo birano, naha ew birînê di rêya ciyê da ku li rû-dêmen min, çav-guhê min, serî-pişta min ketibûn hêdî hêdî qenc bûne, lê birîna li fîncanê, ya li dilê min ketî qe qenc nabe. Qencbûna wan ma wê demê, gava em vegerine bal wan kevir-zinarên ku li berê çemê gund xwe ra cî-war bûne.

1 litimîm: kuliyam.

2 bet: teht, pel, zinar.

3 hedimandin: hilweşandin.

4 seqirîn: sekinîn.

DERMANÊ DILÊ DÊ

Rewayî diya xwe Gulistana Îsa dikim.¹

Min înstîtût kuta kiribû, diçûme mal. Min pir bîra diya xwe û kurê xwe kiribû. Ew êpêce wede bû ku min ew her du jî nedîtibûn.

Ber xwe nedida ez kengê bigihîjme gund. Pozê min bona wana dişewitî. Tariyê erd hilçinîbû, ez gihîştîme gund. Gundê me yî bi-pergar bû. Ew li rastê hatibû cî-warbûne. Avayî gişk pê da, pê da birêz hatibûne çêkirine, yek ji yekê rindtir, bedewtir bû. Êvara dûr va şewq vedida û li rûyê mêriv dikeniya. Ro darên fekiya ye reng bi reng, movên tiriya, axê rakirî, kulîlkên hewşa vê malê, wê malê dilê mêriv tijî hizkirin dikir. Meri ber bi xwe dikişand.

Min ber bi malê lezand, lê nizanim çawa gihîştîme ber hewşa me sekinîm. Ne deng bû, ne hes. Her çêleka me ber kapê xwe mexel hatibû û dikaya. Ez pêş da hatim ber wê sekinîm, destê xwe da sturiyê wê. Ewê serê xwe vir da, wê da ba kir, lê lê bû rabe². Min sturiye wê berda, ber bi odê çûm. Hêdîka ketime hundur. Tarî bû. Vê gavê dengê dayîkê li min tesele bû:

-Ew kî ye?

Ez hema ber şêmîkê bûme risas, ji ber ku dengê dayîkê bihesret bû, bi ricaf bû. Min bi dijarî bişkoka ronayê givaşt û ronkayê ode hilda. Dayike nava cî-nivîna da bû, rengî spîçolkî bû.

Kurîkê min jî rex pal dabû. Dayîkê ez dîtîne şa bû. Sorayî hate rûyê qerçimek. Min bi kelogirî xwe avîte pêsîra dayîkê, me hev ramûsa. Bîstekê me hev hemêz kir, dayîkê ker ker hêsir barand.

1 rewayî diya xwe Gulistana Îsa dikim: diyarî diya xwe Gulistana Îsa dikim.

2 lê lê bû rabe: dikir ku rabe.

Min destê wê da ser dilê xwe û dor bi dor maç kir. Nizanim dilê wê ra çi derbaz dibû, lê min tirê şepûk ser min da hatiye, dunê reş girêdaye, ji ber ku dayik nexwêş bû. Dayika dunyayê.

Dayika merivayê. Dayika ku ber germê, ber sermê gulîke xwe reş kiribû, gulîke xwe spî kiribû. Dayika ku ji hevdehsaliyê heta roja îroyîn kar kiribû, çerçiribû¹, wekî destê lawê xwe bigihîne nanê jiyane.

Hinekî şûn da kurikê min hişyar bû... Min ew da milê xwe, maç kir, lê ew milê min nesekinî, xwe avîte pêsîra pîrikê.

Hema vê gavê dayikê xwest rabe, min pirsî:

-Dayê, çi dikî? Ku da radibî?

-Lawo, ne tu rê hatî, niha birçî yî, rabim te ra tiştêkî hazir kim.

Diya min kincê xwe xwe kir ku rabe, serî lê gêj bû, ket. Ez ketime bin milê wê, dîsa kire nava cî-nivînê wê û pirsî:

-Dayê, ez bi gorî, tu çima ha heliyayî, çima ketî vê rojê? Kê dera te diêşe?

-Ê, lawo, çi bêjim.

Min tê derxist, wekî dayik naxweze derdê xwe bêje. Ez zû rabûm gempîv² anî ku bizanibim germaya wê çiqas e. Ewê nehîşt. Min got:

-Dayê can, ne ez doxtir im, gotî tu derdê xwe min ra bêjî? Gotî ez meniya nexweşiya te bizanibim?

Pey vê, min destê xwe danî ser eniya wê ye qerçimekî ye delal û got:

-Dayê, porê te jî hemû spî bûye.

-Ê, lawo, pey çi ketî, dibên: “Beraşê aşa ro da diçin, ew pey çeqeçe qetiyê...”

Ewê ew gilî got, dîsa çavên wê tijî hêsir bûn, lêvên xwe ye bizmargirtî cûn, axînikê kûr rahişt. Ez usa posîde bibûm, min qe nizanibû çi bikim, wekî dayika xwe ji wî halî derxim? Gilî-gotinê wê dilê min disotin. Gelo çima ewa usa bêxem bûye? Te tirê, dûrî wê be, ewa mirina xwe dixwaze. Min xwe xwe ra got: “Kula kor min da bê”.

1 çerçiribû: xebitîbû û ked dabû.

2 gempîv: amûra ku germahiyê dipêve; termometre.

-Lawo, Îsmayîl, tu çawa doxtir dixwazî derdê min bizanivî, erê?

-Ere, dayê erê.

-Serê min diêşe, dilê min bi zexim dikute.

-De, usa bêje, ay ez rabim, bal min him dermanê dilêşe, him, yê serêşe hey e.

-Lawo, dibînim tu naxwezî dest ji min bikişînî. Bihêle kula dilê xwe te ra bêjim. Xwezîla dewsa wan dermanê bal te heye, dermanê şêkirdariyê¹, yê merivayê hebûya.

Ewê ha got, ez ketime mitala, lê dayikê nehîşt ez bigihîjime nêta gilî-gotinê wê, ewê bi hemdekî fire got:

-Kurê min, ne tu zanî bavê te baxvan bû, mirovan ew bi tiliya nîşan didan. Salekê, rind tê bîra min, darê sêvan, hirmiyar, zerdelan rind anîbûn, lê nişkê va, rojekê ba-bagereke usa rabû, Xwedê nîşan nede. Tişteke ser daran nehîşt. Wê salê bavê te yî rehmetî ji kerba nexweş ket. Min gotê:

-Lo, Xwedê mal ava kiro, çi seba hine reza fêkiya haqasî mitala dikî? Mêr jî qe ruhê xwe dide malê dunê? Hebûna dunê qirêja desta ye.

Ewî ez kêleka xwe dame rûniştandinê û got:

-Mormorkê, ez jî rind zanim, wekî hebûna dunê qirêja destan e, îro heye, sibê tune. Lê pirs ne ew e. Ez ber xebata xwe dikevîm. Lema gotine, karkiro mala xwe da nemiro.

Min îdî nêta dayika xwe fem kir, lê tişteke negot. Xwe xwe ra got, dilê wê tijî ye, bila gişkî bêje û barê nexweşiya xwe sivik ke.

Ewê dûmayîn da nêta xwe:

-Delalê min, ez jî bûme baxvanê sê kuran, du keçikan. Min bi pir dijiwariya va gişk firê xistin. Şa me, lê... Tu yî du salî bûyî, gava bavê te çû rehmetê. Min terî-caniya xwe da ser we, bira û xûşka. Roja derva xebitîm, şeva mal da. Hûn hedî hedî min ra gihîştin, ez şa bûm. Birê te yî mezin înstîtût xilaz kirinê ra zewicî, lê salekê nekişand cihê bû. Min go, bila cihê be, bila der-cîran bêjin: ay ew mala hanê mala Hesenê kurê Ezîz e. Ez dîsa xebitîm: şeva xwe kire ro, roja xwe kire şev. Vê carê keçika min Xanimzer gihîşt, bû ya mêra.

1 şêkirdarî: sipasdarî.

Xazgîniya derî li min birîn. Min ewa birûmet, bihêz verêkir, go bila nebêjin ew e bê bav e. Belê, vê carê jî kurê min î dinê Welo tijî emir bû, xwend, bû traktorîst¹. Min ew zewicand, bûk anî ber destê xwe, lê gelekî nekişand ew jî cihê bû. Şa bûm. Min go, bila cihê be, bila ew jî bibe malekê.

A, aha dayika min riya emirê xwe, kirina me ewleda qal kir. Min dixwest çend giliya bêjim, ewê hêdika destê xwe danî ser devê min û got:

-Bisekine, tu xwe ker ke. Ez ê niha bême dora te.

Paşê ewê av xwest. Ez rabûm, min av dayê. Av vexwar, got:

-Le kirin hene ku dilê mêriv dikevin... Îja birê te cihê bûn pir pak, jî gund jî derketin, bar kirin, herekê² devê xwe alîkî girtin çûn. Timê mitala dikim, gelo îro ewledên min roj çawa derbaz kirin, gelo nexweş nîn in, gelo zarê wan çawan in gelo, tî ne-birçî ne?.. Pirtî nan, xwerekêkî germ bê wan min tirê li min jera mera ye... Lebê, lawo, ewana cihê bûn, çûn, mal da mane ez û tu. Te dixwend, min jî dîsa kar kir, çawa dibên, "heta mirinê çav î kirinê". Te dersxana deha kuta kir, min tu şandî înstîtûtê... Hê kûrsa yekê tu ser Eysê bengî bûyî. Min go, çima dilê lawê xwe bişkênim, tu zewicandî. Lê çavê felekê birije, Eysê ser vî tîfalî çû rehmetê. Min hê xwe danî dewsa bûkekê, kurikê te xayî kir. Îro şa me, ewî îdî sêsalî ye. Kurê min, zanebûna ez zanim, te gotiye, wekî pey kutakirina înstîtûtê ra, ez ê bajêr bimînim. Bimîne, Xwedê ya dilê te bike. Her hîviya min ji te ew e ku tu neviyê min nestînî, qe na bila ew bibe bîna ber min, hetanî qudûm çokê min da heye, ez ê wî xweyî kim. Eva yek. Ya duda ew e, bila warê Ezîz vala nemîne. Kî zane, diqewime ew mezin be û jiyana xwe vî gundî ra girêde. Ez bawer im, agirê me bi temamî natemire. Ez bawer im, vê malê da dengê mêra bi carekê va nayê birînê. Rojên cejna wê ese³ baqê kulîlkan bîne ser tirbên me, vê malê da wê xêr-xêrat li me bê dayînê.

Li vira diya min xwe ker kir, çavê xwe paqîş kir û got:

1 traktorîst: ajovanê traktorên.

2 herekê: her yekê.

3 ese: teqez, qethiyen.

-Ê, çi bêjim, xwezila wê malê ku timê jê dû tê. Lawo, tu dipirsî, çima porê min spî bûyê? Lê ew barê giran, ev kula dilê min porê min spî neke, wê yê kê sipî ke? Lê bila Xwedê per-baskê xwe bide ser hemû ewleda, we jî tevayî. Eva xwestina min, niha kerem ke.

Ewê bi hesretî ez mêze kirim û hîviya bersîva bû. Min destê xwe stuyê wê ra bir û got:

-Dayê can, dayê, ez ê mizgîniya xêrê bidime te. Kê te ra gotiye, wekî ez ê bajêr bimînîm, nizamîm. Bi hîvîkirina min ez şandime hema li gundê me bixebitim. Ez tu gava qayîl nabim ku ronaya mala kal-pîrê min bitemire. Ez ê tu gava vî derî girtî nehêlim. Dayê can, mala bê ronayî, derê girtî, destexana bê mêvan, aşê bê av e. Dayê can, hema hinekî ser xwe da hatî em ê herine mala Hesên, Weloyê bira, mala zavan.

Te hew zanibû ev gilî bûne dermanê dilê dayikê, wê demê kulîl-ka eniya wê vebû û xûdaneke zîpikzîpikî ser ra avît. Rabû, mîna bûkekê xwe hejand û got:

-Ez heyrana wî aqilî, wî zar-zimanî me! Ez ê vê gavê êgir dadim, bila dû derê, him ji kurê xwe ra xwarineke bitehm çêkim.

EWLED

Ez sovxoze da mēxanîk dixevitîm. Lê ewa mehek hebû, qulixa¹ min mezin kiribûn anîbûme nehiyê.

Êvar êvar pey xebatê ra derdiketime baxê seyrangê², digeriyam, qasekê ser îstolên³ wir danî rûdiniştim.

Vira car cara rastî xortekî û bûkekê dihatim. Wana destê keçika xwe ye du-sê salî digirtin, ewa êpêceyî digerandin, paşê rûdiniştin, şîrîn şîrîn xeber didan.

Xwîna min usa ser wê keçika çûk e rindik da dikeliya, te qey digot ewa keça min e, ya ku min hevde-heyjdeh sala berî vî çaxî mal da hîşt çûme şer! Ez ji şer hatinê, min ne ew dît, ne jî dê.

... Tava havînê ye ku sibê da diqijiland teze dageriyabû, siya dara penc avîtibû. Te tirê her tişt çî ku çavê te dibîne ji germê hêsa dibe.

Ez dîsa bêx da rûniştibûm. Min nihêrî ewana dîsa destê keçika xwe girtine, têne bêx. Dilê min îsal çend sal in bona ewled bi hesretî şewitî, mîna dilê kara xezalê ye ku nêçîrvan berdidê dike çîrpînî, xût usa kire çîrpînî û xwîna tamarên min çawa pêlêd behrê ye hêrsbûyî leqemê didine qeykê⁴, a usa dane dilê min, ew bê heq-hesab dikuta.

Ewana hindik mabûn bigihîştana min, riya xwe guhastin çûn

1 qulix: peywîr, wezîfe.

2 baxê seyrangê: baxê seyrangêhê.

3 îstol: cihê rûniştê yê li park û hwd.

4 qeyk/qayik: navgîna avê ya biçûk; kelek.

ketine ciyê şikilkêş¹. Çend deqîqe derbaz bûn, ewana hatin ser îsto-
la ez rûniştî rûniştin, çimkî îstolê dinê vala nîbûn.

Destê xort da şikilekî mezinkirî hebû. Keçika çûk nehsî² dikir, wê
jî dixwast wî şikilî binihêre. Keçikê stend, ku şikil binihêre ji dest
kete erdê. Ez zû xar bûm, wekî şikil hildim bidime wê, dest li min
sar bûn.

Vê demê dîsa rojêd çetin e nebînayî, tîbûn, birçîbûn, reqereqa
top-tivinga, kûzîniya dengê firindê dujmin e mîna gurêd çila, kuş-
tin, birîndarbûn, xwîna gevez e weke çemekî kişiyayî, mîna roja
îronî³ hate ber çavê min. Fikirêd roja çetin, çawa hespa xam gemê
bicû, a usa aqilê min cû, birim derxistime binatara Moskvayê, çûm
derketime Lêningiradê. Ew roja ku eskerê me rev dujmin xist, bir
derxiste Bêrlînê, te qey digot, hêjika⁴ qewimiye û ez ber bi qasira
dujminê qetilê, xwînê gav dikim û hazir im textê wî yî xwîna însa-
net va sorkirî bişewitînim...

Usa jî ew roja bexteware, ku eskerêd me digotin-dikenîyan, roja
şêr xilazbûnê, ew seheta radiyoyê elam kir⁵, wekî şer xilaz bû û dîsa
edlayê⁶ rûbarê wetenê me bihingivîne kete bîra min...

Bi gilîkî, qewimandinêd şer e nebînayî mîna moriyêd tizbiyê ye,
ku orta tiliya xwe ra derbaz dikî, hema usa ber çavê xwe ra der-
baz kir û wî çaxî min serê xwe bilind kir, ez î ser îstolê tikîtenê me.
Ewana kîngê çûbûn nizamim. Ez agirdadayî bûm⁷... Gelo min çima
nepirsî ewana kî bûn?

Ew şikila çawa ketiye destê wan? Ev çi cure? Van pirsra mîna tî-
rekê dilê min qul dikirin.

We şevê xew nekete çavê min. Min qewimandinê emirê xwe
mîna xelegêd zincîra pey hev rêz kir...

1 şikilkêş: wênekêş.

2 nehsî: şûmî, delalî û nazî.

3 roja îronî: roja îroyîn.

4 hêjika: gavek/bîstek berî niha.

5 elam kir: da zanîn, îlan kir.

6 edlayî: edalet.

7 agirdadayî bûm: agir pêxistî û şewitî.

Emir jî mîna zincira ye, te hew nihêrî nişkê va xeleqek qetiya û bû du ciya. Ay¹ şer usa anî serê min. Berî şer min înstîtûtê da dixwand.

Kûrsa sisiya da dixwand Rihana xwe, xezala emrê xwe jî anî wî bajarî, kî derê min dixand.

Vira me keça xwe ye sê salî şande baxçê zara. Rihan jî kete ser xebatê.

Me qet nizanibû, rojêd me ye şa ye bextewar çawa dihatin derbaz dibûn. Keça me ye findeq e rindik Nûbar bona me dê-bavê cahil rastî jî nûbar² bû û ewê mîna gulêd baharê ro bi ro gul vedida û em ji bîna wê têt nedibûn.

Ez bi serfinazî derbazê kûrsa pêncê bûm. Lê paşê? Paşê jî duj-minî qelp î xayîn hucumî ser wetenê me kir, dest bi şer bû û ez çûme şerê Weten.

Ji şevê êpêce derbaz bûye, îdî naxwazim qewimandinêd salêd çetin bînime bîra xwe, lê tenê dixwazim bêjim cima'etê rind gotiye: «Kî ji şêr dût e, ew gul-nûr e».

Ez hatime wî bajarî, kî dere min dixwand. Kî dere min xatirê xwe ji Rihana xwe xwest, kî dere cara axiriye min keça xwe da milê xwe û ramûsa. Of...

Ez nêzîkî wî xan-manî bûm, kîjanê da ku em berî şer diman. Xan-manê sê qatî bibû xerabekî. Tişteke ser tişteki tunebû. Colaneke³ zara ye çûk e pelixî ye hûrbûyî wir bû. Min tirê ewa colana Nûbara min e. Ê min ewa ber xwe va kir, vê demê hêsira rê neda hev.

Dîwarêd xênî yî nîvcî hilşiyayî ji dû hundur û derva va mîna teniya sêlê reş dikirin. Ser kelpçekî ji xênî ketî rûniştim û ketime mitalêd kûr: «Gelo ji kê pirs kim kanê Rihana min? Kanê ewleda min e keçik?». Te qey digot vê demê dîwarêd xênî ye hilşiyayî digotin: «Tişt nave, şer gele malê aha şewitand, xerav kir. Gele ewled ji bava, diya, gele bav-dê ji ewleda qetand, gele dila da hesret hîşt. Ev

1 ay: aha.

2 nûbar: fêkiya nû.

3 colan: hêlekan.

yeka ji rûyê dujmin da bû. Lê axiriyê da rûye dujmin çawa dîwarêd min e ku reş bûne, reş bû.

Rabe ser xwe, rabe serê xwe bilind bigire, çimkî wetenê te derbêd mirinê dujmin xist û alt kir. Û bîr neke: «Peza nêr bona kêrê ye?»

Paşê ketime salix-sulixa¹ min ra gotin, wekî jina te pey te ra keçika xwe hilda got, ku ez ê herime gund, bal qewm-pismamên xwe. Berî wî çaxî min ji gund name stendibûn û dinivîsîn, wekî Rihan nehatiye gund.

.. Pey şêr ra vegeyame gund û paşê înstîtût kuta kir.

Qewm-pismama çiqasî kirin-nekirin ez nezewicîm. . . Te tirê dilê min rê nedida, wekî xêncî navê Rihanê navekî dinê ji wir da cî-war be û gumana min hebû, lê nizam ser çi?

Aha, îro şikilê destê wê keçika çûk birîna min e çendî çend sala teze kir û qest-qerezî da ber kêra.

Gelo usa dive, çira mala te ye îsal çendî çend sala temirî nişkê va vêkeve? Gelo usa dive, xweşbextî derê te yî morkirî bikute? Belê, orta van sala da çiqasî nêzîkî mala xwe dibûm, hew zanîbû derê min morkirî ye, yanî ketinê hundur li min usa dihate xanê mal da çira vênakeve, ez î merîkî kor î bêzên im,² dor hev têm, diçim.

Timê sifet-qerefetê³ Rihanê û Nûbara min e rindik dihate ber çavê min. Îna bikî orta van sala da deqîqekê ewana bîr nekirine. Wextê xebatê, pey xebatê ra, li dewata, li şîna te qey digot ewana va ne bal min in û derd-kulê min ra jî divine şîrîk.

Çend roj ketine ortê. Ez çiqasî dihatime bax rastî wan nedihatim.

Dîsa bêx da tik-tenê ser stolekê⁴ rûniştibûm. Çavê min mîna ewrêd baharê ye xitimiye tijî baran, ji kerba tijî hêsir bibûn. Bîna min teng bibû. Min hew zanibû ev hewa havînê ye hênîk têra min nake. Çimkî xemêd îsal e çend salî dilê min da bibûne kuleke bêder-

1 salix-sulix: pirs û lêgerîn.

2 bêzên: bîrkor, bîroke, bêhiş.

3 sifet-qerefet: rû-şekl, ser-sîçe, bejn-bal.

4 stol/îstol: rûnişteke.

man. Îja nişkê va dermanê wê peyda kî û wê deqîqê undakî, hela binê li mêriv wê çiqasî kudert¹ bê.

Mîna merivê sûckar rabûm, serê xwe kire ber xwe ku herim hem men xort tenê rûniştibû rojname dixwand. Ez çûm bal wî rûniştim. Îdî nêçîr ketibû dest min û nedixwast careke din ji destê min derê, lema hêdîka min niçande milê wî:

-Xortê qenc, ew rojnama îro ye?

-Belê apo, kerem ke binihêre.

Min rojname ji wî stend û pêşxeberê nihêrî.

Pêşxeber derheqa şerê Weten da bû. Careke din min rojname li wî vegerand û got:

-Ê, kurê min hilde, naxwazim dîsa derheqa wê zulma derbaz-bûyî da bixûnim.

Vê gotina min ra ewî axînîke kûr rahişt.

-Xorto,-min hêdîka gote wî,- min şêr da cizaret² kişand, hela tu çima diki axînî?

-Navê we bi xêr, apo?

-Navê min Sedo ye.

-Apê Sedo, eger we çî eziyet dîtive jî sax û silamet vegeyriyane nava kulfetê xwe. Lê du birê min çûne şer kaxazê wan î reş hat.

Wextê min kelima kulfet bihîstinê xwîna tamarêd min mîna ava fewarê³ leqem dane⁴ mêjiyê min. Xûydaneke sar hate eniya min. Êvara havînê ya germ bona min bû şeveke zivistanê ye hişketarî ye qetran. Ricafekê ez hildam, te tirê tevziyê kulê dilê min qul dikirin.

Lê min zefta xwe anî û got:

-Ez çawa dewsa bavê te, hîvî dikim tu serhatiya xwe min ra qal ke. Paşê ez ê...

-Apo navê min Serdar e. De, serhatiya min haqasî jî ne hewaskar e, hela min rind emir ne dîtiye, teze piyê xwe avitiye şêmîka emir.

1 kudert/kul-derd: jan-jehr.

2 cizaret: eziyet.

3 fewar: ava ku ber bi jor ve diavêje; fisqiye

4 leqem dane: hilpekiyane, hilfiriyanê.

Min li gund dersxana deha kuta kir, gerekê bêjim, bi qîmetê zef baş va kuta kir û hatim ûnîvêrsîtê da qebûl bûm. Kûrsa çara ser keçî-kekê bûme bengî. Ewa fabrîka kinçdirûnê da dixebitî. Razanxana me nêzîkî wê fabrîkê bû. Apo, ez gelekî naxwazim dirêj kim, em ser hev bengî bûn. Rokê em ji kînoyê derketinê, ewê min ra got:

-Serdar, ezîzê min, tu zanî wekî ez e êtîm im?

-Na, çawa, -min gote wê, - yanî tu ye êtîmî?

-Belê, ez e êtîm im, lê kesek nizane... Naha guh bide min: Berî şêr bavê min bajarekî nêzîkî Moskvayê da dixwand. Diya min jî xwe ra dive wir. Paşê şer dest pê dive. Bavê min diçe şêr. Diya min pey çûyîna bavê min ra, min hildide wekî vegere gund. Rê va eskerek dibe hevalê wê û jê dipirse:

-Xûşka delal, tu vê zivistanê, vê zarokê va ku da diçî?

-Diçîme Adirbêcanê.

-Ez jî diçîme Adirbêcanê, esker dibêje.

Rê va avtoya wan weldigere qeziya tê serê wan, ew bûka cîbicî¹ can dide. Hemen esker çiqasî digere, nagere tu kaxizekî, yanî senetekî navîne, ku bizanive ev kulfet ji kîjan nehiya Adirbêcanê ye. Tenê nava mêdaliyona² stuyê wê da şikilekî xortekî bîst pênc-bîst şeş salî divîne. Şikil hildide û piştê van giliya dixûne: "Rihana emrê min ra, ewleda min e Nûbar ra". Vê derê îdî min xwe zevt nekir çavê min tijî hêsir bûn.

Serdar ev halê min dîtinê pirsî:

-Apê Sedo, axir min çi got, wekî hûn ketine vî halî?

-Çimkî birîna dilê min e bi sala ye kêmgirtî te der kir. Ne axir wexta birîna kêmgirtî nişkê va der dikî, daxa mêriv dertê û kî jî heve³ wê bigirî. Kurê min, birîna min nivçî der neke, bêje, binê hizkiriya te paşê çi te ra got.

-Paşê ewê got: Hemen eskerî ez anîme mala xwe, rast e, wî çaxî ez e çûk bûm, lê min gele tişt fem dikir. Vê rojê da diya esker min

1 cîbicî: derhal, hema di cih de.

2 mêdaliyon: madalyon.

3 heve: hebe.

ra dêtî, bavê wî bavtî kir. Ezîzê min, hemen esker Fexredîn çend sala pey şêr ra bi teherekî jî, çimkî birîna piyê wî gelekî eziyet dide wî. Rokê wextê îdî halê wî lap giran bû, gazî min kir şikilekî çûk da min û derheqa şikil da çawa min te ra qise kir, ewî min ra got. Paşê Fexredîn diya xwe ra got:

-Dayê, ez zanim ez ê bimirim. Ez bêmiraz diçim, lê tema Nûbarê didime te. Usa bizanive ez î zewicîme, eva keça min e.

Paşe dîsa min ra got:

-Nûbar, ev şikil, şikilê bavê te ye, mîna îşqa çavê xwe xayî ke, kî zane...

Îdî nizam Fexredîn ê çî bigota, giliye xwe xilaz nekir û hetaheta-ye çavê xwe ye belek girtin...

Xulase, kutabûna kûrsa çara ez zewicîm, ez Nûbarê va gihîştine mirazê xwe. Min kûrsa pênca xilazkirinê me ra keçikek bû. Wextekê nehiya me xebitîm, niha jî eva çend meh e şandime vira. Nûbar niha naxebite, çimkî hindik maye bive dayika du zara. Niha ez hîvî dikim tu serhatiya xwe bêje.

-Kurê min, serhatiya min te anî ser zara. Dixwazim hinekî lê zêde kim. Tê bîra te hevtekî berî vî çaxî tu, Nûbar û keçika xwe va hatibûne vira û destê we da şikilek hebû?

-Bele, ewa yê bavê Nûbare bû, Fexredîn dabû wê. Me ew şikil anîbû, dabû mezinkirinê.

-Zavê min î delal, hela rind binihere, ne ew şikil şikilê min e.

Ew zûr ma¹, êpêceyî li min nihêrî û paşê ez mîna bavê xwe hemêz kirim, got:

-Tu gelekî û gelekî hatî guhastinê, tenê çavê te û ew buriyêd te ye reş şedetiya² wê yekê didin, wekî tu ew merivî.

Serdar rabû ser piya û milê min girt got:

-Rave, rave em herine mal, Nûbar mal e. Ax, ewê çiqasî şa be!

Rojnama "Rya Teze", sal 1966

1 zûr ma: bi awireke tûj lê nihêrî.

2 şedetî: guwahî, şahidî.

DARA GÛZÊ

Ez û Esmera xwe rojê du cara rastî hev dihatin: Sibê şebeqê û êvarê. Berbangê ewê cêr hildida û dihat derê mala me ra kubar kubar derbaz dibû, diçû kaniyê.

Wê gavê min jî sabûna reqê û pêjgîr hildida, qesta serçev-şûştinê diçûme ser kaniyê. Hetanî ewê cêrê xwe tijî dikir, em bi beşara evintiyê ye agir wê dema kurt bi hev şa dibûn... Ax, min çiqasi dixwest, wekî cêrê delala min dereng tijî be. Ax, min dixwest nişkê va kanî bimiçiqe, keç-bûkê dinê bên binihêrin av tune, vegerin û ser kaniyê ez bimama, ewa bima. Kî zane diqewime wê gavê me têr têr hev mêze kira, min bigota:

-Esmera min.

Wê bigota:

-Çi ye, berdilê min? ...

Ez û Esmera xwe rojê du cara rastî hev dihatin: Sibê şebeqê û êvarê. Êvarê wedê îdî gund xalî dibû, Esmera min ji doxtirxanê, ez jî, ji dibistanê derdiketim û hetanî dara gûzê hev ra, hev ra gav dida. Li gundê me darê gûzê gellek bûn. Lê dareke here mezin li ser riya mala me, ser riya mala wan penc vedabû. Em digihiştine wê darê, qesta bînstendinê bîstekê disekinîn û hev dinihêrin. Ew dema here nebîrkirî, here hizkirî bû bona me her duya. Paşê ewa dadigeriya aliyê mala bavê xwe, lê ez hê cîyê xwe da disekinîm. Ewa çend gava çûnê şûn da, vedigerî li min dinihêrî û paşê ez dadigeriyame aliyê mala me.

Ez û Esmera xwe rojê du cara rastî hev dihatin: Sibê şebeqe û êvarê. Tenê rojên lehdê êvarê ez rastî Esmera xwe nedihatim.

Wekî destûr destê min da hebûya, min ê roja lehdê ji nava roja derxista. Ji ber ku wê rojê ders tunebûn. Le wê rojê jî derê malê di-sekinîm, heta ewa dihate bin dara gûzê. Min dûr va bejin-bala wê bi heyr-hejmekar mêze dikir.

Ez û Esmera xwe rojê du cara rastî hev dihatin: Sibê şebeqê û êvarê.

Êvarekê, rojeke lehdê bakî usa yî gur dihat, ku cîran nediçû mala cîran. Ewrêd reş e giran daketibûne ser gund, qirçîniya erd û esman bû... Car-carana ewra dikire girmegirm, birûskê şewq vedida.

Tirs kete dilê min, wekî niha Esmera min ê ji doxtirxanê derê û wê rê va şil be. Ewa gihîştinê bin dara gûze qurf kete dilê min û sehweke giran ez hingavtim¹. Nişkê va birûskê lê da, qirçîniya darê û qûrîniya evîniya evîndara min kete guhê min. Ez mînanî merîkî sewdeser ber bi dara gûzê revîm! Dar ser Esmera min da şikestibû!

Dara gûze ye pirsale, ku bibû şehdê mirazê gellek keç û xorta, bû bayîsê mirazê min û Esmera min.

Ax, ez û Esmera xwe rojê du cara rastî hev dihatin: Sibê şebeqê û êvarê!

Rojnama "Rya Teze"

12.11.1969

¹ qurf kete dilê min û sehweke giran ez hingavtim: êşekê dilê min şidand û tirseke giran ez rapêçam, hildam.

KEVIRÊN REŞ

*Bi dilekî beristan¹ rewayî comerd,
dost-hogirê xwe Osmanê Paşa dikim.*

Alîkî gundê me çiya bû, alîk deşt. Hebûn û dewlemendiya gundê me him çiya, him deşt bû. Yekê ya mayîn dida xemilandinê, yek bona ya dinê dibû rewşa salê.

Ji aliyê çiyê çem dikire guşeguş, gîha dihate lîsandinê², heywan lê disekinî. Fêkî-rez lê dihate beravkirinê, boy zivistanê bi deha pin-carên nav bi nav dihate hişkkirinê, dihate zexîrekirinê. Bi kevirên wê dîwarê odan, tewlan dihate çêkirinê.

Ji daristanê wê kêran, stûn dibûne rindaya odan. Salê çend meha em li zozanê wê ye rengîn dibûne mêvan.

Li deştê ekinê³ bostanan, zeviyan, rezên baxan xêr-bereket dida gundê me.

Zivistan dara dilê min da dema salê ye here bedew û bi kardar⁴ bû. Aliyê çiyê berfê ser berfê da lê fikir. Ser keviran, li gelî-gebezokan⁵, dor zinara mala xwe datanî. Dara qeşav⁶ digirt, serê xwe berjêr fikir. Dûr va te tirê bûkekê xemila xêliya sipî avîtiye ser serê xwe.

Mala da sêpî dihate danînê. Firêt, hevinê reng bi rengî, masûr, kerkît, pîjik, dargur û bevş⁷ dihate amedekirinê. Ji berbangê hetanî

1 beristan: erdê fireh, bê serî û binî.

2 lîsandin: lûs/lîs dan ser hev, part kirin, lod kirin.

3 ekin: çandinî.

4 kardar: kêrhatî.

5 gebezok: ji gelî biçûktir e û ne kûr e; gelî ji gebezokê kûrtir e

6 qeşav: qeşa, bûz.

7 firêt, hevinê reng bi rengî, masûr, kerkît, pîjik, dargur û bevş: hemû alav û amûrên tevnkariyê ne.

êvara dereng keç-bûk tî-tevnê xalî-xalîça va, zîlî-emeniya va, xurc-têran va dizeliqîn. Dengê şeşeşeqa kerkît, bevş û mêkut tevî dengê morî-mircanê zenda zer, tevî dengê xişil-mişilê kurtik, êleka dibû û te hew zanibû miqamek cî bi cî tê lêdanê.

Nexş pey nexşekî dihate hûnanê, tevn pey tevna dihate birinê û lema ji îro li vê malê, sibe li malekê dinê dibû şayî.

Pey şîvê ra, gellek cara em beravî mala rispiyê gund Eliyê Xezalê dibûn. Lê çima ew bi navê bavê nedihate gotinê, nedihate gazîkirinê? Ji ber ku biçûktiyê da bavê wî miribû û mezintayî li malê Xezala diya wî kiribû. Dibêjin, wekî ewa jineke ser xwe, bi nav-namûs û bi mêranî bûye.

Eliyê Xezalê mêrekî bejin nîvçe bû. Dêmi fire, enî ber bû. Mêrekî gilîxweş, zarşîrîn, rêkişandî¹, aqilbend, nandar bû. Belê, belê rispiye gund bû. Çawa gel dibêje, ciye wî bilindciya bû. Ew merîkî giran bû, wê da hatinê bê hemdî xwe te xwe şaş dikir.

Her gilîkî wî dibû rûnê helandî û dilê her yekî da ciyê xwe digirt. Hemû merî dibûne hewcê şewra wî. Çawa dibên, ew him dikaribû hilkişe çiyayê herî bilind, him dakebe rastan. Lema jî digotin, Eliyê Xezalê biçûka ra biçûk e, mezinan ra mezin. Bona wê yekê jî her êvarê zivistanê qewm-pismam, der-cîran beravî mala wî dibûn.

Wana weke zanebûna xwe ji emirê dunyayê, ji kar-xebatê gilî dikirin. Lê tu êvarek, tu şevek bê kilam, bê beyt-serhatî, bê qewlik, bê cîrok, bê dilok derbaz nedibû.

Sê odê wî hebûn. Li oda mezin navsere û ahil, di oda navîn da keç, xort û bûk, li oda biçûk zar berav dibûn.

Te hew nihêrî xortê bengî, ku zû va hîviya vê êvarê bû, dûr va çavê hizkiriya xwe mêze kir û got:

*Hat nava mala qeysî,
Min ne kirî, ne pirsî,
Xezal canê, dû min ra,
Qewil nede tu kesî.*

1 rêkişandî: rênas, rêzan.

Ji vê şûn da mînanî kaniyê bilqînî dikete dilê xort û keçikan û rêzên kilaman pey hev rêz dibûn. Îcar jî keçikê kula dilê xwe ra digot:

*Lawike min rabû cenî zîn kir,
Dewlek lê dayê har-dîn kir,
Lawike min gulên me hîştin,
Çû şîlanê xelqê bîn kir.*

Îdî te zefta tu kesî nedihanî. Xort, keç, bûk diketine destê hev û govend şên dikirin.

Bîstekê şûn da mêr, jinên emirdîtî derbazî oda navîn dibûn, yeko yeko diketine govendê, her yekê destê xortekî, destê keçikekê digirt û govendê govek dida¹.

Ax, sed car ax, ewana usa direqîsîn te tirê erd diheje, usa distiran bilqînî dikete dilê meriya. Him awaza pêldayî², him reqasa heyr-hejmekar merî bê hemdî xwe dibire dunya kilaman, dunya reqasên hevtê hevt rengî. Paşê, êpêce sal derbazbûnê şûn da min fehm kir, wekî wan rispiyan, wan porsipiyan bi wê yekê va gotine me: “Keçik-xortno, hînî reqasan, miqaman, kilam-stranan bîn, zû, yanê dereng em ê ji govenda jiyanê derên, gotî hûn dewsa me bigirin û evê dewlemendiyê hînî ewledên xwe bikin. Ji ber ku ev sazbandiya gelê kurd bi sed sala ha hatiye xweyîkirinê, gotî ha jî bê parastinê.”

Ay, şeveke zivistanê ye aha ye bi şayî, ber çarmedora³ mala Eliyê Xezalê sa hindik mabû merîkî xerîb pirtîpirtî bikin. Xortên me elbê ra derketine devra⁴ û ew merivê xerîb ji devê sa xilaz kirin, anîne mal. Ew xortekî bejinbilind, simêlreş bû.

Wê deqîqê av dane wî. Cî nîşan danê. Ew rûnişt, bîna xwe stend.

Eliyê Xezalê pirsî:

-Lawo, navê te çî ye? Tu kî yî? Ji ku hatî, ku da diçî?

1 govek dida: mezin û dirêj dibû.

2 awaza pêldayî: dengê ku pêl bi pêl belavbûyî.

3 çarmedor: hawîrdor.

4 devra: derva

Ewî tûka xwe daqurtand, li mirovên beşderbûyî¹ nihêrî, paşê giran giran got:

-Nave min Balo ye. Apo, ez sêwî me. Ne bavê min heye, ne diya min.

Ez ji filan qebîlê me. Lê rispiyê wê qebîlê sal bi sal keda min dixwe û nahêle ez jî bibime xudan mal. Min navê Eliyê Xezalê bihîstîye, hatime vî gundî, ku herim xwe bavêjime ber bextê wî.

-Lawo, Eliyê Xezalê ez bi xwe me.

Eliyê Xezalê ha gotinê, ew ji ciyê xwe rabû û hat her du destê wî girt, xar bû ramûse, lê ewî nehîşt:

-Xorto, ez tiştê ha hiz nakim. Tiştê ha dûrî me ye. Mêr gotî mêr be.

Ev yeka me gişka xweş nehat. Eliyê Xezalê jî tê derxist, wekî nava me da pêlê vê yekê pêl da, lê ewî xwe wan erda danenî û dîsa kelimî:

-Tu hatiyî, wekî xwe bavêjî ber bextê min, gundê me, erê?

-Erê, apo.

-Em ê sibê pirsê safî kin. Îşev him zû ye, him dereng e.

Paşê teme da lawika, wekî Balo rê hatiye, birçî ye, bibin nîn-avê bidinê. Bila rehet be, Xwedê kerîm e.

Çend roj derbaz bûn.

Şevêkê, bawer ke, gund gundîti dîsa beravî mala Eliyê Xezalê bi-bûn. Gelleka ji wir, ji vir bihîstibûn, ku îşev wê bê diyarkirinê, gelo, Balo gundê me da bimîne, nemîne?

Îşev rispiyê bêjin, em wî temûl dikin,² yanê na?³

Dîsa govend şên bibû, li oda mezin dengbêja kilamên mêrxasiyê distiran, lê li oda dinê dengê ken-henekê keç, xort-bûkan bû.

Ji şevê êpêce wede derbaz bibû. Hatin gotin, ku werêne oda mezin, wê pirsê xortê hatî binihêrin.

Ewqas meriv beşder bibûn, wekî gellek ser piya bûn. Seqirtiyê⁴

1 beşderbûyî: beşdarbûyî, tevlêbûyî, li wir amadebûyî.

2 em wî temûl dikin: em tehemula wî dikin, wî di nava xwe de qebûl dikin.

3 yanê na: an na, yan na.

4 seqirtî: bédengî.

ode hilda. Eliyê Xezalê bi giran giran, bi kubarî ji ciyê xwe rabû û got:

-Xorto, Balo, rabe şîpê, a li dera hanê bisekine, bila gişk te bivînin.¹

Balo rabû hat ciyê kivşkirî sekinî.

-Gelî gelê min, -Eliyê Xezalê got, - em pey pirs-hewala ketin, me rê-dirb pîvan, hilxist-daxist û hatine ser wê nêtê, wekî evî xortî hildine ber bextê gundê me. Hûn çi dibên?

Tu kesî dengê xwe nekir. Lê xalê min î Sedo got:

-Em xort temûl nekin sibê kî bibihîze, wê bêjin, ji kerî nanê xwe tirsîyan û li sêwîkî nebûne xweyî.

-Belê usan e, -dengê Eliyê Xezalê bilind bilind hate bihîstinê,- lê pirs bi wê yekê va xitim nabe. Em gotî, bi her alî bibine piştovanê wî. Gotî ew bibe xudan mal-hal. Gundê me da mêrê herî kasib nîv seme-re pezê² wî heye. Ez bîstekî didime Balo, rispiyê mayîn³, kerem kin.

Rispiya yekî pênc, yekî deh pez danê, jimara pêz devedevî semerekî bû.

-Me heywan da te, -Eliyê Xezalê got,- bibe xudanê hebûnê û mala malmêvana.

Yekî odeke xwe da.

-Me ode da te, bibe xudanê avayî.

Yekî deste cî-nivîn da.

-Me cî-nivîn da te, stêrê te bilind be.

Yekî çek da.

-Me çek da te, bibe mêrxas.

Yekî hespek da.

-Me hesp da te, xwe ra nav-deng derxe.

Pey vê yekê ra Eliyê Xezalê dîsa berbirî Balo bû:⁴

1 bivînin: bibînin.

2 nîv semere pez: 50 pez.

3 rispiyê mayîn: ruspiyên din.

4 berbirî Balo bû: berê xwe da Balo û axivî.

-Em ê kerî¹ pezê gund jî bidine te biçêrîne, bi kardar be. Mêrê bê kar, mirin ser be! Gotî tu xwe bibî xudanê keda xwe. Lê pirseke here ferz ma. Ew jî pirsê zewaca te ye. Bi merivê gund ra rabe, rûnê, di îro da tu bûyî kurê vî gundî. Pirsê zewacê, ew e ku bêtî hizkirinê. Kîjan rojê te gote me, wekî ez keçika filan kesê dixwezim, ewa jî min hiz dike, em ê te bizewicînîn.

... Ew mehek bû, wekî Balo li gundê me bû, tevî xêr-şera gundiya dibû. Xorta ra diçû-dihat. Hineka pesinê wî didan, digotin ew xortekî êgin e.²

Ewî çav berdabû min. Li govenda timê dihat dikete destê min.

Carekê ewî tiliya min givaşt. Min xwe şaş kir, pê li piyê hevala xwe kir û ji ber vê yekê sergovendî şaş bû, govend teribî.³ Ji wê rojê min porkura porkur, dûrî serê bav-biran, ew heband. Huba wî firî dilê min. Rojekê jî hate mala me. Ez ser tevnê bûm, gote min:

-Lêlê, Gulîzerê, nexşê te ye hevanî⁴, mîna te bedew in. Ware morî-mircanê zenda zer veke, te ra bazinê zêrîn bistînim û ev benda kilamê ser da zêde kir:

Lê bi domamê lê, te zû bigota,

Kur xulamê lê, te zû bigota.

Yek bazin bû lê, têkira cot da,

Yek bazin bû lê, têkira cot da.

Me qewil-qiyar⁵ da hev. Roj hatin derbaz bûn. Îdî bahar bû. Êvarekê Eliyê Xezalê û çend rispiyê dinê hatine xazginî. Ez Balo ra hatim xwestin. Çendekê şûn da dewata me hate lêdanê. Ez anîme mala Balo. Eliyê Xezalê derê malê nava hemû meriyê dewatê da gote Balo:

-Me tu zewicandî, wekî bibî xudan kur-keçan. Mirovên gund hebûn da te, tu kiriya hevalê camêran. Lê emir da jiyan di destê te xwe

1 kerî: 300 pez.

2 êgin: jîr û jêhatî.

3 govend teribî: govend belav bû, her kesî destê hev berda.

4 hevanî: li hev anî.

5 qewil-qiyar: soz-qîrar.

da ye. Bizanibe, ji îro da nav, namûsa vê êla rengîn ya te ye, nav-
dengê te ya me ye. Xwedê pîroze ke!

Malê me li zozanan bûn. Rojên me pak derbaz dibûn. Lê car-
caran derheqa Balo gilî-gotinê netê¹ ber guhê min diketin. Welleh,
carekê, duda min tê derxist, ku dor wî telik-tolav² hene. Min wî ra
kire şer, ew şîret kir, lê...

Me keç-bûkan li zozanan bêrvantî dikir, pez didot. Keriye pêz
hatinê bêriyê, dibû şepeşepa şepalê me, şingêşinga elbê me, diçûn
yek vî alî, yek wî alî çok vedida, ser keviyekî rûdiniştin û dest bi
pezdotinê dikirin.

Pey bêriyê ra bêrvana nav hev da dikirine pîçepîç³. Nizam çi bû
ji min vedişartin. Rojekê aha, duda aha, lê danekî, bêrvana keriye
Balo gote min:

-Lê lê, xûşkê, keriye pezê Balo diçerîne şîr kêr dide. Ev çi hewal e?

Min sond xwer, wekî ez tişteki nizamim. Ev çi yek e, çi hewal e?

Tu nebê eva yeka zû va ahan⁴ e. Evê pirsê digihînine Eliyê Xe-
zalê. Pêşiyê ewî gotiye, wekî eva vir-vizê jinan e, şerm e tiştê aha ne
hildin, ne dayînîn. Lê nebûye... Dîsa bêrvan tên dibêjine Eliyê Xe-
zalê, ku welleh, ew çend miyê Balo diha gellek şîr dide, ne ku keriye
miyan. Ew jî dibe pak. Heyrana serî me, bin va teme dide du xorta,
wekî xwe li Balo bitelînin.⁵ Ew xortana xwe ditelînin.

Dinihêrin Balo miyê xwe cêhê dike, bere merga dide. Paşê hinek
manê wedê bêriyê ra, ew keriye miya dadixe newalê, tijî zaxê dike.

Miya yeko yeko nivcî nivcî didoşe, şîr tijî meşkan dike. Wê şûn
da meşkên tijî şîr datîne ber kevirên teresiya û ji oba dinê tên diravê
wî diqînê, şîr dibin.

Xort tên, çi dîtine Eliyê Xezalê ra dibêjin. Sibetirê ew dîsa dispê-
re çend xortên bi dexim-zexim û dibêje, wekî bila ew şîr bidoşe, tijî
meşka ke, paşê wî bi meşkên şîr va bînine obê.

1 netê: neyînî, nebaş.

2 telik-tolav: dek-dolab, fend-fût.

3 pîçepîç: pistepist, kurtepişt.

4 ahan: wisan.

5 bitelînin: bi dizîka bişopînin.

Sibê xort usa jî dikin. Wextekî, nîvro zarên obê bi hev ra hev ra diqîriyan:

-Diz girtine! Diz anîne!

Ez ji van giliyan veciniqîm, derketime derva. Bintara konê Eliyê Xezalê mêlrast¹ bû. Te tirê, biçûk-mezinê obê, gişke wir bûn, xênjî min. Ez jî hatime wira. Xûşkên min, keç, bûkên me dora min civiyan, ber dilê min da hatin.

Eva deqîqa jiyana min e here dijwar bû, min dixwest erd biqelişe ez têkevîmê.

Merivên obê dora wî çît girtibûn². Ew şipê, serê xwe kiribû ber xwe sekinîbû. Dihate kîvşê lawikan ew rind mizdane. Nişkê va Eliyê Xezalê wê da hat. Mirovan rê danê, ew hat çend gava dûrî Balo sekinî. Dê mê wî reş qemilîbû, ji hêrsa lêvên xwe dicû.

Hêdî-hêdî serê xwe bilind kir û berbirî beşderan bû:

-Gelî qewm-pismamno, dost-cîranno, îro nanê me hatiye pêpeskirinê. Me vî nemerivî ra her tişt kir, lê ew ji riya xwe xalîfî.³

Bele, qewimandin çawa bibû gote hazira û ser da zêde kir:

-Pirs tenê ne pirs malê dunê ye? Lê pirs here şewat ew e, wekî ewî her ro pezê xwe cêhê kiriyê, bere mêrgê daye. Yên ha tu car nikare bibe şivanê êlê-eşîrê. Me (ewî destê xwe dirêjî rispiyên din kir) îdî salê emirên xwe piş van çîyan hiştiye. Dora me hat, em ê herin. Lê Xwedê neke, sed car neke, yekî aha bibe mezinê êlê! Ew ê her malekê navekê lê ke, yekê wê ji ya mayîn cuda ke, nefsa xwe wê ser hemû tiştî ra bigire. Merivên aha dikarin gelan bi hev bidine qirê. Nelet li te!

Dûra gote xortan, wekî meşkên bi şîr tijî bînine bal wî. Ewî li meşkan nihêrî, nişkê va mîna zinarekî leqem pê keve, da gava ber bi Balo hat. Lê xwe zêft kir, paş da vekişiya, got:

-Devê meşkan vekin! Şîr hirşînîne ser serê wî.

Ya rebî! Xortan meşkên şîr bilind kirin û ser serê wî da hirşandin. Min xwe xwe ra got: "Xwezila ew vê gavê şeqşeqî bikirana".

1 mêlrast: qada rast, gera rast.

2 dora wî çît girtibûn: li dorê girtibû û nedihîşt bireve.

3 xalîfî: ji rê derket, ji rastiye dûr ket.

Pey vê yekê ra Eliyê Xezalê dîsa xwe mukur hat¹:

-Şivekê bidine min.

Xortekî bir, şiva destê xwe da wî. Gişka tirê ewê bi şivê Balo bikute, lê na.

-Xorto, -Eliyê Xezalê berbirî ciwanê şiv anî bû,- evê şivê bibe bide destê wî berazî.

Xort bir, şiv da Balo.

-Lo, ez te erdê kim, -Eliyê Xezalê bi hêrs got,- heyfa erdê! Tu bi şiveke aha şeveke zivistanê li me qesidiyî.² Me şeva te kire rojeke aha ye vekirî, ez dikarim te bi lawikan bidime kuştinê. Lê naxwazim xwîna berazê mîna te van dera biherimîne. Şivê hilde, ji obê derê. Bila roja te bibe şeveke tarî. Bila şeva te nebe ronkayî.

Bavê min kêleka Eliyê Xezalê sekinîbû. Ewî gote bavê min:

-Ev gunê gunê min e. Min bihewzîne.³

Bavê min got:

-Gunê me gişka ye.

-Gulîzer, keça min e bîaqil, pêş da were.

Ez ji nav keçikan, bûkan derketim û hatime bal Eliyê Xezalê.

Ew hate eniya min û got:

-De, te her tişt dît, çi bêjim nizanî? Lê dixwezim tu mîna Werdeka diya Kulik bi cul'et bî. Bêje me binê tû yê wî ra herî, here. Em nikarin neynûkê ji goşt bikin.

-Apê Elî, bavo, rûyê min ber piyê we. Xwezila, mirina min hebûya, lê min ev yeka nedîta. Ez haj van kirinê wî ye bi fen-fêl tuneme, bila gişk bizanibin.

Min aha got û xar bûm ji erdê sê kevirên reş e biçûk hilda û dîsa gep kir:⁴

-Evî kevirî davêjim, ew bextreş ji îro da "birê" min e. Evî kevirî davêjim ji îro da namusa min ne namûsa wî ye. Paşê min berê xwe da apê Elî:

1 xwe mukur hat: her tişt rast got, her tişt hilda stûyê xwe, tişteke veneşart

2 qesidiyî: hatî ba me, bûyî mêvan.

3 bihewzîne: biparêze.

4 min gep kir: axivîm.

-Bêje wî kurê nemerda, bila ji vir here, kevirê sisiya ez ê paşê bavêjim.

Ew telaqreşa îdî hîviya gotina Eliyê Xezalê nesekinî, hêdî hêdî, mîna birîndara pêberjêr da gava. Min kevirê sisiya pey avît û bilind bilind got:

-Here, mirina te hebe, lê jiyîna te tunebe! Here, bila Xwedê roja te reş ke mîna vî kevirî!

BAR-CEMEK

Gundê wan gûndekî mezin bû. Hema jê ra usa jî digotin: “Gundê Mezin!”

Ew ne quntara çiyê bû, ne rastê bû. Gundê ha ra dibên gundê pêşa çyan. Fêza gundê wan da çendî çend gund hebûn. Xwedayê Mezin, yek jî xwezayê qe firqî nekiribû nava van hemû gunda. Bedewî-rewş, hebûna xwezayê te tirê misqal misqal nava van gunda da hatibû parevekirinê. Lê çî ku bi destî însan, mirovan dihate çêkirinê, avakirinê, kişandinê firqîke mezin hebû.

Dûr va ew gundên fêza “Gundê Mezin” qe nedihatine kivşê, te hew dizanibû ewana kevir, zinar, zerên çiyê va hatine zeliqandinê, hinek mal-avayî mîna kariya dihatine xanêkirinê. Lê her çar rozgarê¹ salê da tariyê ku erd hildida, ev “Gundê Mezin” ji ber çavan minê dibû, cî ciya ronahiya weke çavên guran birq dida. A, li gundên mayîn ji êvar da hey lempên tokê vêdixistin, şewq-şemala xwe davîtime ser zer-zinaran, mal-avayî yeko yeko dihatine kivşê, çiya dibû siya wana.

Gundiyên “Gundê Mezin” payîz da karê zivistanê dikirin: pesarî, kerme, êzîng amede dikirin, derê malê qelax lê didan. Li rojên zivistanê ye ewilîn derva kuçik-tendûr, mal da bixêrî vêdixistin û hetanî baharê dû da zer dibûn. Lê gundiyên gundên fêza wan salê danz-deh meh, soben tokê vêdixistin, çawa çîroka da dihate gotinê, ser xaliça xurek dipehtin.

Ax, wax çî bêjim, çî nebêjim? Ev “Gundê Mezin” gundê kurdan bû... Vî gundê mezin da her tenê dukaneke biçûk hebû, rizqê xwe-

¹ rozgar: demsal, mewsim.

rinê jî, kinc, perçe jî, fera-fotik jî û kel-melên mayîn tevhev hatibû-ne cî-warkirinê. Yek jî, ji dukanê wêdatir koxtika nifta Êlman bû. Bineliya¹ ev nav li ciyê neftfirotanê kiribûn.

Li wir du sindanê neftê ye mezin danîbûn, yek jî cîkî mîna koxtika hatibû çêkirinê, Êlman kel-mele neftfirotanê datanî wira. Ew salekê gelletir bû, ku Êlman vî gundî nift difirot. Ew ji gundekî jorê bû. Ro êpêcekî bilind bûnê ew bi maşîna xwe dihat, hema hinda koxtikê neftê ewa dida xweyîkirinê.² Ewî tiştek xwe ra kiribû edet. Maşîne peyabûnê fereqeke wî ya bi qulp hebû. Ewê 2-3 lîtir neft digirt. Ewî ew fereq tijî neft dikir, îro dihate mala Heso, sibê diçû mala Keso, awa mal mal digeriya. Xênî ji vê, Êlmîn hinek nan-man, hûrik-mûrik dikire çewtikê³ destê xwe, hema gihîştinê derê mala kê devê wî vedikir û ew “xwarin” davîte ber seyê derê malê.

Kesekê ji vê kirina wî serederî dernedixist. Serbarê ser da bine-liyan digotin, “peh kulê tu mala mêra nekevî, Êlmanî çiyî merd e, destvekirî ye”. Bi wê kirina xwe va ew bibû hizkiriye hinek mal-betan.

Belê, seyê gund jî ew nas dikirin, îdî diçû derê mala kê sê dêla xwe ber wî ba dikir.

Her ro berêvarê mêr, ciwanên gund beravî ber dikanê dibûn û hetanî tariyê erd hildiçînî li wir hev ra diaxifîn. Aran dibirine zozanê, zozan dihanîne aranê.

-Rizgoyê bira, -Nasoyê camêr pirsî, - tu yê bizanibî em ê hetanî kengê ber çira neftê zer bin? We ye Gulistana belengaz dîsa diçe neftê bikire.

Te hew dizanibû eva cara yekem e ewana dibînîn, wekî jin-bûkên gund diçin neftê bikin. Gişkan bi eceb wî alî nihêrîn.

Êmê çend deqîqan⁴ ji tu kesî deng derneket. Camêrê Naso dîsa pirsaxwe wekiland:⁵

1 binelî: şênî, akincih.

2 dida xweyîkirinê: dida sekinandinê.

3 çewtik: çentik.

4 êmê çend deqîqan: di heyama çend deqîqan de.

5 wekiland: dubare kirin.

-Çima tu nizanî? -Rizgo bi posîde kêlimî, - ronayî jêl va¹ anîn, tûşa gundê me berê wê wê da lê dan, fêza gundê me ra derbaz kirin, birine gundê jorê. Gotin gundê me neketiye planê.

-Lo camêro, -Silo tevî axaftinê bû, - bihêle ez bersîva wî bidim.

-Çi plan? Plan jî destê wan da ye, erd jî, av jî.

-Em, em bin planê jî ya me be, ax jî, av jî berê berê da ya me ye.

Cîwanekî awa got, yê dinê ser da zêde kir:

-Em îdî em in.

-Xwedê dengê te bibihîze!

Ber dikanê pirsan pirs anî, hucetê hucet, herekê nêtek digot, her kesî ya dilê xwe dihanî ser zara. Lê Gulistan hê ber koxtikê nefte bû. Ewê dixwest here Êlmîn ewa da xayîkirinê:

-Lê lê, bedewa dunyayê, vî gundî tu ji gişkan gellektir niftê dikirî. Tu ewqas neftê çî dikî? Him jî jineke tenê yî! Min cara dinê jî te ra got, mêrê te miriye, kî zane kurên te ku da çûne, unda bûne, here mêr. Evê bedewiya xwe xirab meke.

Gulistan ji van giliyana him soromoro bû, him hêrsa lêvên xwe cûn.

Xwest mîna şerekê êrişî wî bike, bi tilî-pêçiyên xwe çavên wî birêje bin piyê xwe, lê zefta xwe anî û ser wî da hêrs bû:

-Tu Êlman î, yanê kî yî, ez nizanim, kula min te neketiye! Derdê min nekşîne, here derdê xwe bikşîne. Ji sibê hetanî evarê mîna seyê avî² derê mala vî, wî digerî! Eva çend car e rex min dikevî, te'na da-vejî min! Naha rind guhê xwe bide min.

Vê qîtê³ her du cîwanê ber dikanê çend gava dûrî wan sekinîbûn û axaftina Êlmîn û Gulistanê rind dibihîstin.

-Lo lo, Êlmanko, -Gulistanê bi kîn-buxs got, - dunya dor bi dor e, ne bi zor e. Kurên min dibên tariya îro, ronahiya sibê ye. Ev dewlet û hukûmet çiqasî me tariyê da xayî dike, ewqasî xwe ra tirbê dikole.

1 jêl va: ji jêr ve

2 seyê avî/havî: kûçikê ku li ber derê xwediyê xwe nasekine, li kolan û sergoyan digere.

3 vê qîtê: wê gavê.

Ev giliyana herek bû tîrekê dilê wî qul kir, lê ewî xwe kerî avît û bi duruztî pirsî:

-Ew kurên te li ku nin?

-Kurên min gotine min, kê ji te pirsînê em ku nin, tu bi cul'et bêje: -Kurên min li serê çiyayê hanê ne, li gundê hanê ne, li filan bajarî ne, di dilê her kurdekî da ne, bal her aşîthizekî ne. Kurê min çûne me ra ronahiye bînin. Ez jî dixwezim mina dayîkên mayîn ser xalî-xalîçê xurek bipêjim.

-Erê min her tişt fem kir! Lê tu ser tiştêkî ra derbaz bûyî. Te negot, tu ewqas neftê çi dikî? Ne tu jineke tenê yî?

-Erê, Êlmanko, usan e. Ez dinihêrim gundê fêza me hetanî sibê ber ronahiya lempa tokê ne. Lê gundiyeş me demekî şevê şûn da lempan ditemirînîn. Gund dikeve nava tariyê. Lê ez dijî nexwestiyên me jî êvar da hetanî berbangê lempê vêdixim. De here, netu-tişt, ciyê xwe bizanibe, xeberdana xwe bizanibe!

Vê şûn da Gulistanê derdana neftê hilda, çend gava ji koxtikê neftê dûr ket, sekinî, piş xwe nihêri, vegerî ser wî:

-Meyto, dinihêri min çawa guhar guhê xwe da dar da kirine, tu jî usa giliyên min xwe ra têke guhar, wana bîr meke! Careke mayîn tu te'na bavêjî min, rex min kevî, ez bi van çiyayên me ye ziyaret, serên ewledên xwe, ez ê bêm çend fera neft ji te zêde bistînim, ez ê wê neftê hilşînîme ser te, agir bere te dim! Tu yê bibî xuliya ber piyê min!

Êlman ciyê xwe da bibû kevirekî, erdê va zeliqîbû. Gulistan êpêceki çûnê şûn da bi hesreteke mezin hey bejin-bala wê, rêçûyîna wê, meşa wê ye bi xanim-xatûnî mêze kir û ber xwe da kire piçepiç:

-Ez ê zutirekê te qurbana xwe kim! Tu yê zûtirekê bibî xurê min!

Ji wê rojê çendek derbaz bibû. Gulistan çûnê neftê îdî kirtîni ber Êlmîn nediket. Kereker bin çava va ewa mêze dikir, derdana wê ji destê wê digirt tişî neft dikir, dirav distand, serê xwe dikire ber xwe. Hema îro jî usa. Ewa çûnê şûn da Êlmîn dilê xwe ra şabûneke mezin derbaz kir:

“Xwedê, qurbana te me! Îşev, vê şeva zivistanê, usa têke tarîstan, bila çav çavan nebîne, Nêçîr hene tariyê da rind têne lêdanê”.

Belê, zivistan ketibû qamê xwe. Fêza gund berfê davîte bejina mirovan, lê nava gund da jîyan bû.

Li gund êvarê, dema alif didane heywîn dibû deng-hes, wê şûn da seqirtiyê gund hildida. Pey şîvê ra payê pirr çira ditemirandin. Gellekî nedekişand li malan yeko yeko pifî çiran dikirin. Îdî gund gundîtî nava xewa şîrîn da bû. Gulistan neketibû xewê, her tenê çira mala wê vêdîket.

Nîvê şevê bû, ewa nava cî-nivîna da kêlek kêlek weldigerî, lê derva vizeviza bê bû, berf ser hev da qatqatî dikir. Hundur da seweke giran¹ ketibû ser wê, derva jî tariyê perda xwe ye reş usa avîtibû nav gund, hema nezîkî malê guran dikire kûzekûz. Te hew dizanibû binrexa² wê berfa qalim qalim bû, lihêfa wê telte telte qeşa bû. Dil dikire pirtepirt, diricîfî.

Sala ewilîn, wedê kurên wê hê nûh ji mal derketibûn çûbûn, ewa zû zû dikete vê rewşe. Xewa wê nedihat, radibû nava cî-nivîna da rûdinişt û dikete mîtala:

“Min dêranê bi hezar cefayî ewled mezin kirin, çawa diya min digot, ew derdixistine ser çiqilan, bifirin, lê nizam kê kewkî avîte wan, ewana ku da çûn?”

Par zivistanê, hema şeveke awa derê wê kutan. Du ewledê wê hev ra hatibûn serîkî diya xwe xin, bi rewşa wê bihesin. Dê jî nêta xwe wan ra gotinê, ewana awa bersiva diya xwe dabûn:

-Dayîkê can, Gulistanê, dayîka diya me welêt ala xwe ye sêren-gî avîtiye me, kiriye kewkî, gazî me kiriye. Eva çendî çend sedsal in dujmin kevir kirine kewkiyên xwe hey avîtiye me, em deroder kirine, ber dîwara hîştine. Bizmik kirine devê me dibên, ne bêjin, ne bikenin, hun yên serê çîyan in. Lê naha me ala dayîka diya xwe hildaye-daye destên xwe hetanî ew nava alên dewletên mayîn da nemilmile, şîrê te li me haram be, mirina me heye, lê paş da vegerîna me tune!

1 seweke giran: tirseke giran.

2 binrex: doşik.

Îşev dîsa çavên dê li dêrî bû, guhên wê ser deng-hesa bû. Nava cî da tehmûl nekir, rabû hate ber roderê.¹ Çavên xwe kuta şûşa derva nihêrî.

Dunyake binav û seqirî!

Ewê serma kir, hat kete nava cî, lihêf kişande ser xwe. Ser tariyê da tarî bejina xwe kir. Hey way, bîn lê çikiya, hat bifetise. Serê xwe ji bin lihêfê derxist û wê weşê² nuqî dilê wê bû, wekî îşev tiştek ê biqewime; kurê dêrî li wê vekin. Him jî keleke kilam-stranê hate wê.

Rastî jî Xwedayê Mezin du dayîn dabû wê. Bedewî, yek jî dengêkî zîz î xweş.

Ewê gellek kilam, beyt-serpêhatî, dilok zanibûn. Nişkê va beyt-serpêhatiya “Memê û Eysê” kete bîra wê. Nava cî da ricifî, te hew dizanibû ewa tayê heft sala ketiye.

Dil da ber dilê xwe, lê “Memê û Eysê” dest ji pêşîra wê nekişand.

Ber xwe da kire vingevîng:

“Dest avîte qirmê ye,

Go, tîrsa min tê ji wê tîrsê ye,

Dengê qirmê bela be rû dinê ye.”

Gulistanê rewşa dayîka Memê-Wetê anî ber çavên xwe ra derbaz kir, çavên xwe girtin, kêr hilda hoşerî³ danî, hoşerî hilda qeme danî, destên xwe nava hewê da ba kir.

Ewê dîsa dil da ber dilê xwe, hêz da xwe rabe, lê te tirê ewa bûye barekî giran, xwe ser xwe da qiriya:

-Weylo, kula kor min da hatê, ez çima awa dikim! Ez taka ketime⁴, çi ye?

Hema vê qasê derî kutan. Ewê ber bi dêrî nihêrî, tîrs-xof ji wê dûr ket. Hiş-sewdayê xwe civande ser hev û bi şîrînîke mezin deng da:

-Ez heyran, bihêle têm!

Ewê yeqîn kir, wekî ji ewleda yekê dîsa dê bîr aniye, şabûna xwe

1 roder: pace, pencere.

2 wê weşê: wê gavê.

3 hoşerî: xencer.

4 ez taka ketime: nexweşiya tayê ketime.

şaş kir, hema tena kiras-hevalkiras ber bi dêrî revî, qe ne pirsî, ne jî tirsî. Qulbenda dêrî hilda wê da avît, derî vekir.

Yekî ew paş da dehv da, derî girt. Ewê janderme ber çavên xwe dîtînê bizdiya, ber bi cî-nivîna revî, xwest lihêvê bikişîne ser xwe, ewê Êlman jî dîtînê tevziya ewa hingavt. Ewê hêrsa lêvên xwe ye kaxetî cûn. Lê Êlmanê ku roja roj bibû heyr-hejmekarê bejin-bala wê ye bi qamet, çavên tasîn, bijangên qetran, dêmên sipîgevez hiş-bir bibû.

Gulistanê tê derxist, ku zenda wê zincîra hevt kotana aliyaye, dest nevêje fen-fêla xilazbûna wê tune. Jenderme jî mîna ruhistî-nekî ser wê ra sekiniye.

-Êlman,- Gulistan kelimî,- jî hevalê te şerm e, zenda min berde ez kincê xwe xu kim, paşê...

Le janderme ser wê da qîjiya:

-Kurên te kanên? Ewana li ku ne?

-Birayo, bihêlin ez kincê xwe xu kim, rabim we ra ezet-hurmetê bikim, îstekanek çay vexwin, paşê her tişt ser çavan!

Ji van giliyan lep li Êlmîn sist bû, ewî zenda wê berda.

Gulistanê dest avîte kincên xwe û hema nava cî da ew xu kirin û rabû ber bi maldizkê¹ çû. Misîn hilda da ser agirê bixêriyê. Ewê bin çava va li wan xêrnexaza nihêrî. Nihêrî Êlman ketiye milê janderme û çawa dihate xanêkirinê ew ber wî digeriya. Te hew dizanibû nişkê va yekê niçande wê û guha da kire pistepist:

-Lê lê, qewimandina "Memê û Eyşê" bîr meke!

Ewê xwe ser hev da anî. Bi destekî şidiyayî hoşeriya dardakirî hilda wê weşê bismikê devê derpiyê xwe ra derbaz kir, dêre ser da berda.

Gulistanê meniya destexanê hat hedî hedî rex wan ra derbaz bû û rind bihîst. Êlmîn digote janderme, şevê zivistanê dirêj in, bihêle em çend seheta hêsa bin², lê janderme qayîl nedibû.

Gulistanê ji çavîkê xênî destexan hilda, dîsa kêleka wan ra ser pêçiya çû û rind bihîst. Îcar Êlmîn bi lavayî digot:

1 maldizk: mitbex.

2 hêsa bin: îstirahet bikin.

-Tu bihêle ez bigihîjime hesreta xwe ye salan. Ez sond dixum, ez ê malê dunê qurbana te kim.

Gava jandarme navê malê dunê-dirava bihîst, dest û pê lê sar bûn.

Dihate kîvşê ewana pev ketin. Êlmîn janderme wir hîşt hate maldizkê û destê xwe stûyê Gulistanê ra bir. Ewê destê wî wê da kir û kêlimî:

-Tu çi mirovekî bêsebir î! Çay hazir e, werên vexwun!

Paşê dilê xwe ra derbaz kir: “Lo lo, qolo, îşev ez ê yanê bi destê we bibime para erdê sar, yanê...”

Wana rûniştinê çay vexwerinê, ewa bi fen çû çavîkê xanî yî mayîn janderme ra cî-nivîn danî. Hema wan çay vexwerinê Êlmîn çav kire janderme, ew derbazî çavîkê dinê bû. Ew jî hate ser cî-nivînê Gulistanê, wê çirîkê kincê xwe derxist, kete nava cî. Mîna gu-rekî birçî hîviya nêçîra xwe bû.

Gulistan ji maldizkê derket, hedî hedî hat, çira fêza serê wî bû, pişta xwe wî da kir, destekî va serê çirê daxist, tariyê çavik hildanê hoşerî ji devdelikê xwe derxist, ber bi Êlmîn hatinê hoşerî da piş xwe û derbê ra hoşerî kuta sîngê duruz û xwe ser da avît. Çawa “Meme û Eysê” da tê qalkirinê hoşerî dilê wî ra derbaz bû, sê tiliya erdê da çû, nalîn kete Êlmîn, revîn kete ber riya Gulistanê. Ewê derî vekir û vê şeva zivistanê ye tarî da minê bû.

Sibê, berbangê li gund bû hêwirze. Ji nehiyê êpêce mirov hatibûne fêza gund. Tu nebê şev stûneke ronahiye birîne û gundên jorê tariye da mane. Ew jî digotin, wekî îşev terorîsta karkarekî¹ dewletê kuştine.

Du-sê rojan şûn da hemû rojnaman gotar, nûçe, buxdan, derew, bûyî-nebûyî, vir-viz neheqî-nebendî dane weşandinê, têlêvîzor² dikirine qareqar, wekî mirovekî xwedanê peywîrê bilind, welethiz filan riyê ra derbazbûnê têrorîstan ew kuştîye.

1 karkar: karker, xebatkar

2 têlêvîzor: televîzyon.

Ya Rebbî! Heqî-rastî mabû newalê da, buxdankarî¹ derketibû serê çiyayên mezin dikire qûjeqûj.

Yên ji nehiyê hatî tiştek jî gotine gundiyên “Gundê Mezin” ku îdî destên xwe nedine stûnên tokê-ronahiyê, ji jorê me ra gotine em ronahiyê bikişînine gundê we.

-Zor gizêrê radike!

Ew çend meh ji wê qewimandinê derbaz bibû. Jandermeyê ku tevî Êlmîn hatibû “Gundê Mezin” kanaleke têlêvîzorê dinihêrî.

Ewî ji çavên xwe bawer nekir.

Mêze kir û mîna zara kire îskînî, dev-lêv lê hejiya:

-Pî, pî eva ew jinik e, eva Gulistan e distirê! Wayla xulî serê me bûyê! Em jî rûniştine her ro pifî tûrik-têr-xiraran dikin, ku bi derewa tijî bin. Ê, ya me mîna gotina vê metelokê ye:

“Derew hatine dunê:

Bar-cemek.

Barek para me ketiye.

Cemek para hemû dunê ketiye.”

1 buxdankarî: îftirakarî.

PERÊ MERZEL

Go, kalekî her roj gopalê xwe dida destê xwe dihat ber rodera mektebê disekinî, çavên xwe dikuta hundur, guhê xwe dida ser dersdar û şagirtan, êpêcekî şûn da dikire axînî, ofînî, sê caran gopalê xwe li erdê dixist, mîna mirovê bargiran hedî hedî diçû ser topikê¹ rex merzel û demeke dirêj rûdinişt.

Dersdar jî her roj li vê kirina kalê, li vê dîdemê mêze dikir. Carekê ewî biriyar kir ku here ji kalê pirs ke: “Ev çi sur e, ev çi hewal e?”

Rojeke zivistanê ye sar bû. Berfê davîte gûzika mirov, him jî gulok gulok lê dikir. Dersdar dîsa ji şagirtan ra ders digot, him jî zû zû li derva dinihêrî, xwe bi xwe ra digot: wekî îro sar e, diqewime kalê neyê. Qasekî şûn da kalê dîsa mîna her car hat ber roderê sekinî. Dersdar li wî nihêrî, ewî li dersdar... Kalê avrûke usa da dersdar qerçimekê eniyê û yen rû bûne yek, bûne deh, bûne bêjimar, gîhiştine hev. Her têleke birû û bijangan bûne mîna tîran û li dilê dersdar ketin. Ji we avrûyê ewî seh kir, wekî janê avîte dilê wî. Ew di ciyê xwe da qerisî ma, lipitandin bi wî nebû, lê kalê pişta xwe da wî û mîna her rojê berê xwe da ser riya merzel.

Êdî dersdar nikaribû ders bigota. Te hew dizanibû dewsa kalê ew li derva, ber berfê ye û ji serma dev-diranê wî ketine hev, axaftin bi wî nedibû. Ji piçepiça şagirtan dersdar bi ser hişê xwe da hat. Dîsa pey kalê mêze kir, lê ew nedihate kivşê. Ewî li seetê nihêrî, hê çend deqîqe hebûn, wekî zengil lê keve. Dersdar tev hev bibû. Mîna merivê gêj li derdorê xwe dinihêrî, yek jî zû zû seetê mêze dikir, her çirikek, her deqîqek bona wî bibûne demeke dirêj. Sebra wî nehat

1 topik: girik, bilindahiya ji çiyayî biçûktir.

hetanî dawiya dersê çavrake ewî hêdîka serê xwe bilind kir û gote şagirtan:

-Rabin, herine mal.

Ji şabûna şagirt li hev ketin, kirine qîreqîr ji dersxanê derketin. Dersdar tenê ma. Kete mitala: "Çima kalê her roj tê ber roderê disekine? Çima paşê ber bi merzel diçe? Çima ew sê cara gopale destê xwe bi hêrs, bi kîn li erdê dixê? Çima ewî usa bi avrûyên tûj li min nihêrî?" Dersdar bersîva tu pîrsekê nedît û nişkê va ji dersxanê derket, pey rêça kalê çû. Her ku ew nêzîkî kalê dibû, saweke giran dike-te ser wî û piyê wî, wî ra nediçûn. Ew gav bi gav, giran-giran diçû, ji dûr va dît ku kalê ser topikekî rûniştiye. Piştî kalê li wî bû. Dersdar çend gavên din jî nezikî wî bû, lê êdî bîna wî diçikiya, ew sekinî. Xwedaneke zîpik zîpik xwe avête eniya wî. Xwest ji bêrika xwe dest-malê derxe, lê destê wî, rex wî da ket. Xwe xwe ra got: "Xwedê xêr bike? Tu dibêjî qey ez qetilkar im diçime bal celad." Weşekê sekinî, dişa da gava û bi hewalekî dijwar hat pêşberî kalê sekinî. Ewî xwest ya dilê xwe ji kalê pîrs ke, lê mîna şagirtê nezan kir-nekir gotin ji devê wî derneket. Kalê ji sêrî hetanî piya ew mêze kir. Qasekê ewana hema usa li hev mêze kirin. Di nava mêzekirina kalê da kîna salan, de'w-doz, şer, di nava ya dersdar da bergerandin, hêvîkirin hebû. Çirikek, dudu jî derbaz bûn dersdar hêz da xwe û bi dengêkî lavayî got:

-Apê Sûto, selam.

-Selam, -kalê bi dengêkî lerizî selama wî vegirt-. Tu ne ew mirov î, wekî selama te bê vegirtinê, lê naxwazim bal Xwedêyê xwe beze-kar bim.¹

-Çima min çî kiriye?

-Te qe bihîstiye dibên: "Perê merzel li ser te be!"

-Belê, ev nîfireke here giran e.

-Lê tu dizanî çima?

Te hew dizanîbû dersdar şagirt e, kalê jî dersdar. Him jî ewî êdî

1 bezekar bim: gunehkar bim, rûreş bim.

derz kir,¹ wekî kalê rijî² van pirsra nade wî, esse tişteke heye. Dersdar xwe xwe ra: “Gotî bêhna mirov fireh be...” lema bi dengêkî nizim got:

-Yanê filan keso, zûtirekê tu bimirî.

-Hema ev?, kalê bi hukum pirsî.

-Belê, zanebûna min hema ev e.

Kalê kuxiya, te tirê gewriya wî diha jî hate vemilandinê, dengê wî hate cincilandinê û got:

-Gava dibên “perê merzel li ser te be” sê nêt di nava vê gotinê da hene. Te yek got. Duda jî ez bêjim. Nêta dinê yek ew e, yanê ku tu ne tişteke î, dinbo yî, kundo yî, tişteke bi te nabe. Van yeka xem tune, lê bi xwe bêjeke vê nifirê ya here giran heye. Ew jî ev e, yane ku tu bimirî li perê (kêleka) merzel bêyî binaxkirinê û heta hetiyê tu kesî fêza te defin nekin.

-Ape Sûto, -dersdar bi posîde pirsî, - Tu evê yekê ji min ra dixwazi?

-Him erê, him na. Guh bide min ez ji te ra bêjim. Ez her rojê tême dibistanê, ber roderê disekinim guh didime te. Te qe rojekê mesele-meteloqeke gelê xwe kurdan şagirtan ra got? Te qe dastana “Ker û Kulik”, “Mem û Zîn”, “Siyabend û Xecê”, “Dimdim” û yên mayîn qal kir. Te qet beyteke Feqiyê Teyra, helbesteke Ehmedê Xanî şagirtan ra anî ser ziman. Ne navê şagirtekî Mem e, yek Zîn e, yek Siyabend e, yek Xecê ye, yek Perî ye, yek Kulik e, yek Werdek e. Qe te got: Mem kî ye? Zîn kî ye? Siyabend kî ye? Xecê kî ye? Xano kî ye?... Niha tu bi xwe bêje perê merzel saxesax li ser te dikeve, yan li wan kesên, ku boy azadiya welêt serê xwe dane û bin axa welat da şirîn ketine xewa hingorê? Tu ne miriyê tev miriya yî, ne saxê tev saxa yî! Bi kurtî: tu ne mirî yî, ne zindî yî. Qe tu dizanî welat çi ye, dayîk kî ye? Gelo tu dizanî welat şirîn e, yan dayîk? Gelo tu dizanî pêşiyê welat hatiye xuluqandinê yanê dayîk? Mirovên bê welat, ew mîna berûyan in, her çar rozgarê salê têne pêpeskirinê. Kêleka xwe bide kêleka min, rûnê bila hulim-gulima axa welêt bê te, wekî tu serma nekî û ez yeko yeko bersiva van pirsan ji te ra bibêjim.

1 derz kir: fehm kir.

2 rijî: bê sedem, jixweberê.

Dersdar qe nekire kirtîni, hêdîka kêleka xwe da kêleka kalê û rûnişt. Apê Sûto bi gopalê destê xwe va berfa ber piyê xwe vir da, wê da paqij kir, hetanî ax hate kivşê, dû ra vegeî ser dersdar:

-Xwedayê mezin pêşiyê a ev ax xuliqandiye, axê ji şekir-şemdan û navê wê daniye welat! Welêt keç-xort xuliqandiye navê yekê daniye dayê, navê yekê bavo! Dayê, bavo em xuliqandine û her yekê me navek lê kiriye. Em ji axa welêt hatine, dawiyê da jî em ê herine hemêza wê. Lê me ew ji destê xwe berdaye, em ê bi çi rûyî herine mêvaniya wê ye heta hetayê?

Vira kalê bîn da ber bîna xwe, xwe kerr kir, dest avîte berfa kêleka xwe, kulmek hilda pê serçavên xwe mizda û dîsa axivî:

-Dersdar, çi ku min got: Bona te hê hindik e. Gunehê te mezin e. Tu li vira dewsa giliyê “Dê” şagirtan ra “anne” şrove dikî, yekî din î li wira dibê “mader”, birakî te yî dinê li dera hanê dibê “moter”, wê wê da jî yê mîna te pizika reş zimanê xwe da tînin çi dibêjin, çi nabêjin ez nizanim! Awa, bona vê yekê ez ji te ra dibêjim, perê merzel li ser te be. Lê hê ne dereng e, tu mîna min nebûyî sêpî û şevkor, temiya min li te, xwe li riya welêt bigire!

Dersdar ji kêleka kalê rabû û pêşberî wî sekinî got:

-Ape Sûto, de bila pêşiyên me welat ji dest bernedana, tu jî îro bi van navniçika nehatayî min.

Ji wê gotina dersdar kalê hêrs ket, gopalê xwe çend cara erdê xist û berbirî wî bû:

-Kuro! Tu usa bihesibîne, wekî ji Hesinkar Kawa girtî hetanî roja îroyîn, pêşiyên me ne de'w, ne şerê welêt kirine, ne jî bona wê xwîn rêtine! Wana çi kiriye, çi nekiriye rehma Xwedê li wan be. Îro usa bişêvîne¹ pêşiyên me tu yî, kerem ke bide pêşiyê, em jî pey te bîn û bibine xwedanê welêt, dayîka xwe! Rind bizanibe te xwe danê dera hanê (ewî bi gopalê xwe merzel da kivşê) ewledê te yê jî bêje, bila pêşiyên me welat saz kira, min ra çi? Yan jî wê ne'letiyê li gor-xêra me bînin? Were neyê xapandinê. Ez ê ji te ra bûyerekê jî bêjim, wê wê da yan perê merzel hilde ser xwe, yan jî deyla² diya xwe bigire!

1 bişêvîne: bişibihîne, bihesibîne.

2 deyl: pêş.

Kalê hêzin da xwe rabû, bi her du destan va gopal girt da ber sîngê xwe, xwe ser da mêl kir û dûmayîn da axaftinê:

-Dibên, wekî yek cara yekem tê dixapîne Xwedê qenîmî¹ wî dibe, lê cara dua ku ew mirov dîsa te bixapîne, wê carê Xwedê qenîmî te dibe. Çima? Ji ber ku Xwedê dibê, lo filan kes, ne cara yekem tu bûyî şehedê wê yekê, wekî şîrê wî kesî heram e, êdî nebe hevalê wî û ji wî bawer neke. Lo lo, dersdaro, were çavên xwe negire, rind bizanibe eva çendî çend sal in dijmin min jî, te jî, wî jî, me hemiya dixapîne! Êdî bes e! Niha tu dizanî Xwedayê Mezin ji yên mîna te ra çi dibêje? Dibêje: Şîrê yê mîna te heram e, dibê yê mîna te hêka mirîşka bê dîk in!..

Kalê xwest bide ser rê here dersdar milê wî girt kelimî:

-Kalo can, kalo, bersîva pirseke min jî bide, paşê here!

-Fermo!

-Lê çima tu her rojê tê vira rûdinêyî?

Kalê piştî xwe rast kir, berê xwe da merzel û bi hizineke kûr², kire axîni û mîna rewîkekî (serab) kerwanê bargiran, rê da axaftina xwe:

-Dersdaro, ka ji kerema xwe careke dinê li merzelê hanê binihê-re. Çawa tu dizanî ew ne merzelê me kurdan e. Ew tirba hanê, ya fêza gişka, ya li perê merzel, ya kalikê min e. Ew di serhildana welêt da, di şer da hate kuştinê. Çawa dibê ewî tînin vir û wî di wî merzelê xerîb da binax dikin. Heta roja îroyîn tu kesek miriyê xwe di fêza wî da binax nake. De binihêre di dinê da çi heye? Lê ez zû zû diçime ser tirba bavpîrê xwe, wî ziyaret dikim û dibêjim: "Bavpîro, min we-siyet kiriye, gava ez bimirim wê laşê min bînin fêza te binax bikin. Min jiyanê da tiştê ji bo welêt nekir, qe na bila perê merzel ji ser bavpîrê min bê hildanê. Bila dujmin jî bizanibe çi heye, çi tune?"

Kalê awa got û ber bi merzel çû, lê dersdar ber bi gund...

Sibetirê kalê dîsa çû mektebê. Ber roderê sekinî, nihêrî ne ders-dar heye, ne şagirt. Wê rojê bes belav bû ku dersdar ne li malê heye û ne jî li dibistanê; ku da çûye, kesek nizane.

1 qenîmî wî dibe: lê tê xezebê.

2 hizineke kûr: huzneke/xemgîniyeke kûr.

HÊSIRÊN XWÎNÊ

Gundê wan ra digotin gundê: “Neçîrvanan”.

Ew gundekî quntara çiyê bû. Çiyan sê aliyan da ew hildabûn nava xwe.

Tenê alîkî da rê dabû bineliyan. Zinar, zerên wê yek ji yekê bilindtir bû; zaxe-şikeftên wê yek ji yekê mezintir-ber bû, newal-geliyên wê yek ji yekê, kûr û dirêjtir bûn.

Xwedayê mezin û xwezayê boy mirovên van navberiyana¹ qe tiştek nehêvişandibû.²

Bintara çiyan, aliye çepê çiqasî çavên te dibirî, daristanekî sixte bû. Li van çiyan û daristanan kar, xezal, gakûvî, memiz, hîrç, şêr, piling, eylo, balinde, gabelek, kew, qartîk û gellek rewir-sewil,³ çivîk, teyrên hov e bêjimar hebûn.

Pisporî, mijûliya mirovên vî gundî yek ji rava-neçîrvanî bû. Ji zarên heft salî, hetanî kal, pîrên heftê salî ev derena buhust buhust nas dikirin.

Zanibûn filan kanî, newal, gelî, şikeft, zaxe, zinar kê dere ye. Riya wan boy wana mîna riya kadînê bû. Hê biçûktiyê da bavan ewledên xwe hînî gulle avîtinê, mêşîndariyê,⁴ hesp siyarbûne dikir.

Vî alî da dîsa barekî giran dikete ser dayîkan. Xênî ji wan dayîkan keçên xwe hînî karên malê, çêkirina emenî, xalî-xalîcan, hûnandina goren neqş bi neqş, hînî hebûna xwezayê dikirin. Keçên

1 navberî: dever, herêm.

2 nehêvişandibû: teksîr nekiribû.

3 rewir-sewil: rawir-sewal, dirinde-ajal.

4 mêşîndarî: nîşangirî.

van cî-waran hê dûr va tê derdixistin ev çi pincar e, ev çi fêkî ye, çawa digotin, wana şîrînayî-telayî bi çavên xwe tê derdixistin.

Dema karî beravkirinê ji gundên jêrîn dihatine berê van çîyan.

Hinek ji kariyan jehrdadayî¹ dibûn, ji ber ku wana kariyên tehl û şîrîn ji hev nedijibartin. Lema ewana timê karniyarî² keç-bûkên gundê “Neçîrvanan” dibûn.

Ardan xortekî 23-25 salî, bejinbilind, navmilpehn, enîkever bû. Zivistan bû. Îsal zivistan daha hişk bû. Li çîyan berfê davîte bejna mirovan. Gelî-newal bi berfê va hatîbûne niximandinê.

Ardan êvar da amede dibû kubira sibê ra³ here nêçîrê. Lûla tîfin-gê, livik paqîş kir, rûn kir, çek û rext da ber serê xwe û bi bawariya sibê raza.

Ewî wê şevê qe xew nekir. Kêlek kêlek welgerî. Te qey digot yekî hinek berf aniye, kiriye nava cî-nivînê wî.

Dîkê serê sibê bang danê, ew bi lez rabû, kincên xwe xwe kir.

-Lawo, Xwedê xêr ke, -dê got, - min îşev xewnek dîtiye. Min dît ez ber çemekî me, desmala destê te dişom. Desmal ewqasî qîlêr bû, meriyan nedixwest ewê bide destên xwe. Min ew kever kir.⁴ Lawo, av ronahiye, lê desmal...

Ewê nêta xwe neanî ser ziman. Xwedê zanibû ewê çi dixwest bêje...

Li ber şêmîkê kur xar bû, hate rûyê dê. Simêlê wî rûyê dê yî qer-çimekên salan ketinê, kire axinî.

-Lawo, -dê dîsa kelimî,- bila ew axiniya te bê min. Here lawo, bila riya te oxir be, kevirê ber piyên te penêr be.

-Dayê can, çima eva cara yekem e ez diçime nêçîrê?..

Dê tişteke negot, mîna her car pey kur şerbike av avît, kur çû, dê vegeîrî nava çiyê xwe.

Ardan li bintara gund, ber çêm, rastî neçîrvanên hevalê xwe hat.

1 jehrdadayî: jehrîn, jehrkirî.

2 karniyarî dibûn: di kar da ew dişopandin.

3 kubira sibê ra: bi berbanga sibehê re.

4 kever kir: spî kir.

Ewana hetanî pêşa çiyê bi lez, bi kel-bîn hatin. Li wir sekinîn û hev şewirîn, ku kî ku da here û guhên wana ser hev be.

-Ez ê ber bi “Şikefta Xezalan” herim,- Ardan bi bişirîn gote hevalan.

Nêçîrvanan bi zendegirtî¹ hev nihêrîn.

-Lo, Xwedê hîşt, -neçîrvanê hinekî navsere berbirî wî bû,- mirov qe axlêvê nikare here derê wira. Tu yê naha çawa herî. Tiştê usa meke.

Îdî kesî tiştek negot. Her yek ber bi ciyê kivşkirî çû. Ardan jî merd-merdane berê xwe da “Şikefta Xezalan”.

Ardan cûnê nêçîrê dice’dand destevala venegere. Îcar jî meremê wî ew bû. Ji pêşa çiyê hetanî “Şikefta Xezalan” êpêce rê bû. Bi nêta wî hetanî wê şikeftê bibe-nebe ewê rastî gur, şêr, piling û heywanê hov e mayîn bê. “Şikefta Xezalan” çawa bircek, qesreke, mîna kelakê hatibû xuliqandinê. Piştî wê li çiyayê biasê bû. Banê şikeftê qest-qerezi bi tehtên şimşehet² va hatibûne raxistinê. Vî alî, wî alî geliyên kûr e bêbin bûn. Teyr jî ditirsîyan li binê wan geliyan daynin. Zivistanê jêl va rêk diçû şikeftê.

Hundurê şikeftê jî bi sêreke xwezayê va hatibû neqîşandinê, him jî ewa çavçavî bû. Çavên wê mîna odên mezin bûn. Ewana gişk hev ra hatibûne giredanê. Riyên ku hundur da ser hev ra, ber hev ra diçûn, dihatin kevan-kevan bûn. Mirovan bi dijiwari serederî ji wan derdixist.

Wekî ber çavên neçîrvan xezalek têteta şikeftê, neçîrvan jî bida pey wê, qe sê rojan li wê bigeriya nedidît.

Sal danzdeh mehan kar-xezalan xwe didane wê şikeftê. Lema jî jê ra digotin: “Şikefta Xezalan”...

Ardan gav bi gav der-dorên xwe dinihêrî. Lê hê ruhberek derneketibû peşîya wî, ne jî dûr va ewana hatibûne kivşê.

Hinek mabû Ardan bigihîje şikeftê, sekinî. Xwîdaneke germ hatibû wî. Ewî desmala xwe derxist, xwîdana eniya xwe paqîş kir.

1 zendegirtî: şaş û mehtel mayî.

2 şimşehet: şimşad, hilû.

Êmekî bîna xwe stend. Paşê tîfing jor da anî da destê xwe, hedî hedî, teletel nezîkî devê şikeftê dibû. Te hew dizanibû hinekan gotîbûne wî, bi fesal here, wexta nêçîr derkeve peşîya te.

Gavek, dudu, sisê ew pêşberî şikeftê sekinî. Ew, xezal û karek hatine rûberî hev. Çîrpînî kete dilê wan. Ardan ji şabûna hejiya, dê û ewled ji tirsê, xofê lerizîn. Xezalê gavek pêş da avît, li kara xwe bû star, sîngê xwe pêş da da. Dilê xezalê ra derbaz bû: “Lawo, bila gulle sîngê min keve, lê tu aza be.”

Xezalê rind zanibû tu riya revê tune. Dora wê çît bi çît e, paş da bireve, têkeve zaxê ditirse gulle ewleda wê bihingivîne. Pêş da here gulle yê wana pirtîpirtî ke.

Ardan jinûya xwe da erdê, tîfing dirêjî xezalê kir, lê nişkê va dudilî bû. Kete mitala: “Xezal heywaneke heyf e, ayîkê wê,¹ wê min bigire. Yek jî xezal çî ye ez neçîra wê bikim.”

Of! Ax! Pêşek²-nexaşiya nêçîrvaniyê dilê wî da mîna me'rê reş serê xwe bilind kir. Ewî sîngê wê hilda ber mêşînê.³ Tiliya wî ser destrêjkê⁴ bû. Hema ew mabû tiliya xwe bilivîtîne dê û ewladê têke xurê gullekê.

Ardan livika tîfingê ra li xezalê dinihêrî. Ya Rebbî!

Ev bedewa van çiya-baniyan ber çavên wî reş qemilîbû: Xezale beş bû. Beşaya wê bibû giloke reş. Ardan derheqa gellek sêra neçîrvana da bihîstîbû, lê qewimandina awa ne hatibû gotinê, ne hatibû bilandinê.

Eva bi sed salan va bineliyên van dera neçîrvaniyê va mijûl bûn, derheqa gellek ecêbên neçîrê da gotibûn, qal kiribûn, lê tu kesî neanîbû ser zara, ku di nava çend deqîqan da heywan dikare awa rengê postê xwe biguhêre.

Neçîrvan çavên xwe ji livika⁵ tîfingê kişand û careke mayîn li dê û ewled mêze kir, îcar rewşeke mayîn ber çavên wî ra derbaz bû.

1 ayîkê wê: ahê wê.

2 pêşek: pîşe, sin'et.

3 mêşîn: nîşangaha tîvingê.

4 destrêjk: tetikê çekê.

5 livik: di çekê de nikilê ku pê nîşan tê girtin.

Çend reng li hev ketibûn, dest li Ardan hejiyan. Ewî xwe ser hev da anî, dîsa livika tîfingê ra li xezalê mêze kir, xwest destrêjkê bi-kişîne, dîdemeke¹ nedîtî dît. Ji çavên xezalê hesir dibarîn.

Ev rewş usa li wî war hat, te qey digot, wekî her hêsirekî xezalê mîna zinarekî jor da tê erdê.

Vê gavê giranîkekê xwe avîte ser her du pîlen wî û te hew dizani-bû neçîrvan erdê va didawisîne.

Nêçîrvan xwe qunculande ser hev, lê hêz da xwe, livika tîfingê ra niherî û biriyar kir, wekî îdî bes e rehmê xezalê bûne. Îcar jî dide-meke mayîn xwe avîte ber çavên wî. Mêze kir, dît ku, li ciyê hesirê xezalê têne ser berfê, ew der sor-gevez dike.

Ji çavên xezalê hesirên xwîne dibarîn. Ji wê yekê porê wî yî kûrîşkî kûrîşkî bûne tîravêj. Ew lerizî. Nişkê va qewimandineke li gundê wan qewimî kete bîrê.

Ewî her tişt bîr kir û nuqî nava wê bobelatê bû:

“Par deste jenderme erişî ser gundê wan dîkin. Ewana dikevi-ne mala gundê yekem, ya devê çêm. Pêşiyê zarokên hûrik, paşê ciwana ber gulla ra derbaz dîkin. Gava dor digihîje dayîkê, gundî bi kirina teleqreşa dihesin. Xwînretî pê ra nagihînin dayîkê bikujin, sibetirê gişkan digotin, wekî ewana ne mirovbûn e, lê terewilê² har e serê çîyan bûne. Pey wê yekê ra dayîka Zozan şev-ro dikire hewar-gazî, bestan va dipeyîvî.

Hêşiran jî qe rê nedidane hev. Rojekê jî diya min got, wekî hê-sirên wê rebenê bûne hêsirê xwînê.

Nava wedekî kurt da dayîka Zozan ji çavan kor bû, ji destan qop bû, ji lingan qot-req bû.

Çend cara ez bi xwe jî bûme şehedê hêsirên wê. Ewa usa bi şewat, usa bi heyr-hesret digiriya, digerland hindik dima kevir bi-teqin.

Kê guh dida wê, ji dil xwîna reş dikişîya.

Dayîka Zozanê hey digot: “Gelî ewledên van çîyan, heyfa zarên roneditî dujmin ra nehêlin!”

1 dîdem: dîmen.

2 terewil: dêw.

Ewê ber wî derd-kulî gellekî tehmûl nekir. Rojekê kete nava cî-nivîna, sibetirê xwe da perê merzel. “Naha jî ez dixwezim jiyana dê-ewled tev biquşînîm. Gelo, firqiya min û wan celadan çi ye?”

Ew nişkê va ji erdê şêrwazî¹ quloz bû, kire qîrînî û tîfing hilbirî ser serê xwe ra avîte zinarê nikî xwe. Desteka tîfingê alîkî, lûla wê alîkî çû. Ardan wî bayî jinûyên xwe danî erdê û bi her du desta va serê xwe girt.

Xezal û karê hê tê dernexistibûn çi qewimiye. Dayîkê tirê gulle li ewleda wê ket, ewledê tirê dayîkê. Bîstekî şûn da xezalê kire kalekal, karê kire mikemik. Hema wê gavê xezalê ser serê Ardan ra çirp kir, karê da pey wê.

Hinekî çûnê şûn da ewê vegerî azadarê² xwe mêze kir û nava çirikekê da ji ber çavan unda bûn.

Ardan ber şikeftê êpêcekî pey xezalê, kara wê mêze kir. Te hew dizanibû ew ketiye nava dunya tarî. Roja zivistanê ye kurt hedî hedî reşeve dihat³, sar û serma quntara çiyê hey diçû ew di nava xwe da dipêçand.

Dûr va dengê teyr-tûyan li wî tesele dibû. Du heylo hatin ser serê wî ra kirine qîrînî, derbaz bûn çûn. Ewana jî ruzê⁴ xwe digeriyan.

Rewşa xwezayê û dengê van dera ye cuda cuda ew ji bin barê gewimandina qewimî ye giran derdixist. Ewî serê xwe hilbirî erşê ezmîn nihêrî. Erş zol zol bibûn⁵. Xitimîbûn.

Niškê va dêmê dê hate ber çavan. Deremên dêmên dê, zolên erşê ezmîn himberî hev kir. Dil kire tirpetirp. Ewî guh da dengê dilê xwe:

“Ewir wê demê zelal dibin, gava berfê, baranê dibarînin, barê xwe datînin. Lê qerçimekê rûyê dayîkên me wê kîngê bêne hildanê?

Kîngê dujmin ji me vegere, kîngê dayîkan bi dilekî şa, bi çavên ziha barê ewledên xwe xar.”

Xewna dayîkê û şîrovekirina wê jî di mêjûyê xwe ra derbaz kir:

1 şêrwazî: wekî şêra.

2 azadar: azadker.

3 reşeve dihat: ber bi tarîbanê diçû, tarî diket erdê.

4 ruz: rizq.

5 zol zol bibûn: parçeparçeyî bûn.

“Lawo, Xwedê xêr ke, min îşev xewnek dîtiye. Min dît ez ber çemekî me, desmala destê te dişom. Desmal ewqasî qilêr bû, meriya nedixwest ewê bide destên xwe. Min ewa kever kir. Lawo, av ronahî ye, lê desmal...”

Erê, dayîkê can, dayê, te xewna xwe çawa cî bi cî şîrove kir. Av ronahî ye. Hindik mabû îro ez xwîna dayîkekê birêjim. Lê min ew aza kir.

Azayî ronahî ye. Lê desmalê ra girêdayî te nêta xwe neanî serî.

Vê sibê ez bi lez bûm. Qe rind nuqî nava xewna te nebûm.

Dayîke, bihêle pirsra desmala desta, ez şîrove kim. Desmal ew welatê me ye. Destê neyaran da qîrêc girtiye, zarezar e. Bona ewa bê keverkirinê, bê azakirinê, bi hezaran yên mîna min gotî çekan hildin, di riya we da nêçîrvaniyê bikin, ewê ji gava neyar ya hesin aza kin, ne ku bên, bibine kuştîyê heywanê bê zar-ziman. Dayîkê, şervanê me kurdan çendî çend cara hatine mala me. Gellek cara te nanê para xwe daye wana, şev birçî razayî. Tu şev-ro dibêjî, ez heyrana wana bim, kevirê piyê wan dikeve, bila serê min keve. Lê gava ewana dibên:

-Dayîke, bila Ardan bê bigihîje me. Hindik dimîne tu wana ji malê deroder kî.¹

-Na, bila Ardan ber çavên min dûr nekeve.

Lê gava du salan, sê salan ev hukumeta xwîna neheq rêtî, me ewleda dibe eskeriya xwe, hûn dayîk dengê xwe nakin. Ewana me dibin, çeka didine destê me, me dişînine ser birayê helal, dibên lê dîn, wana bikujin, ew dujminên me hemûyan in. Her Xwedê zane kî dujminê kê ye? Dayîkê can, bila dengê min bigihîje te. Jiyanê da tenê şaşiya te ev e. Rind bizanibe, min tifinga xwe ye neçîrvaniyê hûrxwaş kir. Îro da ez ê çeka azadariyê hildim.”

Bi van ramanan va Ardan ji “Şikefta Xezalan” dûr ket. Êpêce erd qevz kir.² Ew hindik mabû bigihîje daristanê bintara gundê wan, riya xwe guhest, kete şiverêkê. Ewî rind dizanibû ew ku da diçe.

1 deroder kî: derxînî û biqewirînî.

2 qevz kir: bi ser re gav da.

Dîsa xwe xwe ra kete mitalan: “Ev şiverê yê min bibe derxe bal şervan-azadaran. Riya wana ya siba geş.

Eva du salan zêdetir e ewana min ra dibêjin, tu yê zû, yanê dereng bêyî têkevî riya me, min boy xatirê dayîkê dudilî dikir. Lê çima dayîkê wan tune? Çima dayîkan ew neanîne? Welle, xezalê bi kirina xwe va carekê va çavên min vekir. Min rind tê derxist ewê xof pêpes kiribû. Boy parastina kara xwe sîngê xwe dabû ber gulla min.

Hêsirên xwînê ye ku, ewê dibarand, ne bona ruhê xwe dibarand, lê boy ewleda xwe.

O, dunyayê!

Dujmin him bûye xwedanê hebûna welatê me, him xwîna bi hezaran kesên me dide rêtinê, dayîkan bi çavhêsir, bavan piştîkûz¹ dike, zaran sêwî ber dîwara dihêle, dîsa hinekê me, ber wana serê xwe xar dîkin.

Na, bes e, ev serî ye, ev oxir e.”

Ardan wedekî xurt şiverê ra çû kete kûraya daristanê. Çend xortên bi çek-req derketine pêşiya wî.

Ewî dest xwe da² tê derxist ewana şervan in. Şa bû.

Ji wan yekî ew nas kir.

-Ardan, -ew berbirî wî bû,- nêçîrvan bê nêçîr dibe, lê çawa gel gotiye:

*“Zozan bê kon nabin,
Çiyayê bilind bê berf nabin,
Geliyê kûr bê av nabin,
Nêçîrvan bê çek nabin.”*

Kanê tîfinga te?

Şervana dora wî girtin û bê sebir hîviya bersîvê bûn. Ardan ji xewna dê dest pê kir, qewmandina xwe û xezalê bi zimanekî şîrîn, cî-cîna bi posîde qal kir. Dawiyê da meremê hatina xwe jî anî sar zara. Wana rûyê hev nihêrîn, him jî hal-hewalê xezal û karxezalê dilê xwe ra derbaz kirin, ketine xemxuriya wana.

1 piştîkûz: piştîhotik

2 dest xwe da: demildest, derhal.

Yeqîn vê yekê, vê seqirtiyê wê pirr bikişanda, wekî du azadaran hev ra gulle neavîtana hewa. Ji gullen avîtî dûmana dilê gişkan kişiya.

Ji şervana yê payedar nikî Ardan bû, destê xwe dirêjî wî kir û got:

-Navê min Rohat e.

Şervanên dinê jî yeko yeko hatin destê xwe dane Ardan, hev ra bûne nas.

Paşê Rohat bi dengekî fermanndan got:

-Ardan bibin deste şal û şapik lê kin.

Berfê hûr hûr lê dikir. Bedewetiya xwezayê hiş-sewdayê mirovan dibir. Hewake zivistanê ye xweş bû. Tariyê jî perda xwe dikişande rûye erdê.

Şervanek û Ardan pêşiyê diçûn, yen mayîn jî pey wan dihatin. Wana dor-berê xwe mêze dikirin. Rêça piyê ruhberê hov li ser berfê neqîş neqîş dihatine kivşê. Nêçîrvanê pispor Ardan disekinî, dewsa wan dinihêrî digot:

-Eva şopa lepên gur e, eva ya şêr, piling e, lê ev rêça karî karî ya kêwrîşkê ye.

-Erê, nêçîrvano, -partîzan bersiv da,- xwezila van rêça, van dewsa, ne ku rêç-dewsa dujminên me. Tu ji vê pê va dewsa lepê terewilan negere, dewsa piyê nexastiyên me bigere. Ev welatê me yî bedew-dewlemend kirine dava¹ xwe bernadin.

-Em ê bidine berdanê!

Ardan ev sê gilî usa bi kîn-buxs, bi teqil got, xwe lerizî.

Şervan êpêce erd hatin. Riyên xaromaro ra, ser kevir-zinaran ra derbaz bûn û li derekê sekinîn.

-Kerem ke, -partizan got,- Ardanê bira, têkeve hundur.

Ardan dor-berê xwe nihêrî û xwe ji xwe pirsî:

“-Ez tekevime kî derê?”

Şervan ev yek derz kir û xwe kete pêşiyê, du-sê gav avîtin û ewa-

1 dav: dafik, tele, kemîn.

na ketine şikefteke bi ronahî, yeke şûştî-mûştî. Hundur mîna odeke mêvanan xemilîbû. Ardan ser vê yekê çarçe'vî bû.

Hetanî hatina şervanên dinê Ardan deste şal û şapik xwe kir.

Xênî ji çend şervanan yên mayîn hatine şikeft-odê. Ewanên der-va mayî dûrî hev, dûrî hev di dorevaniyê¹ da sekinîbûn.

Rohat ji sêrî hetanî piya bejna Ardan mêze kir û got:

-Hunerê te bibe hunerê şêran.

Îro şal û şapik li bejna meran.

Azadar gişk hev şa bûn, pey hev, pey hev Ardan pîroz kirin! Şa-bûna per-baskê Ardan tunebû, wekî bifire. Vê demê Ardan berê xwe da Rohat:

-Ez ê hîvîkê ji we bikim. Destûrê bide bila hevalek here gund, dayîkê ra bêje, ez îro da neçîrvanê azadariya “Şikefta Welêt” im. Bila çavên we li rê nemîne. Ew ê hew bizanibe qeziya hatiye serê min.

-Ardan, -Rohat got, -qe şewişîna nekişîne². Naha şervan dayîkê ra qewimandîna îro dibêje.

Jiyana serê çîyan didomî, şerkariya boy azayê dimeşîya. Dîsa zivistan bû. Ro da ba-bagerê tev dilûbandin³; berêvarê ne ba bû, ne bager. Erşê ezmîn barê xwe li rûbayê erdê reşandibû, naha sayî bû. Te hew dizanibû ew goleke hêşîn e. Xweza bibû sazband û bi kovanî⁴ miqamên cihê cihê, yên usa lê dida, yekê ya mayîn nediwekiland.

Evê sazbandiyê berbîn⁵ ruhê şervanên ku derva çek li destan mîna parêzgerekî di dorevaniya welêt da sekinîbûn, nûh dikir, bala her yekî ber bi xwe dikişand.

1 dorevanî: nobedarî.

2 şewişîna nekişîne: xema wê yekê nekişîne.

3 dilûbandin: gujeguj û vizeviz dikirin.

4 bi kovanî: bi xemgînî.

5 berbîn: nefes.

Rohat bi çend şervana ra hema hêcika ji vê ruhdariyê qetiyên hatine hundur. Ardan jî nava wan da bû. Ewana ji spartineke gel-lekî ferz bi serfîniyazî vegeyriyabûn.

Ew çendek bû neyaran dizînkî va çekdarên xwe li jêrê dicivand. Bintara çiyê qeleçe¹ çêkiribûn. Şervanê kurdan roja roj bi hatina wan hesiya bûn. Lê ji jor teme hatibû dayîne dijî wana tu ewlekarî neyê kirinê, hetanî şanîdanî² neyê dayîne.

Sedem? Sedem ew bû, wekî bila dujmin hemû hêzên xwe bicivîne, paşê bi carekê va erîşî ser wan kin.

Di aliyê dinê da tivdîr dihate kirinê. Li quntara çiyê binê çend zinarên mezin hatibûne kolandinê, aliyê çepê û rastê şervanan girtibû, pêşî jî li wan hatibû stendinê. Azadar bi mêranî hîviya ferman-darên xwe bûn.

Ew weke salekê bû, wekî Ardan mîna bi hezaran şervanan şalşapik û çek li bejinê, şerkariya azaya axa welatê xwe dikir.

Şervanên ku ji spartinê vegeyribûn, bîna xwe stendibûn, dest-xan vekiribûn nan dixwerin.

-Ardan, -Rohat got, - eva salek e tu hatî nava rêza me. Şîre dê ra tevayî, nanê şervanan jî li te helal be!

Ardan pariyê devê xwe cûnê şûn da kêlimî:

-Zehf spas! Ez qurbana wê rojê me, ku hatime nava şervanan. Nava vê salê da ez hînî gellek qîlêriya neyaran bûm. Lê hêsiyên xezalê qe ji ber çavên min naçin.

-Erê, birao, -Rohat berê xwe da wî, - lê eva çendî çend sal in neyarên me kurdan ji çar aliya da, ji çavên dayîkên me hêsiyên xwînê diherikîn, qe kes heyfa xwe bi wan naynin!

Şervanên mayîn şîrîn şîrîn him nan dixwerin, him guhên wan ser axaftinê bû.

-Gelî birano, -Ardan bi dilşewat axifî, - ez ser pirsekê nasût mame. Em çima şerkariyê dikin? Em çî dixwezin? Em dibên, destûre bidin bila dayîkên me ewledên xwe ra bi zimanê xwe bipeyî-

1 qeleçe: çeper, mewzî.

2 şanîdanî: îşaret, ferman, talîmat.

ve. Binihêrin dayîka kurd, çok dide erdê ewledan tîne, bi şîrê xwe dimêjîne, dixweze bi zimanê xwe wî ra, wê ra lorî, de lorî, lorika min bêje, neyarê me dibên: -Na! Lê lê, kurdê, ewleda weyne¹, şîr bidê, mezin ke, lê bila bi zimanê min biaxive! Yanê na, ez ê hêsirên xwînê têkime para te!

Ji van gilî-gotina helana² mêrxasan, hewariya dayîkan hate şervanan.

Vê weşê ewana amade bûn herin text-tacê neyaran welgerînin, bişewitînin. Ji pêşmergan yek kelimî:

-Birao, tu mîna helbestvanekî derdkêş diaxifi.

-Belê, keko, -Ardan axaftina xwe domand, - em gişk helbestvanê derdkêş in. Bihêlin ya dilê xwe gişkî bêjim.

Hemûyan hev ra hev ra:

-Kerem ke! Fermo!

-Wê rojê ez dordariyê da bûm. Xwe ra ketime ramana. Min xwe xwe ra got: “Wedê xezalê kire kalînî, karxezalê kire mikemik, pêwîst bû min ewana bigirtana, xezalê ra bigota têke “oreor” “paşê ez ê te berdim”. Axir, min ew post kira jî, ew ê nekira “oreor”, ew ê bi dilê xwe, bi zimanê xwe bikira kalînî. Naha ez pirs dikim: Gelo ev neyarnexastiyê me vê yekê nizanin, yanê fem nakin? Na, ewana him rind zanin, him rind fem dikin. A ya dilê min ev bû, gelî biran!

Rohat dîsa tevî axaftinê bû:

-Te hemû tişt rind qal kir. Lê bîr nekin bi lavayî, bi hîvî dujmin nayê rayê. Riya neheq xwe ra kiriye “heq”. Hetanî dujmin zorê nebîne, ewê ya xwe bike.

Naha, hûn gişk rind guh bidine min. Rabin hinekî razên, îro ferman hatiye dayînê, wekî sibê êrişî ser dujmin kin. Xwedê hez bike, em ê dujmin di lana wî da bixeniqînin.

Ewî her şervanek ber çavên xwe ra derbaz kir û tê derxist tu kesek natirse, lema jî dûmayîn³ da axaftina xwe:

1 weyne: bîne.

2 helan: olan, deng û gazî.

3 dûmayîn: berdewamî.

-Ardan, rabe razê, hindikî xezalê bîr bîne. Ez ê wedekî şevê te ji xewê rakim û spartineke dijwar bispêrime te.

-Ser çavan! -Ardan bi te'limî¹ bersîv da.

Wê şevê hemû şervan nerehet bûn. Ewana ketibûne xemxuriya wê yekê, sibê çawa bikin piyê dujmin ji axa welêt bidine birînê.

Lê Ardan dilê xwe ra ew yek derbaz dikir, ku nişkê va spartineke usa bispêrine min, ez ewê bi serfiniyazî neqedînim, pêwîst e serê xwe bidime ber gullan.

Ji nîvê şevê êpêcek derbaz bibû. Rohat nêzîkî Ardan bû û bi dengê nimiz² got:

-Mêrxaso, rabe!

Çend deqîqa şûn da her du jî derketine derva. Rohat destê xwe stuyê Ardan ra bir û spartin da wî:

-Vê sehetê xwe bigîne geliyê "Heylo". Hinda bihurê "Bûkê" tofe³ pêşmerge yê hîviya te bin. Serekqumandariyê ew ewlekariya aliyê rastê spartiyê te. Tu wan dera rind nas dikî. De here, te ra oxir be!

-Zehf spas!

Ardan pey van giliya ra nava tariyê da minê bû.

Ardan gihîştinê geliyê "Heylo" rastî şervana hatinê hê kew di-kete sibê. Ewî nava çend deqîqa da fermana xwe da, şervan li ciyên pêwîst da cî-warkirinê. Usa kir, çawa dibên, re-dirb li dujmin da birînê. Vê qasê guregureke usa hate bihîstinê, te hew dizanibû çiya hedimiye jor da tê.

Ardan ber xwe da kenîya. Ewî zanibû, ew zinarên, ku çendekî berê binê wan hatibûne kolandinê, dema wan hatiye.

Şervanan bi-navbirîn yek pey yekê hol dikirin. Ew zinarana ser riya xwe kevir-zerên mayîn diketin; ji wan derbaz bûnê, pey xwe sêlafa qiracan⁴ dihanî.

1 bi te'limî: li gorî rêzikên leşkerî.

2 nimiz: nizam.

3 tof: yekîneya leşkerî.

4 sêlafa qiracan: lehiya kevir-kuçikan.

Dujmin firêqet¹ razabû.

Ewana wê demê bi xwe hesiyan dema ew zinarên mezin li zezinaran, kevir-beran, kuç-berikan diketin ji wan pirîsk dibarîn.

Guregurê wana, qirçeçiqirça gullên partîzana tev hev bibûn. Bibû hewêrze.

Dujmin nizanibû erd diheje, yanê erşê ezmîn hatiye erdê va zeliqîye.

Saw, qurf ketibû dilê her yekî, bi hovnakî hev ketibûn. Hinek berjêr revîn rastî gulla hatin, hinekan ber bi rastê, hinekan ber bi çepê lezandin, lê laşên mirovên xwe ber çavên hev didîtin, diricifîn.

Evê rewşa dujminê bi heşir hetanî ro dagere kişand. Ew yek hate zanînê ji dujmin ew kes ruhber bû, yê ku ji mala xwe derneketibû.

Seqirtiyê navberî hingavtibû. Dûmaneke kulavî erd di nava xwe da pêçabû. Vê weşê serekqomandariyê ferman da, wekî her serkarên tof-destan, desta xwe bicivînin, binihêrin çiqas mirî, birîndarên wan hene. Birîndar û laşan hildin veqerine ciyê xwe!

Ji tofa Ardan du kes hatibûne birîndarkirinê, şervanek tunebû.

Hevalên wî gotin, wekî du seheta berê ew li bintara “Şikefta Xezalan” dîtine. Ardan fitilî ser dewsgirtiyê² xwe û ferman da:

-Tu birîndaran bide hildanê, herine ciyê me. Ez ê pey we bêm!

Tof rêketinê şûn da Ardan boy şervanê nehatî dîsa xwe da “Şikefta Xezalan”.

Hinekî çûnê şûn da rastî dewsa piyan hat. Ew kete wê rêçê, gav bi gav diçû. Berfê hewber hewber lê kiribû. Çûyîn dişwar bû. Lê serê wî ber da bi çapik³ diçû. Nişkê va gullek hate avîtinê. Ewî bi gef-gur⁴ dest avîte qirna ber xwe û mirovê pêşberî wî veleziyayî da ber gullan. Destê neyar sist bû û qirna wî kete ser berfê. Ardan xar bû nihêrî hêta wî xwînê hildaye. Ew rûnişt. Dest avîte şelê xwe, ciyê gulle lê ketibû, hinekî qelişand, wekî birînê bivîne û çareserîkê bike.

1 firêqet: dilrehet û bêtirs.

2 dewsgirtî: cîgir, fermandarê alîkar.

3 bi çapik: bi zîrekî, zû bi zû.

4 bi gef-gur: bi awayekî lezgîn.

Ewî dor birînê vekir. Dît gulle hêtê da maye. Hoşeriya xwe ji kêlîn derxist û xwest bi nukulê wê gullê derxe, çavên wî reşeve hat. Ew ser piştê ket. Hey pertav da xwe¹ rabe, tişteke derneket. Bîn lê çikiya, hiş ket. Roja zivistanê ye kurt ciyê xwe da şeva wê ye dirêj. Sur-sermê hêdî-hêdî gewdê Ardan ditevizand, xwîna wî diqerisand. Ne dê bû dû-dermanekî çarekê-hasil ke, ne xûşk bû ber sêrî rûnê, serê wî bide ser çoka xwe, ne bira bû dest-piyê wî mizde, ne bav bû birînê girêde. Her tenê pišta wî li axa welêt e bê serobin bû.

Wedekî şevê germayî hate Ardan. Xwîna wî ye cemidî fitil da. Hiş hinekî birî, lê hê mîna dûmanekê tarî bû. Demeke xurt derbaz bû, hiş yekcar hate damilandinê. Ewî ew yek derz kir, wekî birîn diêşe, him jî tu qey dibêjî, yek wêya dixurîne. Aloşê bedena wî hildaye. Pišta wî jî diêşiya. Ewî xwest ji ser piştê vegere ser kêlekekê, hêz da xwe, lê birîna kûr, qeşa li erdê ya xwe kiribûn. Ser piştê kincê wî qeşê va zeliqîbûn. Hêdî hêdî kew dikete sibê.

Zertav dibû.² Ardan jî, ji jan-êşa êvar da hinekî dûr diket. Sibeke zivistanê ye tavzer bû. Him xwezaya zivistanê, him ruhberên çiyê seranser hişiyar bibûn. Her tenê Ardan xwe xwe ra şerkarî dikir, rabe. Guhên wî hemû deng-hes dibihîst, hulmeke germ hey rûyê wî diket, bîneke xweş dihate wî. Nîşkê va bawîşk hatine wî. Ji wê kel kete çavan, birû ji hev qetiyar. Ronahiyê xwe avîte dunya wî ye tarî.

Çavên xwe vekir. Siyê xwe avîtibû ser wî. Tirpînî³ kete dil. Mêze kir ku xezalek birîna wî dadilêse, yek jî nikî wî sekiniye.

Ser vê nebîniyayê⁴ şaş ma. Nêrînê awirê wî û yên xezalê hatine ser hev. Azadarekî li azadarekê dinihêrî. Ardan çavên xezala par azakirî nas kir. Çavên bi hêsirê xwînê, îro şewq-şernal didan. Ewî hêz da xwe rabû. Xezal ji wî dûr ketin. Karxezala par weke dê bû. Ardan hemû tişt bîr kir, şa bû.

Ewî dora xwe nihêrî. Dewsa piyên xezalekê çaralî ser hev, ser hev hatibûne avîtinê. Yek bintara piyê wî sekinîbûye. Çaven wî fi-

1 pertav da xwe: hêz da xwe.

2 zertav/tavzer dibû: zerekiyên tavê derdiketin.

3 tirpînî: terpeterp, gulpegulp

4 nebîniya: tiştê nedîtî.

şenga gullekê ket. Birîna xwe mêze kir tê da gulle tunebû. Ardan hê tê derxist, wekî ew hiş ketinê şûn da xezal hatine ser wî. Yekê hetanî berbangê birîna wî dalastiye, mîna hekîmekî destemel, bi zimanê xwe va gulle ji birinê derxistiye, yekê zivir zivir pî avîtiye, sekiniye, bîna xwe ye bi hulm-gulrî daye ber bîna wî.

Ardan ketibû ramanên kûr. Qewimandinên qewimî dilê xwe da hildida, dadixist. Hema vê çirkê du azadarên welêt rex wî ra derketin. Yekî ji wana hê dûr va çêpilen xwe fire vekir û ber bi wî revî, ew hemêz kir.

-Birao, -ewî bi dengêkî şa kire qîrînî, - tu pey min hatî, van dera asê bûyî, em jî îşev hey¹ li te geriyane.

Pîrsa Ardan e yekem bû ev:

-Çima tu ji heval-hogiran qetiyayî?

-Dujminekî gewdemezin², te qey digot, ev derana rind nas dikir, ber bi şikeftan direvî, ruhê xwe xelaz ke. Min da pey wî, ew çû, ez çûm. Min kire firsendê, gullek bere eniya wî da, paş da vegeirîm. Paş da vegeirîne min riya xwe guherî, min go bi riya kurt herim. Ez xalifîm.

-Birao, careke mayîn tiştê nîvcî negire. Ew gapêran bi gulla te nemiribû... Naha guh bidine min ez ê wera hemû tiştî qal kim. Lê berê birîna min girêdin.

Birînê nihêrîn. Şa bûn. Birîn newerimibû. Xezalê li wê loxmanî kiribû.

Wana Ardan nava hev ra kirin û ber bi ciye şervanan rê ketin.

Rê da Ardan qewimandin ta-derziyê ra kir.³

1 hey: her.

2 gewdemezin: laşmezin û qerase.

3 ta-derziyê ra kir: wekî tayî ji derziyê re derbaz bike şîrove kir.

XWÎN BI XWÎNÊ

Qijejja germa havînê bû. Rojên awa¹ li bajêr hewa dubare germ dibe. Hulm-gulma riyên bi qîr-qetran, duyên zavod, fabrîk û yên maşînên bêjimar, bîna bēnzîn-neftê tevî hev dibin û hewê daha jî² giran dikin. Ew dixitime...

Danê nîvro bû. Neviya min nexwaş bû. Dunya li serê min teng bibû. Dermannama³ doxtir destê min da û bēgav mam derketime kolanê, herime dermanxanê. Te hew dizanibû bajar kirine beroşeke mezin e bi hezar çemilî, dane ser heftê heft kuçikan kelandine. Kînekîna erd û esmîn bû.

Dermanxana here rind çend sed mētran dūrî avayê me bû. Nava avayê me û dermanxanê da pireke mezin hebû. Çawa dibên, min peya da ser rê. Ji ber ku bi maşînê gotî rêke dirêj biçûyama, fitil bida, hê bihatama dermanxanê.

Germê wê deqîqê li min zor kir. Min xwe xwe ra got: “Pêwist e bilêzînim xwe bigihînime pirê. Wira bin siya wê da hinekî bisekinim, bîna xwe bistînim, wê wê da rê kurt dibe.” Serê min ber min da bi lez çûm û xwe gihande bin siya pirê. Pire, pireke ber e dirêj û bilind bû. Ser ra riya hesin bû, tirên derbaz dibûn; bin ra maşîne.

Ji rê wê da, bingaha pirê da, him aliyê çepê him aliyê rastê, deviyên beyanî⁴ pê da pê da hatibûne nikandinê.⁵ Serên wan li baniyê pirê diketin. Devî bi lêlavkê mîna nexşekî hatibûne rûgirtinê.

1 awa: wiha, wisa.

2 daha jî: bêhtir, pirtir.

3 dermanname: reçete

4 deviyên beyanî: darên biyanî.

5 nikandin: çikandin, hêşînbûn.

Min him rewşa pirê dinihêrî, him xwîdana eniya xwe paqîş dikir.

Ji germê maşîne jî kêr dihatin-diçûn. Vê lezê dengê pisîkekê, mewemewa wê kete guhên min. Min mêze kir pisîkeke reş e gir wî alî, nikî devîyan tiştek kiriye devê xwe diçû. Çivteçivta çivîkekê jî li min tesele bû. Ser serê pisîkê ra beytîkekê fitil fitil dida xwe, diçû-dihat, Herê carê dengêkî cuda cuda derdixist û di nava vî dengî da him hewar-gazî, him lavayî him şîn-girî hebû.

Pisîkê ew tiştê devê xwe cû, daqurtand û bi lez qulozî jorê bû, lêlavka stûr, sixt vir da, wê da kir, kete nava devîyan.

Êmê çend deqîqan şûn da ewê xwe avîte erdê. Dêv da tiştek û mîna kelbekî¹ dikire miremir. Vê carê dengê beytîkê usa bi zelûlî guhên min da pêrde pêrde hat, te hew dizanibû dayîkek li ser laşê ewladê xwe dilokên şîne dibêje.

Ez ji vî alî pirê, derbazî aliyê dinê bûm. Gava ez gihîştîme wî alî pisîkê nêçîra xwe daqurtand, dîsa bi bayê lezê ser çiqilên devîya ra hilperikî banê pirê bû. Ewê xwe jor da avîtinê erdê min dît dêv da çêjeya² beytîkê heye. Pisîkê hema li hewa çêjek xeniqandibû. Min hê tê derxist beytîkê li jorê, li arîkê pirê hêlûna xwe çekiriye, çêje derxistiye.

Xwedê dizanibû heta vê gavê pisîkê çend çêje xaribûn. Naha serê çêjeyê kiribû devê xwe û serê xwe vir da, wê da ba dikir. Dihate kîvşê îdî pisîkê têr xariye. Nêçîra devê xwe nedicû.

Ewê bi nêçîra xwe dilîst, şa dibû. Çend çêje xaribûn, xwîna wan mêtîbû, naha jî ketibû “reqasa” kirinên xwe ye xaxreşî.³

Pisîkê carina serê çêjeyê ji devê xwe derdixist, laşê wê dikire nava lepên xwe ye pêşîn û bi pencirûkên xwe va digivişî, xwîn derketinê, bi zimanê xwe dadilast, paşê ew lepên xwe ser xwe ra davît, zû digihîştê ew “nexşên” xwe diwekiland. Nava vî wedeyî da beytîkê xwe dipêritand. Lê xema pisîkê nîbû. Ber çavên dayîkê ewledên wê xweribû; naha jî têr bibû, lê ji dexesiyê, çavtêrnebûnê dest vene-dikişand xwîna çêjekê dimêt.

1 kelb: kûçîkê nêr.

2 çêje: têje, têjik.

3 xaxreşî: rûreşî, telaqreşî.

Evê dîdemê ez lerizandim, tevziya ez hingavtim. Germa havînê li min bû sur-serma zivistana bi şexte. Şeqeşeq dev-diranên min ketin.

Weşekî şûn da min tê derxist xwîna tamar û deremên min qerimiye. Lipitandin bi min nedibû saweke giran ketibû ser min. Min dixwest alîkariyê bidime beytikê, lê îdî pisikê qetilkariya xwe kiribû. Hêlûna beytikê ya ku ewê bi hezar cefayî mina nexşekê hûnandibû, xirab kiribû, ewledên wê xweribû. Ez bibûme mirovekî bêgav.

Bibûme yeki mêzekar.¹ Min bi dilşewat kirina pisikê mêze dikir. Lê şerkariya beytikê ber çavên min bibû meydaneke şer. Ewa ji vî serî pirê, difirî wî serî, dihat qîlozî banê pirê dibû, çawa dibên, serîk hêlûna xwe ye wêrankirî dixist, ewledên xwe dihanî ber çavan, te hew dizanibû, ji Xalîqê Jorîn hêz distand, dihat êrişî pisikê bike, lê te tirê, ewa her gav rastî sûreke kevirî tê, nikare wêya derm-dax ke.

Mêzîna wan e kaşekaşê ne weke hev bû. Lê kîn-buxsa dayîkê, dilê bi germ, bi cul'et dem dem dixwest wêya bifetisîne.

Xwînê çavên pisikê girtibû. Tişteke ber çavên wê nedihate kivşê. Dunê ya wê bû. Bi dîtina pisikê berayî û dirêjaya dunyayê ji bingeha devîyan hetanî hêlûna banê pirê bû. Hêz û giraniya gerdûnê weke çêjeya nava lepê wê da bû. Goşt xwerîbû, xwîn mêtîbû, dalastîbû û bibû yeke altnebûyî². Bin da xalî-xalîçe, ber serî balgiyê tûkê, ser textê zêrîn veleziyabû û steyrka xuliqandina xwe dihanî ber çavan û xwe xwe ra digot: “Ca binihêrin, nava hemû steyrkan da, steyrka min him mezin e, him giran e, him bi şewq-şemal e. Tu dest nagihîje steyrka min, tu perde nikare ber şemala wê bigire.” Vê weşê pisikê esse xwe ra digot: “Lema tu kes nikare piştî min erdê xe.”

Ger naha min ji erdê kevirek hilda bavîta wê, ewê hilperikiya rûyê min. Ji ber ku, heta naha ewê ewqas hêlin hilweşandibû, ewqas goşt xweribû, xwîn mêtîbû, dilê xwe da bibû yeke nemirî.

Mirin qe nedikete bîrê.

Pisik ewqasî nêçîra xwe ra leystibû, westiya bû. Naha ser kêlekekê veleziya bû, laşê çêjeyê kiribû nava her du lepên xwe ye paşîn,

1 mêzekar: temaşevan.

2 altnebûyî: serkeftî.

nazdar nazdar bi zimanê xwe çavên xwe “dişûşt”. Carina jî tîmar dida pirça xwe.

Nava vî wedeyî da beytik weşekê nedisekinî. Baskên xwe hev dixist, hey ser serê pisikê ra difirî, dikire hewêrze. Carina nizm difirî, lê qe xema pisikê nîbû. Dilê dayîka ewledundakirî, hêlûn wê-rankirî dipiritî, dişewitî, dikizî.

Ewa jor da ser pisikê da mêl bûnê, te digot, wexta¹ pisikê cî bi cî bifetisîne, paşê wêya bide ber nukula qulqulî bike. Bayê baskên wê pirça pisikê ji hev dikir. Erê, ser ecebekê jî pirr pirr posîde bûm. Tu teyr-tûyekê dengê xwe nedida dengê beytikê. Nedibûne şîrikê bobeleta wê.

Dayîk dîsa çarnikal ser pisikê ra firî. Paşê cend cara dirêjaya pisikê ra firî û nizam çima pisikê boçika xwe hilda erdê xist, serê xwe hinekî bilind kir, careke dinê hêmin veleziya. Min tê derxist beytikê boçika wê nukul kir. Beytikên mayîn jî bê xem vir da, wê da difirîn: Vê gavê min dilê xwe sot: “Xwedê tu kesi bê pişt, bê cî-war neke. Nehêlê hinekê bihêz, hinekê xwînmêt bona nefsa xwe hêlûnan hilweşînin, ewledan xêzke, dayîkan bi çavhêsir bihêle û paşê qure qure simêlen xwe badin û bêjin: “Ev erd û esman ya me ye.” Pisîk nava dunya xwe ye altindariyê da bû. Naha jî nêçîra xwe danibû bin serê xwe, qe tişteke talaşa wê nîbû. Veleziya bû, banê pirê mêze dikir, hêlînê nûh digeriya, wekî rabe wana jî wêran bike. Lê nişkê va...

Lê nişkê va beytik mîna bahozekê hat ji min derbaz bû û wê demê pisîke dengêkî usa lerizî derxist, ez veciniqîm. Min dît pisîk çawa ji ciyê veleziyayî quloz bû, careke mayîn hate erdê, ser hev ser hev, kêlek kêlek welgerî hate ser riya şossê.

Vê lehzê maşînek bi lez wê da hat, ser her du piyên wê ye para va² derbaz bû. Pisîkê dîsa kêlek kêlek xwe welgerande ser hev, ber bi binê pirê, ber bi aliyê hêlûnê hat.

Li ciyê veleziyayî kire meyomeyo. Ez hatim ser wê ra sekinîm. Min dît çavekî wê bi xwîn e, her du piyên paşîn hêtê da perçiqîne.

1 wexta: a niha, hema niha.

2 piyên wê ye para va: piyên wê yên paşîn ve.

Ez ser wê da mêl bûm, min rind tê derxist, wekî beytike bi nukulê xwe va bîboka çavê pisîkê rijandiye.

Ewe du-sê cara devê xwe vekir, qîlen wê ye bi xwîn îdî ser hev da nehatin.

Ez ketime ramanên kûr: “Way dunyayê! Xwezila neheq timê awa xwîna xwe da bimewicin.¹ Paşiya gotiye: “Xwîna neheq erdê namîne.” Lema jî xwîn peşîkî² pisîkê.

Tebaxa sala 2002a

1 bimewicin: bigevizin.

2 peşîkî: bijiqî, bijiya, lê geriya.

DEVA SIPÎ

Mirov gewlazê salan ser xwe ra derbaz kirinê, esse rojên bihurî, cuda, zarotiya xwe bîr tîne û ya ecêb ew e, wekî ew salana reş bin, yanê sipî bin, firqî tune, tu xwezilbûna xwe wana tînî û xwe xwe ra dibêjî: “Xwezila wan salan, xwezila ez dîsa zaro bûyama!” Naha, wedê rêzên salan ser min ra hatine, çûne, derbaz bûne, gava gopal didime destê xwe, carina ser piyê rastê, carina ser piyê çepê dixingirim¹, giran giran rê diçim, xwezilbûna xwe salên zarotiya xwe tînim. Welleh, billeh zarotiya min ne bi gul bû, lê bi kul bû.

Ji rûyê neheqîya dewrê em, çend mal-malbetên kurdan pey deroderkirinê ra hatibûn fêrmeke kolxozekê da ketibûne ser kar. Du kerî pezê kolxozê, garana dêwêr, revoyê hespan û devan hebû. Min car caran dibihîst mezinan hev ra digotin:

-Me jiyana xwe da qe deve xayî nekirine. Ewana nebîne bela serê me, her tişt ê qenc be.

-Lo mal avao, deve ji heywanê din daha sernerm in.

Yekî digot:

-Lê kîna devan?

-Mirov, neheqiyê li devê neke, deve bi kîn nabe. Gotine: “Deve giran e, rabûye ser hêkê, hêk neşkestiye.”

Min usa rind guh dida van nêta, tu nebêje, çendek ê derbaz be, ez ê bibime xemxurkêşê devan.

Fêrma ji gund-kolxozê çend kîlometroya dûr bû. Fêza fêrmê rêzên gir-topikan bû, bintarê rast-best bû. Ew ciyê bajona² heywîn û

1 dixingirim: dikulim.

2 bajon: çêregeh.

zeviya bû. Li wir, ceh, genim dihate reşandinê. Lê li bintara topikan bostan dihate avîtinê: şîrînaya zebeş, kindor, xiyar, pamîdorên¹ wê derê ji tehma devê mirovan nediçû. Ew bejî bûn². Xwezaya vê derê bi ecêb bû. Her çar demên salê him bayê gur, him bayê nerm dihat. Havînê kînekîna tavê bû, diqijiland. Şev hewa dişkest, hênîk dibû, destê berbangê qiraviyê davîte der-dorên topikan.

Li fêrmê ji zarên girik, hetanî mêrê mezin şivantî, gavantî, revovantî³ dikir, jina jî bêrîvanî. Ez 9-10 salî bûm. Çîrpîke germeşoyê⁴ da-bûne destê min û min revovantî li devan dikir. Rind tê bîra min deh deve û du-sê kudikê⁵ wan hebûn. Pêşê min⁶ ew bû ku nehêlim deve têkevîne zeviyan, êvara dereng jî wana bînîme mexel. Xêncî Deva Sipî, gişk ber kap-singê wan hetanî berbangê dihatine girêdanê.

Nava deva da devek hebû, pûrtik-hiriya wê qerqas-sipî bû, lema jî jê ra digotin: “Deva Sipî”.

Deva Sipî ji devan gişkan mezin, gir bû. Mexel hatinê, mirovan dûr va ew mêzekirinê, te hew dizanibû kerî pez li guharê mexel hatîye. Rojên ewlîn gava Deva Sipî ji ciyê xwe radibû, sim-lepê xwe ye pencavîti datanî erdê, hûrik -hûrik meşîyanê, min tirê hej çiyakî bilind ketiye, him jî xof-tirs tijî dilê min dibû, wekî wexta erd alîkî da xar be, kelefê⁷ yê pêş da bê, ez ê tê da herime xarê.

Gellek nedîtîyên Deva Sipî, yên bi heyr-hejmekar hebûn.

Ewê nedixwest êvar êvar wêya kap kin, sing va girêdin. Evarê li guharê mexel dihat, kîngê deve berdidan, radikirine bajonê, ew jî, ji mexel radibû, deve alîkî da diçûn, ew alîkî mayîn da.

Her êvar min berê xwe dida bajonê, diçûm deve dihanîn guharê. Devên mayîn dudu-dudu, sisê-sisê, hinekî dûrî hev diçêriyan. Min ewana beravî cîkî dikir, ber bi guharê ajotinê, Deva Sipî çiqasî dûr

1 pamîdor: bacanê sor, firingî.

2 ew bejî bûn: dêm bûn.

3 revovantî: kesê ku li hesp û deveyan dinêre û diçêrine.

4 germeşo: cureyekî darên ku zû bi zû naşikê

5 kudik: têtjikê deveyê.

6 pêşê min: pîşeyê min, karê min.

7 kelefê: xaniyê xerabe.

bûya, dida pey me, dihate guharê. Min jî xwe ra kiribû edet, diçûm êpêcekî serê Deva Sipî, çavên wê tîmar dikir, mizdida, ewê jî hey ez bîn dikirim.

Roj bi roj ez û Deva Sipî hînî hev dibûn. Çi ku dikete destê min qalikê zebeşan, kindoran, nanê kûtçûyî¹ dibir û kerrekerr dida Deva Sipî.

Carekê, dema min ew tîmar dikir, nişkê va ji devê min derket: “Yix!”

Ewê wê weşê çokên xwe danî erdê, mîna avayîkî rûxiya, merixî. Ez wê siyar bûm û ewa hêdî hêdî rabû. Ez him tirsîyam, him jî min qure qure der-dorê xwe nihêrî, min go, ka binê qe kesek min dibîne, wekî ez devê siyar bûme. Lê tu nebêje, diya min e rehmetlêbûyî, derê malê sekinîbûye, li vê yekê mêze dike. Ewê kire qîreqîr û ber bi me hat:

-Rizgano, lawo, bi fesal be,² deve yê te erdê xe! Lê min qirmika devê³ bi her du desta va girtibû. Diya min ber bi me hatinê, devê jî ber bi diya min da gava. Em gihîştine himberî hev. Deva Sipi hêdî hêdî jor da hate erdê, hêmîn merixî. Diya min ez hemez kirim û bi dengêkî bergeriyayî⁴ got:

-Deva Sipî, hingî ez hatime gihîştine vî emrî, evê dunya gewrik bi derd-kula va ez bar kirime, him jî daxa du ewleda li sîngê min xistiye. Yek birçî da mir, yek tî da bihecî. Sala xelayê min yek ber dîwêr hîşt, çûme qurfê, zaroka sê salî tê ber tendûrê, jor da tendûrê dinihêre û dikebe wê difetise, yek gava em deroder-nefî kirin, rê va av tunebû, tî da kire qîreqîr û ber çavên min tî da bihecî. Deva Sipî, tu jî bi destî mirovan hey hatî barkirinê, carina mirovên bêînsaf ser-bar jî ser da dane pişta te. Îro da ez ê nehêlim te bar kin.

Ji wê rojê da Deva Sipî bû hizkiriya hemû mirovên li fêrmê.

Erê, ji wê rojê êpêce av kişiyaye, salên dirêj ketine ber hev, lê gewimandinên zarotiya min e din jî, yên ku bi tevgeliya Deva Sipî

1 kûtçûyî: rind nepijiyayî.

2 bi fesal be: baldar be, dîqet bike.

3 qirmika devê: hotika pişta wê.

4 bi dengêkî bergeriyayî: bi dengêkî tijî lava, tika û rica.

hatine serê min qe bîra min naçin. Ewana yek ji yekê hewaskar in. Ez ê ji wana duda bêjim, qal kim, diqewime hinek mirovên ku zû nan-xoya xwerî bîr dikin, yên ku bona nefsa xwe, bona kêrhatina xwe salên dostiya dirêj pêpes dikin, ser ra derbaz dibin, yên ku sîr-pîvazekê ne hêja ne, lê beqî¹ hinekê din derdikebine holê, ber gavên xwe tişteki nabînin, yên ku gavên wan ji mal-milk-hebûna dunê têr nabe, yên ku qetilê dikin, buxdana² davêjine mirovên paqîş, yên ku şera radikin, gelan bi hev didine qirê, yên ku hey dixwezin pariyê bi rûn tenê devê wan da be, belkî berê xwe bidine kirina Deva Sipî, ji wana şerm kin, serê xwe berjêr kin û xwe ra hafiyan³ derxin.

Ew salekê zêdetir bû, wekî ez miqatî devan dibûm. Nava wî we-deyî da ez hînî hemû tevgerên wan bibûm, bê şik ew jî hînî kirinên min bibûn.

Rojeke havînê ye germ bû. Me nihêrî maşînek hate fêrmê û xêncî avtoajo⁴ sê mirovên hukumetê jê peya bûn. Digotin yek sedrê şewira gund⁵ e, yek dîrêktorê mektebê⁶ ye, yek jî, ji nehiyê hatiye, lap mezin e. Wana hemû mirovên fêrmê civandine cîkî û şîrove kirin, wekî hukumeta Sovêtê biriyar pejirandiye,⁷ ku tu zarek ji mektebê der nemîne. Hate zanîne fêrmê da sê-çar zar hene, gotî yekê sêntyabrê⁸ herine mektebê, yanê na, wê serêşanê bidine dê-bavan, sedrê şewira gund jî berpîrsiyarê vê yekê ye. Mirovên hukumetê nav, paşnavê dê-bavan, yên zarên ku wê herine mektebê nivîsîn û ser hev, ser hev teme dan, hîştin çûn.

Salên bên derbaz bin, ez ê bixûnim, kar bikim, têkevime nava rewş-rêvebirina hukumeta Sovêtê û mîna bi mîlyona mirovan tê derxim, wekî alîkî da Xwedê giravî ew dewleteke xemxur e, aliye dinê da du çêlek, gak, hespek û çend pezên kê hebûya digotin tu

1 beqî: di dawiyê de.

2 buxdan: îftira.

3 hafî: şîret û ibret.

4 avtoajo: ajovan, şofêr.

5 sedrê şewira gund: serokê meclisa gund.

6 dîrêktorê mektebê: rêvebirê dibistanê.

7 pejirandiye: qebûl kiriye.

8 sêntyabr: meha eylûlê.

kûlak î, dewlemend î; ew kes, ew malbet dida nefikirinê, ji cî-warên kal-bavân deroder fikir, dida girtinê... Çawa ev çend malbetên me!

Yekîtiya Sovêtê xwedanê du baran bû. Barekî da kirinên çavgir-tonek, xwe pesinandin, barekî da ji vir-viz, derew bû. Lema ji hevtê salî şûn da hej stûnên wê ket û ew bi carekê va hilweşiya. De, lo lo lo!

Belê, yekê sêntyabrê çawa malbetên me da digotin, yekê meha neha, hat derê me birî. Em çar zar, tevî birê min î mezin berbangê ji fêrmê derketin û me berê xwe da mekteba gund.

Mekteba gund sê-çar kîlomêtran dûrî fêrmê bû. Dewsa zarên mayîn îro ji nikarim tişteki bêjim, lê min tirê per-baskê min heye û ez her bi mektebê difirim. Şabûna min li erd-esman hilnedihat. Em gihîştine mektebê. Hewşa mektebê ye fire, darên pê da pê da dor-çarmedorê çiqil bi çiqil, kulîlkên reng bi reng, zarên ku deste deste dihatin, dengê miqam, der-dor hingavî, avayê mektebê yî yekta, şibaqên wê ye sipî heyr-heweseke usa tijî dilê min kir, min xwest biqîrim, bêjim:

-Îdî ez, ji vê derê, tu dera da naçim!

Ê rastî ji xwezila wê rojê! Birê min em spartine dîrêktorê mektebê, teme da me, em bi tore¹ bin. Ew çû, em man.

Bona min rojên mektebê yek ji yekê xweş derbaz dibû. Her tenê riya me dûr bû. Car-cara zarên din menî dikirin², îro yek nedihat, sibê dudu nedihat, kî dihat, kî nedihat, min her ro riya mektebê bi şabûn dikuta, diçûm-dihatim. Dersxana sisiya da xwendinê îdî tik-tenê diçûme mektebê. Bi hewaskar ders dixand. Pey dera ra, gava dihatime mal, ez dîsa miqatî deva dibûm.

Riya mektebê hinda mexelê devan ra derbaz dibû. Devên mayîn dûrî mexel diçêriyan, lê Deva Sipî ji mexel hinekî wê da, dora riya me diçêriya. Em wê da hatinê, ewê devê xwe ji çêre derdixist û li me dinihêrî. Zarên mayîn kêleka wê ra derbaz dibûn, lê ez nêzîkî wê dibûm, min serê wê tîmar fikir û paşê diçûm digihîştine şagirtên hevalên xwe.

1 bi tore: bi edeb û terbiye.

2 menî dikirin: bihane dikirin.

Dawiya rojên payîzê bû. Şilî-şilope, ba-baran, herî-herîreşk tev hev bibûn, çûyîn-hatina mektebê dijwar bibû. Îdî ji fêrmê tenê ez diçûme mektebê. Dê-bavên şagirtên din herekê menîk derxistine holê, zarên xwe nedişandine mektebê. Ez tenê mabûm.

Her ro diya min şeqeqê ez ji xewê radikirim. Min zû zû kincên xwe xwe dikir, ser-çavên xwe dişûşt, di nava wî wedeyî da dayîkê nanekî tendûrê yî qalîn dikire çentê min, him jî min ra qûçek¹ amede dikir.

Gellek cara, wekî hebûya, hêkeke êvar da pehtî dikire nava parî nan, dida destê min, ez ji mal derdaketim. Min rê da ew qûç dixwar. Rê dûr, wede kurt, gotî wedê da bigihîştama mektebê.

Rojekê hinekî derengî ketibûm. Qûçê nîn destê min da gihîştîme devê. Devê serê xwe hilbirî, devê xwe kire mirçemirç, li rûye min nihêrî. Paşê çentê min bîn kir. Min berê xwe da wê:

-Deva Sipî, -got, - yeqîn bîna nîn avîte pozê te. Pey vê gotinê ra min dest avîte çente, nanê tendûrê yî qalim derxist û nivî kir, dirêjî devê kir. Ewê pêşiyê nan bîn kir, paşê devê xwe avîtê, parî parî ew xwer. Nan xwerinê şûn da serê xwe bilind kir, te qey digot: "Xwe-dayê Mezin, şukur vê rojê ra!" Paşê bi pozê xwe va niçande min, serê xwe kire ber xwe û ji ciyê xwe leqiya, çû.

Ji wê rojê da, gava ji mal derdaketim, diçûme mektebê, wê da ber bi guharê hatinê, min dinihêrî Deva Sipî ji guharê rabûye û hatiye ser riya min sekiniye, stuyê xwe dirêj kiriye, him dev davêje vî alî, him wî alî gîhayê dor rê diçêre. Ez nêzîkî wê bûnê, ewê devê xwe ji çêre dikişand, çavên xwe da nîşanî min dikir. Ez digihîştîme wê. Serê wê, çav, poz, guhê wê tîmar dikir û dest davîte çenteyê xwe, nanê tendûrê yî qalim derdixist, nan dikire du kerîya, kerîk diki-re çenteyê xwe, kerîk dirêjî devê dikir. Ewê usa şîrîn şîrîn ew nan dixwer, mirov heyr-hejmekar dima.

Rojekê jî diya min ez ji xewê rakirim û got:

-Lawo, rabe zû zû kincên xwe xwe ke, ser-çavên xwe bişo, ji birinceşîra êvarê hinek maye, min germ kiriye bixwe, eva jî sê manat xwe ra bide kalêtan² bistîne, bixwe, de rê keve.

1 qûç: hop, balûle.

2 kalêt: şîrînayî, qurabiye.

Min birinceşîr xwer û hatim gihîştîme Deva Sipî. Mîna her car min ji çente nan derxist, nivî kir û direjî devê kir. Devê nanê para xwe xwer, xast here, hate hişê min: “Min birinceşîr xweriye, sê mat ji diravê min heye, ez ê bidime kalêt bixum”, lema min keriyê nanê para xwe direjî devê kir.

Ewê keriyê destê min nihêrî, serê xwe bilind kir, ez mêze kirim, mîna mirovê xeyîdî, piştî xwe da min, çû.

Sibetirê min dîsa ew kirina xwe wekiland: nan kerî kir, direjî devê kir. Ewê dîsa keriyê nîn şîrîn şîrîn, bi mirçemirç xwer. Min keriyê din direjî wê kirîne, ewê qe rûyê min nenihêrî, serê xwe kire ber xwe, piştî xwe da min, kire loqeloq, meşiya...

Wedekî dirêj min kir-nekir devê ji keriyê para min parîk ji nexwar. Deva Sipî timê para “xwe” kuncî kuncî, bi mede dixwer, qe çav bernedida para min.

Rojekê dîsa devê keriyê para “xwe” xwerinê şûn da, min keriyê din dirêjî wê kir. Ewê serê xwe bilind kir, hinekî zûr bû li rûyê min nihêrî, tû kir, da gava, ji min dûr ket.

Pey vê yekê ra min her ro tenê kerî nan dirêjî wê fikir, vira mesele-meteloqeke gel kete bîra min:

*Bila pariye mirovan nîvcî be,
Bila namûsa mirovan cî be.*

Eva qewimandinek...

Ya duyemîn: Min dersxana sisiya da dixwend. Nava wan sê salan da tişteke nehatibû guhastinê, her tenê riya min hinekî alîkî dinê da dagerîbû.

Dîsa berbangê dayîkê ez hişiyar dikirim, dîsa min qûçek dida destê xwe, rê da dixwer, dîsa Deva Sipî derdikete ser riya min, ez gihîştinê tûsa wê, min nan dikire du kerîyan, kerîk dida wê, ewê nan xwerinê şûn da, min riya xwe didomand.

Şiveriya ku, tê ra diçûme mektebê, nava şoveke mezin ra derbaz dibû. Çawa min jorê got, kolxozê wira genim-ceh direşand. Payîzê dext-ber hildidan, ka dikirine çend lodên dûrî hev. Lodek ser rêça min bû.

Zivistan bû. Zivistaneke hişk bû. Hero şilî û şoyî bû. Rê qevzkirina min dubare-sêbare dijar bibû. Herîreşkê davîte teşkê¹ min. Te hew dizanibû ew ne herî ye, lê qetran e, benîşt e te va zeliqiye.

Rojekê ji rûyê bêxemiya min da, wê zivistanê, hindik mabû jiyana min biquside.² Pey dersan ra şagirtên dersxana me pev ketin herin barîgeh-salona mektebê da volêybol bilîzin. Ez jî wan ra çûm.

Lê êmekî min bîr kir, wekî ez ne ji wan zarên hetab³ im, çawa dibên, mal-avayên wan ber piyê wan e, lê riya min dûr e, rojên zivistanê kurt in, tarî zû dikeve.

Nizanim me gellekî lîst, yanê hindikî, dema ez ji mektebê derketim, min dît îdî dereng e, ronahiyê daw û delingên xwe hildiçîne, wekî bi carekê va minê be, him jî sar e. Min da ser rê. Ba û baran, mij û dûman tev li hev bibûn pêra va⁴ li min didan, ez paş da de'v didam. Min tîfalî tê derxist ez serma dikim. Te hew dizanibû rûyê min didine ber gûzana. Min destê xwe da dêmên xwe, tê derxist kuliyên berfê ser hev, ser hev dibarin û li rû-bijangên min va dizeliqin, dimînin.

Min carekê ji bavê xwe bihîstibû, gava mirov dikeve nava seqemê, bahoze cîkî bisekine, ewê biqerise, paşê jî Xwedê zane wê çi bibe?

Lema jî min gavên xwe fire fire avît, wekî di nava livitandinê da bim.

Hindik mabû bigihîjme loda ser riya xwe. Li wir riya min nîvî dibû, kurt dibû. Xofeke giran ez hingavtim. Dengên terewilan guhê min da hatin. Li vira gur, wawîk, rûvî hebûn. Min nizanibû, ew deng çi deng e, gelo ji dûr tê, yanê nêzik?

Min riya xwe domand, gihiştîme ber lodê. Ew dengên gava din nedihatî, lê tirs, xof laşê min ra dibeziyan. Min piştî xwe da lodê, xwest çentê pirtûkan dayînim erdê, dest, ser-çav, guhên xwe mizdim û zû rê kevim.

Nişkê va kûzekûza çend gurên ku pêşberî min sekinibûn, ez leri-zandim, hej bi min ket! Min her carekê kire qirînî! Zimanê min hate

1 teşk: çîp ji aliyê piştê ve.

2 biquside: biqede.

3 hetab: dilrehet.

4 pêra va-para va: ji pêş ve-ji paş ve.

girtin, guhên min xitimîn, çavên min reşeve hatin, çok li min ba bûn, hindik mabû ez hişê xwe unda kim. Çeqeqeqa dev-diranê guran notla mêkutekî serê min diket. Çavên guran dibiriqîn, diçirûsîn, vêdiketin. Min centê pirtûkan dabû ser sîngê xwe, bi her du desta va digivişt. Wana dev vekirî, bi qirçe qirça qîlên xwe erişt min dikirin, cake din¹ gavekê-duda paş da vedikişyan. Nêçîr ketibû nava lepên wan, lê nêçîra xwe ra dileyîstin, deng didane dengê hev. Gavekê şûn da dengê usa hate bihîstinê te tirê erd-esman hev ket, guhê min vebûn. Ew dengê nirîna² Deva Sipî bû. Ronahî hate çavên min. Deva Sipî ketibû nava guran. Çivane çivane³, dorchêl dorchêl fitil dida xwe, nirenira wê bû, para va çivt davîtin, pêra va derbên giran davîte hovan. Heriya ku loqeloq ji bin lepên devê derdiketin mîna derbên giran guran diket. Hovên birçî da deliyayî⁴ nedixwestin dest ji nêçîra xwe bikişînin. Deve jî bona van peraniyan⁵ bibû zinarekî; devê xwe davîtime wê, devê wan va tiştek nedihat, serbarê ser da derb li wan diket.

Pişta devê min da bû. Gurekî para va xwe avîte devê, ewê çivteke usa dev-diranên wî da lê da, peşiyê gewro kire kûzekûz, paşê wê da ketinê, mîna sa kire ewteewt. Min rind didît derb ser derban van pereniyan dikebe. Yek ji derba piyên devê erdê diket, yê din dihat ser wir ra derbaz dibû, diçû, cake paş da vedigeriya. Di nava vê heşir-meşirê da tiştek kete bîra min. Mezina gotibû, min jî hilda-bû. Digotin kul-merezeke gurên serên çuyan ew e, wekî ewana zo zo nagerin, yek-yek, sisê-sisê, pênc-pênc, heft-heft digerin, ji ber ku baweriya xwe hev naynin. Min ew jimirîn, ew pênc bûn. Nizanim çawa bû, weşekê şûn da du gura hev ra kirine kewteewt.

Pey vê yekê ra min dît gur paş da vekişyan, ji lodê dûr ketin, ser hev ra banzdidan, ber hev ra diçûn-dihatin, kûzekûza wan, ewteewta wan hev ketibû, nalîna wan dihate bihîstinê, rev bi wan ket. Deva Sipî pêşberî min sekinîbû, ustuyê xwe ber bi min dirêj kiribû, çavên xwe kutabû çavên min. Êmek derbaz bû, ewê çokên xwe da

1 cake din: careke din

2 nirîn: dengê deveyan, nirenir.

3 çivane: fetl, zivirîn.

4 da deliyayî: boçik daxistî.

5 peranî: êrişkar.

erdê û te qey digot, wekî ware min siyar be, nanê dayî li min helal ke. Ez hinekî ser hişê xwe da hatim û devê siyar bûm. Ewê berê xwe da malan. Ez hê ditirsiyam, min xwe xwe ra digot:

-Diqewime gur dîsa êrişî me bikin. Em ji lodê êpêcekî dûr keti-bûn, min dengê sa bihîst, çirikek-dudu jî derbaz bû, hewar-gaziya yekî hat:

-Qolo, ha qolo nehêle!

Pey vî dengî ra dengê diya min ez hingavtim, hejandim:

-Hewar, hey hewar, zû warên!

Hema vê gavê çend seyên fêrmê, rex devê ra, bi ewteewt derbaz bûn. Wana bîna gura hildabû.

Bayê gur mij-dûman bela-bela kiribû, berfa gava din nedibarî, sayî ketibû erşê ezmin. Min nihêrî apê min pêşiyê ye, diya min, bavê min û hinekê din dane pey wî, deng dane dengê hev ber bi me tîn. Gava em gihîştine tûşa hev, devê fitil da xwe, riya xwe guhast, kire loqeloq, gavên xwe zêde kir. Diya min kire qîreqîr:

-Weyla min porkurê! Dûrî serê kuran! Weyla min çav rijiyayê!

Mirovên ku hatibûne hewara min gişk paş da vegeîn, dane pey devê.

Deva Sipî berî gişkan gihîşte derê malê, wê deqîqê çok danî erdê, hemû mirovên malên me derva beravî ser hev bibûn, birê min ez hemêz kirim, ji ser devê hildam, hate rûyê min.

Hinekî şûn da mirovên wê derê hev qesidîn, herekê tişte digot. Ez birime hundur, min ra cî-nivîn danîn, diya min destê xwe ber serê min ra biribû. Hê kesî ya bûyî bi hûr-gilî nizanibûn. Çend sehetî şûn da-gişk pê hesiyan eva sê sal e, min nanê para xwe kerî kiriye, kerîk daye devê, min kiriye-nekiriye devê keriyê din nexwe-riye, îro devê ez ji devên guran xilaz kirime.

Hê bû kûrekûra dayîka min, wêliya jî deng dane dengê hev.

Bavê min bi kesereke kûr va, bi dengêkî şidiyayî got:

-Deva Sipî, mal-halên min qurbana te bin! Deva Sipî, nanê te xwerî li te helal be! Xwezila hinek mirov jî nanê xwerî pêpes nekin, bîr nekin.

LO KEKO, LO BIRAO

Lo keko, lo birao, lê te digot:

-Lê xûşkê, ez ê bêm!

Rojeke baharê bû.

Berbangê dayîkê dey li min kir û bi dengê lerizî gote min:

-Porkurê, ser min da, zû rabe, eva êpêce wede ye ez hişiyar im, min nihêrî kekê te ne nava ciyê xwe da tune. Ez çûme xaniyên din, çavên xwe maldizkê gerand, ew nedît; derketime derva der-dor mêze kir, fitilekê-duda dora avayî çûm-hatim, ne deng e, ne hes.

Hej bi min ket, bi destên ricaf kincên xwe xwe kir, mîna elkekê¹ derketime derva. Tava berbangê ji serê çiyayê pêşberî gundê me di-zeriqand, tîrêjên wê xwe avîtine dêmên min. Nişkê va dilê min ra ew yek derbaz bû: "Xwezila usa biqewimiya, min bi her du destên xwe va tîrêjên tavê bigirta, derketama asoya ser çiyayê me, ji wir mêze kira ka binê kekê me sê xûşkan li ku ye?" Bavê min mirinê ez pênc salî, ew hevt salî bû. Her du xûşkên me ye mezin çûne mêr, herek gundekî ye. Pey mirina bavê min ra, çend sal derbazbûnê şûn da gellekan diya min xwestin. Lê ewê digot:

-Diqewime rojeke usa bibe, yek ji mêrê min î duda pirs ke:

-Ev zar zarên te nin, ew jî bêje:

-Na, ez zirbavê wan im.

Bona min mirin daha xweş e, ne ku wan giliyan bibihîzim. Him jî şukur mala min ne bê mêr e. Rûbarê min mêrê malê ye.

1 elk: 1. li gorî mîtolojiyê peri ya ku tê ser jinên welidî û ruhê wê distîne 2. jina porgijik

Rastî jî îdî Rûbarê bira bibû xortê ber simêl xwîdayî. Ewî xwe mîna mêrê qerd dida kîvşê.

Me xûşkan gellekî kêr bi navê wî gazî wî dikir, me jê ra digot: Keko!

Hinekî jî wede derbaz bû, ez û dayîk harehejî bibûn¹. Diya min ber dilê min da hat:

-Lawo, hinekî sebir ke, Xwedê kerîm e!

Hema vê demê me nihêrî Rûbar qevze kulîlk hemêz kiriye, wê da tê. Ez ber bi wî revîm. Em gihîştine himberî hev. Ewî bi destekî va qevzê kulîlkan dirêjî min kir, bi destekî va jî hêsirên berê çavên min paqîş kir û got:

-Kew ketinê sibe, min go, rabim herim baqê kulîlkên çiyayê me, yên ku hê qiravî ser in xûşka xwe ra bînim.

Vê weşê dayîk jî hat gihîşte me.

Rûbar ewa hemêz kir, hate rûyê wê. Em ker-lal hatine mal. Min baqê kulîlkên rengrengî bire oda xwe. Min meqes anî qarotên² kulîlkan weke hev da ber meqesê, av bere qerqefê³ kir, kulîlk kirine wê û danî ber roderê.

Wê deqîqê bîneke xweş ode hingavt, weşekê şûn da çend bîna hev ra, hev ra havîte pozê me. Dayîkê gazî me kir, em çûne mal-dizkê. Ewê destexaneke tijî raxistibû: toxafk, hingiv, rûnê nivîşkî, penêr, toraq, çay... Me xwer, vexwer, şikirbûna xwe Xwedê anî. Dayîkê rabû got:

-Ez diçim çêlekê bidoşim. Dayîk çûnê şûn da Rûbar destê min girt û bi dengê hez-heyran gote min:

-Lê lê xûşkê, delalê, were te kulîlkê bibime bal baqê kulîlkan.

Em hatine oda min. Ewî destê min berda, çû qerqefa kulîlk tê da hilda, anî ber pozê min, vir da wê da bir-anî.

-Xûşkê, horiyê, -ewî gote min, - bona hezar, hezar xûşkê mîna te kulîlkên çiyayên me bîn kin, bona hinek bi neyarî wana pêpes ne-

1 harehejî bibûn: dîn û dîwane bibûn.

2 qarot: saq, bist.

3 qerqef: vazo.

kin, ez ê îşev nîvê şevê herim derkevim çîyan, têkevime nava refên pêşmergan. Lê dayîkê ra nebêje.

Kirtînî min neket. Ewî çû xaniyê din du balgî anî, danî ser kulavê qerqaş î mîna berfê, xwe jî derbaz bû rûnişt; balgîk da berpalê xwe û got min:

-Lê lê xûşkê, xalxaloka birê were kêleka min rûnê, ez ê ya dilê xwe te ra bêjim!

Ez çûm nikî bira, fîrnaxdarê¹ mala me, rûniştim. Ewî balgîk jî da berpalê min û her du destên min kire nava lepên xwe ye mêranî û got:

-Ez diçim, ez ê bêm, lê diqewime bi ruhê xwe bêm, firqî tune ez ê mizgîniyê xûşka xwe ra bînim!

Hey lê, xûşk-birano, lêzimno, der-cîranno, ya qenc ew e, bihêlin ez kula dilê xwe ra daxweza birayê xwe, gotinên wî we ra yeko yeko qal kim:

Lo lo keko, lo birao, lê te digot: lê lê xûşkê, ez ê bêm. Ez ê rojeke usa bêm, bêm binihêrim xazgîniyê te jî hatine, derî li me birîne.

Ez ê bêm derbazî jorê bibim, ser kulavê xurustanî rûnêm, qure qure balgîkî, duda, sisiya bidime ber palên xwe, paşê ez ê bêjim:

-Bila xazgîniyên xûşka min bêne hundur.

Ez ê wan ra bi giran giran, bi mezin mezin bêjim:

-Hûn ser sera, ser çavan hatine, kerem kin rûnên. Xûşkê, delalê, tu yê ser siniya gulgulî kubar kubar fîncanê çayê binî, peşiyê, berî gişkan fîncanekê bidî ber birê xwe, vegerî yeke din bidî ber xezûrê xwe yî paşdemiyê. Pêy vexwerina çayê ra ez ê berê xwe bidime xazgîniya:

-Kerem kin, xêr e hatina we?

Bavê xort wê bêje:

-Em hatine gula mala we, xûşka te ye delal bixwezin, bikine bûka mala xwe. Tu qelendê xûşka xwe bêje, em jî pey te bîn.

Lê xûşkê, lê delalê, êz ê xwe giran bigirim û bêjim:

-Çiqas qelen dilê we ra derbaz dibe xwe bêjin.

1 fîrnaxdar: nazdar û fêlbaz.

Xazginiyên hatî wê bi ecêb çavê hev binihêrin. Bavê xort wê bêje:

-Min deh pez, noginek da, de tu jî bêje: “erê”.

Lê ez ê jî xwe qure kim bêjim:

-Na, na!

Wê pirsra qelen gellekî hildin-daxin, ez ê bêjim:

-Na, na!

Xazginî yê rabin bixeyîdin, herin.

... Pey çûyîna xazginiya ra ez ê te ra bêjim:

-Lê lê, lê xûşkê, lê heyranê, min qesd usa kir, bila ewana careke din bên. Cara duda dîsa her tişt ê bê wekilandinê, lê tenê vê carê bavê hizkiriye te wê bêje:

-Min panzdeh pez, noginek da, de tu bêje: “erê”, em rabin çaya şîrîn vexwun.

Îcar jî ez ê bi hutul-mutil¹ bêjim:

-Na, na, na”! Xazginî wê dîsa por-poşman rabin herin, çendek ê derbaz be ewana yê cara sisiya bên. Kal-bavan jî heta sisiya gotiye. Lê lê xûşkê, lê lê zeriye, dîsa her tişt ê bê wekilandinê, lê îcar bavê xort wê bêje:

-Min çawa qelend 20 pez, çêlekeke bi gollik, meyîna qemer da, de tu bêje: “erê”.

Lê lê, rindikê, îcar ez ê rabime ser pê û bêjim:

-Xûşkê, heyranê, misînê avê, teyştê bîne, avekê ser destê birayê xwe ke.

Tu yê kawekaw misînê avê bidî destê xwe, teyştê bînî ber min daynî, tu yê avê lê kî, ez ê destê xwe bişom, bi pêjgirê va paqîş kim û bêjime xazginiyan:

-Lo pismamno, qelend qirêca destê min bû, min şûşt û ewa qurbana xûşka xwe kir. Min qest-bendê qelend menî girt sê cara hûn birin-anîn, wekî bêjim: “Rastî jî qelend qirêca desta ye, ewê qurbana xûşka xwe dikim, lê xûşkê qurbana wê nakim. Çawa edet awa dibêjin: “min keçikek qurbana we klr”. Ez qelend qurbana wê

1 hutul-mutil: bi teqezî, misogerkirî.

dikim, lê periya mala me qurbana tu kesî nakim! Min bi dilê paqîş xûşka xwe da xortê we.

Lo keko, lo birao, lê te digot:

-Ez ê bêm, roja dewatê-şayiyê gava bejina te bixemilînin, kofiyê bidine serê te, xûşkê ez ê bêm piştê te girêdim.

Lo birao, lo keko, eva deh sal in çavên min riya te ye.

Çendekî berî dayîka me nexweş bû, nexweşxanê da bû, min xwe-rin, hinek kel-mel hilda; ji malê derketim hatim li rawestgeha avto-bûsê sekinîm; ewa jî dereng, dereng dihat û ez dîsa ketime mitala.

Lo keko, lo birao, nava van sala da ber agirê hesreta te gulîke min reş, yek sipî qemiliye. Lo keko, lo birao, lê te digot ez ê bêm. Lo, lo keko, lo birao, ez heyrano, weleh, bileh tu hatî mala me, tu hatî mala gellekan, ez kî me wana bijmîrim, ewana bêjimar in. Tu hatî bi dehan, bi sedan, bi hezaran xortên neçê derbaz bûyî û te palê xwe daye lûtkeya çiyayê ku, hatiye navkirinê “Şehîdên Welat”. Tu neyar, tu dujmin nikare ber bi wî çiyayî gavekê bavêje. Ji ber ku ew mixenet¹ hema we demê ji piya qop dibe, ji çavan kor dibe, hej pê dikebe, jor da hol dibe, tê û dibe xurê hovên mîna xwe!

Lo, lo keko, lo birao, ew bilindayî, ew lûtkeya nabe qismetê her kesî. Ji ber ku, ew bilindayî, ew lûtke ya azadarî, parastina bi hezar, hezar dayîkên mîna dayîka me ye, xûşkên mîna min in, ya hemû zindiyên welate me ye! Lo keko, lo birao, tu bûyî xwedanê gotina xwe, tu hatî!

Ez ewqasî bi gîro² birayê xwe ra ketibûme nava axavtinê, min qe tê dernexist avtobûs çawa hatiye gihîştîye rawestgehê, dengê avto-ajo, giliyen wî ye bi hêrs ez veciniqandim:

-Lê lê pîrê, zû siyar be, dereng e!

1 mixenet: xayînfî, xedarî

2 bi gîro: bi giriftyarî, bi guftûgoyeke kûr.

SERHATİYÊN WERGERANDÎ

Ji zimanê azerbaycanî:
Ahmedê Hepo

I.

BEDEWA KURDAN

Huseyn Îbrahîmov

Nîvê havînê bû. Hewa germ derbaz dibû. Ji hewa xitimî mirovan nikaribû bîna xwe bikişîne. Te hew dizanibû toz-xubar kişandine ser rûyê erşê esmîn. Demên awa ji kar westiyayî dihatime mal. Min xwe ra kiribû edet hema ez ku digihîştime mal, berî çayê-nîn îstekane ava sar ji sarincê derdixist vedixwar, ser dîwanê vedileziyam, tranzîstor dida ser sîngê xwe, deng dida pêldaran, dihênijîm û di ketime mitalan.

Ez dîsa ser dîwanê veleziyabûm. Bi tranzîstorê kilameke gelêrî didan, dengê dengbêjê yî şîrîn ode hingavtibû.

Keça kurd rûniştiye xaliyê dihûne,

Yê ewa hizkirî wê ça ke malê dunê.

Dengbêj ketibû hewasê û bi dengê xwe yî zîz va bedewa kurdan dinitirand, boy nefsa wê giliyên qenc digot. Nişkê va vî dengê heyr-hejmekar hiş-sewdayê min kişand, ez birim derxistime rojên derbazbû ye dûr e dûr...

Min dersxana deha hê kuta kiribû. Ezî jarik bûm, lema ji xatiya min ez xwe ra biribûme zozanê. Sibetirê ji nava cî-nivînen xwe lap zû rabûm.

Çiyayên ku mina pehlewana namil kutabûne namila hev, pişt kutabûne pišta hev, her yek bi rengêkî dihate xanêkirinê.

Te hew dizanibû çiyên hinekan ji şeltên dûmanê ye sipi berpişt girêdane û bi destî destemelan ji kulîlkan, gulan, gihayên cuda cuda xalîke mezin hûnane û birine li berojên çiyên, li sîngên giran raxistine.

Tava şebeqê mîna sinîke zêr zer dikir û tirêjên xwe avitibûne ser kolozên sipî, yên çiyayên dûr e dûr.

Dengê avên çemên çîyan, yên ku bi gur newalan ra dikişîyan, piçepiça kulîlkên reng bi rengî, wîtewîta çivîkan tev hev bibûn û ecêbeke dunyayê ye bi sêr xuliqandibûn.

Min destên xwe para va stûyê xwe ra biribû, singê xwe pêş da dabû, ji kûraya dil bîn dikişand. Ev hewa heweke badilhewa nîbû, ewa bi bîn-buxs, bi tem bû... Paşê ez veleziyame erdê, min xwe rast-çep ser hev da hol kir, rûyê xwe kulîlkan, çêrên şûştî-mûştî xist. Hezar yek gulav tevî hewa çîyan bû û tijî dil-hinavê min dibû. Te tirê weşeki bêhiş, ser piştê veleziyam, çavên xwe girt, xwe ra vehatim.

Gava min çavên xwe vekir, fêza serê xwe ewrên sayî ye zelal dît.

Te hew dizanibû hinekan qest ewrên mezin e mîna kulîlkên helûjeyê sipî birine yeko yeko perçên heşîn va zeliqandine û paşê ser van çîyan, newalan raxistine.

Nişkê va hewar-gaziya xatiya min ez ji ramanên şîrîn dûr xistim:

-Vahîd, nehêle golik revî!

Ez zû ji ciyên xwe qiloz bûm, rabûme ser piya. Xatiya min e têr e tijî li dora kon diçû-dihat, pey golîkê ketibû. Ez jî pey wê ketim, boçîka wê kete destê min. Ewê her du piyen xwe ye paşîn zo kir û singe min da lêdanê şûnda hevraz revî. Di nava weke wedê qirpan-dina çava golik ji kon dûr ket.

-Mala min şewitî bê girte pozê golîkê... Gidîno, alikariyê bikin!

Çêleka belek ev yek awa dîtîne kire oreor, hêz da xwe singê ku-tayî ji erdê derxist, paşê stûyê xwe dirêj kir û bi posîde posîde aliyê golika xwe nihêrî. Alabaşê ber kon ketî jî carekê, duda kire ewte-ewt, ewî jî xwe ker kir.

Min qe tişteki nenihêrî, qûjeqûja xatiya xwe ber tişteki nehesi-band, pey golîkê revîm. Ewa çû, ez çûm. Ewa revî, ez revîm. Çawa çîroka da dibêjin: "Gellekî çûn, hinekî çûn, gelî-newalan ra rast çûn." Usa bû ez bi çalepiya hilkişiyame ser nikê dawiyê.

Min piyê xwe bi zorê xwe ra dikişand-dibir. Gava ez derketinê ser hafa geliyê heşîn, ber çavên min zozanên bi dîdemên nûh va ez heyr-hejmekar hiştim. Kewanên ewra ser serê konên pêşê çîyan vegirtî ra diçûn-dihatîn.

Dûr va kerî, garan usa raweşiyabûne berojan, te qey digot, hinekan ewana bi destên xwe wan dera belabelayî kiriye. Lê lap nêzîk jineke navsere bi erf-edet lingên xwe ber hev ra qat kiribû, ser çêrê hêşîn rûniştibû.

Şingeşinga wê bû gora destê xwe ye bi nexiş dihûna. Ewê geh şîşik pêçiyen xwe digerland, geh pêçiyen xwe li şîşikan digerland. Lê keçika ku rex jinikê ser cêcima reng bi reng rûniştibû, gewlezên rîs ên cuda cuda, yên ku bi rengê kulîlkan, gihan û çêran hatibûne boyaxkirinê, dikire gilok û bi pergar beravî bêjinga ber xwe dikir. Jinikê ez dîtîne dest li xwe girt.

-Alemzer te dit, -ewê got,- xwedanê golikê hat derket.

Keçikê serê xwe bilind kir, di aliyê min da nihêrî. Me hev mêze kir.

Çawa çîroka da dibejin: Çiya, ewir tev hev bûn hatine ser min. Min dil da ber dilê xwe bi awakî ser piya sekinîm. Ji dilê min dengê hat tijî guhê min bû: "Ya Rebbî, qe bedewê awa jî hene?!"

Te hew dizanibû xwezaya wênekêşe hênehên bi pêkariya xwe qelem hildaye bedewiya vê bedewê nitirandîye.

Te çiqasî çavên wê ye gir e reş, dêmên wê ye sor, burû-bijangên wê ye qetran, lêvên kaxetî dinihêrî têr nedibûyî.

Bejin-bala wê ye bi qamet mirov dîn-har dikir!

-Kurê eceman, tu ser sera, ser çavan hatî zozanên me ye Eyrîcê. Metirse, were rûnê! Me golik ser jê nekiriye, nexweriye. Em ne ji wan kurdan in!

Alemzer keniya. Ewa zû rabû ser piya û qerçimekê kincên xwe ye hevrişîm e nûh, yên paqîş bi destên xwe va met kir, kembera zîvîn e li pişta xwe şidand. Ewê golika ku hinda bêjingê, her du piyen xwe ye pêşîn dabû ser hev û dihênijî, nîşanî min da û got:

-Le, xorto, bila nava me da bimîne, golika te jî mîna te rindik e!..

Ewê ev giliyana usa bi şîrîn, usa bi hizkirin got, wekî min westandina xwe bi carekê va bîr kir.

-Lê lê, keçê, çî te zarê neketiye ewî xerîb e, -jinika navsere got -, û çavên xwe wê ra qelişand, paşê bala xwe da min,- lawo, were, were rûnê, tu qey dibêjî, çêrlêdayê tu yeman westandî. Tu li zarên êlatê naçî? Usa keçikê nenihêre. Ewê henekê xwe kir. Naha ew wedê wê ye...

Wê jinika navsere gellek pirs, hewal ji min kir.

Min her tişt cî bi cî qal kir. Paşê nanê sêlê, firoyê ku Alemzerê anîbû danîbû ber min, min ew çawa xweribû, naha jî nayê bîra min!

Alemzer keça xûşka jinika navsere bû. Ewa mehek bû ku ewê dil dabû şivanekî merxas Êlderya. Ji van giliyan şun da ewê jina navsere çi gotibû tişteke bîra min da nema bû. Min tenê rê tê ra dît bersîva Alemzerê da, navê xwe got:

-Vahîd.

Alemzer derbazî heneka bû:

-Navê te jî rind e! Ez ê navê te li kurê xwe nekim, lê ez ê navê te li neviyê xwe bikim.

Jinika navsere dîsa çavên xwe wê ra qelişand:

-Lê, lê, bes e tu zimandirêjîyê bikî!

Alemzerê tê derxist ez posîdê bûme, lê ewê kire kakekak kenîya, her ku ewa dikenîya agir dilê min diket. Ê, ne her kes nikare ji dil bikene. Ev yeka bi xwe bedewîk e, xwe jî boy jinan. Lê kenê bi kakekak yeman li bedewa çîyan dihat. Ewa kenîyanê kortikên dêmên wê ye tijî xweşî mirovan dihat. Te hew dizanibû dengê kevotkên zînanan, tevî dengê lemalema kaniyan bûye û ji lêvên wê dikişîn-tên.

Ez zendegirtî mabûm...

Hema vê demê ji girîkê pêş kon hirîniya hespekî hate bihîstinê. Nişkê va dêmê Alemzerêyî bi ken xitimî. Bi çavên xwe ye gir derdorê xwe mêze kir. Ji gêdûkê hêşîn pêşiyê papaxê siyar, paşê ew bi xwe, hinekî şun da hespê wî hate kivşê.

Siyar mêrê sitê bû.

Ji wê roja qeç, ya ku ez li zozanên Eyrîce rastî bedewa kurdan hatibûm êpêce wede, çawa dibên, salên weke jiyana mêrxasekî derbaz bûne. Di nava wan salan da ez li gellek bajaran geriyame, gellek welata qesidîme. Min bi dehan tabloyên madonnayên eyan li mûzêyên Vatîkanê yên hunermendên dewra Întîbahe nihêriye, ber wêneyê bedewa dunyayê-Cokondayê sekinîme, wedekî dirêj ketime mitalan, lê li her derê biriyara min yek bûye: "Na, Alemzer daha bedew bû."

Di nava van salan da ez bêjimar rastî bedewan hatime, min timê bêhemdî xwe horiya bêhinber, ya ku min li zozanên Eyrîce dîtibû

bîr dihanî, dîsa ji dilê min dengê dihate bihîstinê: “Na, ji wana tu kes li Alemzerê naçe...”

Diqewime ev gilî-gotinên min yê derheqa bedewan da ji hub-hizkirin, ji baweriya bê cî pêş da tê.

Na, naha jî zimanê min nagire ez usa bêjim. Ev yek ne baweriya bê cî ye, lê heqî ye.

Eva giliyên çend salan in. Min li bajêr têxnîkûmekê da kar dikir.

Îmtahanên qebûlê hê kuta bibûn. Di demê awa da karkirina dîrektor hinekî sivik dibe, ew dikare serbest here-bê oda xwe. Ez hema hê ketibûme oda xwe, min nihêrî pîrek kincên jinên çiya lê, ber dêrî hate xanêkirinê. Ewê salam da, destûr stend û derbazî hundur bû. Bona ewa rûnê min cî nîşanî wê da.

-Dibihîzim xûşkê... Çi qulix?

-Xwedan qulix bî, birao! Ez ji te zef razî me, wekî te neviyê min qebûlî têxnîkûmê kiriye. Lê hatime hîvîkirinekê. Tu bizanibe, li vira tu qewm, lêzimekî me tune. Dilê zarê jî hinekî şikestî ye, bavê wî jî şer venegeriyaye. Hîvîkirina min ew e, wekî mecêla te hebe boy mayînê hemjiyîn xanê da cî jî bidî wî. Navê wî jî Vahîd e. Vahîd, neviyê Êlderyayê şivan.

Hema jinikê giliyên xwe kutakirinê, derxist goreke bi nexş danî ser pêşxwîna min û bi şermoke got:

-Evê jî bihejîne çawa para xûşka xwe. Dibên, naha li bajaran gel-lekî gorên hêne bi nexş pê dîkin.

Min serê xwe bilind kir û bala xwe da jinikê. Ewê tirê ez ê hêrs kevim, hinekî paş da vekişiya. Min qe bi xwe jî tê dernexist, ew navên ku wê kişandî, min wekiland: “Vahîd, Êlderya.” Min hela navek jî ser wan nava da zêde kir: “Alemzer”...

Jinikê bi ecêb li min nihêrî û careke mayîn rûnişt! Min jî ewa jî piyan heta serî mêze kir. Ez şaş nebibûm, ewa ew bû, Alemzer bû. Lê salên bê eman ya xwe kiribûn.

Xênî ji çavên wê, her tişt hatibû guhastinê. Ne çav nayêne guhastinê, ewana kal-pîr nabin.

Min rasthatina me ye yekem, ya li zozanên Eyrîcê bîr anî. Wê şun da jinikê carek dinê ez ji serî hetanî piya mêze kirim, paşê bi

kujê kelexaya reş e li sêrî çavên xwe paqîş kir. Me tu gilî hev ra negot, her tişt eyan bû. Ewê ji kûraya dil axînek kişand, lê ji sîngê min nalîneke bi şewat hate bihîstinê. Ne dibên, hevalekî pîrbûn-kalbûnê yî bi amin heye, ew jî: “Ah-way” e.

Min xwest biqîrim, ku “Na, pîrê, tu derawa dikî, tu Alemzer nîn î!”

Min careke mayîn serê xwe bilind kir, li wê nihêrî. Ew çavana, ew nêrînên bi hizkîrî cî bi cî ciyê xwe da bûn. Giliyên min di gewriya min da man. Nişkê va dengê hate guhê min: “Vahîd, neyê xapandinê, ne te dunê dîtiye, ne tu hevraz, bejêrê dunê ra derbaz bûyî, demên cuda cuda dîtine. Ev pîrîka hema ew Alemzera tu dibêjî ew e. Çi gunê wê heye sal zû pey salan hatine derbaz bûne! Xwe ji salên usa, hela bila heftên, mehên wê, wê da bisekinin, qe mirov nikare rojekê wana paş da bizivîrîne. Ewana dûr, dûr in, ne dest digihîje wan, ne deng!” Bona wê yekê, wekî ewê navê min li neviyê xwe kiriyê, min razîbûna xwe da wê. Min gilî da wê, wekî ez ê mîna ewledê xwe li Vahîdê biçûk binihêrim. Lê gorên bi nexş ez ê mîna bîranîke-ke ezîz xweyî bikim, her ku min li wan nihêrînê ez ê Alemzera ku li Eyrîcê gilî ber min ra avitîbû bîr bînim. Ewa dêrî va derketinê careke dinê vegerî li min nihêrî û careke mayîn bi kujê kelexayê va hêsirên ber çavên xwe paqîş kir.

Wê rojê min destê xwe reş-sipî nexist. Ji kar daha westiyayî vegerîm. Veleziyame ser dîwanê, dîsa tranzîstor danî ser sîngê xwe.

Vê demê dengê dengbêja ku “Keseme şikeste” distra oda min hingavt.

Yek ji hev qetîn, yek jî mirin,

Xwezila qe yek tunebûya.

Dilê min ra nêteke ecêb derbaz bû:

-Lo, lo, hunermendê gel î nav ne eyan, wedê te ev kilama bi şewat efirandinê, lê te çima rex giliyen “ji hev qetîn” “mirin”ê giliyen “kalbûn”, “pîrbûn”ê nexuliqandiye?”

II. LÊ DAYÊ, BÊ LÊ DA SIMBILÊ ME ŞKÊNAND

Êlûca Atali

Gellek cara hatime girtinê, cizaretî dane min, lê ez ji mala me dûr neketim, li cîkî dûrî dest-piyan negeriyam, qe ew nêta min tune bû. Lê cizaretiya dawiyê, ji yên berê daha giran, daha bêter bû. Nûnerên organên bêqeziyabûna Îranê ye taybetî gef li min dixwerin, wekî ji welat dernekebî mirinê bîne ber çavên xwe. Min çiqasî raman dikir, deriyên pêwîst ser min da hatibûne girtinê. Bona aboriya giran, rewşa siyaseta xirab ez bêgav mam, wekî ji Azerbaycana Başûr derê, herim. Bi dehan netewiyên pêşketî ku me pişt kuta bû piştê hev şerkarî dikir, zû va çûbûne welatên dereke û bibûne peneber, lê belê, ewana bi xweşiya xwe neçûbûn. Wekî awa gotin dibe, bêjim, rêjîmê li soqaq-sûkan, li xasbaxçan, li ciyên ku mirov gellekî diçûn-dihatî şirîtdar dabûne damirazandinê, cîwanên welat ber çavên dê-xûşkan, ber çavên dilşewîtiyên wan bi hovtî dar da dikiirin û hêmin disekinîn mêze dikirin. Bona vê dikê, bona rezîlbûna bedena mirovan nebînin, çawa dibên, kindir ji ustûyê xwe derxistibûn, rev dabûne pêşiya xwe, her tişt hîştibûn çûbûn.

Roj bi roj nûnerên hukumetê yê ku jimar û curê cizaretiyê di dane zêdekirin, dixwestin, wekî binelî rêvebirina wan ra qayîlbin, dengê xwe dernexin. Lema jî welat, seranser, kiribûne zîndana bineliyan û ew nava wê da mîna xerbenda xayî dikirin. Diqewime bi cî be, wekî bêjî li memleketa ku tê navkirin Îran, mirov çarenûsa berxa qurbanê dijîn. Kingê bixwezin dikarin xwîna wana bidîne rêtinê. Welêt da dadgeha bi heq tune bû, lema ji yên ku, xwîn didane rêtinê bona wana daraza rast tune bû. Wekî rêvebirin bi xwe ser neheqiyê hatibû damirazandinê, îja kê dadgeha heq bida derbazkirin? Lema jî bi hezaran cîwanên Azerbaycanê yên ku, nikaribûn

heqîya xwe, rastiya xwe bidine petekirinê, bêgav diman ji walêt derdiketin diçûn.

Wekî navên ciwanan bînime ser zaran, hûnê gellekan nas kin. Eliyê ku tevî me mehelekê da mezin bû, li welatê dereke sitar stand, çû Kanadayê. Bi xwestina wî bûya, sed sal derbaz bûyana, ew tu dera da nediçû. Bona çi biçûya? Ê, wî xizanî çi kiribû, çi ziyan gihandibû hinekan? Karê wî her tenê ew bû, wekî bireşîne, biçîne, qezenca heyî bibe bifroşe û roj bi roj malbetê rê bibe. Çima di nava emelê wî da dijî siyaseta hukumetê tiştek hebû? Lê de tu ware birê wî yî mezin Mesûd Ûnîvêrsîtê da oda dersxanê da rûniştibû, hatin girtin, birin bê pîrshewal, bê dadgeh nava çar dîwarên zîndanê da dardakirinê şûn da, camerê bavê wî Hemîd nexweş ket, kete nava cî-nîvîna.

Paşê kurê wî yî duda, daha rast yê tenê, bona birê wî, wede-bêwede dibirin, dahanîne îdara taybetî, mala wana sero-bino dikirin, pirtûkên heyî desteser dikirin, bi wê va careke din didane zanîne ew ji vir derê here welatê dereke. Resûl jî du roja berî dewata xwîşka xwe bêgav ma çû. Îdî wî çi dikaribû bike? Elîrîza sê cara kirine zîndanê, ji wir derketinê, hişê wî her tenê ew birî, wekî ew di nava reş-sipiyê da, şev-rojê da, nava xiroşiyê da, nava rêça ronahiyê da xwe ra rêkê bijbêre û here. Heval-hogirên min wedê rê ji rêya dibijartin tu çewtî nedikirin. Wedê ewana ji welat derdiketin, huba wê tevî derdê wê dikirin û xwe ra bi hizkirin dibirine welatê xerîb. Lê min nikaribû diya xwe tenê bihêlim û herime welatê dereke. Ji ber ku, tenê ewledêkî wê mabû.

Dema ji taxa me dost-nasekî mala xwe dihîşt diçû, diya min digot:

-Wekî tu ji ber çavên min bihêlî herî, ez ê nikarbim wî derdî bi-kişînim.

Awa bi awa, rojekê min xwe bêgav kir û diya xwe ra vekirî axivîm:

-Tu bi xwe zanî bona nêtên min e cuda-cuda evê rêjîmê ez çendî çend cara girtime, cizaretî daye min.

Ewê bi hemdê xwe got:

-Zanim! Her tiştî zanim!

Paşê çend cara serê xwe ba kir. Gava ewê giliyên min rastand, ew jî bû menî, wekî ez nêtên xwe bidomînim:

-Lê naha bi mirin-kuştinê va tême tirsandinê. Wekî ez neçime welatê dereke, wê her tiştî bînine serê min.

Min giliyê xwe yî dawiyê got û dengê xwe birî, dengê xwe nekir. Min rûyê diya xwe mêze kir. Rengê diya min e sipîçolkî mecal neda ez giliyê xwe bidomînim. Vê carê ewê seqirtiya heyî teriband, got:

-Ez her tiştî zanim, tu bêjî, nebêjî, ez her tiştî zanim.

Diya min usa bi endaze, cî bi cî axivî te tirê çî ku hatiye serê min, ewa ji min rindtir zane.

Min pirsî:

-Çi?

-Devê min kevirê reş kebe, ji me dûr be, kiş-kişa mirîşka be, ewê anî serzaran paşê hinek gotinên êl-obê yên ku ji jiyana mirovan bere derd-kula dike, xwe ra dibe, got, him jî navên wan kesa kişand yên ku van paşdemiya hatine dardakirin, kirine zîndanên. Dawiyê da awa kelimî:

-Ne dikarim bêjim bimîne, ne jî here! Lo lawo, bê lêdaye simbilê me şikênandiyê...

Diya min giliyên xwe xilaz kir, ker-lal li min nihêrî. Min nizanibû dayîka diltijî çima xwe ker kir. Min tê derxist dilê wê tijiye, lê ditirse gişkî bêje, min biêşîne. Paşê rabû ser piya, derbazî oda nikî me bû. Hinekî derbaz bû, hat pêşberî min sekinî. Destê xwe yî rastê dirêjî min kir û bi kelogirî got:

-Vana hilde, ruhê xwe xilaz ke. Bihêle, here.

Min ji guhê xwe bawer nekir. Gelo, rastî jî van giliyan diya min dibêje? Ewa mat bibû, rûyê min mêze dikir. Ewê xwe şaş kiribû, tê derxist ez wêya derz nakim, paşê ser da zêde kir:

-Wedê min te ra digot tu li ber çavên min be, min dixwest ez te timê şa û hetab bibînim. Lê naxwezim tirba te ber çavên xwe bibînim.

Giliyên "tirba te" ewa posîde kir, paşê bû sedemê kûre-kûra wê. Min derz kir, weteya van giliyan ewê xwe ra daye jiyane, naha ew anînê ser zaran reş qemilî, posîde bû. Min xwe avîte wê, qayim-qayim me hev hemêz kir, dê û ewled bona çarenûsa xwe ye reş hêsir

barand. Bîra min da ye wê şevê xew nekete çavên min. Nişkê va min nihêrî diya min derî vekir, serê xwe dirêjî hundur kir. Ewê dît ez nalivim, hew zanibû ez razame, nêzîkî çarpaya min bû, piştî min vekirîbû, dest avîte lihêva ser min, kişande piştî min. Min nişkê va zenda wê girt.

-Ê dayê, çima ez zar im, hatiyî, ser min digirî.

Min ev giliyana him hêdîka, him mîna xeydekê gote wê. Diya min berê xwe da min û got:

-Tu pêncî salî yî, lê bona min tu zarokê nava hêleşanê pêçekê da yî. Ez hew dizanim min qet tu mezin nekiriyî, tu hêleşanê da yî, ez te ra dilokan dibêjim.

Ez berbanga zû ji mala kal-bavê xwe ya li Erdebîlê derketim. Hewa hê ron nebibû. Ewqasî zû bû çivîkên kakolîyan, yên ku berbangê bi kakekakên xwe va bajar hildidane serê xwe, vê roja baharê dengên xwe ye xweşik gewiriya xwe da xweyî kiribûn. Min raman dikir, wekî yeqîn ez lez ketime û derketime ser rê. Gelo careke din wê bibe qismetê min, guhdariya wana bikim? Ji diya xwe qetiyam. Derbarê vê yekê da hêza min tune biaxivim. Ez usa dişêvînim, wekî hemû dayîk di rewşekê da, di qewlekî da ji ewledên xwe diqetin. Cara yekemîn bû ji diya xwe qetiyam, ketime rê û hinekî çûnê şûn da, vegeriyam, piştî xwe nihêrî. Diya min hê neçûbû mal, ber dergê hewşê sekinîbû, hey pey min mêze dikir. Dilê min taw nekir, min pêşt da gav neavîtîn, paşt da avîtîn. Pêçeka destê xwe rê da danî alîkî, revîm hatim diya xwe hemêz kir.

-Lê dayê, -min got, - çima dawîya dunê ye?

Ewê bi dengêkî xerîqî kire piçepiç û got:

-Nuqutiye dilê min, eva cara dawiyê ye te dibînim.

Min ji nava rê kelmelê xwe hilda, dilê xwe da xwe xwe ra got, wekî ez ê careke din piştî xwe va nenihêrim. Lê wedê şiverêya hinda mala ciranê me xalê Hesên ra dageriyame rêya mezin, bê hemdî xwe min piştî xwe va nihêrî. Diya min nava dûmana sibê ye ku hê ji hev belabela dibû, mîna peykelekî granîtê bê lipitandin sekinîbû.

Ji diya xwe, ji mala xwe ye helal û ji êla me qetiyane şûn da, awa bi awa, li welatekî Avropayê da cî-war bûm. Li vira jî min şerkariya xwe ye bona azaya welat, bona yek û tewbûna wê didomand. Min li

vira bi awakî din rêya şerkariyê qevz kiribû. Rast e, li derva bûm, lê li vira jî min nikanibû jiyanê seqirî derbaz kim. Ez çawa hêzeke dijberiyê ye dijî rêvebirina Îranê dihatime binçavkirinê, ez ditirsandim, wekî ji rêya şerkariyê bidine silikandinê. Vira jî dihatime dizexmandinê, rastî gefxwerinên bê bingeş dihatim. Bi gilîkî, ez bibûme serêşê rêjîmê. Nûnerên îdara Îranê ye taybetî çendî-çend cara serêşan da-bûne diya min, wekî ez ji çalekiyên xwe ye li vira dest bikişînim û vegerime welat. Lê him diya min, him jî min rind zanibûn hafiya paşt da vegerandina min, wê bi wê yekê xilaz be, wekî li meydana bajêr şirîtdar hatiye damirazanadinê û hîviya xwedanê xwe ye.

Min qe derheqa wê yekê da mitale nekiriye, wekî vegerime welêt, lê ez wê rêyê digeriyam, wekî diya xwe bîname cem xwe. Min ew yek jî xwestiye, dilê xwe ra derbaz kiriye, wekî diya min mîna tûrîsta bê Avropayê, qe na, carekê em hev bivînin. Bona vê yekê ewa jî diçerçirî. Çend cara bona nasnamê-pasporta dereke bistînim, ez berbirî organên pêwîst bûme. Bê gilî, bona min nasname nedidane wê.

Tê bîra min, carekê min bi têtêfonê gote wêya:

-Ev xerîbî, ji hev qetandin min gellekî posîde dike. Gelo, ji dê dûrketin girantir derd heye?

Diya min gote min:

-Lo lawo, dewsa diya xwe, derbarê welatê xwe yî helal da mitale bike. Welatê mîna dayîkê aza nebe, tu dema rûyê dayîkê nakene. Her car min bi têtêfonê wê va axavtinê, çî ku min hîştibû hatibûm derbarê wê yekê da ji wê yeko-yeko dipirsî.

Ji wan pirsan çendîkan rêz kim: Derbarê darê sêvên me da bûn, gelo ew darana, ciyê xwe da nin, wana îsal ber aniye. Qe baweriya min nayê, her kesê min fem ke, ez çî dixwezim bibêjim, her tenê ew kesê min derz ke, yê ku bêgav dimîne, bi zembîlekê ji welat deroder dibe. Awa, ne pîrr, ne hindik çardeş salan min diya xwe nedît.

Şevêkê, dereng dengê zengilê têtêfonê hat. Nizanim kî bû têtê dixist. Ew deng ji dûr dihat, lê dengê nêzîkî ruhê min bû, ji hewşa me xalê Hesen bû. Nişkê va mirina diya min anî serzaran. Min bona zengilê wî qayîlbûna xwe da wî û ew jî gotê, wekî ez ê sibê bilêtê bistînim û bêm, tevgelî ewlekariya binaxkirina dayîka xwe bim. Camêrî xitimî, deng nekir. Lê paşê mîna poşmanekî giliyên

xwe domand. Got, wekî diya te çendekê berê nexweş bû, lê nişkê va ewa giran bû, tevhev bû. Me qe bawer nedikir, ewa bi wê nexweşiyê here. Wî wedeyî me xwest te ra têlê xin, bibêjin. Lê wesiyetê wê yî dawiyê ew bû, wekî ewa bimire, wêya binax kin, paşê bersîvê bidine te. Diya te nedixwest tu bona wê dijiwariyê bikişînî. Ewê hela ew jî wesiyet kir, wekî pey ewlekariya binaxkirina wê ra jî, tu venegerî neyêyî, tirba wê ziyaret nekî. Paşê xalê Hesên got, berî mirinê diya te wêneyê te destê xwe da girtibû, danîbû ser singê xwe. Deqîqa dawiyê da ewê sê cara navê te anî ser zarê xwe, paşê ruh da. Vê derê min xwest bixivim, zimanê min kire pitepit. Xalê Hesên tê derxist dengê min hate birînê, gote min, wekî pewîst nîbû min ew yek te ra bigota. Ew pêşman bibû, lê çi feyde! Heta naha kîjan giliyê ku ji dev derketiye û careke din vegeriyaye cî-warê xwe yî berê, wekî giliyên xalê Hesên jî vegeriyana, ez jî biseqirtiyama.

Min dilê xwe da hilxist-daxist diya min deqîqên dawiyê çi fikiriye, çawa jiye. Wekî usan e diya min nexwestiye bi mirina xwe va jî min posîde ke. Axavtina min û xalê Hesên hatinê dawiyê destên min sist bûn, bedena min tevizi. Têlêfona destê min kete ser dîwanê. Dîwêr da wêneyê diya min nava çarçevê da dardakirî bû. Ez rabûme piya û ber bi dîwêr çûm. Rû bi rû pêşberî wê sekinîm û êpecekî bi seqirî li wê mêze kir.

Ramanê min çûn, derketine ser rasthatina me ye çardeh salan berê. Diya min destmala beriya xwe derxist, nav da kapêkên reşe ku bona roja me ye reş berav kiribû, dirêjî min kir. Nizanim ji perojê bû, ji çi bû destên wê hejiyan. Lema jî dirav nava destmalê da neman, kirine çingêçing li erdê belabela bûn. Diravê kaxiz sivik bûn nehatin negihîştine erdê, hewê da difiriyan. Ewê got:

-Hilde, here! Derê, here! Here! Bila tenê tu silamet bî!

Min bal kişande ser diravên ku bela-belayî ber piyên me bibûn û heyfa xwe bi wê yekê anî, wekî ew diravê têra xercê rêya min neke. Eva bûyereke dirêj e, usa nîn e? Lê ez bawer nakim bûyera ewledê xerbendê welat, ya yekî din, ji vê bûyera xeribiyê cudatir be! Ji rêya min e derbazbûyî, ew kurt be jî. Hemû bûyerên xeribiyê weke pîvandinekê, bi rengêkî tê nivîsarê...

09.05.2008 Stokholm.

III. SURRA EVRA

Hezî Eliyêv

/Ser bingeha bûyera gel/

Demen jiyanê ye ku bîra mirovan da diminin, ew di wêne û bîranînan da dijîn. Her gav, gava ez rûpêlê berevoka bîranînên xwe daponîja da ser hev da qat dikim, bûyereke ku min zû va bihîstiya tê ber çavên min ra derbaz dibe.

Li gundeki çiya yî dûr ji şevê êpêcek derbaz bibû kalikê Nûrû yî 90 salî, yê ku porê wî sipî bibû, rûdana wî dihat dadikete ser sîngê wî ber ronahiya lempê rûniştî bû û bi lewzekî şîrîn bûyerek qal dikir. Îro jî ew bûyera ji ber guhê min naçe.

-Xwendevanên delal, ew bûyera şeva zivistanê ye bi berf-bager, ku me ra hatibû qal kirinê û ya ku mîna bîranîneke nebîrkirî bîra min da maye, wê bona we jî hewaskar be.

Yeqîn wî kalê nûranî zû va dûnya xwe guhastiya. Lê, belê, ew qewimandina qalkirî mîna emanetekî evra îro jî bîra min da tê parastinê.

Her car gava ez ewê axaftinê bîr tînim hişkûrî, qîret, gilî, gotin, kirinên bav-pîrên me ye mêrxas têne ber çavên min. Dikevime ramana, rastî jî gotî, mirov awa be, xwedanê giliye xwe be, merd, netewandî be.

Bikurtî, wê daha rind bê derbazî nêta sereke bim. Kalike Nûrû qewimandineke, ku ciwantiya xwe da bibû şehed usa qal dikir, te tirê em filmeke hewaskar mêze dikin.

Ez ciwan, 17-18 salî hebûm. Dewreke zemîn e dijwar bû. Birçîbûnê pêparê xwe yî giran avîtibû ser gundê me yî li quntara

çiya jî. Birçîbûna, ku mîna şîpûkeke¹ giran gundê me hingavtibû roj bi roj jimara mirovên dimirin zede dikir. Rojekê kabûsa mirinê derê me jî kuta.

Darpiştê malbeta me-bavê min çû rehmêtê. Hewar-gazî, şewata diya min naha jî bîra min da ye.

Ewê usa bi nalînî, şewat digerland te hew dizanibû tu kesekî me wê derneyê sibê. Hesirên berên çavên min ziha bûn. Min xwe xwe pirs da xwe:

-Lê ez ne mêr im?

Ne axir, dewsa bavê min ez heme. Gotî layîqî wî, dewsa wî bigirim.

Rêbirina malbetê dikete stuyê min. Yeqin diya min ji hêza min, ji destemeliya min bawer nedikir.

Ez rojekê tevî hogîrên hemsal ên xwe bûm û çûme gundekî Îranê yî nezîk.

Ew oxira min bi serfîniyazî bû. Min ar, genim stend anî mal. Wê şun da min pê avîte gundê mayîn jî. Destê min dihanî. Me debar dikir. Gişka li min, çawa mêrê malê dinihêrîn.

Gund da tu kesî gilîkî min nedikirine dudu. Diya min bi taybetî li min dinihêrî, digote xûşk-birayê min e biçûk, wekî birayê xwe yî mezin ra hurmete bikin, çi dispêre we biqedînîn. Hinekê mayîn jî wê çav bidine we û wê mîna we bikin.

Ji cejna Newroz 15 roj derbaz bibû. Şeveke baharê ye here xweş bû. Nûra hîva ku ji asoyê derketibû, bi şeweq-şemala xwe der-dor hingavtibû.

Bi tevî hevalên xwe em dîsa ber bi Îranê rê ketin. Dema bang kirina dîka ye sisiya dûmaneke usa der-dor girt, me riya xwe xalifand. Me nizanibû em kuda herin. Me hev ra got “ya Xwedê” û riya xwe domand. Sibe ron bû.

Hinekî şun da tavê da. Lê dûman hê ji der-dora nekişiya bû, neçû bû.

Danê nîvro di nava weşekî da dumanê xwe da newala. Her alî

1 şîpûk: bobelat, keresat, felaket, belengazî, xirabî

zelal dihate kivşê. Em li cîkî mêrg-çiman bûn. Kulîlkê gazî kulîlkê, bilbilê gazî bilbilê dikir.

Ji bîn-buxsa kulîlkan me birçîbûn bîr kir, em mest bibûn. Dûr va şeş holik-kon, di nava wan da avayîkî bedew dihate kivşê. Kal-bava rind gotiye: "Pêşa mezina fire dibe." Hema bona vê yekê jî ez û dostê min Îsaxan ber bi wî avayî çûn. Nêta me ew bû, em herine wira rê pirs kin, paşê bona nan destxistinê riya xwe bidomînin. Êpêcekî çûnê şun da em gihîştine avayî. Ez pêşiyê, Îsaxan pey min bû. Min nişkê va dengê girî bihîst.

Min rodera avayî ra li hundur nihêrî. Kalekî, ku buriyê wî çaven wî girtibûn, rûdana wî ji sîngê wî berjêrtir bû, usa bi kûrekûr digiriya, te hew dizanibû keştiyên wî di nava behrê da minê bûne. Em derbazî pêş malê bûn, me derî kuta.

Hinekî şun da kalê derî ber me vekir. Çavên wî usa kort da çûbûn me bi zorê tê derxist ew giriya.

Em berbirî kalê bûn:

-Kaliko, mêvanê Xwedê qebûl nakî.

Ewî bi wete li me nihêrî û got:

-Ez qurbana Xwedê me jî, qurbana mêvanê wî me jî, kerem kine hundur.

Me da zanînê, wekî em gellek in. Em ê herine cîkî mayîn. Qet na, hema sibe gotî em hinek rizq bigihînine malbetên xwe.

Kalê hevalê me jî dewatî mal kir. Hinekî şun da em dora destxanê rûniştin, me serdew dixwer, ya ku bi spartina kalê hatibû pehtinê.

Mitala ez disotim, gelo, kalê çima digiriya?

Gelo, çi derdê wî heye?

Tav piş çiya va qulibînê, me dît çawa çend kerî pez ber bi konan dikişin. Kalê wê şevê em bi zorê mêvan xayî kir û da zanebûnê, wekî we ra çiqas ar, genim pêwîst e ez ê bidime we.

Hinekî şun da kalekala miyan, berxan ew derana hildane serê xwe.

Min firsend dît ez nêzîkî şivanekî bûm û pirsî:

-Ev kêriyên kê ne?

Şivîn bi ecêb li min nihêrî û got:

-Tê kîvşê tu cara ewlîn e tê yî van dera. Ev keriyana gişk yê bavê me yê kalikê Hezar in.

-Çend ewledên wî hene?

-Hevt kur, du keçên wî hene. Gişke xwedanê malbetê, keç-kurran, nevî-neviçirkan in.

Ez daha jî tev hev bûm. Ev çi yek e? Lê çima kale digiriya? Çi derdê wî heye?

Evarê em gişk beravî dora destexanê bûn. Ez bal qedirgirtiyê gişkan, nikî kalikê Hezar rûniştim. Xurekên bi tehm danîne ser destexanê. Ez birçî bûm, lê min ji xwerinê na na kir. Gişkan bi ecêb li min nihêrîn. Kalikê Hezar sedemê nan nexwerina min pirsî. Min bi biriyar da kîvşê, wekî hetanî kalikê Hezar sedemê giriye xwe nebêje ez nîn naxwim.

Kurên wî hema ciyen xwe da pirsên cuda-cuda dane wî:

-Kaliko, diqewime hinek dilê te ketine?

-Kaliko, belkî bûkan giliyê te erdê xistine?

-Kaliko, belkî ber xwe dikevî?

Kalê bi ecêb li herekê me nihêrî, bi hesret her ewledekî xwe mêze kir. Êpêcekî şun da kêlimî:

-Ewledên min, tişteq neqewimiye. Lê rind bizanibin, edetekî gelê me yî rind heye, wekî yek li ser destexana yekî, tişteqî ji wî bixweze, ew ser xatirê nîn, ser xatirê parî tu tiştî na na nake. Bal me hurmeta nîn mezin e. Nan ji her tiştî zêde ye, pêşdatir e.

Kalikê Hezar posîde bû, xitimî. Ji çavên wî ye kort da çûyî du hêsir jor da hatine ser rîdana wî ye sipî ye mîna berfê û dilopî erdê bûn.

-Çi bikim? Tê kîvşê çarenûsa min awa hatiye nivîsarê, wedê mirina min bi hatina van mêvana ra girêdayî bûye. Hûn min bêgav dîkin, ku ez sedemê giriye xwe bejim, wekî ez wê surra evra we ra vekim, bêjim, ezê bimirim.

Cara yekem ev giliyana boy me gişka mîna kenekî, mîna he-nekekî hate kîvşê. Çawa dibê ku ji yana mirov destê surrekê da be. Naha ne ku tenê min dixwest surra, kalê bizanibim, lê gişk ketine heyra wê yekê.

Kalê hinekî xwe ker kir û paşê dûmayîn da axaftina xwe:

-Tişt nabe, nanê xwe bixwin, surra ku min ji dunê, ji mirovan vedişart ez ê we ra qal kim.

Me qe nizanibû, çawa me nanê xwe xar. Destexan hate berav-
kirinê.

Çay anîn. Perda kulê xwe avîtibû ser dêmê kalikê Hezar, yê ku mîna ewra xitimîbû. Ewî fire çay vexwar û ji kûraya dil kire axînî. Te tirê ewî gewriya xwe paqîş kir û des bi giliyan kir:

-Bavê min mirinê ezî çar salî bûm. Diya min sîngê xwe da ber hemû dijwarî û zorberiyên, salên jiyana xwe ye ciwan rewayî min kir. Porê xwe sipî kir. Neçû mêr. Hetanî 18 saliyê ez nebûme hewcî tiştêkî. Em rind dijiyan. Demê jiyana min e here gulvedayî bû. Min şûr dikişand, hesp dida bezê, destê min ser destê hevalên min ra bû. Ez yekî bi bejin-bal, mêrxasekl bêxof bûm. Hema wê demê di nava xantiya me û kurdan da dest bi şer bû. Min jî mînanî yên mayîn xatirê xwe ji diya xwe xast û çûme şêr.

Şer ewqas, nekişand. Evarê, tariyê erd hingavtinê, min tik-tenê hespê xwe ber bi gundê talankirî ajot. Gişk revîbûn, gund bibû xerabekî. Çavê min qeretûkî ket. Min hoşeriya xwe ji kêlîn kişand. Di halê şer da sekinim. Dengêkî zirav li min tesele bû û milên min li min sist bûn.

Ber çavên xwe keçikek dît.

-Xortê mêrxas, min nekuje, min bi xwe ra bibe. Ez ê kêrî te bêm.

Ez nezîkî wê bûm. Jiyanê da cara yekem bû, wekî dilê min kire kizînî. Du çavên belek mîna xezaleke bi tirs li min dinihêrîn. Hema wê demê ez ser vê bedewa Xwedê xuliqandî bengî bûm. Min usa tê derxist, wekî bext bi xwe em rastî hev anîne û wê rojê da ez ê bê wê çirikekî, deqîqekê nikaribim bijîm. Gotî ewa bibe pêşroj û paşroja min! Ez ji ser hespê jor da xar bûm. Min destê xwe navkêlka wê ye zirav ra bir û ewa hilda da terkiya xwe. Min navê wê pirsî.

-Navê min, -ewê got, - Senûber e.

Min jî navê xwe anî ser zara. Hindik mabû em bigihîjine desta me Senûbere zivirî gote min:

-Hezar, min nebe nava leşker, eze bedew im, wê min ji te bistî-
nin.

Min giliyê Senûberê anî cî. Em tevayî bi rêke mayîn ra hatine mala me. Diya min e belengaz ji dereng hatina min tab neanîbû û nexweş ketibû. Çendekî şun da vefat bû. Min û Senûberê xêra diya min da, me tevayî şîn girt. Du meh derbaz bûn. Min gote Senûberê, were te bistînim. Lê ewê gote min:

-Ber xwe nekeve, hê zû ye, em ê bizewicin, em ê rojê qenc derbaz kin.

Şevêkê ji xewê rabûm, min nihêrî Senûber ciyê xwe da tune. Bi sersemî ji ciye xwe rabûm. Şûrê min î dîwêr da dardakirî, çekên min e dew-doza tunenin. Min zû kincên xwe xu kir. Ez çûme tewlê, hespa min jî biribû.

Şiverêya kurt ra revîm û newalê da min peşiya Senûberê birî.

Ewa di nava kincên min da mîna pelewanekeî sewgirtî dihate kivşê. Şûrê min jî li pişta xwe girêda bû. Min boy tivdîrê ji mal hoşerî hilda bû, min ewa ji kêlîn kişand Senûberê ber hîva çilmisî usa li min dinihêrî dilê min mîna mûmê nerm bû.

Senûber berbirî min bû:

-Hezar, birao, min biborîne. Min heta naha te ra negotiye ez kî me. Naha gotî te ra bêjim. Ez kurapê xwe ra biçûktiyê da kertme kirime. Van nezîka dewata me yê bibûya. Pewîst e ez ese wî bivînîm. Tu xortekî qenc î. Mêrxas î. Mêr î. Jiyanê da kî rastî te bê wê timê ji bextê xwe razî be. Di nava wedê ku mala we da manê min mîna bira ji te hiz kir. Huba min ber bi te roj bi roj zêde bûye. Lê çawa bikim? Edetê êla me heye. Ez bixwezim, nexwezim gotî ez bibime ya kurapê xwe. Heqê min tune ez yekî mayîn hez im. Ez tirsiyame, wekî bi nêteke mayîn te hez kim. Carina, ji te veşartî, min bi seheta va hêsirên çava barandiye.

Lê ez tiştekî mayîn nikarim bikim.

Min gote wê, wekî ez tu demê te bernadim herî. Wê gavê Senûberê dest avîte şûr. Me her du pelwevana meydan xweş kir. Sehetekê zêdetir me şer kir. Rastî jî Senûber mêrxas bû. Mirov ewa 10 xortên mêrxas ra nediguhêst. Ewê derbên zexm digîhande min, lê min nikaribû derbên xeder bigihînim wê bedewa ser bedewa ra. Destên min bilind nedibûn. Dilê min rê nedida vê yekê. Ez weşekî derengî ketim. Tenê weşekî. Ji wê weşê ewê kelik kir û derbek serê

min xist. Ez hema li wir erdê ketim. Min çavên xwe vekirinê, dît ku serê min ser çokên wêne. Senûberê melhem datanî ser birîna min. Tavê zeriqandinê, tebiyetê dêrê gulgulî xwekirinê, wî tewîta çivîkan li der-dora bela bûnê em bi şîn-girî ji hev qetiyên. Senûber ber bi gundê xwe çû, lê ez venegerîme mala me. Ez çima biçûyama wira?

Li we derê kî hîviya min bû? Diya min? Senûber? Ez bi posîde ketime rê û qe min xwe jî nizanibû ku da diçim. Ez nikarim bêjim ez çiqas rê çûm, lê hatim derketime êlekê. Serkarê êle Hesên Xan bi pirsê hesiyane şun da, ez hildam çawa kurê xwe. Min dest bi şivan-tiye kir, pezên Hesên Xan çêrand.

Roj derbaz bûn, mehan domand. Hesên Xan keça xwe Gulsaba pêşniyarî min kir. Min dengê xwe nekir. Paşê min bi dilkovanî ev hub-hizkirin paş da da. Min Gulsaba xwe ra çawa xûşk hesiband û çawa xûşk ji wê hiz kir. Rojekê min keriyê pêz hinda gundekî da mexel û ez bi xwe daketime ser kaniyê avê vexwim. Li ser kaniyê keçikeye cêr ser mila zûr bû li min nihêrî û got:

-Hezar, tu ser sera, ser çavan hafî, tu ku, ev derana ku?

Ez bi eceb ciyê xwe da qerimîm mam. Gelo ev keçik min ji ku nas dike. Bona şikberiyê bide belakirinê ewa dîsa kelimî:

-Qe bi ecêb nemîne, xanima min ewqasî derheqa we da min ra qal kiriye, dêmê we timê ber çavên min bûye. Deremên rûyê we bîr tînim. (Zarotiyê da ez erdê ketibûm li ser buriyê min derz hebû). Nuqutîbû dilê min, em ê rojekê rastî hev bên.

Ewê av danê min şun da bi miqîm gote min:

-Hûn vira bisekinin, ez herime mal, hatina we xanimê ra bêjim.

Hinekî şun da Senûbera ku ez boy wê şev-roj dişewitîm, dipe-ritîm hate bal min. Em bi heyr-hejmekar rastî hev hatin. Ewê kêf-halê min pirsînê şun da derbazî nêta sereke bû:

-Hezar, ezîzê min, tu çi mirovekî hetab î. Tu weda da hatiyî. Sibê roja dewata me ye sisiya ye. Kurapê min, min hez nake. Ez jî naxwezim radesî mirovekî usa bibim, yê ku ez hez nakim. Bi edetê me dewat xitim bûnê şun da keç û xort 3 roja di konê ji gund dûr vegirtî da dimînin. Di nava wî wedeyî da tu kesek nêzîkî wê derê nabe. Tu dijî edetê me şev nezîkî kon be.

Wekî kurapê min, min bihebîne, tu serê xwe hilde herê. Wê şun da min heta-hetayê bîr ke, lê ew min nehebîne, em ê wî bikujîn. Ez ê timê bibime ya te.

Sibetirê, wedekî şevê ez nêzikî kon bûm. Senûber kete hundur û berbirî mêre xwe bû:

-Kurapê mini ezîz, te ra çay daynim?

-Ji ber çaven min biceme bêheyayê demeke dirêj çûyî unda bûyî, naha jî hatî bêşerm çavên min dinihêrî, -kurapê wê bi hêrs awa got, -û bi çepa destê xwe şîlek keçikê xist.

Ji çavên min agir firiya. Senûberê tiştek negot. Ewa ji kon derket dîsa kete hundur û cara dua gote wî:

-Kurapê min, te ra çayê daynim?

Kurapê wê vê carê tiştek negot û şîleke bi zor devê wê da lê da.

Devê wê tijî xwîn bû. Qe ji çavên Senûberê hêsr nehatin.

Ewa ji kon derket û eşaretî da min:

-Ev axmax min fem nake. Têkeve hundur. Şûrê fêza serê wî hilde û paşpîlê wî ra derbaz ke.

Ez hêdî-hêdî derbazî hundur bûm. Xortekî hurpîjî serê xwe kiribû nava destên xwe û bi hêrs fişefîşa wî bû. Min şûr hilda, xwest piştê da biniçikîm destê min, min ra nehatin. Senûberê dît ez dudilî bûme nava weşekî da şûr ji destê min kişand û piştî kurapê xwe da çikand. Em tevayî ji kon derketin, herekê me hespekî siyar bû û di alîkî mayîn da, da rikêfa.

Em li cîkî peya bûn, wekî bîna xwe bistînin. Senûberê serê min danî bû ser çokên xwe. Şîrîn-şîrîn ketime xewê. Wextekî min nihêrî Senûber min hişyar dike:

-Hezar, rabe, ewana tên?

Ez bi veciniqî ji ciyê xwe rabûm. Wê da ber bi me weke 10 siyara dihatin. Min gote Senûberê, wekî dema revê ye. Le ewê nehîşt û got:

-Wedê me miqabilî xantiya we şerkirinê bavê min nehîşt ez şer bikim, got ku ez keçik im. Naha dem e, ez ê hêza xwe bicêribînim. Tu piş va min çev ra ke.

Siyar nêzik bûnê Senûberê kirê qîrînî:

-Apo, gunê min tune. Kurê te ji min hez nekir, ez nehebandim. Min çi bikira?

Apê Senûberê û bavê wê mîna siyarê qîtê erîşî me kirin. Senûberê ev yek dîtîne fîrek kire kevîn. Nîşan hilda, apê xwe ji ser hespê anî xarê.

Paşê ewê bi emir kire qîrinî:

-Bisekinin û guh bidine min!

Gişk ciyên xwe da sekinîn. Çi qewimîbû, çawa bibû Senûberê her tişt qal kir. Ew jî da zanîne ku ji min hiz dike. Bavê wê bi hêsirên çava emir kir û got:

-Senûber rast dibêje, werên em paş da vegerin!

Wana bi posîde meytê apê Senûberê hildan paş da vegerîn. Lê em vegerîne gundê me yî ezîz. Li wî gundî diya min ez anîbûme dunê, mezin kiribû. Min xwe ra jiyaneke qenc saz kir. Min Senûber stend. Zarên me nedibûn. Rojîke zivistanê ye bi ba-bager bû. Ez ber roderê rûniştibûm û posîde-posîde li rastên ku kirasê sipî xwe kiribun dinîhêri. Lê Senûber ber bixêriye rûniştibû û ketibû mitala. Min seqirtî teriband:

-Senûber, çima ez nebûme bav?

Xwezila min ev giliyana negotana. Te hew dizanibû birûskê li Senûberê xist. Nişkê va ji çavên wê ye belek hêsir bariyan.

-Belê, ev jî aha, -ewê got, -wekî usan e di nava me da neqayîlbûn pêş da tê.

Senûber rabû ser piya. Bi nihêrandinên xwe ye posîde va ez mêze kirim. Destên xwe stûyê min ra bir, ser hev, ser hev rûyê min, çavên min paç kir. Bi girî di nava weşekî da şûrê diwêr da dardakirî hilda û dilê xwe da çikand.

Kalê giliyên xwe ye dawiyê ser hev da anîne şun da, hoşeriya ku bin arxalixê xwe da veşartibû derxist.

-Binê Senûberê awa xwe kuşt, -ewî got, - û bi hêz hoşerî dilê xwe ra kir.

Sibê me kalikê Hezar î 120 salî yê bi xem û ecêb bi hurmet binax kir.

Kalikê Nûrî xwe ker kir. Keserek rihaşt û qelûna xwe ye temirî vexist, qulabeke kûr lê da, bi rêz em mêze kirin. Em gişk ketibûne nava mitala. Ber çavên me du peykelên bi nûranî dihate kivşê. Yên mirovên ku giliyên wan, kirinen wan yek bûne - peykelê Senûber xanime û kalike Hezar.

IV.
ZINARÊ HÛMAYÊ
(Bi kurtkirinê biçûk va)

Famîl Sulêymanov

Gund li cî-warekî usa hatibû pencvedanê ku, girê nikî gund ew ji bayê sar î, ji aliyê çiyayê Mirovê ber bi Erez dihat, diparast.

Pêşberî gir zinarê Hûmayê bilind bilind bibû. Ev zinar usa gewremezin bû, gava tu derdiketî ser wî, zozanên Karagolê, zinarê Ketezbûkê, çiyayê Tûmas, Erimezê, zinarê Laçînê, çiyayên Eliyanliyê mîna kefa destan dihate kivşê. Dema mirov hey ev dîdem mêze dikir, te hew dizanibû, ew ber tabloyekê sekiniye, ya ku wênesaz ser rewşa xwezayê nitirandiye. Bona derkevî zinarê Hûmayê ji gundê me du rê hebûn. Rêkê va pirr dijwar derdiketî, ev rê nava zinaran ra derbaz dibû. Lê kê ku dixwest bi maşînê here pêwîst bû sî kîlomêtrî rê qevz ke. Bintara zinêr şikefteke mezin hebû, weke pênsid pezî digirt.

Pêşberî zinarê Hûmayê rasta şivîn bû. Ev rasta aqareke fire bû.

Li rastê peykelekî ji kevir yê şivanekî apince xwe alandî, lê li dora wî kerî pezê ji keviran hebû. Li bal şivîn seyê ku bibû kevir ketibû. “Bi siya zinarê Hûmayê” pîrikên me ye porsipî, rîdansiapiyen me ye hişkûr wede tê derdixistin. Havînê wedê nîrvo sî dikete ser kevirê reş rast sehet yek bû.

Ez timê diçûme rasta şivîn, li hinda peykelê kevirî yê ku apince xwe war kiribû disekinîm û bi seheta va ew ber çavên xwe ra derbaz dikir.

Diketime mitalan gelo kîjan peykelêkerî ev berhema hunerî efirandiye. Lê çiqasî zûr dibûm, ew mêze dikir rêça tu destî nedidît û hatime ser wê baweriyê, wekî ev peykel, ev pezên kevirî ji qudreta Xaliqê Jorîn mîna tiştekî nedîtî hatiye xuliqandinê.

Derheqa zinarê Hûmayê da ji kal-bavên me destpekîrî hetanî ro-

jên me bûyerek ser zaran e. Bi gotina gotiya li navberiya Kurdistanê mirovekî dewlemend hebûye. Jimara revoyên hespên wî, ya keriyên pez, deva tune bû. Rast e, Xaliq ji her tiştî par dabû wî, lê ji aliyê ewledan da tenê keçîkek dabûyê. Ev keçîk ewqasî bedew, ewqasî aqil bû ku, hemû obên derdor derheqa bedewiya wê da dastan qal dikirin, pesin digotin.

Keçîkê hemû xazginiyên hatî wê da dikir, tu kesî ra “erê” nedigot.

Tu nebê, keçîkê şivanê obê yî bi nav-deng, bi bejin-bal Hesret hez kiribûye. Her şev ewê wî ra tevayî li zinarê Hûmayê ber ronahiya hîvê esmanê bi steyrk mêze kirine.

Ev rojên hetab gellekî nakişîne.

...Li ser zinarê Hûmaye rasteke biçûk ya bi navê Hesret heye. Min zarotiyê da şev heywanên me dibir li wê rastê diçêrand, hetanî berbangê çavên xwe li steyrkên esmîn digêrand, bobelata Hûmayê û Hesret mêtûyê xwe ra derbaz dikir. Ez dewsa piyên wan digeriya, derheqa wê zelûliyê¹ da ku bibû dastan mitale dikir. Her ku ez rex vî zinarê ecêb ra derbaz dibûm, min ev zinaran didane axaftinê.

Lê wedê min ji wana tu gilî nebihîstinê, te tirê horî-meleka hubê ber guhê min dikire piçepîç:

-Ew maşoqana li wira bin erş-esmanê paqîş da hevra diketine axaftina şîrîn û derheqa çarenûsa xwe da rê ji riya dibijartin. Lê bayê reş huba dilê her du hizkiriyan da ber xwe bir kevir-zinaran xist.

Rojekê kurê apê keçîkê bona wê xazginiya dişîne. Hizkiriya ev yek bihîstinê pirr pirr posîde dibin. Dibên yê xazgînî şandî him dewletî, him jî cindî bûye. Lê ew î zewicî bûye, du zarên wî jî hebûne.

Keçîk dinale, dike axe-of û mirovan dişîne bal bavê xwe hîvî dike, bila ew vê yekê ra qayil nebe. Bav keçîkê gazî bal xwe dike û dibêje:

-Keça min, rast e jin-zarên wî hene, lê ewî dewlemend e. Lê Hesret şivanê me ye, yekî kasib e. Keçîk dibê:

-Mirov dikare her tiştî mîna parê par ke, le hub-hizkirinê nikare têke du ciya.

1 zelûlî: mehrûmîyet, belengazî.

Bav hêrs dikeve û yekcar nêta xwe dibêje, wê zûtirekê dewatê bike.

Hesret û Hûmayê dixwestin ji vê derê birevin. Bavê Hûmayê û apê wê bi vê yekê dihesin û çavnêrîna ser keçikê daha jî zêde dikin, nahêlin ewana rastî hev bên. Deh roja dewatê didine lêdanê.

Hûmayê hespê zînê bi zêrîn, zengûya bi zêrîn, gema bi zerîn dîkin. “Xwedê xêrê bidê” dibêjin û wêya verê dîkin.

Hesret li “Rasta Şivîn” pez diçêrand. Ewî zanibû, wekî îro wê Hûmayê verê kin.

Ewî bi rêpanî, bi hesretî ciyê rasthatinê-zinarê ku bibû şehedê evîndariya wan mêze dikir û dilê wî ra xwîna reş derbaz dibû.

Vê weşê dengê zûrna reş hey nêzîk va dihatê bihîstinê û li zinaran diket, dikire gujeguj. Nişkê va li serê zinêr siyarekî hespê boz hate kîvşê. Eva Hûmaya kincê buktiyê xwekirî, hespa buktiyê siyar bûyî bû. Keçikê Hesret, Hesret jî li keçikê dinihêrî. Dilên hizkiriya di nava xwînê da dimewicî.

Li ser zinêr bi tehtan wargirtî cîkî star hebû, Berê bengî dihatin vira star dibûn, rûdiniştin û hev ra diketine nava sêlafa hub-hizkirinê. Hûmay ji hespê peya dibe, tê wê derê û ji wir xwe jor da davêje. Hesret ev yek dîtî berê xwe dide Xwedê û bi dengê lerizî dibêje:

“Xaliqo, min têke kevir.” Xwedê dengê dilê bi huba paqîş dipejirîne û di nava qasekê da ewî dike kevir.

Keriyê pezê hinda wî û seyê wî yî bi îtbar jî dike kevir.

Ji vê qewimandinê şun da xût wî zinarî ra dibên zinarê Hûmayê, wê rastê ra dibên Rasta Şivîn.

Peykelê kevir usa sekiniye ku, rastî jî li zinarê Hûmayê dinihêre.

Bi gotina gotiya dibên, wedê keçikê xwe jor da avîtiye hê li hewa dibe kew û her ro difire tê ser pilê peykelê kevir datîne, dike nale-nal, zarezar, hêşiran dibarîne, pûrta xwe vediçire.

Mîn her dem peykelê kevir nihêrînê, didît wekî zok kew ser pilê wî ne. Lê li ser serê zinarê Hûmayê zok eylo hêlûn danîbûn.

Ewana timê zo bûn.

FERHENGOK

Aa

ahil: mirovê bitemen, kal, pîr, zana
alt kirin: mexlûb kirin
aran: cihê ku ne zozan e, sermiyan
avtoajo: ajovan
awa: wisa, wiha
axlêve: destpêka biharê
azadar: azadker

Bb

baîs: sedemkar, kesê ku bûye sede-
 mê bûyereke
bajon: çol
bakî: bayekî
bede: bedew
belg: 1. rûpel 2. belge 3. nîşan
beqî: teqez, helbet welhasil
- beqî hinekê din derdikebine
holê: helbet hinekên din derdike-
 vine holê.
berav bûn: berhev bûn
berbirî yekî bûn: berê xwe dan wî û
 pê re axivîn
berbîn: tiştê ku bêhna mirovan ve-
 dike
berk: sext, zexm, xurt, mehkem
berpal: berpişt
- balgîk da berpalê xwe: balîfek da
 ber pişt xwe
beşer: 1. rû, çehre 2. mehde
beşeve hatin: vebîşirîn
beşter: beşdar, kesên kombûyî
teribandîn: xera kirin, betal kirin
bikebe: bikeve
bilandin: çend caran li ser hev gotin
-gotin-bilandin: jî gelek aliyan ve
 nîqaşkirin

binelî: niştecih, gelhe, mirovên li
 gund, bajerekî dijîn

binên: binêrin

binge: bingeh, war

bingekirin: bicihkirin

binrex: raxistina binî, doşek

bistan: memik, çiçik, ber

bişqvedayî

bivînin: bibînin

bîzbîzî: (ji bo pirçê) vîzvîzî, rast û
 hişk **bokeberan:** 1. beranê bijarte
 2. (mecazî) xasmêr

brîgadîr: (bi rûsî ye) serokê komekê,
 serkar

Cc

cahil: ciwan, cahil

cake: careke din

ce'dandin: 1. hewl dan 2. kudandin,
 berdewam kirin

-bicedîne: bikudîne, berdewam bike

cer: kûzê avê

cew: cihoka avê

cêhê cêhê: cihê cihê

cizaretî: ceza, eziyet

cîkî: cihekî

ciyê sekînî: bêsedem, li ser tiştêkî
 tune yî

cul'etî/cur'etî: wêrekî, lehengî, ce-
 saret

cûn: cûtin

Çç

çarmedor: çeper, çît û sûra dorê

çerçîrîn: xebitîn, têkoşîn

çirîk: kêlî, deqîqe

çirp kirin: ji nişkê ve bazdan
çirpîke/çirpiyek: şivika ter

Dd

dan gava: gav kirin, zû meşîn
derîk: deriyek
daw: dafik, tele, kemîn
delk-dolav: dek û dolab
derem: reh, damar
deroder kirin: qewartin, derbider kirin
dersxana deha: dibistana amade-hiyê
derz kirin: fehm kirin
destexan: sifre
destkêş kirin: gema hespê girtin û li pey xwe kaş kirin
di riya Xwedê: bide xatirê Xwedê
dîrêktor: gerînende, mudîr
duruztî: nebaşî
dû: derman

Ee

elam kirin: îlan kirin
edlayî: edalet, dadmendî, heqnasî
elbê ra: pê re, wê gavê, bêmuhlet
elk: 1. li gorî mîtolojiyê peri ya ku tê ser jinên welidî û ruhê wê distîne
2. jina porgijik
emenî: cureyekî ferşan e
enene: pirs û pirsiyar
-ketin enenê: bi berfirehî pirsiyara tiştekî kirin
erze: daxwazname, erzehal
esse: bêgîlî, teqez, mutleqe
eyan: aşkera
eyan kirin: aşkera kirin

Êê

êgin: jîr, mêrxas
êvarî: şevbihêrk

Ff

fera-fotik: qasik-tasik
fesal: 1. awa, şêwe 2. baldarî, dîqat
-bi fesal: bi baldarî û dîqat
firnaxdar: nazdar û fêlbaz

Gg

gapêran: mirovê qerase, kesê wekî gayekî
gebezok: ji gêlî biçûktir e û ne kûr e; gelî ji gebezokê kûrtir e
gep kirin: axaftin
germeşo: cureyekî darên ku zû bi zû naşikê
gewlez/gelwaz/gewlaz: 1. bendê ku dendikên gêzan, hêjîr û hwd li ser têne raxistin 2. (mecazî) tecrube
gotî: divê, pêwist e
govek: 1. çenber, xeleq, dayîre 2. bingeh 3. fireh
-govendê govek girt: govend wekî xeleqekê li hev rêz bû gupik:
-bi gupikî

Hh

harehejî bûn: dîn û har bûn
hatin dest-rûyê hev: 1. (di nava hev-temenan de) merhebatî dan hev û rûyên hev maç kirin 2. piçûkan destê mezinan û mezinan jî rûyên piçûkan maç kirin
hatin rayê: hatin ser rîyeke hevpar, li hev kirin
hedimandin: rûxandin, tep kirin
hemjiyînxane:

herda: her duyan
herek: her yek
herîreşk: cihê av û herî
her sêk: her sê
hev: heb
hetab: xweşbext, bêkeder
hewaldan: axaftin, xebordan
hewas: xwestin
hewêrze: hawarî, gazî û qîjevîj
hezir kirin: hizir kirin, hesab kirin
hêjika/hêcika: çend kêlî/xulek berî
 niha, demeke gelekî kurt
hên: dem, gav, wext
hêvişandin: kêmasî kirin, teksîr
 kirin
-nehêvşandin: kêmasî nekirin,
 teksîr nekirin
hilbirîn: bilind kirin
hilçandin: girtin nava xwe
hilşîn: rijîn
hilxistin-daxistin: 1. hildan-danîn 2.
 bilind kirin-nizm kirin
hingavtin: girtin nava xwe, dor lê
 girtin
hivî kirin: tika kirin, lavayî kirin,
 rica kirin

Îî

îja: îcar
îjînêr: endazyar, mihendiz
înstîtût: enstîtu

Jj

jan: êş
jehrdadayî: jehrkirî
jenîn: 1. (dîwar) lê kirin 2. (mijar) lê
 gerîn, lê pirsîn 3. (gule) lê reşan-
 din

Kk

kabînêt: civat, meclis
kalêt: şîrînayî
kare: awa, şekl
-çi kare ye: çawa ye, çito meriv e/
 tişt e
kalan (awayê tewandî yê peyvê
 kêlîn): cihê şûr, kêr û xencerê
kalêt: şîrînayî, qurabiye
karkar: karker, xebatkar
kasib: kesê ku bi qezenca destê xwe
 debara xwe dike, feqîr
kelb: seg, kûçik
kelefe: kavi, xirabe
kerrekerr: bêdeng
kese: kesek
kesirîn: 1. hesret kişandin, dil avêtin
 tişteki 2. tî bûn
kewkî: tiştê ku virvirkî tê avêtin
kew ketibû sibê: berê asoyê spîtayî
 ketibûyê
kewgirîn: gelekî giriyan, zû zû bi ber
 xwe ketin, hundirê xwe xwarin
kewran: karwan
kêlimîn: axivîn, gotin
kêlîn: -kalên (awayê tewandî yê pey-
 va /kalan/- cihê şûr
kêwirîşk: kerguh, kêroşk
kimkimî: mişt tijî
kirtînî: kirtekirt, dengê kotinê
kivşkîrî: diyarkirî
kolxoz: dema Yekîtiya Sovêta berê
 de koperatîfa gundiyan bû. Gundî
 dibûne endamê kolxozê, kê kar
 dikir, dewsa heqê xwe, rojxebat
 distant. Pêş rojxebatên xwe
 dawiya salê kolxozê çi direşand û
 diçand ew distant.

kula serteşî: kula bêderman

kutasî: dawiya dawîn

Ll

lehd: yekşem

leqem ketin tişteki: livîn, qeş û derz pê ketin

hine: hinek

lê lê bû ...: hema hema dikir ku ...

lipitandin: lebat, bizav, hereket

litimîn: milmilîn, pirpitîn, hejîn

livitîn: libitîn, hereket kirin, ciyê xwe de nesekinîn

loqman: zanayên gelêrî, hekîm

Mm

maldizk: mixbex

menî: 1. mehne, wate 2. sedem 3. bihane

meht: riprast û şimşad

meqledûz: miqnatîs

mer I: bêra devrast

mer II mirov, merî

-mera: mirovan

meyt: mirî, cinyaz

mewicîn: tê de gevizîn, tê de gut bûn

mexmer: qedîfe

mifte: belaş, bêpere

miftexur: belaşxur, heramxur.

minê bûn: winda bûn

miqabilî: li hemberî

mitale: fikir û raman

mixenet/minexet: xayîntî, xedarî

mukur hatin: îtfraf kirin

-xwe mukur hat: her tişt rast got, her tişt hilda stûyê xwe, tişteke veneşart

Nn

namebir: posteger

namilpen: navmilpehn

navnîş: navnîşan

ne, axir: jixwe

nebîniyayî: bûyerên ecêb, yên qe nebûyî, yên ku qe kesî nedîtiye, nebihîstiya

nefî kirin: koçber kirin, surgûn kirin

netê: nedurist, çewt û neyînî

nevê: nebêje

nêt: 1. fikir û raman 2. wate

nûqî avê an jî tişteki bûn: ketin kûrahiya wê/wî, noq bûn

Pp

pak: baş

pal dan: razan

para va: ji pişt ve

paşdemî: pêşeroj, dema bê

penc vedan: (dar û giya) reh berdan xweliyê û xurt bûn

peroşî: heyecan

pev ketin: ketin xeberdan û suhbetê

pêberjêr: ber bi jêrê

pêpar/pêpal: qudoş, yom

pêpes kirin: bînpê kirin, pê lê kirin

pêşek: pîşe, meslek, sinaet

pêşekzan: pişekar, xwedî-meslek, sinaetkar

pêxem lê xistin: feşkilandin, pûç kirin

piçepiç: pistepist

piçilikîn: alîn, geriyan

-li hev piçilikîn: li hev geriyan, li hev aliyan

pişikîn: bijînîn, rijîn û lê gerîn

piştîkûz: pişthotik

pîrqepîrq: hîrehîr, cureyekî kenê bi deng
poçte: poste
posîde bûn: xemgîn bûn, bi ber xwe ketin
poyêz: şîmendîfer, trê

Qq

qalim qalim: qalind, stûr
qas-quduret: hêz û karîn
qeleşe: kozika leşkerî; çeper
qelexa kerma: qûçê sergînan
qelp: dilnesax, xayîn, sextekar
qemilîn: 1. reng lê qemer bûn 2. kizirîn
qerd: ajalên qert, gir, mezin
qetilkarî: qetliyam, komkuji
qevz kirin: bi ser re bazdan
qewat: hêz, quwet
qewimandin: serpêhatî, bûyerên pêkhatî
qewî: xurt û zexm
qiloz bûn: bilind bûn
qûç: hop, balûle
qudûm: taqet, hêz

Rr

ra bûn: ray jê bûn, çareser bûn
ray: 1. rê 2. çareserî 3. deng (hilbi-jartîn)
-hatin rayê: hatin ser rîyeke hevpar, li hev kirin
reşeve kirin: çilovîlo kirin
revo: hespê bezê; kihêl
rewa: 1. seza, meşrû 2. layîq 3. diyarî
-rewayî filan kesî: diyarî û pêşkêş ji bo filan kesî
roder: pace

ronkayî: ronahî
rozgar/rojgar: 1. çerxa demê 2. demsal, mewsim

Ss

satircem: cureyekî zikêşa giran e ku carinan mirovan dîkuje ji
sazbend: koma muzîkjenan
seba: ji bo
seh kirin: bihîstin û tê gihiştin
seqirtî: bêdengî
serederî: çareserî, karîn
-serederî jê derxistin: çareser krin, pê karîn
serfînyazî: serfirazî
serwaxt kirin: tê gihandin, pê dan fêm kirin
sew: tirs, sehm
sewgirtî: sehm-girtî, tirsîyayî
sipîçolkî: rengê spî û gewr tevlihevî
sivder: korîdor
stansiya: rawestgeh (peyveke rûsiye)
stekan: îskan
silikîn: sil bûn, tengijîn

Şş

şebec: serê sibê, şefeq
şel: şal
şelte: parçe (ji bo tiştên cemidî)
şevkorî/şevkorî: kesê ku di tarî-banê de baş nabîne
şexte: zîpîka gur a ku piranî zirarê dide giya û daran
şêkirdarî: sipasdarî
şîpûk: bobelat, keresat, felaket, belengazî, xirabî

Tt

tab: sebr, hedûr

tat/teht: kevirê ku rûyê wî rast e

talandin: bi dizîka veşartin û çavdêrî kirin

temûl nekirin: tehemul nekirin

teng 1. nefirê 2. kembera zîn

-teng şidandin: kembera zîn li bin-zîkê şidandin

tesele bûn: hatin bihîstin

-deng lê tesele bû: deng hate guhan

tevzî: êş û janên zirav ên wekî elektîrîkê di canê mirovan re derbas dibin

tê ra dîtîn: wisa dîtîn, wisa hesab kirin

têxnîkûm: dibistana amadehiyê, lîse

tîfal: 1. zarokê viringî 2. reben, belengaz

tir: qey, hew

-te tirê: te qey digot, te hew dizanibû

-wî tirê: qey wî, hew wî

tîştîşî bûn: qelişîn, derizîn

topik: gir, kêrt, bilindayî

tirb: gor, merzel

Vv

verê kirin: şandin

Ww

weyne: bîne

wede: heyam, dem

wekilandin: dubarekirin

welgerand: wergerandin, zivirandin, fetilandin

weş: heyama kurt

wexta: hema piştî çend xulekan

wêlî: xizm

Xx

xalîfî: rîya xwe şaşkirî

xanêkirin: xuyakirin

xewle: cihê talde û kesek lê tune yî

xeyîrîn: guherîn

xênî ji: ji bilî, xêncî

xingirandin: xwe di govendê de hejandin

xingirîn: di govendê de lîstin

xof: tîrs

xuliqandin: afirandin, çêkirin, pêkanîn

xuliqîn: afirîn, çêbûn, pêkhatin

xudan: xwihdan

xût: hema

xwînmêt: xwînmij

xuzula: xwezila

Yy

yanê: an jî

Zz

zar I: zarok

zar II: ziman

zelûlî: mehrûmîyet

zendegirtî bûn/man: mehtel man, ecêb man

zer: kendal

zêrandin: êşandin, eziyetkirin

zûr bûn: 1. bêyî çavê xwe biqirpîne li tiştekî nihêrîn 2. demeke dirêj mehtel mehtel li tiştekî nihêrîn

Berhemên Ahmedê Hepo
 ne tenê ji aliyê zimên ve
 belgeyînên wêjeyî ne; her
 wiha ew serpêhatiyên wî jî
 bi qasî zimanê wî orjînal in.
 Her kurdekî ku bi mebesteke
 kurdewariyê çûye Azerbaycanê
 teqez riya wî bi mala Apê
 Ahmed ketiye; bi alîkariya wî
 ghiştiye mirazê xwe. Ahmedê
 Hepo him damezrînerê wêjeya
 kurdî ya kurdên Azerbaycanê
 him jî bi xebatên xwe alîkariya
 pêşveçûna wêjeya kurdên
 Ermenistanê kiriye.

....

Ev "Berhevoka Serhatiyan" a
 Ahmedê Hepo li ser du beşan
 hatiye levakirin: Beşa yekem ku
 para mezin a pirtûkê pêk tîne
 ji kurteçîrokên wî bi xwe pêk
 tê ku nivîsandina wan ji sala
 1965an dest pê kiriye: Hinek bi
 sernavên "Adar" û "Emir Gul
 Vedide" wekî pirtûk hatine
 weşandin, hinek jî di nava
 berhemên wî yên din de hatine
 raçandin. "Adar" û "Emir Gul
 Vedide" jî tîpên kirîlî ji bo latînî
 hatin guhastin; her wiha yên
 belawela weşandî di vê beşê de
 hatin kom kirin. Di beşa duyem
 de jî hinek kurteçîrokên ku wî
 ji azerbeycanî wergerandine
 hene.



ISBN: 978-605-81608-3-5



9 786058 160835
 peywend - çîrok

PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

